CİGERXWÎN



# TARÎXA KURDİSTAN

-1-

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

LIV, KL, 2439
02/08/2017
O CIG TAR (1)

# TARÎXA KURDİSTAN

## Cigerxwîn

CÎLD 1
ÇAP 1

Institut kurde de Paris

STOCKHOLM 1985

WEŞANÊN
ROJA NÛ

AGAHDARÎ:

Dema me dest bi amadekirina çapa "Tarîxa Kurdistan-cîldê yekem" kir,mamosta Cigerxwîn li jîyanê bû. Li ser daxwaza wî, em têkilî şêwayê nivîsandina wî ya rêzmanî nebûn. Her wisa li ser navan(Navên bajaran, dewletan, qiralan û hwd.) jî me tu guherandinek çênekir. Lê, ji bo hêsankirina xwendina pirtûkê, me rûpelê naverokê amade kir û çend xarîte û wêne lê zêde kir. *(Xarîte, ji "The Penguin Atlas of Ancient History" hatine wergirtin.)*

WEŞANÊN ROJA NÛ

Institut kurde de Paris

ISBN 91 7672 010 1
Copyright Cigerxwîn
Printed in Sweden
Stockholm 1985

## NAVEROK


Pêşgotin ........ 1
- Cografîya Kurdistan ........ 3
- Koka Miletê Kurd ........ 5

Zimanê Kurd ........ 14

Ola Kurd di îro de ........ 17
- Rojî ........ 18
- Cejnên misilmanan ........ 19
- Elewî, mesîhî, êzdî ........ 19

Ola zardeştî ........ 23
- Zardeşt ........ 24
- Avista ........ 27
- Ola manî ........ 36
- Zardeşt û ola îslam ........ 39

Awirek bi kurtî li pêş tarîxê ........ 40
- Qunaxa kevirî kevnare (Balyoletîk) ........ 40
- Qunaxa kevirî navçe (Mîzolotîk) ........ 42
- Qunaxa kevirî nû (Nîyolotîk) ........ 42
- Qunaxa kevirî nûhatî ........ 43

Welatê Somer ........ 44
- Dewleta Gutî li Somer ........ 51
- Malbata Orê sêyem ........ 58

Dewleta Êlam ........ 65
- Dewleta Susa ........ 66
- Dewleta Êlam di bajarê Larsa de ........ 67
- Êlam û Somer ........ 68
- Dewleta Kasî ........ 69

Dewleta Akad ........ 73

Dewleta Babîl ........ 76

Kardoxî, Lolo, Horî û Mîtanî ........ 80
- Dewlet yan miletê Nayrî ........ 80
- Kardoxî ........ 81
- Sêrtî ........ 82
- Musrî ........ 83
- Alan ........ 83


Institut Kurde de Paris

AGAHDARÎ:

Dema me dest bi amadekirina çapa "Tarîxa Kurdistan-cîldê yekem" kir,mamosta Cigerxwîn li jîyanê bû. Li ser daxwaza wî, em têkilî şêwayê nivîsandina wî ya rêzmanî nebûn. Her wisa li ser navan(Navên bajaran, dewletan, qiralan û hwd.) jî me tu guherandinek çênekir. Lê, ji bo hêsankirina xwendina pirtûkê, me rûpelê naverokê amade kir û çend xarîte û wêne lê zêde kir. *(Xarîte, ji "The Penguin Atlas of Ancient History" hatine wergirtin.)*

WEŞANÊN ROJA NÛ

ISBN 91 7672 010 1
Copyright Cigerxwîn
Printed in Sweden
Stockholm 1985

Institut kurde de Paris

## NAVEROK


Pêşgotin .................................... 1
Cografîya Kurdistan .......................... 3
Koka Miletê Kurd ............................. 5
Zimanê Kurd .................................. 14
Ola Kurd di îro de ........................... 17
Rojî ......................................... 18
Cejnên misilmanan ............................ 19
Elewî, mesîhî, êzdî .......................... 19
Ola zardeştî ................................. 23
Zardeşt ...................................... 24
Avista ....................................... 27
Ola manî ..................................... 36
Zardeşt û ola îslam .......................... 39
Awirek bi kurtî li pêş tarîxê ................ 40
Qunaxa kevirî kevnare (Balyoletîk) ........... 40
Qunaxa kevirî navçe (Mîzolotîk) .............. 42
Qunaxa kevirî nû (Nîyolotîk) ................. 42
Qunaxa kevirî nûhatî ......................... 43
Welatê Somer ................................. 44
Dewleta Gutî li Somer ........................ 51
Malbata Orê sêyem ............................ 58
Dewleta Êlam ................................. 65
Dewleta Susa ................................. 66
Dewleta Êlam di bajarê Larsa de .............. 67
Êlam û Somer ................................. 68
Dewleta Kasî ................................. 69
Dewleta Akad ................................. 73
Dewleta Babîl ................................ 76
Kardoxî, Lolo, Horî û Mîtanî ................. 80
Dewlet yan miletê Nayrî ...................... 80
Kardoxî ...................................... 81
Sêrtî ........................................ 82
Musrî ........................................ 83
Alan ......................................... 83


Institut kurde de Paris

Dewlet û welatê Lolo ..................... 84
Xaldî û Mûşkî .............................. 86
Horî, Hevêrkî ............................... 88
Welat milet û zimanê Mîtan ................ 90
Şerên Hêtîtan û kurdên Horî û Mîtan ........ 92
Hevsînorê Mîtan miletê Asûr ............... 95
Koka miletê Asûr û welatê Asûr ............. 96
Dewleta Mîdya ............................... 108
Nayrî û Sobarî ............................. 109
Dewleta Mîdî ............................... 110
Kemberî û Eskîsî kîne? ..................... 112
Şehristanîya Mîdya ......................... 114
Faris ....................................... 117
Dewleta Faris .............................. 118
Destpêka Êrişên ereb li ser welatê kurd û faris 130
Şorişên kurd ............................... 140
Dewleta Merwanî ............................. 149
Destpêka dewleta Merwanî-Humeydî................149
Avakirina Nesrîyê .......................... 160
Wezareta Fexrîdewle ........................ 161
Fermandarîya Fexrîdewle .................... 171
Dewlet û fermandarîya Heskîf a kurdî ........ 193
Dewleta Kurdî Zendî ......................... 201
Dewleta Kurt ................................ 215

Institut kurde de Paris

# PÊŞGOTİN

Jıbo zanîn:

Dixwazim bi kurtî biguhêzim û binivîsim û di dawîya nivişta xwe de lîstakê bi navê wan niviştên, ko min ji wan guhaztiye bidim xuyakirin.Çawa,ko di gelek cihan de awira xwe didim zanîn û guh nadim çîrok û evsana û goman û derewan ji nivişta xwe dûr dixim. Herwekû gelek caran di ber miletê kurd de didêrim û carna jî dirêjî miletê kurd dikim û kêmasîyên wî didim ber çavên wî.

Ev çend salin, ko renc û dijwarîyê, dixum û serê xwe tê şênim û dixwazim bi vî karî,karekî ji mirovanî û miletê xwere pêşkêş bikim û di nav karwanê xebata milet û mirovaniyêde destvala bi rê nekevim û di vê meydanêde xwedî par û pişk bibim.

Ne dijminê kesîme lê dijminê ristikên kevn û riziyayî û bi wan bawer nakim û dixwazim sivik ji nav welat û miletê me bêveger koça xwe bar kin û em riwên wan hew bibênin. Ew kesê bixwazî avê di bin seradêde veşêrî,xwe tenê didin xapandin û derewa li xwe dikin.

Dijminê miletê kurd dixwazin,min ji milet, yan miletê kurd ji min dûr bixin,lê hew dikarin. Tenê heta, ko miletê kurd çavên xwe vekî û qencîyê ji pîsîtî û dijmin û dostê

Institut kurde de Paris

xwe nas bikî, wê gelek ji me bi kul û derdên xweve herin bin axê, lê milet û mirov her û her sax dimênin, paşê ewê bi xwe biryara "herê-na" di vê meydanê de bidin û dost û dijminê xwe ji hev nas bikin.

Di vî perçî de dixwazim, Cografiya û nav û koka kurd,zimanê kurd,olperestiya kurd û rewşa abûrî,civakî,rêzanî bidim xuyakirin.Eger ev karê dijwar ne barê mirovên weke mine jî,lê dixwazim her nebî,kevirekî ji devê rê bidim alî, ko hozan û tarîxzanên piştî me karibin bi hêsanî vî karî bibin serî û bi cîbikin.

Çawa hin mirovên weke Mihemed Emîn Zekî Beg û Merdoxî û Şerefxan û hin mirovên dî ji hene,ko rê jimere xweş û ronî kirine,ko şayanê pesn û rûmetin û em di îrode sipasên xwe û miletê kurd ji wan mirovênre pêşkêş dikin.

## QENCÎYÊN XWENDİNA TARÎXÊ

Kurê Esîrê Cizerî dıbêjî:

1- Mirov bi raborî û serpêhatiyên kevnare agah dibî.
2- Dikarî qencî û neqenciyên mirovên berî nas bikî û xwe ji wan neqenciyan biparêzî û kêmasiyên mirovên mezin nasbikî.
3- Bi xwendin û zanîna wê hînî rêzanî siyasetê dibî, weke neynikê her tiştî têre dibênî.
4- Dikarî di civatande xwe bixî dilê xelkê û xwe bidî nas kirin û dilê xelkê xweş bikî.
5- Tarîxzan ji serpêhatiyên tarîxê natirsî û bi gernasî li ber zor û setemê radiwestî û dikarî xwe biparêzî.

Şerefxan Bedlîsî Dibêjî:

1- Xwendina tarîxê gelek nerme-hesaniye.
2- Di xwendina wêde xweşî heye.
3- Rastî û derew ji xwendina tarîxê têne xuyakirin.
4- Mirov hînî serpêhatiyên kevnare dibî.
5- Tarîxzan bi xwe zana û ne hewceyê hana ye.
6- Tarîxzan, dil xurt û ji serpêhatiyrn natirsî.
7- Dilê mirovên zana nerm dikî û dûrî sawiran dikî.
8- Mirov bi xwendin û zanîna tarîxê zana û mezin dibî.

Bi rastî tarîx bîr û baweriya mirov, weke xwe mezin û fireh dikî. Çax û demên naka û hete bi hevve girêdidî û bi tarîxê rewşa çax û demên xwe nas dikî û ev tiştên, ko Cizerî û Bedlîsî gotine tevan bi cî dikî.

Lê gereke bê zanîn, ko tarîx ne her tişte û her tişt ne tarîxe. Gerçî tarîx weke kehreva hindirê mijiyê mirov ronî

Institut kurde de Paris

dikî û weke agirê serê çiya, serê çiya û hawir xwe jî didî xuyakirin. Lê hin nifşên zanînê hene, ko bi gelekî ji tarîxê mezintir û çêtirin.

Bi kurtî zanîn bi hemî nifşên xweve weke tarîxe, giranbiha û mezine û ji miletekî weke miletê kurdre ev nifşên xwendin û zanînê gerek û bive-nevêne.

## COGRAFÎYA KURDİSTAN

Kurdistan, ji du gotinên kurdî(Arî) bi hevve hatiye danîn; Kurd, ko bi daxwaza "Gernas" hatiye û navê miletekî Ariye, ko di berî îslamêde yek ji çar perçên miletên Îranî bû: Kurd, Faris, Cîl û Deylem bûn û ji kevnarede di sînorê Ereb, Faris, Aşûr, Elam, Ermen de, yan di nêreka çiyayên Zagrosde hatiye xuyakirin. Di îrode jî, hêj di van cihande perçe perçe bindest dijî. "Sitan", ko bi daxwaza Asitan cîşûn hatiye danîn. Weke, Kurdistan, Ermenistan, Gurcistan , Turkistan, Erebistan, Pakistan, Hindistan, Efxanistan, Bilocistan û hwd.

Kurdistan, navê cografiya kurde, ko ji kevnarede têde dijî û rûniştiye. Şerefxan cografiya Kurdistan ji pingava Hirmiz-Xelîcê farisî dikişênî ser pingava sipî û dibêjî : dikevî navbera Faris, Ermen, Ereb û Rom(Turkan).

Herwekû Mînorûskî(Pêzanê mezinê Rusî) dibêjî, Kurd di welatê Faris, Qawqaz, Turkiya, Îran, Îraq de rûniştiye. Daxwaza wî ewe, ko welatê kurd di nav van dewletan de hatiye perçekirin, lê Sûriya jibîr kiriye.

Herwekû hin tarîxzanên kevnare di serê İslamêde dibêjin ji Hemedan û heta pingava Sipî, yan welatê Tekfûr û kurê lawîn dirêj dibî , di çaxên herî kevnarede bi Kurdyên, Kardoniyaş, Bakarda Kardokya Bextwix dihate navkirin. Lê herwekû tê zanîn û xuyaye di çaxê Sasaniyan de navê cografi ji kurdre nema bû, tenê navên perçe, perçên welatê kurd û bajarên kurd mabûn ko misilman di wan hindamande li kurd rasthatine û bi kurdanre şer kirin. Weke, Azerbaycan, Ermênya, Elcizîre, Mûsil, Elcibal, Xozistan.

Lê navê Kurdkoh, Husnilekrad, Kurdika di hin hindamên Kurdistanêde mabûn. Lê di sedê pêncê koçîde navê perçak ji çiyayên Kermanşah-Senanduc, Şehrezûr li ser destê Selcoqiyan hate veqetandin û navê wê hindamê kirin Kurdistan û Suleyman Şahê selcoqî bû fermandarê wê hindamê û gelek devlemend bû û bi pêşve çû. Hatina Kurdistana Suleyman Şah du milyon zêr bûn û Suleyman Şah di 511'ê koçîde bû fermandarê vê hindamê.

Institut kurde de Paris

Herwekû Turkan-Osmanliyan hindama Dêrsîm kirin Kurdistan û kengî ev nav dihat daxwaz jê, hindama Dêrsîm bû û be re bere ev nav li her hindamên Kurdistanê belav bû û di sedê 9'ê koçîde ristevanê mezin Melayê Cizîrî ji welatê Kurdistanre dibêjî :


Şebçiraxê şebê Kurdistanim !
Gulê îremê baxê Botanim !

Şerefxan, ko tarîxa xwe di sala 1005'ê koçîde qedandiye bi seda car navê Kurdistan aniye. Ji vir tê xuyakirin, ko zû navê Kurdistan li welatê kurd belav bûye ko Seydayê Cizîrî wilo gotiye:"Şevçiraxê şevê Kurdistanim". Çawa ko tê zanîn di çaxê wîde jî Kurdistan di şeveke tarîde mabû. Çawa ko Sîro Danjen di nav welatê Aşûrde ducar welatê Kardoka dîtiye ko bi welatê Sove hatibû girêdan û welatê So di jêrê pingava Wande ye, ko heta çaxê Şerefxan jî ev nav li kelehekê ma bû, ko di jêrê pingava Wanê de ye û di zimanê Aramîde; Welatê Kardo-Gizartayêkardo ji hindamê Cizîrabota re dihat gotin. Herwekû Ermana ji hindama Bota-Bextare dîgotin "Bextewîx". Lê ev nav hemî ne navê Kurdistana îro bûn, belkî navên hin perçên Kurdistanê bûn, ko diketin bin destê miletên mayin; miletên raser û serdest ji ber ko di sedê heft, heşt û nehên koçîde, çend derebeg hebûn ko heryek bi navekî dihate nivîsandin, weke; Erdelan, Baban, Soran, Badînan, Bextan, Xerzan, Kurtikan, Gurdikan. Lê li ser hev xelkê Kurdistanê bûn û ji tevanre Kurdistan hatiye gotin.

Mihemed Emîn Zekî Beg dibêjî: Kurdistan welatê kurd, ci hê pêşîne ko piştî tofana Noh, mirov lê rûniştiye di serê pêşînde miletên Lolo, Gutî, Kasî, Xaldî, Sobarî, Horî têde rûnişti bûn û miletê Elamî, di jêrê welatê kurdde bû û ji Elamiyan pêve evên dî bi carek kok û bingehên miletê kurdin û miletê Mad, piştî kurd piştî van miletan hatiye Kurdistan û têkelî kurdên kevnare bûye û bixwe Arî bû û bi ko çerî hatiye hindama Beuxteryana-Azerbaycan welatê Mîdya û ew Mîdî çend êl û eşîrên kurd bûn, ko di rojhilatê welatê Aşûr de diman û zimanê wan ji nifşê zimanên Arî(Hind-Ewrûpî) bû û ew ziman bingehê zimanê kurdiye, lê Mîdî di nav Faris û Kurd de winda bûne, lê Mandî li Cizîrê(Amûdê) rûniştine lê pir hindik mane. Tenê Karîlton Kon, di nivişta Kerwande dibêjî: Mac, eşîrek Madî bû, ko tiqûsên ola mad , di destê wê eşîrêde bûn û ji tevan bilindtir û birûmettir bû.

# XARÎTA KURDİSTAN

Institut kurde de Paris





## KURDISTAN

**ECHELLE 1:4.000.000**

Di navçeyên çixêzkirî da kurd wek etnîk bi gelên din va tevayî dijîn. Ev xarîte di memoranduma nîsan 1946'an da, li ser "Maf û rewşa kurdan" ji Koma Miletan ra hatîye pêşkêşkirin.*(Binêre: " Le Kurdistan Irakien Entitê Nationale"-İ.Ş.Vanli)*


MER
CASPIENNE
AZERBEIDJANE
TIFLIS
Leninakan
Bakou
Erivan
Choucha
Beyazid
Nakhitchevan
Guzelu
Chorchali
Marakand
Khoi
Chahpour
TABRIZ
AZERBEIDJANE
Abvar
Saraskand
Mianeh
Masouleh
Maragha
Mahabad
Ahmadabad
Kazvine
MAZANDERAN
TEHERAN
Erbil
Kelek
Rowandouz
Sakiz
Nasrabad
Bijar
Bianou
Petit Zab
Kirkouk
Souleimaniye
Sinneh
Khourwar
Sabachi
Hamadan
Kirmanchah
Malayir
Irak
Ilam
LORES
Bourougird
BAGHDAD
Badra
Tigre
BAKHTIARS
ISPAHAN
K
A
K
Karoun
KHOUZISTAN
Bandar Dilam
FARS
Chiraz
Kaleh Masua
Musghun
Khanik
KOUWEIT




## KURDISTAN

*ECHELLE 1:4.000.000*

Di navçeyên çixêzkirî da kurd wek etnîk bi gelên din va tevayî dijîn. Ev xarîte di memoranduma nîsan 1946'an da, li ser "Maf û rewşa kurdan" ji Koma Miletan ra hatîye pêşkêşkirin.*(Binêre: " Le Kurdistan Irakien Entitê Nationale"-Î.Ş.Vanlî)*

Institut kurde de Paris





## KURDISTAN


ECHELLE 1:4.000.000

Di navçeyên çixêzkirî da kurd wek etnîk bi gelên din va tevayî dijîn. Ev xarîte di memoranduma nîsan 1946'an da, li ser "Maf û rewşa kurdan" ji Koma Miletan ra hatîye pêşkêşkirin.*(Binêre: " Le Kurdistan Irakien Entitê Nationale"-İ.Ş.Vanlī)*


TIFLIS
Leninakan
AZERBEIDJANE
Bakou
MER
CASPIENNE
Erivan
Kamarlou
Choucha
Bayazid
Nakhitchevan
Marakand
Cherchali
Khoï
Chahpour
TABRIZ
AZERBEIDJANE
Abvar
Masouleh
Saraskand
Mianeh
Kara Aghatch
Mahabad
Ahmadabad
Kara Dareh
Hajiabad
Bianou
Kazvine
MAZANDERAN
TEHERAN
Sakiz
Erbil
Petit Zab
Kirkouk
Souleimaniye
Bijar
Sinneh
Khourwar
Sabachi
Hamadan
Malayir
Irak
Ilam
LORES
BAKHTIARS
ISPAHAN
Tigre
KHOUZISTAN
FARS
Chiraz
Kaleh Masua
Musghun
Khanik
KOUWEIT



Institut kurde de Paris




The Indo-European Family of Languages

Zimanê kurdî di nav Famîlya Zimanên Îndo-Ewrûpî da cîh digre.

Gelek diriste, ko Kurmac(Kurmanc) bermayê vê eşîrê bin û bi xwe di welatê Mîdyade rûniştine û ber bi rojavade fire bûne

Herwekû Supayzer dibêjî; Ev navên newekhev diriste ko ji miletekîre bêne danîn û her miletek li gora zimanê xwe navê milet û welatan dibêjî.

## KOKA MİLETÊ KURD

Sidnî Simîs dibêjî;“Kurd gelekî serbixwe û sedê 7 berî zayinêde di van hindaman de hatiye xuyakirin. Lê Mînorûskî dibêjî, bêgumane, ko Kardşoyê kevnare welatê Karde, kok û bingehê welat û gelê kurdên îro ne, çawa ko xeldî û kurdî navê yek miletî ne.” Û Rîsk dibêjî:“gotina xeldî, kurdyayî tev bi daxwazekêne û li gora zimanê kurdî, gelê kurd îranî yan jî sînordaşê îraniya ye. Lê gelek xelkê Îranê têkelî kurd bûne û hin gelên dîjî, di nav kurdde hatine Pişavtin û hin gelên bêgane fermandarî li welatê kurd kirine.”

Lê Mihemed Emîn Zekî Beg dibêjî;“Kurdên kevnare Qawqazî ne, lê kurdê nû(Mad) bi ser wan de hatine û kurdên kevin kirine Arî(Hind-Ewrûpî).”

Herwekû Şerefxan dibêjî;“Kurd zariwên wan mirovên ko ji ber şûrê Ejdehakê xwînrêj reviyane û ketine serê çiya û jin û mêr li hev ketine û kurd ji wan veqetîne".lê ev derewe. Û fermandarê Bedlîsê pêde diçî û dibêjî, lê hin dibê jin ji ber ko kurd mêr û gernase navê wî kirine kurd û dibêjî "Rustem" û "Ferhad" û "Gurgîn", ko bi gernasî navdarin, ji miletê kurdin.”

Herwekû di cîkî dîde dibêjî; Dibêjin kurd tev ji Becn û Bext derketine. Lê Ebûlfida dibêjî Kurd, Cîl, Deylem birayê hevin û her yek ji wan bûye bavê miletekî û li gora, ko ew dibêjî gereke kurd îranî bin û ji hersê bavikanre dibêjin (Faris) Kurd li çiyayê Zagros rûniştiye. Gelek caran fermandariya Îran ketiye destê kurd.

Lê tarîxzanê Ereb dibêjin; Kurd, ji miletê Erebe û di sînorê Ecem de rûniştine û zimanê xwe jibîr kirine û xwe winda kirine. Lê her yek bi awakî kurd digihênî ser Ereban

Tenê gelek diriste, ko navê yekî ji mezinê Erebên kevnare kurd bî, lê gereke berî wî kurd hebin, ko ev nav li xwe kiribin, weke: Faris, Çirkes, Teter, Çaçan û Ereb, ko di nav kurdande têne dîtin. Çawa, ko tarîxzanên Turk dibêjin: Kurd, bi daxwaza, qurd-gur hatiye û turkê serê çiyane û zimanê xwe ji bîr kirine.

Tarîxzanê Faris jî xwe dibêjin; Kurd perçek ji gelê fari

Institut kurde de Paris

se û zimanê kurdî ji şîweyên zimanê farisîye. Lê ne weke hev têne axavtin. Ne weke hev dibêjin. Weha renge ; Aşûr, Kildan, Ermen jî dibêjin kurd ji mene , lê kes nabêjî, em ji kurdane. Ev jî, jiber, ko kurd ne xwedî dewlet û bindeste dijminê xweye. Ji ber, ko heke kurd bi rastî: Turk, Ereb, Faris bûna wê dewletên, Turkya, Ereb, Îran li ser gelê kurd bixeyidya û doza yektiya xwe û kurd-hemî kurdan bikira. Weke, ko turk li ser turkên Qibris, Kerkûk dixeyidin û Ereb li ser Erêtirya, Somal, Xelîcilerebî(Erebên xelîc), dixeyidin û îranî doza hin cizîrên xelîc dikin û dilê sînordaşên xwe dihêlin.

Lê ez dibêjim; Mirov hemî yek milete û qada, ko mirov li sere, bicarek yek welate û milet li gora zimanê xwe ji hev dûr ketine û hatine naskirin û navkirin. Ji ber, ko miletên cihanê têkilî hev bûne, em nikarin xwînê yan reng bikin nîşana miletekî. Çawa, ko nikarin olperestî jî wiloye, herwekû, xwîn, reng, ol nikarin mirovan ji hev bidin alîkî.

Lê li gora zimanê kurdî, em dikarin bêjin; kurd pismamê miletên Arî û xesma mirovê Faris, Efxan, Bilocistan, Hindistane û ji Arîtiya kurd gelek nêzîkî miletê Ewrûpî, Ariye û jibo wilo dibênin di zimanên miletên arî de gelek gotinên kurdî peyda dibin.

Lê ji zûde kurd ji pismamên xwe veqetiyaye û bi zimanê xwe û di welatê xwede dewlet û derebegî li dar xistine û xwe daye naskirin.

Çawa, ko ew navên, ko bêgana newekehev li kurd kirine, ji ber du tiştaye: yek ewe ko bavik û eşîrên kurd cihê cihê dewlet çêkirine û bi nav û nîşanên xwe tenê dewleta xwe eşkera kirine, weke: Sober, Somer, Mîtan, Hewr, Mad, Nayrî Kardo, Kaşo, Lolo, Goto, Kardoxî, Kurdyen û çaxê Îslamê de weke; Bextan, Baban, Badînan, Hekaryan, Xerzan, Merwanî , Şedadî, Berzikanî, Lorî, Bextyarî, Şadencanî, Kakoyî...

Ê diwem ewe ko ev mezinmirovên, ko ev nav li kurd kirine, bi ziman û rewş û welatê kurd bê agah bûn û nezan bûn, û ji devê hin mirovên dijminê kurd bihîstine.

Lê kurd di îrode miletekî xwedî ziman, qad, abor û rewşa tarîxî û dixwazin di welatê xwede û bi zimanê xwe dewletekê lidarxin. Û bixwe hatin û hebûna welatê xwe bixun û bi aştî û dilovanî bi hevsînorên xwere derbaskin û naxwazin şerên xwîndar û ser gêjyan di cihanê de çêbibin û azadîxwaz û aştîperesin.

Herwekû wê rojek bê, ko ev sitêrek bibî welatek û miletên cihanê hemî bibin yek milet û mirovanî şûna miletî tije bikî û bihevre şerê bêxwendin, birçîbûn, zordestî, tarî

tî, nexweşî, xezanî, nezanî yê bikin û damarên wa ji cihanê bibirin û bêveger koça xwe barkin.

Bê gomane, ko miletê kurd weke hemî miletên rojhilatê navîn têkilî hev bûye û gelek milet di nav mede hatine pişavtin û di welatê mede rûniştine û hêjî berma û şopên wan miletan têne xuyakirin. Em xelkê Kurdistanê dikarin bi hevre, bi dilxweşî, biratî, wekhevî jîneke bi camêrî rabiwêrin û destên xwe di meydana avnî û pêşvebirina welatê xwe de gavên hêja bavêjin û destên xwe bidin hev.

Herwekû ji gotinên tarîxzanên rojhilatê navîn, tê xuyakirin, ko miletê kurd berî çend sedsal, li pêş islamê di van hindamên ko îro têde rûniştîne rûniştibûn û pirên wan di navbera Îran û Îraqde bûn û ta bi welatê, Hezo, Husnilekrad, Mereş û pingava Sipî ber bi rojavade çûbûn, çawa ko di Şam, Misir, Hicaz, Yemen de jî hebûn û gelek ji wan hêj xwe winda nekirine û hin ji wan bi zimanê kurdî jî diaxêvin û ji bo dilê xwendevanên me dicîkevin dixwezim çend awiran di virde bidim nîşandan:

1- Kurê Esîrê Cizerî dibêjî: Navê jina Behramê Çûpîn kurde û navê birayê wê kurdî bûn û piştî kuştina Behram, Kesra ev jinik mar kiriye. Lê eger hin bêjin ko tenê navê wan bû em dikarin bêjin, eger ev rast bî jî gere ke berî van,miletê kurd hebî û navdar û bi deng bî, heta , ko navê wî li zariwên xwe kiribin weke, Faris, Çaçan , Teter, Ereb ko îro di welatê mede îro têne dîtin.
Û kurê Esîr dibêjî: Dema, ko Erdeşêrê kurê Babik tac da serê xwe û bajarê Medain(Teysefûn) avakir û doza padîşahî kir, Erdewanê Eşkanî, padîşahê Îran nivîsarek jêre şand û got:" Ey kurdê kurê kurd kê ji tere destûr daye, ko tacê bidî serê xwe û bajaran ava bikî? Gorna xwe bi destê xwe dikolî û li mirina xwe dilezênî".
2- Qadîdawî dibêjî: Ewê, ko gotiye, ka em Îbrahîm Peyxamber bişewitênin, yek ji kurdên welatê Faris bû.
Herwekû Ebdilahê kurê Ebas jî, gotiye: Ew mirov ku yek ji Erebên welatê Faris bû, yekî jê pirsî û got;«Ma Ereb wê çaxê li welatê Faris hebûn? »
Di bersiva wî de (Ebdilah) got;«Kurdên Faris, Erebên Farisin.» Di virde daxwaza wî kurdên koçerin.
3- Mesûdî di sala 332'ê koçî de dibêjî; Şahcan eşîreke kurde. Li Hemedan, Dînewer(Deynûr) rûniştîne û eşîra Macerdan li Gencawer rûniştine û Hezebanî(ezbenî) û eşîra Serat li Azerbaycan rûniştine. Eşîrên Şahdencan û Lazba li Rey rûniştine. Madencan, Barîsan, Xalî, Celalî, Ceba

rikî, Cawanî, Mistikan li Çiya Elcibal rûniştine. Debabile li Şam rûniştine û herdû eşîrên kurd, ko fileh bûne "Yaqûbî, Curqan li jorê Mûsil û hindama çiyayê Cûdî rûniştine.
Herwekû Mesûdî di Eltenbîh û Welişraf de gotiye; Eşîra Bazencan jî kurde.

4- İstexerî di sala 340'î koçîde dibêjî; Navên eşîrên kurd evin: Maşwêra, Bozika, Kîka ko di îrode li hêla Mereş rûniştine.
Herwekû di rûpelê 282 de dibêjî; Cihên, ko kurd têde rûniştine welatê Faris, Kerman, Secistan, Xerasan, Esfehan, Çiya, Mahkûfe, Mahbesre, Mahsebzan, Hemedan, Şehrezûr, Darabgurd, Samxan, Azerbaycan, Ermenistan, Diwîn, liser çemê Arasê, Eran, Babilebwab, Babilekrad, Berzêe, Belîqan, Derbend, Cezîre, Şam, Sixûr

5- Herwekû di sala 340'ê koçîde navê pênc Rimûman, ko di wande rûniştîne didî nîşandan:
   1- Ramcan yan Ramceloye(gêloye); Di navbera Esfehan û Xozistan de ye.
   2- Ram Liwalîcan; Ko dikevî navbera Şîraz û Delavê Hurmiz-xelîc.
   3- Ram Dêwan; Ko dikevî Kûra Sabûr.
   4- Ram Kariyan; Ko dikevî hember Kerman.
   5- Ram Şehreyan; Ko dikevî nêzîkî Esfehan û jêre dibêjin Bazencan û gelek ji wan ketine bajarê Esfehan.

Lê Ram Hurmiz û Ram Ehmed jî hene, ko diriste piştî İstexerî çêbûbin û Ram bi daxwaza war di zimanê Farisî de ji wan cihên ko kurd têderûniştîne dibêjin Ram. Ji tevan re têgotin Rimûm.

Lê İstexerî pêde diçî û dibêjî; Her yek ji yan(Rimûman) xwedî paytext û fermandarin û serbixwe dijîn. Û paşê dibêjî 32 eşîrên kurd li hindama Faris rûniştîne: Kermanî, Ramanî, Mudesir, Mihemed Binî Bişir, Bîqilî, Berdamehrî, Mihemed Binî İshaq, Supahî, İshaqî, Edîrkanî, Şehrakî, Tehemdanî, Zibadî, Şehrewî, Bandadkî, Xesroyî, Zencî, Seferî, Şehyarî, Mehrakî, Mubarekî, İştamehrî, Şahonî, Feratî, Selmonî, Mîrî, Azaddoxtî, Birazdoxtî, Mutelebî, Memalî, Şehkanî, Keçtî, Celîlî.

İstexerî dibêjî; Min ev nav tev ji Dîwanisedeqat derxistine. Çawa, ko dibêjî; Ev eşîrên kurd bi carek di konade bûn û nîv milyon mal bûn, tenê eşîrên Loristan jî ji kurdên welatê Faris dijimêrî.

6- Kurê Belxî dibêjî; Di sala 500'ê koçî de, ev eşîrên kurd bi carek di serê islamê de winda bûn û hatin kuştin, tenê ji wan mirovek bi navê Elik misilman bû û heta 500'ê koçî jî, hêj zariwên wî li van navan mabûn.

Lê ev kurdên, ko di îrode li welatê Faris rûniştîne di çaxê Edididewlede ji hindama Esfehan anîne welatê Faris.Lê eger em kurdên Loristan jî, weke ko İstexerî dibêjî ji kurdên hindama Faris bijimêrin wê çaxê Kurê Belxî ne rast dibêjî.

Lê Kurê Belxî gelek pesnê Şivankare, eşîra kurdê navdar didî û dibêjî; Di dawiya devleta mala Biweyhîde ev eşîra kurd Şivankarê hêzekî mezin û xurt bû, leşkerekî dijwar û bi rûmet bû.

Tenê Şerefxan navê Şivankare di nav eşîrên kurdên îranî de naniye, lê navê Ramanî, ko bavikek ji Şivankareye gotiye.

7- Yaqut Hemewî dibêjî; Zozan welatekî gelek xweşe, dikevî navbera, Ermenistan, Xelat, Azerbaycan û digihê bajarê Selmas, Erman û kurd têde rûniştîne.

Lê kurê Esîr dibêjî; Zozan welatekî fireh û pane, dikevî Rojhilatê, Dicle û bi qunaxa du rojan(120 km) li rajorê Mûsile di sînorê Xelat, Azerbaycan de ye, di gihê heta bajarê Selmasê û gelek keleh têde hene û bicarek di destê kurdên Becnewî û Bextî de ne. Cerqe, Beşîr di destê kurdên Becnewî dene û mezinê wan ko navê wî Atîle li keleha Curzqîl de rûniştiye. Çawa, ko Bazilhemra, Qey, Erwex, Berxo, Baxoxe, Kengûr, Tîre, Xoşab di destê Bextan de ne.

8- Qelqeşendî 814'ê koçî de dibêjî û ji Meşalikilebsar kitêba Fedul Ullah Ulemrî diguhêzî Sibhilasa û dibêjî; Kurd meger çendan, ji çend gelan gihaye hev, lê gelekî serbixwe û di sînorê Ereb de rûniştiye û gelek bi nav Ecem de belav nebû ye û çend eşîrên kurd li Şam, Yemen jî rûniştîne û gelek welatan peyda dibin, tenê pirê wan di navbera Ereb û Ecem de rûniştîne

Qelqeşendî pêde diçî û dibêjî; Daxwaz ji Cîbal-Çiya, ew çiyayên ko dikevin navbera İraqa Erebî-Besre, Kûfe û welatê Xerasanê û dibêjî; dixwazim navên çend eşîrên kurd, ko baş nas dikim bidim xuyakirin û tenê navê malmezin û fermandarên wan bibêjim û ji rêve ezê dest bi kurdên çiyayê Hemedanê bikim, paşê Şehrezûr, Erbîl û heta Cezîrê, Kewar, Mûsil bidim xuyakirin.

1- Lor: Eşîreke kurd û gelek mezine û gelek eşîrên mezin di nav de peyda dibin, xwedî melik û fermandarin, Ew li Şam, Misir jî peyda dibin lê pirên wan li Şam rûniş-

Institut kurde de Paris

tine, mirovên gernas, rastgone û bixwe du perçene, Lorê mezin û Lorê biçûk.

2- Şol: Eşîreke kurd û navdare, lê di rabûn û rûniştina xwede wek Şevankarene, lê gelek şervan û xwînrêjin, tenê gelek comerd û destvekirîne. Belengaz û parsek xwe liwan digrin û di nav wande digerin.

3- Şevankare: Lê çêtir û bibal ola islamêve nêzîktirin xwe dî bext û bawerî biwan têkirin.

Fedilahê Umerî xwediyê Mesalikilebsar çiyayê Kurdistanê didî zanîn û dibêjî çiyayê Kurdistan(Elcîbal) ji Hemedanê Şehrezûrê destpêdikî û berbi rojavade diçî heta digihê welatê Tekfûr û hindama ko dibin destê kurê Lawîn de dirêj dibî û diçî. Yanî digihê heta Edene, Mesîse ko bi Ermenistana biçûk navdare. Kurê Tekfûr padîşahê Rom bû ko heta Sêwas di bin destê wîde bû, çawa ko xwediyê Mesalikê navê 20 hindaman têni ko kurd di wande rûniştîne û xwedî fermandar û serbixwene.

1 - Mahîdeşt: Di çiyayên Hemedan Şehrezûr deye û kurdên "Goran" di vê hindamê de rûniştîne, xwedî fermandar û serbixwene.

2 - Derteng: Ev jî cihê eşîrên "Gora"ne û xwedî fermandar û serbixwe ne û herdû perça 5 hezar şervanên wan hene.

3 - Danserk-Nehawend : Ev herdû hindam nêzîkî Şehrezûrin û eşîrên Celalî di wande rûniştîne, mirovên şer û şûrin hezar şervanên wa hene xwedî fermandar û serbixwe ne.

1- Çiyayê Hemedan: Eşîreke kurd têde heye, ko nêzîkî Celalîyaye. Bi navê Zengene (Zengene) rûniştine , xwedî fermandar û serbixwene.

5- Şehrezûr: Dû eşîrên kurd "Kose" û "Bapîrî" têde rûniştine, xwedî fermandar û serbixwene ,lê piştî serpêhatîya Bexda ji vir rabûn û çûne welatê Misrê û li şûna wan eşîra Xolse-Xole ko bi xwe ne dijî kurdên bingehîne, rûniştine.

6- Di Azerbeycande cihek heye ko dikevî navbera Şehrezûr û Eşno.Kurdên Siyolî(şolî) têde rûniştine.

7- Elîştar: Kurdên Qertawî(Kertawî) têdene û hin hindam ji Erbîl jî di destê van qertawîyandene.

8 - Karkar: Kurdên Hesena têdene, ew jî sê perçene Îsa, Şihabidîn û Têlî(Çakî) ne.

9 - Derbendê Qerablî: Kurdên Qeryawî têdene, xwedî fermandar û serbixwene, ko baca riya Derbend distênî û bi welatê Misrê ve girêdayîne û ji padîşahê Misrê re dinivîsin.

10- Keruhîn(Deqûqinaqe): Mînorûskî dibêjî; Kurdên Tîrka - rîn têde rûniştîne û dikevî navbera Kerkûk-Tawiq( Tawik).
Hisamidînê Hezbanî fermandarê kevnarê Erbîl di vî bajarê de serê xwe daniye û hatîye veşartin. Ko jêre di gotin "Ebu heycayê qelew".
11- Li welatê Erbîl di navbera du çiyande hin kurd rûniştîne, ko hevalbendê Misrê bûn û bi Teteranre jî derbas dikirin.
12- Mazencan: Bîrewe, Necme, Suhran di van hindaman de kurdê mazencanî rûniştîne û ji kurdên Humeydî ne. Ev Humeydî di nav leşkerê Eyyubî de perçê çarem ji leşkerê kurd bûn. Hekarî, Zirzarî, Mehranî, Humeydî cîkî bi lind girtibûn. Çawa, ko mala Mubarizidîn ji kevnarede mezinê vê êlê bûn û melîk bûn û ji Bexda ji wanre perwa û diyarî dihatin û Erbîl jî di destê malbata Mubarizidîn-Kek de bû.
13- Hindama Sohran; Şeqlawe, Xeftiyana Ebûelî û Xeftiyana biçûk bi deşt û derbendên xweve di destê eşîrên xweşnav Sohrande bûn.
14- Melazgird-Ristaq: Di van herdû hindaman de kurdên Zirzarî rûniştîbûn û dibêjin, Ecemin, lê bûne kurd.
15- Çolemêrg: Kurdên Çolemêrgî, di vê hindamêdene û dibêjin, em Erebin lê em bûne kurd û melik-fermandarên wan li nav kurdan gelek bi rûmet û payedarin.

Lê kurdên Çolemêrgî, Hekarîne, tenê mezinên wan dibêjin em Ebbasîne, lê kurdên mayîn ne Erebin û Çolemêrgî, baca rê û derbende ji rêwî û kerwanan distênin û fermandarên wan bi xwediyê çolemêrg, navdar û bidengin.(Notê Cigerxwin)
16- Mergever: Hin kurdên hevalbendê Çolemêrgiyan têde ne.
17- Kewar: Dikevî sînorê rojavayê Çolemêrg, kurdên Kewar têdene.
18- Dînar:Kurdên dînarî têde rûniştîne.
19- İmadiye-Heror: Kurdên Hekkarî têde ne, lê di îrode ji wan re dibêjin Badînan(Bihaidînan) û ji Hekarya Dasinî mane.
20- Qemranî, Kehf-david: Kurdên Tenbekî, Mistikî têde rûniştine.

Lê xwediyê Mesalik paşê navê; Bextî û Sindî û Dasinî û Dinbilî jî didî xuyakirin, herwekû navê "Baliwê Xursî" jî, bi gernasî û mêrxasî didî xuyakirin û dibêjî,"hindik mabû ko Mardîn têxe destê xwe".
10- Tesqîf: Xwediyê Tesqîfê ji nivisarên kevnê Misrê derdi

xî û navê 25 eşîrên kurd didî xuyakirin.

11- Mînorûskî: Navê 24 eşîrên kurd ko li Qawqaz rûniştine, didî zanîn û dibêjî; Du eşîrên kurd bi navê Gel û Zengene li Xerasan hene û eşîra Çîkan li Gurcistane.

12- Kurê İbn Xeldûn dibêjî; Du eşîrên kurd bi navê Badîn û Lawîn li Cezair rûniştîne. Gelek diriste, ko Badîn ji Badîna çûbî Cezair û Lawîn bermayê Lolo bî.

13- Şerefxan, kurd li gora şîwê yên wan dikî çar parçe:Kurmanc, Lor, Gor û Kelhor. Lê Kurmac ji hersê perçên mayin bihevre mezintire, jiber, ko ji pingava Sipî û heta gola Ormî dirêj dibin û ji Mûsil û heta Gurcistan , Ermenistan berjor diçin. Lê ev hersê perçên dî ji Ormiyê digihêne ser pingava Hirmiz û ji Erbîl diçin heta bi Kerman-Hemedan(Kermanşah).

Herweha fermandarê Bedlîs cografiya Kurdistan ji pingava Hirmiz dikişênî ser pingava Sipî-Xelîcê İskenderûn yan dawiya Meletya û Mereş û dixî navbera Faris, Azerbaycan , Ermenistana Mezin, Ermenistana Biçûk, Sûriya û İraqa Erebî

Herwekû dewlet û fermandarî, derebegî yên Kurdistanê ji hev vediwejêrî û dûr û dirêj bidarve dikî û keleh û eşîrên kurd didî xuyakirin, lê mexabin kok û bingehên fermandarên kurd bi çîrokî û ji devê zarokên wan diguhêzî û nivîştên kevnare bi kurtî diguhêzî.

Lê Mihemed Emîn Zekî Beg, bêtir û firehtir didî zanîn lê ew jî jimar û kok û eşîrên kurd ji devê mirovên bêgane diguhêzî lê emê çi bikin ko ji devê bêgana neguhêzin.

Hawîr me hatiye girtin û nahêlin ko zanakî kurd li nav gelê xwe bigerî û serbest binivîsî. Lê hêvîdarim, ko piştî mere gelê kurd serbest bibî û zanayên kurd her tiştîbi rin dî û dûr û dirêj bidin zanîn û xuyakirin û baweriya xwe lî ser kolan û bermayên kurdên kevnare deynin û tarîxa gelê kurd hê betir fireh û mezin çêkin. Vê paşiyê çend nivîştên hêja û giranbiha hatine çapkirin, weke"Mufericilkirûb" kurê İbn Wasil dewleta Farqîn, kurê İbn Ezreqê Fariqî û çend nivişt di biwara fermandariya Badînande hatine çêkirin û mirov dikarî ji van nivîştan tiştên hêja biguhêzî, herwekû gereke mirov peyayên rûmetmendên wekeMihemed Emîn Zekî Beg Şerefxan, Merdoxî ji bîr nekî û ji ber xwe û gelê kurdve supasên xwe ji wanre pêşkêş dikim. Çawa, ko İhsan Nûrî, Nûrî Dêrsimî, Ebdirehman Qasimlû, Celal Talabanî û hin mirovên dîjî çend nivişt divê meydanêde çêkirine û dibihîzim, ko Qedrî Cemîl Paşa, Ekrem Cemîl Paşa jî dixwazin du niviştan çap bikin, yan çapdikin. Lê hêj min nedîne, ev hemî karên hêtêne, ko ji gelê kurdre têne kirin. Çawe ko bi Tûrkî

Farisî, Erebî û Ewrûpî jî gelek tarîx û nivişt di biwara kurd û Kurdistande hatine çêkirin û hin ji wan hatine tercumekirin û hin jî hê wilo mane, tercume nekirine. Lê jiber, ko perçe,perçe û her yek di biwara dewleteke, derebe, giyekê yan hindamekê de hatine çêkirin û hin jî têne çêkirin. Dixwazim, tevan bicivênim û ji tarîxên dî jî bi serve zêde bikim û tarîxeke mezin ji kurdre û bi zimanê kurdî çap bikim.

Herwekû hêvîdarim, ko ev karê dijwar, karêkî biçûk ji xebata milet bê jimartin û di vê meydanêde xwedî par û pişk bim.



Institut kurde de Paris

# ZİMANÊ KURD

Bêgomane, ko zimanê kurdî, ji zimanên Hind-Ewrûpî( Arî) ye û gelekî nêzîkî zimanê Farisiye û hêj berepêş neçûye.
Lê zimanzan bûne du bir; Bira mezin dibêjî, zimanê Kurdî zimanekî kevnare û ji zimanê Farisî jî kevintire, lê hin dibêjin, zimanê kurdî şîwak ji zimanê Farisî ye û bere bere serbixwe maye.
Bi rastî çend şîweyên kevnare di nav zimanê kurdîde têne xuyakirin, ko dûrî zimanê kurdî ne û ji kurdî, Farisî , Erebî, Turkmani têkel bûne û kurmanc jî ji wan fam nakin, weke, Lorî, Hewramî, Kelhorî, Dinbilî(Zazî) lê, tê ber çavê mirov ko pehleviya kevnarebin, yan jî zimanê mîdî bin ko di nav Farisî de rewşa xwe guherandine. Ji ber ko padîşahên Îran, kurdên koçer hawîr welatê îran digerandin û tevlî eşîrên farisî dikirin. Çawa, ko hin eşîrên kurd gelek nêzîkî eşîrên turk bûne û gelek gotin û pirsên xwe ji gotin û pirsên turkîre berdane û bicarek windakirine. Çawa ko zimanê Erebî jî gelek ji kozik û çeperên zimanê kurdî girtine û semedî ola islamê ye. Ne tenê ziman û ne tenê kurd, belkî ziman û gelên misilman tevde dibin vî barê girande mane û gelek ji pirsên xwe winda kirine û di îro de pirsên Rûsî, Ermenî, Ewrûpî jî dikevin nav zimanê me, ji ber ko dezge û hemî alavên xwarin û li xwe kirin paley,cot karî û heta xwendina zarokên kurd bûne Ewrûpî, Farisî, Turkî, Erebî.
Tenê zimanê kurdî, gelek ji kozik û çeperên xwe parastine û bi gernasî li ber xwe didî, ko xwe winda nekî, di st-

ran, dîrok, berdan, berdolabî, bêlote, govendêde pirsên kurdî hatine parastin. Kengî, kurd biserxwebên wê zimanê kurdî jî, xwerû û paqij bibî. Hin pirsên ko di navde bimên wê bi carek di nav xwede winda bikî û bi pişevî.

Dewlemendiya zimana bi du tiştên mezine: Yek pişavtina gotinên bêgane, ko di nav zimanekî hebin û yek jî, hebûna dezgeh û pêşveçûna aborî ye, ko navne nû têne çêkirin û afirandin.

Bedlîsî dibêjî: Zimanê kurdî çar perçene; Kurmancî, Lorî, Gorî, Kelhorî. Lê şîweyê zazî di îro de di nav şîweyê kurmancî de rûda ye. Dibî di çaxê Bedlîsîde ev şîwe Kelhorî bî, lê bi rastî şîweyê Zaza gelek dûrî kurdî ye, diriste ko Pehlewiya kevnare bî, herwekû navê paytexta wan jî Pehlew-Palo ye.

Lê weke tê ber çavê min, di îrode du şîweyên mezin hene, ko li ber xwe didin û her yek dixwazî bibî zimanê kurdî, hemî kurdî. Herwekû Tewfîq Wehbî beg û Emîn Zekî beg dibêjin; Zimanê kurdî kurmanci ye û Sorî kurmancê rajêrin, û Xanî jî Kurmancî li şûna Kurdî aniye. Çend newekhevî di navbera herdû şîwande peyda dibin. Lê win dikarin li nivişta min " Awa û Destûra zimanê kurdî" binerin û nas bikin, tiştên gelek dijwar, Bernav û kirina kirok winda ye.

Lê di sivikî û xweşiya peyv û gotina de kurmancî ji Soranî naziktir û xweştir û şêrîntire, tenê Soranî di xwendin û nivîsandinêde daye pêşiya Kurmancî û gelek nivişt û ji her nifşî têde hatine çêkirin û çapkirin. Ev pêncî (50) salin ko di xwendegehande tê xwendin û nivîsandin.

Çawa, ko kurmancî di çîrok, stran, dîrok, helbesteyên, kurdî de ji Soranî dewlemendtir û firehtire. Mihemed Emîn Zekî beg, ji şîweyê kurmancî sersor dimênî û dibêjî: "Çawa heta niha serbixwe maye û bi gernasî li ber xwe daye".

Stran, helbeste, dîrok, şêr, serpêhatî, berdan, berdestar, berdolabî, berpaley, bêlote ji helbesta pêve evên dî hemî jî, di şiveyê Sorî de peyda nabin, tenê di hindama Erbîlde Heyran heye, ko em jêre dibêjin Lawikê Şengalî. Lê meqamê Erbîl yekî teneye.

Tenê di kurmancîde her lawikek meqamekî wî heye, ne weke heyrana Erbîlêye. Herwekû, çend ferheng di herdû şîwande hatine çapkirin û li Ermenistanê gelek niviştên kurdî bi kurmancî derketine. Çawa, ko li Sûriya û Turkiya jî hin nivişt hatine çapkirin û hin dîjî têne çapkirin. Reşî Kurd û Kemal Badilî û min Rêziman û Destûra zimançapkirine û Celadet Bedirxan, Kamîran Bedirxan hin elîfbayên kurdî, latînî li Sûriya, Libnan çapkirine û Kamiran hin pirtûkên dî

jî çap kiriye.

Çend nivîştên dî jî, bi latînî li Sûriya hatine çapki - rin. Rist û nivîsar bi şîweyê kurmancî hatine çêkirin û hin ji wan hatine çapkirin jî û gelek neçapkirî mane. Dîwa na Cizerî, Mem û Zîna Xanî, Rewdîneîma Axtepî hatine çapkî rin. "Seyfilmiluk", ko Siyapoş çêkiriye û çend dîwanweke ; Dîwana Mela Zahir, Dîwana Hecî Fetah, Dîwana Licî û Dîwana Mir û çend nivîştên tarîxê, ko min çêkirine hêj li çap neketine.

Gelek nivîştên hêja li Ermenistana Soviyetistanê bi kur mancî çêbûne û çêdibin. Û li Sûriya hin nivîşt hatine çê- kirin û çap nebûne.

Lê çiqas me çêkiribin jî, dîsa weke şiwê Sorî nehatine çêkirin. Lê em çibikin, dijminê kurd rê nadî me, ko nivîşt û dîwanên kurdî bi kurmancî çêkin û çapbikin.

Hetta Badînan newêrin bi zarê kurmancî zarokên xwe di xwendegehên xwede bidin xwendin û Sora jî, şerê xwendina bi şîweyê kurmancî dikin û bi zor şîweyê Soranî di xwende- gehên Badînande didin xwendin. Badînan, ji bêxwendin û des tevala rawestiyane.

Bi kurtî herdû şîwe di ber hevre dibezin û her yek di- xwazî cihê bilind ji xwere bistênî û bibî zimanekî tevayî ji Kurdistanê re.

# OLA KURD Dİ ÎRO DE

Kurd bi piranîya xweve misilmane, herwekû pirên kurdên misilman jî, Sinî ne. Salê çend hezar ji van diçin hecê û bihezaran zêr di vê rêde winda dikin. Di her gundekîde bi hindikî, mizgevtek hatiye avakirin û mela û feqehan xwedî dikin. Dehyeka malê xwe didin mela û belengaza û rojê pênc caran li mizgeftê dicivin û nimêj dikin. Ji heftê carekê di roja Înêde nimêja mezin dikin û bi zimanê Erebî xutbe dixwenin, lê gundî nizanin mela çi dibêjin, tenê serê xwe dixin ber xwe û bi ser xwede dipûjinin û carnan jî hin ji wan digrîn. Ji ber, ko tenê dizanin, ko gotinên melê hemî gotinên xwedê û peyxamberane.

Herwekû di her hindamekêde Şêxek yan çend şêx hene. Gundî reben û perîşan dibin, murîd û sofî malê xwe li devên wan radigrin û xwe bi carek disipêrin wan û bê şêxê xwe tiştekî nakin.

Jin, mal, karên şêxê mezin beleş tên û têne kirin û bi serde jî li ber şêx serê xwe xwar dikin. Eger bi dest wan kevî, destê wî jî maç dikin û li piya û li hember şêx radi westin û destên xwe li ser hev û li ser sînga xwe datînin û ser di berde li piya dimênin û dengê xwe nakin ta wekû şêx destûra wan bidî, ko li ser çoka xwe rûnin.

Şêx di xan, qûnax û qesrên bilind û mezinde rûniştî û gundî li ber derê wî dighên hev û hey-hey û semayê dikin. Li ber tavê, li ber dîwaran rûdinin, pêxwes, pirçî, tazî, reben, belengaz karê şêxê xwe belaş dikin. Gelek caran hêviya xwedêtiyê jê dikin û bawer dikin, ko rojaşehîn bê danîn û xwedê dakevî Şamê wê şêx wan ji agirê Dojehê biparêzî û derê Bihiştê ji wan re vekî.Bawer dikin, ko şêxê wan bi her tiştî dizanî û çi bikî bi destê wîve tê.

Di çax û demên kevnarede di ber her mizgevtekêde hin xwendegeh avadikirin û zarokên kurda bi zimanê Erebî têde dixwendin û hin camêr hebûn, ko xwendevan xwedî dikirın û xwendin Serf, Nehw, Mentiq, Beyan, Felsefe, Tore, Felekî, Jimar, Hendese, Hedîs, Tefsîr, Fiqih bûn.

Lê melên nezan jimar, hendesê, felekî ji nav rêzê avê - tin. Ji ber, ko nikaribûn, nizanibûn ji suxtên xwere digotin "Ev xwendin ya gawiraye" hindik mabû, ko mentiqê jîrakin û digotin, heçî mentiqê bixwênî dibî zendîq-zendikî.

Herwekû carna terkîb, ewamil, zirûf jî bi kurdî dixwendin û carna mirovên mezin û bi deng ji wan xwendegehan der diketin. Lê sofîtî yê mirovên mezin winda kirin û tevan be rê xwe dane xapandina gelê kurd û xwarina malê gundî û rebena.

Rojê pênc caran li ser minaran, cihên bilind bi zimanê Erebî banga mele bilind dibû, markirina jina Erebî, veşartina miriya Erebî, xwendin Erebî, nivîsandin Erebî, rojî û nemêj Erebî, lê xencer û şerê ser çiya nehiştine, ko kurd zû bibî Ereb.

Şêx û mela jî, weke beg û axa xwedî bend û berberî bûn û şerê hev dikirin, hevdî gawir dikirin û carna jî pevdiçûn û hev dikuştin. Lê şêxan bixwe direjî hev nedikirin te nê gundî û hov û nezana li ser rehên şêxan şerê hev dikirin û carna jî hev dikuştin.

Meger çendan ne weke beg û axa bi şûr û mertalan diçûn hev, lê hevdî pîs dikirin û dubendî di nav wande xurt di bû. Eger gelê kurd nezan û reben û hov bû jî, lê gereke van mirovên zana û mezin wilo li gelê xwe nekira û bi hindikî hinek ji xwedê bitirsiya.

Xwediyên birc û eywan û serayên bilind gemara destê cot kar, gundî, rebena didizî û dixwarin. Tenê di hember vê di ziyêde, ji wan re digotin: Emê we ji agirê dojehê biparêzin û we bi xwe re bibin bihiştê. Ji ber, ko em pêşîwa û rêberê ola Xwedê û Peyxamberin. Bi rastî ji serpêhatiyên şêx û beg û axa re nivişteke serbixwe mezin gereke û divêt.

## ROJÎ

Di meha Remazanê de misilman sîh(30) rojan bi ro pêde, bê xwarin û vexwarin dimênin, nikarin herin cem bindara xwe, lê bi şev şîv û paşîvê dixun û bedlek ji şevê nimêjên terawîha dikin, lê piştî, ko şîva xwe dixun û di dawiya me hêde her mirovek hûr , gir hinek genim didin belengaz û re

bena û berî roja cejnê vî genimî belav dikin, didin xwestek û belengaz û rebena. Lê şêx û melan vê paşiyê ji wan distandin.

## CEJNÊN MİSİLMANAN

1- Cejna Remezanê: Weke hate zanîn di piştî, ko sîh rojan mehek bi rojî man û piştî, ko heyva nû dîtin, sipîdê di kin cejn û tev mêr diçin lep û riwên hev û li nav malan digerin û cejna hev pîroz dikin û xwarinê li malên hev dixun. Di serê pêşîde diçin mala axê û paşê têne mala melê û dawî li nav gund belav dibin û her kes di mala xwede xwarinê çêdikî û zarok digerin û berê salê didin wan û lîstik û qirdik çêdikin û govend û dîlanê dikin gunehên xwe dadiweşênin.
Di vê rojêde mela li ser menberê bi zimanê Erebî tiştekî dibêjî û gundî lê guhdarî dikin û serê xwe dixin ber xwe û ji xwedê hêviya qenciyê dikin. Wekû nimêjeke dirêj dikin û gelek zar-zar û lûblûbê li ber xwedê dikin.
2- Cejna Heciya: Di vê rojêde hecî li havîr kevirê reş bi bez digerin û li navbera Sefa û Merwa bi lok dibezin û hemî rût û tazî ji çokê û heta navikê xwe dinixwimênin, lê jin nixumandî ne. Ji bo tevayî bi heciyanre, misilman hemî cejnê dikin û pez serjê dikin û goşt belav dikin û dixun, ger û govendê dikin.
Lê ji van pêve jî cejnê miletê kurd gelek hene, ko di bihar û payizande dibin û her kesê jinekê bênî, yan kurek jêre çêbibî, yan kurê xwe sinet bikî, yan şêrînekî ber dilê wî ji zîndan û leşkerî bê mala xwe ger û govend û şahî û cejnê dikin û xwarinê didin. Di van cejnan de dahol û zurne, saz têne lêdan û kes guh nadî gotinên mela û şêxan.

## ELEWÎ MESÎHÎ ÊZDÎ

Kurdên Elewî, nayên jimartin, lê pirê kurdên Loristanê û çiyayên Dêrsîm bûne Elewî. Lê Elewî jî neweke hevin. Hin ji wan hene, ko dibêjin, Elî weliyê xwedêye û hin hene, ko dibêjin,"Eli xwedêye".

Lê kurd ji Elewiyên Dêrsimêre dibêjin, Rafidî û ji Elewiyên Loristanêre dibêjin, Elewî û ji wanê paşîre dibêjin, Elî îlahî û herdiwê paşî ji misilmana têne jimartin.

Herwekû ev rêça Elewî rêçeke siyasiye, îraniyan xwestiye, ko pê şerê misilmana bikin û bêtir şerê Emewiyan bikin. Ji ber, ko Emewî gelek dijminê Kurd û Faris bûn, yan jî dijminê Ecem bûn. Ji lewra Eceman jî, bi her awayî şerê wan dikirin û sergêjî diriwê wande diafirandin. Çawa, ko li ser destê kurd û îraniyan dewleta Emewî hate windakirin û dewleta Ebbasî li ser destê Ebûmuslimê kurdî Rawendî Xerasanî hate danîn.

Kurdên Mesîhî-Îsewî, hindikin û du eşîrên kurd tenê çûne ser ola Îsa-Mesîh, ko Mesûdî navê wan dibêjî, Yaqubî, Curqan. Ev herdû eşîr li jorê Mûsil û heta jorê Nisêbînê belav bûne.

Lê filehên kurd jî, xwe Suryanî dihejmêrin û bi zimanê Suryanî dipeyivin, dixwênin, dinivîsin û nimêj dikin. Tenê hêj çend nimêjên wan bi kurdî manê û awayê nimêjên wan bi awayê stranên kurdî têne gotin û bi kurdî jî mijûl dibin û di nav kurdande diberberî û şeran de weke kurd xwedî tiving û şervanin. Kurdên fileh û misilman bihevre dijminê xwe, kurdên fileh û misilman dikujin û talan dikin, weke Ezdiyane.

Lê di sala 1915'de dewleta Osmanî fermana filehên Kurdistanê rakir û bi destê kurdan gelek, gelek ji kurdên Mesîhî jî dane kuştin û ji wê rojêde ji me xeyidîne û bi me bawer nabin, weke, ko em dibêjin.

Tenê tiştek heye, ko em karibin bidin zanîn, ko miletê paşdemayî ne tenê dijminê Filehên nav xwene, belkîjî, xwe bixwe dijminê hevin. Eger em li raboriyên kurd temaşe bikin dibênin, ko xwe bixwe ne bi hezaran tenê, belkî bi mil yona ji hev kuştine û mal û can û welatê xwe bivî awayî jî dijminê xwere berdest û bindest hiştine.

Lê tenê Filehên kurd yan jî kurdên Fileh, guh dane rewşa fileha û tarîxa kurdên misilman nexwendine û guh nedane welatê xwe. Ji ber, ko xwe nekurd dibênin û di welatekî bê ganede dibênin.

Belam filehên nekurd, di welatê mede gelek peyda dibin, weke Ermen, Suryan, Kildan, Aşûr. Tenê li ser Kildan û Aşûran jî, newekhevî heye, ji ber, ko hin dibêjin, Kurdin û ji kevnarede bûne Kildan û Aşûrî, lê hin dibêjin, Kildan û Aşûriyên rajêrê kurdistan di çaxekî de hatine kurdistan û têde rûniştine û heta niha mane.

Lê ew filehên, ko ne kurd bin, kurdên misilman nehêlin çeka hilgirin û şerê misilmanen kurd bikin û di bin destê xwede dibênin û bi çavekî kêm li wan dinêrin û di çaxekîde

dikirîn difirotin hev û Salyana serê xwe, jin û zarokên xwe didane derebegên kurdên misilman û bi nanezikê ji wanre dixebitîn, cot û karê wan dikirin.

Kurdên êzdî yan êzîdîyên Kurd, Tarîxzanên cihanê, ko bi rojhilatê navîn ve mane, bûne du perçe; Hin dibêjin, bermayên Zardeştiyane û hin jî dibêjin hevalbendên Yezîdê kurê Miawiyan ne.

Lê gotina pêşî gelek bêtir nêzîkî rastiyê dibî. Ji ber, ko dixwestin şerê wan bikin. Dijminê kurd dixwestin me jihev perçe bikin û dizanibûn gelek ji kurdan, yan kurd gelek dilxwazê zarokê îmam Elîne, ev kurdên Yezdî-Ezdî-Yezdanî, kirine hevalbendê Yezîdê kurê Mûawiyê û bi vî navî xwestine kurd bi kurd bidin kuştin. Bi rastî kurdên Huseynî û kurdên Yezîdî gelek ji hev kuştine û dilê dijminê xwe li xwe xweş kirine.

Lê herwekû ji tarîxê tê xuyakirin, xuyaye, ko ev kurdên ko li ser ola xweya kevnare Zardeştî, mane, di serê çiyade bi mêranî xwe parastine û bi gernasî zora dijminê xwe birine.

Kurê Belxî di sala 500'ê koçîde dibêjî; Nîv milyon malên kurd, ko li hindama Faris rûniştîbûn yekî tenê bi navê Elîk misilman bûye û ên mayîn bi carek hatine kuştin û win dabûne.

Berî hingî di sala 250'ê koçîde Ehmedxanê kurê Leysê kurdî bi çend hezar siwarve çû ser bajarê Emîr Ehmed Kerman û talan kirne û jin û keçikên wan revandin û keçikanî xistin. Di şerê Yaqubê Seferde, yaqub gote paykê Elî, kurê Huseyn fermandarê Şîraz; Ma Elî misilmane, ko Ehmedê kurê Leysê kurdî, kurdên gawir dişênî ser Kerman, mal û jin û keçên misilmana yexma û talan dikin.

Herwekû Şerefxan, di sedê deh, yazdehên koçîde dibêjî ; Eşîrên Dimbilî, Mahmûdî, Silîvanî, Xalîdî, Bextî, Dasinî, bicarek êzîdî bûn. Lê îro de ji van eşîrên borî Dasinî tenê êzîdî mane û evên mayîn misilman bûne. Lê heta nihajî, ko sala 1972'ê zayînê hêj êzîdî bêtir ji milyonekê mane û li her cihên Kurdistanê cî girtine.

Herwekû êzîdî dijminê ola îslamêne û îslamê li cem xwe weke gawiriyê li cem misilmana dibênin û dibêjin "ji misilmaniyê pêve tiştek ji belengaziyê pîstir nîne". Çawa ko ji hevre dibêjin "Weyle misilmanbivî". Çawa, ko eger yekî misilman herî riyê jineke êzdî, ew jin li hemî êzdiyan nadirist dibî û gereke yekî misilman mar bikî yanjî bêkuştin, ji ber, ko êzdî nema karibin marbikin, xwe pê biqerêj bikin.

Çawa, ko çi dema lawê yekî êzdî nexweş dikevî, kuştina yekî misilman li ser xwe dibirî, ko xwedê kurê wî rakî. Mê rikê êzdî di nav nivînê jinika misilmande ranazî û li ser Ehremen dixeyidî û cihê, ko nû roj lê bidî radimîsî.

Lê hin tiştên misilmana ji xwere girtine. Weke, Şexhadî û çend mirovên dî kirine mezinê ola xwe û li ser wan dixeyidin û gorna wî ji xwere kirine laleş-hec.

Herwekû dinav êzdiyande, Qatqatî gelek xurte; Pîr ji pî ra jina tênin û şêx ji şêxa tênin û feqîr ji feqîra tênin. Lê milet qata jêrî ji hev jinan tênin. Ev reng di ola isla mê de peyda nabî.

Lê ji bo, ko em bidin zanîn, ko êzdî kurdên Zardeştîne, divê em ola zardeştî di virde bidin nîşandan.

# OLA ZARDEŞTÎ

Berî ko Zardeşt rabî miletên Îran çawa çavên xwe vekirin du xwedê ji xwere pesinandin: Xwedanê Ronak; Roj agir qencî, dilpakî û xwedanê setem; zordestî,şevtarî, dirindî mêrkujî ,talankerî, zivistan, serma, bahoz, pijkîn, volkan.

Çawa, ko di çaxekê de sê xwedanê Îraniya hebûn: Mîtra, xwedayê şînahî, çêre, biharê bû, çawa, ko Zardeşt bi xwe gotiye; Mîtra parêzê çêre û xwedê şînkayî ye, ew bidî kê, kes nikarî destê wî bigrî. Ji vê gotinê tê xuyakirin, ko di wê çaxêde kurd pez-sewal pir xwedî dikirin û li ser biharê çêrê şerê hev dikirin. Xwedayê diwem, navê wî Yîma bû, ko, xwedayê piştî mirinê bû. Xwedayê siyem, Aşa bû, ko xwedayê qadê bû.

Vê paşiyê di kolanê Hêtîtande hin tişt hatine dîtin, ko ronahiyê tavêjin ser olperestiya îraniyan û didin xuyakirin, ko navê xwe dayên îraniyan, Mîtra Vironaandra , Nasay ta ne û di sedê çardehê berî zayînê padîşahê Îran ev xwedan pîroz dikirin û bi rûmet didîtin.

Herwekû îraniyan bawer dikirin, ko agir, tiştekî pîroz û mezine û hin xwedê hene, ko nayêndîtin weke, xwedayê Şer xwedayê teba kuj û bawer dikirin, ko xwedanek heye, ko can dar dibin, hêz û hinera wî de rawestiya ye û bê wî nikarî tiştekî bikî û tiştekî kesnedî ye, ko bêser û bin di jînêde her û her heye.

Lê di çaxê Kurdên Mîdîde Somayan, Fahoma weke, ko di avista de hatiye, ji xwere bi xwedayê Şer nasdikirin, Paşê Diwaîva Dêw, xwedanê şer hatiye naskirin, ko di paşîde bûye Ahraman dêw.

Institut Kurde de Paris

Lê di welatê Hindêde Daîva xwedayê Xêrê bû, yan jî, ji canê ronakre dihate gotin. Ji xwedayê şer re jî digotin A-sûra, çawa, ko Ahora di ola Zardeşt de xwedayê xêrê ye xwedayê Ronake.

## ZARDEŞT

Navê wî çiye û ji kuye?

Gelek navên Zardeşt hene: Zardeşt, Zurdeşt, Zurteşt,Ze-radeşt, Zuradestira, herwûka ji van pêve jî diwazdeh navê wî hatine gotin. Lê di Avistade navê wî Ziradestra, Esbîta Mazra Destra ye, Lê Ewrûpî dibêjin Zerwastir û di Pehlewî de Ziratuşt û di Farisiya nû de Zurdeşte. Tenê İbnî Nedîm, dibêjî, Zeradeşt kurê Esbîtman û xwedîyê nivişata Basîta nî û felsefeyê û dibêjî, Şitaşozarduşt.

Lê ez dibêjim, ev hemî ji nezaniya tarîxzanaye, ko vî navî ser û binê hev dikin û heryek tiştekî dibêjî, Navê wî bi rastî Zar-deşte, zar bi daxwaza zimane û deşt bi daxwa-za raste, yanê peyxamberê Rasgo, Rast goye. Lê hin dibêjin Zard bi daxwaza Zer e û Uştra bi daxwaza Uştur devê ye, ya nî xwediyê devê zer, lê li nik min Rastgo ji xwediyê devê-zer rasttir û xweştire. Lê Feylesofê Almanî Nîçê bi Zara navê Zardeşt dinivisî, herwekû bi kurdî, Zar-Zarav, bi da-xwaza zimane, lê zarav, ji zimanê tilûr û tebare tê gotin.

## NAVÊ BAVÊ ZARDEŞT

Navê bavê Zardeşt, Porşev-Porşeb e, ji zariwên Ferîdon, padîşahê îraniye. Zardeşt kurê Porşev kurê Dexdo kurê Hatî kataspaye.

Lê çawa, ji niviştên Zardeştî, Bendheşîn, Zadsibadem, wîgirkart û Dînçe tê zanîn, Zardeşt digihê ser Menûçehır kurê Îrec kurê Ferîdon û navê diya wî Dexdo ye û mirova ba vê wiye.

Lê di hebûna Zardeşt de jî, du awir hatine, yek dibêjî, ji xwe Zardeşt nehatiye cihanê, belkî tiştekî efsane û de-rewe û ev tiştên, ko dixin sitiwê wî, hemî çîrok û derewin û li ser zimanê wî anîne weke mele Navdar Ciha û Behlûl.

Tenê ev awir, di îrode bi carek pûç û weza bûye. Ji ber ko ev tiştên, ko di îrode di nav kolan û vedanêde derdike-vin bi xurtî didin zanîn, ko raste Zardeşt mirovekî mezin û xwedî ol û nivişte.

Lê awira diwem dibêjî, Zardeşt raste û mirovekî tarîxiye, xwediyê vê awirê, Eflatûn, feylesofê Yewnaniye, navdare, ko dibêjî, Mazdîsermezd kurê Or, peyxamberê îran çawa çêbûye di wê rojê de keniyaye.

Herwekû, di çax, sal û demên çêbûna wîde jî neweke hev hatiye gotin. Hin dibêjin, di serê sedê 6 berî zayînêde çêbû ye û hin dibêjin, di sedê dehem berî zayinêde hatiye cîhanê û hin dibêjin, şêst qirnî berî zayinê çêbû ye.

Xwediyê awira diwem, dibêjin, dara padîşahê navdarê îranî di sala 521-485 yan di sala 479'ande li ser ola Zardeşt bû û ev ol kiriye ola dewletê, ev ji nivîsarên Behsitûn tê zanîn.

Lê di nav berma, kolan û vedanade hatiye zanîn, ko di nav nexşên Aşûr û nivisên Aşûrde hatiye xuyakirin, ko ola Zardeştî di welatê Mîdya de berî Keyxwesrewê-Kohreş, ko di sala 558-530 de bûye padîşahê îran, berî zayînê bi dused sal ev ola Zardeştî hebû, yanî berî zayînê bi 714 sal ola Zardeştî hebû. Ji ber, ko du padîşahên Mîdî navê xwe kiribûn "Mezdaka", ko ji Mezda veketiye, ko Zardeştî ji xwedêre digot "Ahora Mezda", ca eger bê bawerkirin, ko ev herdû padîşahên Mîdî jî pêbawerên ola Zardeştin, gereke berî wan ev ol bi çend sedsal hatibî meydanê û di nêzîkî 1000 salî de bî.

Lê xwediyê awira yekem dibêjin, rastî ewe, ko bi 600 salî berî zayînê bî û xwediyê vê awirê, Dermistîd û Hêwardin ko herdû jî Firinsîne û Wîst, Birawin Îngilîzî û Cakson Emerîkî ye. Ev çend mirovên zana dibêjin,- Zardeşt di nîvê dawî ji sedê heftê berî zayînê de hatiye meydanê û di nêzîkî sala 660 de çêbûye û di sala 575 de serê xwe daniye, hatiye kuştin û 77 sala sax û jîndar maye. Di Azerbaycanêde çêbûye û li Belxê di çaxê Kuştasebde ola xwe eşkera kiriye.

Lê hin dibêjin, ji Felestîn hatiye Îran û nivişta xwe çêkiriye, lê kesî pê bawer nekiriye û piştî gereke dehsala hatiye cem Kuştaseb û padîşahê Îran baweriya xwe pê aniye û agirdanek jêre çêkiriye. Dibêjin, gilokek agir di destê wîde bû, ko kes nedişewitand û ronî dida.

Lê nema kes bi vê awirê bawer dikî û gelek sêfil û weza ye. Awira îraniyan bêtir rast derketiye û niha herkes bawer dikî, ko Zara-Zardeşt ji kurdên Mîdîye û li hindama Atropatîn (Azerbaycan) nêzîkî gola Ormiye çêbûye. Hin dibêjin, ji Mîdya dest bi belavkirina ola xwe kiriye, lê pirê zana dibêjin, li Belxê(Baktiya-Bextirya) ola xwe eşkera kiriye.

Institut kurde de Paris

Navê agirdana wî, Atiravan bû. Avaniya agir, çawa, ko bi zimanê Hindî Atravan, xaniyên agirin. Avan bi kurdî ye û Abadan bi Farisî ye. Nivişta, ko Zardeşt bi zimanê Mîdî nivîsandiye Katahaye, ko berî hemî nivîştên wî û li Mîdya hatiye nivîsandin.

Bi kurtî, Zardeşt, kurê Porşev ji kurdê Mîdî ye û li nê zîkî gola Ormiye çêbûye. Di sala 660 de berî zayînê çêbûye û di sala 583 de li Belxê bi destê turka hatiye kuştin û 77 sala sax maya. Ji Mîdya çûye Bekterya û li wir ola xwe eşkere kiriye û dehsala li çol û çiya geriya ye û Kuştasab Kuşt-Asef, ne bavê Dara ye, ko li Persopolîs fermandar bû.

KOSTÎ- KOSTEK

Kostî yan kostek, beneke nav bi qule. Du caran li pêş û du caran li paş girê didin û li ser xirqeyê pîra girêdidin.

Ev kostek ben û xirqe,ji rewşa kevnarê Îran bûn. Çawa Zardeşt hat di ola xwede pîroz kir û hetta niha jî kurdên êzdî li ser xirqê yê pîroz girêdidin. Lê kurdên misilman piştekê li ser çoxik şalê xwe çend caran digerênin û li pêş li hev dizîvirênin û carekê dibin paş û çend caran li newqa xwe digerênin.

Zardeşt sê cara jin aniye yan sê jin aniye. Ji jina pêşî sê keç û kurek mane û keçeke xwe bi navê Porşista daye Camasebê wezîr. Ji jina diwem, du kur bi navê Orvatatnara û Hevarîkza mane. Yek ji wan bûye mezinê cotkara û yek bûyeserdarê leşkerê, ko bavê wî saz kiribû. Ji jina paşî, ko navê wê Hevovê bû û keça Firaşsostra, birayê Camasebê wezîr bû, lê zarok jêre çênebûne. Herwekû Camaseb û birayên xwe ji pêşvetirê yar û hevalên peyxamber û padîşah bûn. Cama yek û Feraşa ê diwem bû û Zardeşt hê bîst salî doza Pey xamberiyê kiriye û deh salan li çol û çiya geriyaye, gelek westiyaye û perîşan bûye û di şikeft, berqef, berlatade ra zaye û maye. Gelek zar-zar kiriye, herwekû diriste, ko em bêjin Zardeşt, bi daxwaza Zarîn xan zarzar, yan jî Destzêrîn hatibî, jan jî bi daxwaza Ristevan bî ê, ko bi zarîn distira û bi rist zimanê kurdî dihûna û dirist dikir. Dibê jin, li Azerbaycan, li ser çemê Dîtî, zara mirovekî nûranî ronak û şewq û şemal diye, ko gelek mezin û bilind bû, weke sitûnekê bilind û bi ronî xwe lê girt û hate cem û jêre got "kincê xwe wergirebavêje" û gotiye navê min Vahomaye, serdarê suriştame û ew tazî biriye ezmana cem xwedê û her tişt bi Zara daye zanîn û sê cara Zara ev mirovê ronak diye û bawer kiriye, ko xwedêye yen nûra xwedêye û laşê wî

dagirtiye û di sala 30 de berî zayînê jêre peyxamberî hatiye.

Hêvîyeke wî, bi navê Mantiram Ahonavêrya herdem dixwend ko ji ser xwe neçî û canê napak dûrî wî bibî.

Xwedê divê em rast û dirist bin, xwedê, Vahomana didî wî mirovê ko karê qenc ji Ahoramezda rê dikî, çi kesê arîkariya birayê xwe ê belengaz û reben bikî Ahoramezda destê xwe li pişta wî dixî.

Dijminê Zara dixwestin wî bikujin, lê herdem dihate parastin. Herwekû pismamê wî Mîtermah berî herkesî bû hevalê wî, baweriya xwe anî. Dexdo diya wî dibêjî " gava ez avis bûm, min di xewna xwede dî, ko bi hezaran tebayên mêrkuj, goştxwer dirêjî min dikirin û dixwestin zikê min biçirênin û zaroka min derxin û bixun. Lê firiştak ji ezmana hat û ez ji nav wan hov û teba derxistim û berda wan û tiştek bi zaroka min nehat.

Li Belxê ola Zara belav bû û hetta Hind, Yewnan, Turkistan jî çû. Dibêjin, feylesofê Yewnanî Totyanos hate cem Zara û kete ola wî. Çawa ko Mobezanê Hindistanê hate cem û baweriya xwe pê anî, lê Totyanos ola Zardeşt li Yewnanistanê belav kir.

AVİSTA :

Navê nivişta ko dibêjin, ji ezmana hatiye Avista "Abistaq" e. Û bi Suryanî Abistaka û bi Farisiya nû dibêjin Abista "Awîsta", lê li Behsitûn Abistam hatiye nivîsandin . Çawa, ko di pehlewî de Awestak hatiye gotin û Darmistîr dibêjî Abistak û Teberî dibêjî, li ser çermê diwazdehezar çêlek hatiye nivîsandin û zêravkirin.

Lê kurê Esîr dibêjî, navê nivişta Zardeşt Aşta bû, lê çiqa geriya kesî nikaribû nivişta wî bixwênin û baweriya xwe pê nanîne û naçare nivişteke dî bi navê Zend, li ser çêkir. Nûvejand û nivişteke dî bi navê Bazend li ser Zend çêkir û gelek nifşên zanînê têde nivîsîne. Weke, zanîna jimarê, zanîna sitêra, zanîna nexweşiyê têde bi hesanî dane xuyakirin. Herwekû, tarîxê gelên kevnare dane naskirin û gotiye, van gotinan ji min bawer bikin heta, ko xwediyê Deveyê sor bê û daxwaza wî ji xwediyê devê sor Mihemed peyxambere.

Lê Mesûdî dibêjî, Zardeşt kurê Esbitman, peyxamberê Mecûsiye. Navê nivişta wî Zemzeme, lê li cem îraniyan navê wê Fisya(Fistah) e.

Dibêjin tîpê nivîsandina vê nivişte şêst(60) tîpin û kesî şîwê vê nivîsandinê nizanibû û li ser diwazdehezar çerm bi zêravê hatiye nivîsandin. Têde, ferman bi erê-na kiriye û qanûn, destûr, rist dane zanîn. Heta çaxê Îskenderê Meqdonî jî Îran li ser van rist û qanûna diçûn, lè Îskender gelek ji perçên vê niviştê şewitandin.

Lê çawa, ko Erdeşîrê kurê Babik bû padîşahê Îran careke dî civandin û perçak jê mabû, anîn û navê wê kirin Îsnad - westa û Mesûdî pêde diçî û dibêjî, Zardeşt nivişteke dî li ser nivişta xwe bi navê Zend çêkiribû û li ser Zend-Bazend çêkirîbû û piştî mirina wî zanayên îran, niviişteke dî li ser hersê niviştên wî çêkirin û navê wê kirin Bard yan Bawer û Mecûsî heta niha jî nikarin wê niviştêji bîr bikin û her yek hinekî jiber dikî, lê dibêjin, li Secistanê yekî jiber kiribû.

Çawa, ko Mesûdî di cîkî dîde dibêji "Di çaxê manîde zendîq derketin û ji ber, ko nivişta Zend li gora dilê xwe ji hev vediwejandin, navê wan kirin Zendîq. Ji Zendî-Zendîqî hatiye. Paşê ji heçî kesê ko bawer dikir cihan kevnareye digotin Zendîq. Ji ber, ko misilman bawer dikin ko cihan bi fermana xwedê û ji nûra wî hatiye çêkirin û rojekê wê bi fermana xwedê wêran bibî."

Daxwaz ji avista kok û bingehe. Lê bi kurdî Awîsta, bi daxwaza "Avêt", " Xwest", çawa, koniviştin bi daxwaza razan û xewe, Avis bi daxwaza hebûna tiştekî nû, ko hêj di zikê diya xwede ye û gelek diriste ji Avis hatibî.

Lê kengî hatiye nivîsandin, newekhevî têde heye, hin dibêjin, gereke di 560'ê berî zayînêde hatibî nivîsandin. Jî navê, ko wilo dibêjin Mêster Caldner e, ko di daîretilmearifilislamiyêde gotiye "ev nivişta mezin cara nehaye(9) ko tê çapkirin. Cîdner dibêjî, di nivişta Dînkurdde hatiye ko li bajarê Îstexer du perçe ji vê nivişta Zardeşt mabûn, lê yek di qesra padîşah de şewitî û yek bi destê Yewnaniya hate windakirin.

Lê hin dibêjin, tenê yek perçe mabû, ew jî, bi destê Meqedoniya hate şewitandin. Çawa, ko hin dibêjin, perçak maye û li Belx yan Semerqend hatiye veşartin. Lê çawa dibî tenê hersê niviştên zardeşt, bi destê Meqdonî û Yewnaniyan hatin şewitandin.

Tenê zana, bi yek deng dibêjin, ji 21 perçî, perçak bi navê Kataha maye, ko îro di nav destê medeye û ji kevnaretirê niviştên Zardeşte. Perçê herî kevnê Avistaye.

Tenê di nivîsandin û çax û demên wêde jî newekhevî he-

ye. Hin dibêjin, Zardeşt bi xwe nivîsiye û bi dengê bilind û sitiran gotiye. Lê hin dibêjin, perçê yekem wî bixwe nivîsandiye û perçê diwem bi alîkariya hin hevalên xwe nivîsandiye.

Herwekû hin dibêjin, Kataha, sê perçene, yek Zardeşt nivîsandiye, yek bi alîkariya hevalên xwe nivîsandiye û yek jî piştî mirina wî hatiye nivîsandin û çêkirin.

Lê niha hatiye zanîn, ko hersê perçe jî Zara çêkirine û nivîsîne. Ji ber, ko gotinên wê gelek kevnare û berî Avista hatiye danîn û bi zimanê Mîdî hatiye nivîsandin. Herwekû ev kataha bi şiwakî xweş û hesanî û bi sitiran hatiye danîn, ko herkes dikarî bixwênî û nas bikî. Ne wek, Zend, hişke. Çawa, ko gelek lav lav li ber xwedê kiriye, ko tê zanîn di wê çaxêde Zardeşt di serê pêşîde bû, ko bi çol û çiya diket û bi hawar û zarî destê xwe li ber xwedê vedigirt û dengê xwe bilind dikir.

Lê perçên mayîn windabûne û hetta çaxê Erdeşêr ji nûva ji devê mirovên zana, ko jiber kiribûn, civandin û yeke nû çêkirin. Lê dibêjin, li ser destê Vologîsîs, 51-78'ê zayîn, berî Erdeşêr hatiye çêkirin, civandin. Erdeşêr di çaxê xwede navbera 226-240 de pêkaniye û careke dî pêrçên wê gihane bîst û yek (21)î. Ji lewra gelek diriste, ko hin tişt li ser gotinê Zara hatibin zêdekirin.

Lê Wîst, ko zanakî tarîxêye dibêjî, ev nivişta Avista, ko di çaxê Sasanîde hatiye çêkirin û komkirin 347 hezar gotin bûn. Lê ev nivişta, ko li ber destê me maye 83 hezar gotin hene.

Wendîdad û Pesta:

Hate zanîn, ko Avista bi destê Zardeşt hatiye çêkirin û bi carek hate şewitandin û yeke nû di çaxê Sasaniyan de hate civandin. Lê di virdê jî, newekhevî peyda dibî. Hin dibêjin, çaryekê wê maye. Weke, ko Wîst gotiye û hin jî dibêjin, perçak ji 21 perçî maye û ji bo dîtina vî perçî jî rûmeta mezin ji zanayê Firensî Enkotîldubirênreye, ko di dawiya sedê hijdehande di niviştxana Bûdilyande hin perçên destnivîsî dîn û xwest, ko dawiya vê niviştê nasbikî. Çawa çû Hindê tercuma perçên mayîn bi xwere anîn Firansa. Lê ev perçe yek ji bîst û yekê Avistaye, ko di çaxê Sasaniyande hatine civandin û navê wê Wendîdade û çar perçên dî bi hevegirêdayî binavê Pesta hatine xuyakirin. Ji lewra em jî, dikarin van pênc(5) perçan di virde bidin nîşandan.

1- Perçê yekem- Pesnaye: Ev perçe ji bo nimêj û hêvîyaye û sitiran, dîrok, nimêjêne, ko têde pesnê Firişt

û jîndaran pîroz dikî û di vî perçî de 72 ha tê gotin, herwekû Kataha jî di navdeye:

Hawar, hawar !
Ji bo mirovan
Bere xwedêye mezin
Di hewara me bê .
Herdû xwedenên bêmirin ,
Tim jîndar di hana me bên .
Ya Ahora, me bibe ser riya rast ,
Qerêjê ji dilê me paqij bike, bi male .

Ya Mezda, tu gelek ciwan û xweşikî !
Bilindî û her tiştî dikî
Û li gora karê me tu bi mere dikî .
Te xweşî daye xêrxwaza ,
Te reşî daye şerxwaza ,
Ev hemî ji qenciya te û dana teye ,
Ey xwedayê mezin û zana !

Zara, di vî perçîde gelek pesnê Kuştasef daye û ji xwedê hêvî kiriye, ko qenciyê pê bikî û jîna wî dirêj bikî:

Mezda, Ahora, dixwazim, hîvî dikim,
Qencî , pakî û serbilindiyê bidî wan mirovên, ko zû ketine ser ola te û baweriya xwe bi nivişta te anîne. Kuştasef berî herkesî ketiye ola te û baweriya xwe bi nivişta te aniye, alîkariya te kiriye, ez di mala xwede xwedî kirime, ey Ahora, ey Mezda!

Feraşaostra, keça xwe da min ,
Ew keça xweşik, rind û şêrîn !
Ko ez gelek jê hez dikim .
Ey xwedayê mezin !
Wî bibe ser riya rast û dirist ,
Wî pak û paqij bike ey Ahora !
Camaseb mirovekî qenc û paqije ,
Hêvîdarim tujî jêre qenc bî .
Wî pak û paqij bikî ey Ahora !
Qenciyê ji Mîtyomah, pismamê minre bike ,
Ji ber, ko berî herkesî
Alîkariya dost û hevalê te kiriye .

2- Perçê diwem- Vîsperd: Ev perçe 23-27 perçene û navê wê Kirdeye û gelek nêzîkî Pesnaye. Têde hin sitiran, lavêjên olperestî peyda dibin, ko di hin rojên şahî û cejnade têne gotin. Lê ev perçe weke dawiya Pesna xuya dikin.

3- Wendîdad- Dijminê Ahrîman: Weke destûr û qanûna ola



Institut Kurde de Paris

Zardeştiye, ko tenê pêzan û rêzan dikarin ji xelkêre bidin zanîn û bibêjin û bi destê xwe bigrin. Baweriya Zardeştî markirina jina, parkirina bermayê miriya têde dane xuyakirin û bîst û du perçene.

Di perçê pêşîde dabaşa afirandina cihanê kiriye, ko çawa Ermezd ev cihan afirandiye û kîjan qad pîroze û çawa Engiromîno Ahrîman çend canên şerxwaz di hember canên xêrxwazde afirandine.

Ji vir tê xuyakirin, ko li cem Zardeşt, xwedê du hêzin; Xwedanê xêrê Ermezd, Ezr û xwedanê şerê Engiromîno-Ahrîmen. Herdû jî dijminê hevin û di ber hevre diçin.

Ev Wendîdad dabaşa tiştên pîs û nedirist û tiştên baş û dirist û paqijkirina bi avê û şuştina miriya û şuştina kinca û laşê xwe û birîna, neynûka û kurkirina porê xwe û dûrkirina ji gunehan dikî. Dibêjî, neynûkbir, mûbirê li ser tawlê deynî li ber çavên xwe bihêlî, porebirî û neynûkên jêkirî bixin bin axê veşêrin.

4- Peştat-Peste: Ev perçe, sitiran û qulwelkin û bîst û yek perçene. Têde pesnê Firişt û qencên xwedê didî û dibêjî İnşasbend, Sazbend, Ezd, ko di çaxekî de yek tê xwendin û navên Firiştan li ser wan sitirana hatine danîn yanî her sitiranek bi navê Fireştekî hatiye navdan û ji ber, ko 12 tenê xuyadikin, xuyaye, ko 9 perçe windabûne.

5- Xurd Evista: Evista piçûk, ev perçe jî bi carek hêvî û zar zar û lûb lûb e, ko xelk ji xwere dibêjin.

Di çaxê Erdeşêrê diwemde Azerbazmehirsipend pîrê Zardeşt di sala 310-389 berî zayînê de çêkirine û gelek Ji van sitiran û guļwelkan, ji Avista hatine guhaztin û hin ji bazend, ko bi zimanê hatiye vejandin hatine guhaztin û hemî hêvî û lûblûb û nimêjin. Ev xurde çar perçene.

1- Nîjîş: pênc hêvîne, ko bi wan gazî Roj, Heyv, Mîtra, Av û Agir dikir.
2- Kataha: Pênc hêvî ne
3- Sîhroje: Ko di her rojekê de yek dixwend, piçûk û mezin hene.
4- Aferînkan: Çar hêvî ne û ji xwedê hêviya pîrozî û pirbûnê dikir. Çawa, ko di xurdede dabaşa, olperestî, hîvî, zarzar, nimêj, gerdanxwariya ji xwedêre, ko di rojên cejn, şahî, markirin, govend, destgîrane de dihatin gotin û xwendin.



Institut kurde de Paris

Lê Zardeştiyan, hin perçên dî li Avista zêde kirine û ji wan 1- Bendhişî, 2- Erdawîrav in.

JÎNDARÎ DÎ OLA ZARDEŞT DE:

Zardeşt, dibêjin, cihan di çar pêlave derbas bûye û her pêlekê sê hezar salin.

1- Pêla yeke: Nîrêzêrînî ye, ko têde Yîma, Cemşîd û Ahoramezda cihan xistine bindestê xwe û Ahora-Mezda xêr û pîrozî berdane ser qadê.
2- Pêla diwem: Ewe, ko tarî biser qadê de hatiye û bicarek di nav reş, tarîstanêde hiştiye, winda kiriye.
3- Pêla siyem: Ewe, ko xêr û şer yan ronak û tarî şerê hev kirine û xêr, ronak zora şer, tarîstanê birîye û Zardeşt hatiye cihanê û rîya rast û dirist şanî xelkê daye û qencî û xerabî ji hev dane alî.
4- Pêla çarem: Ewe, ko xêrê zora şer biriye û Saoşyant, hatiye meydanê û pîrozî ketiye cihanê û xerabî di çaxa wî de bi carek ji ser riwê qadê rabû ye û xêr bûye padîşahê jînê.

AFÎRANDÎNA MÎROVAN:

Di serê pêşîde, mırov ji sê damaran gihaye hev. 1- laş winda dibî û dibî ax.2- Hiş, ko bi xêra wî mırov dikarî qencî û xerabiyê ji hev bidî alî û nasbikî.3- Can, ko pak û paqije û jêre dibîjin Ferawas, her û her dimênî, winda nabî bi xwedêve hatiye girêdan.

Ji ber vî awayî laş, ko pîs û bi qirêje ne diriste, ko kes destê xwe bidî laşê miriya û bi agir jî neşewitênin û nexin bin qadê, ji ber ko qad û agir pîrozin.

Di çaxê wîde jibo laşê miriya Dekhoma çêkirine û laşê miriyan tavijin Dexma jibo, ko tilûr û teba bixun.

Ji bo hilgirtina miriya malbatek heye, ko dikarî bi laş re herî Dexma û laşan hilgirin û bavêjin Dexma û li ser qulwelkan bixwênin. Deh-koma(Dexma) çardîwarê servekirîne, laşan têde datênin, ko tilûr û tebayên goştxwer wan bixun. Sê rojan jêre hêvî û lûb-lûbê dikin û roja çaran rojî digrin û ji xwedê(Ahoramezda) hêvî dikin, ko wî xweş û bi hesanî di ser pirêve derbaskî. Divê ew mırovên, ko ne paqij û şuştî bin, bi laş re neçin nav Dexma(Deh-koma).

Herwekû rista, Kemta Mezda. jêre dixwênin û tavêjin nav Deh-Koma.

RİSTA KEMTA MEZDA:

Xweda Mezda, ji te pêve kî heye, kî dikarî mırovên bindestê dijmin weza û sêfîl ji destê gawiran biparêzî.
Ey Mezda, tu xwedakî pîroz û xurtî, zana û rastî, her tenê dikarî riya rast û dirist şanî me bidî, rastiyê şanî me bide.
Ji te pêve, kî karî serê dijminê dijwar bipelixênî, ji te pêve kî dikarî me biparêzî.
Ey Mezda, serdarekî zana û rêberekî dilpak şanî me bide ko destê me bigrî û bi ser riye tede bi bal teve bikşenî.
Serdarê Firiştên, xwe bike rêberê perîşan, reben, waza û mirovên pak û dilovan. Me biparêze ji dijmina û bere dijmin herin bimrin û heval û dostê wan jî pêre bimrin, winda bibin, serê dijminan bi perçiqêne.
Ey dirj dijmin, here rajorê welatê me, dako em ji te bêne parastin.

KUŞTİNA LAŞÊ XWE:

Zardeşt, kuştina laşê xwe xwedest dirist nedêraye û gelek gunehkarî dibênî û dibejî, xwekuştin, dijminahiya Ahoramezdaye. Ew mirovê, ko xwe dikujî yekî ji leşkerê xêre kêm dikî, gereke mirov xwe û mirovaniyê bi carek biparêzî çawa, ko bermekî agir diparêzin.

AHORA MEZDA:

Aho ez, ra cihan, Mezda xwedêye yanî-ez xwedê me. Çêkroxê cihanim. Lê xweda ji du gotina gihaye hev: xwe, wî, da, çêkir- afirand. Yanî wî xwe afirandiye, wî xwe çêkiriye. lê bi kurmancî mêr û jine.
Yan jî, xo-da, diya xwe, yan tebîe û dê ye, herwekû bi daxwaza xwedî jî hatiye, ez bê xwedî û xwedanim, bêkesim.
Çawa, ko Ezd-Yezd Yezdan, jî bi xwaza mezintir hatiye yezdî gurd bi daxwaza gernas, mezintir hatiye yan jî gernasê xwedêye. Çawa, ko tê xuyakirin Ahoramezda xwedanê yekta û bê hevale û Ahrîmen ne di hember wîde tê xuyakirin, lê du hêzên dî hene, ko di hember hevde di rikê hev dene. weke Esbetamîno û Engeremîno. Ê pêşî dawerê xêr û ê paşî dawerê şere. Yanê Hirmiz dawerê xêr û Ahrîmen dawerê şerêye.
Şehristanî, di nivişta xwe elmilel we nehelde dibîjî , ola Zardeşt, ola xwedênas û yektiya xwedêye û Yezd xwedakî tenê û dijminê Ahrîmene û di cîkî dîde dibêjî, xwedê ronak û tarî, bi hevve danîne û ronak berî tarî hatiye lê

tarî lê peyda bûye.

DÎ OLA ZARDEŞT DE:

Xwedê yeke Ahoramezda Hurmize, Ronak koke û tarî rewşa wêye, siya wêye û ronak gelek pîroze.

Du hêzên xurt di cihanêde hene. Xêr û şer, xêrxwaz mirovên çê û hevalên xwedêne û şerxwaz, mırovên xerab û dijminê xwedêne

Du perçene dubirin: 1- xêr, ronak, jîn, rastî. 2- Şer, tarî, mirin, xap. Di pêşiya bira yekemde Esbentamîno û şeş hevalên wî hene: Bîrbina çê, Rista çê, melekûta mezin mirovên pîroz, bi rûmet, jîndarî, Xweşî, Navdarî, hermayîn û li peyvan heft tiştên dî jî tên, zanîn, mêranî, paqijî, dilovanî, pakî, pêbawerî, comerdîne.

Di paşiya her şeş hêzên şer de Engiromîno sanê şerxwaze û heft hêzên pîs xerab alîkariya wî dikin. Durûtî, xap, bêbextî, tirs,çirûkî, zordestî, kuştin û di navbera herdû hêzande herdem şer û pevçûne. Ev dijminahî her û here timiye. Her yek ji wan dixwazî cihanê di bindestê xwede bihêlî, mirovaniyê bixî bin destê xwe.

Zara ferman dikî û dibêjî, gereke mêrê qenc herdem dost û hevalê xêrxwaza bî û şerê şerxwaza bikî.

Baweriya bi roj û ronakê, bi şingariya civakî ya Kurdistanêve hatiye girêdan. Ji ber, ko çûn û hatina serê çiya bi şev û di tariyê de gelek dijwar û bi tirse. Çawa, ko bê agir û ronahî kes nikarî di Kurdistanêde û hetta di xaniyên xwede rûnî yan bicivin û hev nas bikin hev bibênin. Rewşa şevê gelek bi saw û tirse.

Herwekû roj bixwe dawerê candar û hebûnêye û qad û sitêran digerênî xwedî dikî, yek ji çar hêzaye, ko jîndarî bê wan di cihanê xweranagrî, germ, serm, oksîcîn, xwarin, yan weke, ko digotin, agir, av, ax, ba. Ji ber ko, çawa di laşde, di candarde, mijî, xwîn, hestî, lebatên bivê nevêne. Wilo jî, av, agir, germ, ba, oksîcîn, xwarin, ax jî ji lebatên dervê laşê candarin û gerekin.

Di çaxê Zardeştde sê agirdan(xaniyên agir, atravan) hatine çêkirin. 1- Agirdana kabul, ko agirê xwedê têd dikin. 2- Agirdana gernasa, ko li serê çiyayê Eznewend-Elwend li qiraxa gola Ormiyê hatiye avakirin û agirê gernasa têde dikin. 3- Agirdana karkera, ko li ser çiyayê Rêwent li xerasan hatiye avakirin.

Zardeştiyan, av, ax, ba jî pîroz dikirin ji ber, ko di wande ebora candar û hebûnê heye. Herwekû, Şaristanî bi kurtî dibêjî, Zardeşt di Zendevistade cihan kiriye du per-

çe, mîna can û gêtî ax û her tiştên, ko di cihanêde kirine du perçe, dayîn û kirin yan jî kirin û dayîn.

Daxwaza Zar, eve, ko xwedê daye û mirov dikî, yan jî gereke mirov bikî û bidî belengaz û reben û ji gurdketiya.

Tevgerên mirovan kirine sê perçe, bawerî, kirin û gotin yanî baweriya rast, kirina rast û gotina rast. Bi van hersiyan mirov mezin û zana û hêja dibî.

Herwekû Zardeşt, gelek pesnê kar kiriye û xwezî jê kiriye û gotiye, bere mirov gelek kar bikî, dewlemend bibî û ji bo ko nexweş nekevî, berê rojî negirî, lê, ko bigrî jî, gereke gelek hindik bî.

Dibêjî, jina gelekan mar bikin da zarok pir bibin, zora dijminê xwe bibin, kar bikin bixebitin. Kûçik, çêlek, ga, pîroz û bi rûmet kirine, ji ber, ko bi ga cot bikin û bi kûçik sewalê xwe bi parêzin. Herwekû çar cî pîroz kirine, Agirdan, Xanî, Qadaçandî û Qadabeyar. Ji ber, ko ji van her çar ciyan kar dikin. Xwe bi agir germ dikin, bi çandiniyê abora xwe dikin û li beyaran sewalên xwe di çêrênin.

Çawa, ko dibêjî, ew xaniyê, ko dex herî nav wî, Ehremen jê direvî û dibêjî, ji derewê birevin, gotina xwe meşkênin dûrî miriyan herin.

Sê nimêj li ser kurd danîne, sibehê, nîvro, êvarê. Nimêj tenê hêvî û lûblûbin.

JİN:

Li cem Zardeştiyan, jin gelek bi rûmet û pîroze, hemdem hevjîn hevkarê mêre û li cem wan Firişt, Melaîke. Şeş nêr û şeş mêne. Jin dikarî li ber agirdanê rûnî û bibî pîr û rêberê olperestî.

Bihişt û dojeh, li nik Zardeştiyan hene, mirovê pak diçî bihiştê û mirovê nepak diçî dojehê, lê mirovê ko xêr û şerê wî weke hevbin, li navbera herdiwa rûdinî.

Herwekû ola Zardeşt weke hemî olên mayîn, tiştên hêja û pak pîroz û dirist dikî û tiştên nepak, nehêja û nedirist dibênî û dibêjî, tiştên pak û hêja bikin û dûrî napak û nehêja herin.

Çawa, ko ola Zara, oleke fereh û tevayiye û ola yekeme, ko di tarîxêde bi ferehî belav bûye.

KUŞTİNA ZARDEŞT:

Di navbera Îran û Tûran de gelek şerên xwîndar çêdibûn û bi sedhezaran mirov dihatin kuştin û talan û berbadî bi ser herdû miletan dihatin barandin, rijandin.



Institut kurde de Paris

Di çaxê Kuştasefde, naçare li hevhatinek di navbera Îran û Turande çêbû. Kuştasef û Xerzasef, padîşahê Turkistan li hev hatin. Lê Zardeşt du tişt avêtin ser padîşah, kurê xwe Esfendyar, ji zîndanê anî berdî û şerê Turkistanê bikî. Padîşah leşkerê xwe şande ser Turkistan û kurê xwe berneda. Ji ber, ko barê Esfendyar, gelek giran kiribûn, ji tirsa, ko Esfendyar li şûna bavê xwe rûnî, birayê wî Gellacî kir û bi dizî ji bavê xwere got, Esfendyar, dixwazî te bikujî û li şûna te rûnî. Ji lewra bavê kal û kêm hiş kurê xweyî gernas xiste zindanê û gotina Zara şikand û berneda. Lê piştî çend şerên xwîndar û dijwar leşkerê Turan zora leşkerê Îran bir û paytexta dewletê, Belx jî talan kirin û şewitandin. Zardeşt bi heştê mirov û hevalên xweve di agirdana Belx de hatin kuştin û xwîna wan tevlî agirê geş û ronak bû.

Naçara Camaseb berê xwe da zindanê û bi hêvî Esfendyar deranî, padîşah ew kire serdarê leşker û şande şerê leşkerê dijmin, Esfendyar bi gernasî leşkerê Tûran şikand û Îran ji dijmin sitand û welatê tûran jî talan kir û bê jimar ji wan kuştin û Xerzaseb, padîşahê Tûran jî hate kuştin û welatê Îran û Tûran bi carek xiste bin destê xwe.

Zardeşt, di sala 216'ê zayînde çêbûye û di sala 293 de serê xwe daniye, hatiye kuştin û bîst û çar salî doza peyxamberiyê kiriye. Çil salan li Xerasan, Hind û Çîn geriyaye û ola xwe bi xelkê daye zanîn

OLA MANÎ:

Dibêjin ola Manî, ji ola Zardeşt û Îsa bi hevve hatiye danîn. Şahpûr kurê Erdeşêr, ola Manî kiriye ola dewletê. Lê piştî deh salan vegeriya ser ola Zardeşt û xwest Manî bikujî, Lê Manî bazda û çû Hindê.

Herwekû di çaxê Behramde Manî vegeriya Îran û Behram Şah ew xiste zindanê û di zindanêde serê xwe danî,serê wî jêkirin û laşê wî bi derê bajêrve bi darve kirin û gelek ji hevalên wî kuştin û gelek jî reviyan û çûne Turkistanê. Piştî, ko Ereb ketin welatê Îran, vegeriyan welatê xwe.

Di çaxê Emewîyande, Maniyan serê xwe hildan, lê bi serdariya Xalidê kurê Ebdilahê Qisrî, waliyê Kûfe hatin pelixandin, Çawa, ko di çaxê Ebasiyande 158-159 koçîde careke dî serê xwe hildan û Mihdî Peyrewê Bexda, ji kurê xwere got, gereke nehêlî ev serê xwe hildin û zû zû wan bi perçiqênî, Mihdî yek ji wan bi darvekir.

Teberî dibêjî, ev şîret Mihdî li kurê xwe Hadî kiriye û Mihdî sund xwaribû, ko ji nexweşiya xwe rabî wê hezar sêda

ran deynî û bi hezaran zendîqan bidarvekî, lê ji nexweşiya xwe ranebû û negiha, ko sunda xwe bi cî bikî.

Teberî pêde diçî û dibêjî, van Zendîqan, Manîyan, goşt nedixwarin, roj û şev yan ronak û tarîperes bûn, keç û xwehên xwe mar dikirin û bi mîzê serê xwe dişûştin û zarokên misilmana didizîn ko misilmannemênin û nekevin ola islamê.

Lê kurê Nedîm, di Fehrestde dibêjî, di dawiya sedê çarê koçîde nêzîkî 300 Manîperest li Bexda hebûn. Cad kurê Dirhem bi xwe Zendîq bû û seydayê Merwan kurê Mihemed Kurê Merwanê Emewî bû. Ji lewra dibêjin, MerwanêCadî, Merwan ji 127 heta 132 koçî peyrewê Îslamê bû.
Herwekû ev Cadî kurê Dîrhem, di zindana Xalid kurê Ebdilahê qisrî de hate kuştin. Di roja cejna qurbanêde, serê wî jêkirin.

Çawa, ko Bişar kurê Bird û mihemed kurê Ubeydilah nivîsvanê Mihdî ji Zendîqa bûn û Mihdî nivîsvanên xwe kuşt. Çawa, ko Bermekî hemî Zendîq bûn tenê Mihemedê kurê Yehya ne weke wan bû. Herweha Fedil kurê Sehil û birayê xwe, Hesen kurê Sehil herdû wezîrên Mamûn û Mihemed kurê Ebdilmelîkê Zeyat, wezîrê Mûtesim bi carek zendeqî bûn.

Manî, bawer dikir, ko du xwedê di cihanêde hene. Ronak, dawerê xêrê û tarî dawerê şer û herdû jî, di jîngariya jîn darde xwedî par, pişk û hevkarin. Û dibêjî, serê pêşî Ronak û tarî bi hevre bûn, lê têkilî hev nedibûn. Çawa tevli hev bûn, şerê hev kirin. Manî ev ola xwe tenê rast û dirist didî û digot, weke, ko germ û serma ji tiştekî dernakivin, wilo jî xêr û şer bi hevre di yekîde nacivin û ji yekî dernakevin. Xêr û şer her hene û wê her hebin.

Li cem Manî, çar tiştên mezin hene: Xwedê, ronahiya xwedê, xurtî û zanîna xwedê. Xwedê padîşahê bihiştêye, ronak, di roj û heyvêdaye û xurtiya wî di ba, av, agir ronakêde tê xuyakirin. Zanîn û bîreweriya wî di ola wîde ye.

DESTÛRA OLA MANÎ :

1- Bawerî bi van çend tiştên ko me derbas kirin.
2- Dûrketina ji, lat û pût û senema.
3- Xwe parastina ji derewa.
4- Gereke mirov ne çikûs bî.
5- Gereke goşt nexun
6- Pey namûsa xelkê nekevin.
7- Diziya malê xelkê nekin.
8- Bixwênin û sihr û zanînê ji hev nas bikin.
9- Di ola xwede gelek bi bawer bin.
10-Di karê xwede bêhavil û sist nebin.

Institut Kurde de Paris

Çawa ko Manî bawer dikir, ko tenê Zardeşt û Bûda peyxamberin û bawerî ji Îsa pêve, bi peyxamberên israîlîyan ne tanî. Digot, Îsa, ji nûra xwedêye, ronake. Ji xwedê cûda bû ye û ew mirovê ko cihiwan kuştiye ne Îsaye, belkî kurê jinebîkêye.

Manî pênc qatin:

Zana, ewên ko xewna vediwejêrin. Zariwên rojê xwendewar mirovên bîrewer û jîrek, bihîstok, ko bixwe guhdarî dikin, herwekû, xwendin û neqş û xetên xweş pîroz dikirin û ji xwe re hin tîpên ebcedî nû çêkiribûn. Çawa, ko neqşê Manî, navdarin û nivîştek divê meydanêde çêkiribû, ko navê wê Erjeng bû. Xelkê ev neqş jêre kiribûn nîşana peyxamberî û digotin, ne mirovê peyxamber û mezin bî, nikarî van neqşê ciwan û şeng çêkî. Manî şeş nivîşt çêkirine.

1- Şahberqan: Têde mirovên qenc û xerab dane xuyakirin. Çawa, Ehremen dikevî nav canê şerxwaz û xelkê dixapênî.
2- Sendoqa jînê: Têde pesnê Ronak û rojê didî û didî xuyakirin, ka çawa jîndar ji ronak û rojê qencî û xweşî jîndarî dibênî.
3- Riya Rast: Karê rast didî zanîn, ka çawa karên rast riyên rast ber mirova.
4- Olperestî: Diwazde mada têde didî zanî û qenciya wan didî xuyakirin. Hin hêvî û nimêjan jî, têde didî zanîn, çawa mirov dikarî dilê xwe paqiş bikî.
5- Veşartî: Dirêjî olên mayîn dikî û kêmasîyên wan didî xuyakirin û dirêjî peyxamberên kevnare dikî.
6- Nivîşta Gernasa: Têde pesnê mirovên gernas, pehlewan, kodiber ol û miletê xwede xebitîne û xwe dane kuştin, dikî.

Herweha ji hevalolên Manî re, dibêjin, zendîq, zendeqî, ji ber, ko nivîşta Zend ko nivîşta Zardeşte, tenê bawer dikin. Li gora daxwaza xwe vediwejêrin û dibêjin, ev nivîşta Zardeşt tenê raste, ji lewra ji wanre dibêjin Zendeqî, Zendîq, Zendekî ne.

NEWEKHEVÎYA ZARDEŞT Û MANÎ

1- Zardeşt, dibêjî, xwedê yeke, lê Manî dibêjî, du xwedê hene
2- Zardeşt, dibêjî, xêr û şer di nav made û can de peyda dibin, lê Manî dibêjî, can pak û paqije, lê laş tenê şerxwaze.
3- Zardeşt, zardeştî ola wan bêtir madi ye, lê Manî, bêtir

can pîroz dikin û bi carek ji made direvin.


4- Zardeştî oleke welatparêzî ye, lê manîtî feretire û cihanparêze. Zardeştî dixwazin welatê îran gavên hêja bavêjî û ferehtir bibî, lê manî guh nadin welat û dixwazin cihan bi carek ji napakî û şer bête parastin û xweş bibî.

ZARDEŞTÎ Û ÎSLAM:

Çawa, ko Zardeşt gelek ji ol û rewş û pergala kevnê Îran xistine nav ola xwe û ji welatê xwere pîroz dîne û ji cem xwe hin tiştên hêja bi serve danîne û kirine destûr û rista welatê xwe, wilo jî Mihemed peyxamber, gelek tiştên, Erebên kevnare weke, kevirê reş, siwarbûna hespa, hînbûna şerê şûra, avjênî, xwarina kevnarê Ereb û hin tiştên hêja, ji cem xwe bi serve danîne û hin ji olên hevsînorên xwe, Faris, Rom, Cihû, miletên Mezopotamya, guhaztina nav niviş ta xwe û hin ji rewş û pergal û destkerên Ereb bêqidoş kirine weke, kuştina keça, veşardina wan bisaxî û markirina çend mêran jinek, talan, dizî, şerê xwe bi xwetî. Hin ji rewşa hevsînorê xwe, Kurd, Faris weke rihkurkirin, simbêlberdan û gotiye, simbêlê xwe kurbikin û riha xwe berdin.

Lê biratî, wekhevî, karên hêja û baş, di hemî çaxan de û di hemî olan de peyda dibin. Herwekû, xurtiya olekê di xurtiya xwediyê olê de ye. Çi dema, ko gelek kêm dikevî ola wî jî berbi windabûnêve digindirî û tarîx jî, di vê mey danê de dolabeke mezin digerênî û her tiştî ser û binê hev dikî.

27.3.1967 Cigerxwîn



*Ahora Mezda*

# AWİREK Bİ KURTÎ Lİ PÊŞ TARÎXÊ

Ew çax û demên, ko li pêş tarîxê derbas bûne, ji wanre dibêjin " çax û demên berî tarîxê". Herwekû ev çax û dem bi sedan, hezaran sal derbas bûne, ko em tiştekî jê nasnakin û nizanin û nikarin bidin xuyakirin. Û ji çaxê, ko nivîsandin derketiye û heta îro, li ber çax û demên berî tarîxê ve gelek hindik û kêmin.

Di çax û demên berî tarîxêde mirov hemî hov û weke hev di serê çiya, şikeft û berqef di nav daristan û mêşe de jî na xwe radibiwardin û ji tirsa ba û baran, serm û germê dî ketin hindirwê şikeft û berqef û di nav daristana de xwe diparastin.

Zanayên tarîxê berê xwe dane kolan û vedana wan şikeft ûberqefan û hin hestiyên mirovên kevnare di wande dîne, ko didin xuyakirin, ko mirov û mirovanî di gelek qûnaxanve derbas bûne.

Navê wan şûn û şikeftan li qunaxên, ko mirov têre derbas bûne, kirine. Bi vî rengî jîngariya berî tarîxê li ser hestî, berma, şop û alavên keviri, sifrî, hasinî rawestayî maye. Ji van qunax yan çax û demên kevnarere dibêjin, qunaxa kevirî, çawa, ko pêzanê tarîxê ev dem û çaxên kevirî kirine sê qûnax:

1- QUNAXA KEVİRÎ KEVNARE(BALYOLÊTÎK): Ev qunax gelek dûr û dirêje. Ji peydabûna mirovan û berî diwazdehezar sal berî zayînê dirêj dibî. Ji lewra pêzanê tarîxê ev kirine du perçe, qûnaxakevirî kevnare yekem, qûnaxakevirî kevnare diwem. Ji her qûnaxekêre çend pêlên tarîxî danîne,

Institut kurde de Paris

navê wan şûn û cihên, ko di wande hestî û bermayê mirovên kevnare dîne, ji wan pêlanre danîne, ko ew şûn û cî li Firansa ne.

Pêlên qûnaxakevirî kevnare yekem, berî Şiliyan, Eşolyan Mostiryan çar pêlin. Mirovên vê qûnaxê di serê pêşîde li welatê Çînê di şikefta, Tişotkotîn de, ko nêzîkî bajarê Pekîn dikevî û di sala 1929'ê zayîn de serê mirove kî dîne û jêre dibêjin mirovê çînî. Bi serê mirovê çînî re hin alavên kevirî, hestiyên teba jî hatine dîtin û tarîxa vî mirovê çînî berî nîv milyon sale.

Herwekû di piştî mirovê çînîre, mirovê Cawî hatiye xuyakirin û ji ber, ko di cizîra, cawa de bermayê wî mirovî hatine dîtin jêre dibêjin mirovê cawî.

Di piştî wîre mirovê Heîdelberg hatiye dîtin, li Almanya û di sala 1907 de hatiye xuyakirin. Rexê jêrî ji çena wî hatiye dîtin, di wî çaxêde mirovê Bilinton, li Îngîltera jî hatiye dîtin di sala 1911 de hatiye xuyakirin.

Mirovên tarîxzan dibêjin, ev mirovê îro, ko jêre dibêjin bîrewer, di dawiya pêlapêşî ji qunaxa kevirî kevnare, ko jêre dibêjin Mostiryan deye û ji mirovên niyandertal veketiye û li nêzîkî bajarê Dusseldorf, li Almanya di sala 1957 de hatiye xuyakirin.

Herwekû pêzana, qûnaxakevirî kevnare diwem jî, kirne çend pêl:

1- Orniyas: Ji ber, ko li Orniyak hindama çemê Karonê jorî li Firansa dîne, navê vê pêlê kirine Orniyas.

2- Soltirî: Ji ber, ko li cîkî bi navê Soltirî dîne navê vê pêlê kirine Soltirî.

3- Mecdelî: Ji ber, ko li hindamekê dîne, ko navê wê Mecdelîne, ji vê pêlê re gotine Mecdelîn û ev li hinda Dordonê li Firansa hatiye xuyakirin û ev pêl gelek dirêj bûye û heta îro jî jêre dibêjin pêla Qatqatî.

Ji van herdû qûnaxan re dibêjin, çaxa Qeşemî Çarem, di Ewrûpade û di rojhilatênêzîkde jêre dibêjin çaxa baranê, çaxa şiliyê.(Pilaysitosîn).

Herwekû, divê qûnaxakevirî kevnare diwem de, hinek ji bermayê mirovê kevnare, Gerîmaldî li Firansa, li nêzîkî bajarê Manton hatiye dîtin û nêzîkî pêla Orniyas û nêzîkî mirovê zencîye ji Efrîqya hatiye Firansa. Lê mirovê, Keromaniyûn, ko di sala 1868 de li şikeftên hindama Dordûnê hatiye dîtin ji pêla Soltirî û bi xwe ji mirovên Qawqazî, ser dirêje.

Di van herdû qûnaxan de, mirov di şikeft û berqefande



Institut kurde de Paris

rûdinişt û xwarina wî, rihên giya û dar, berê wan dar û giya bûn û nêçîra tebayên çolê dikirin, bivirê wan ji kevir, alîk tûj û alîk gilover bû. Bi kêrî şer û kar jî dihat, lê paşê gelek alavê dî çêkirin, weke, kêr, çakûc birek û alavê kolan û vedanê. Herwekû paşê alavin ji, hestî jî, ji dara jî çêkirin. Agir anîn meydana civakî, lê tenê ji ber, ko xwe liber germ bikin û ronî bidî û divê qûnaxê de mırovan ayîna teba li ser dîwarên şikefta kolane, weke, kovîyên birîndar û tîr di laşê wan de çikandî. Herwekû di şikefta Tamêra de, li rajorê Espanya ayîna gakî rengînî, ko ji pêla Mecdelîye hatiye dîtin.

Çawa, ko ayîna, hirç, kovî, fîl jî li hin cihên dî hatine xuyakirin û ayîna mirovan jî hatiye dîtin.

2- QUNAXAKEVİRÎ NAVÇE(MÎZOLOTÎK): Ev qunax weke guhaztinê, tê jimartin, yanî mirov ji qûnaxa kevirî kevnare xwe guhaztiye qunaxakevirî kevnareya nû. Herwekû ev qunax ji sala diwazdehezar(12000) sal berî tarîxê û heta sala 7 hezar sal berî tarîxê dirêj kiriye. Hin dibêjin, ev bi xwe, bi ser qunaxa kevnareve tê jimartin. Ji ber, ko tiştekî hêja divê qûnaxê de nehatiye kirin, tenê alav hinek bi pêşve birine û çêtir kirine.

3- QUNAXA KEVİRÎ NÛ(NİYOLÎTÎK): Ev qunax ji heft(7) hezar sal berî tarîxê destpêdikî û heta çar hezar û pêsed sal berî tarîxê di nav xwede digrî. Di vê qunaxê de mirova, gelek tiştên hêja bi pêşve birine. Berî her tiştî di vê qûnaxê de mirova di meydana xwarinê de gavên mezin radane û ji pêla, nêçîr û xwarina dar û bera derketiye û çandinî, xwedîkirina sewal û teba anîne meydanê. Yanî mirov di vê qunaxêde bûne xwedî pez, sewal û bûne cotkar û karker, xwedî mal û dexl û dan. Hina jî pêzan û tarîxzana navê vê qunaxê kirine Serguherîna çandinî yan avanî. Ji ber, ko cara pêşîne, ko mirov ji pêla koçerî derbas dibî pêla avanî, gundîtiyê û bûye xwedî çandinî, pez, sewal û qad.

Çaxê baran, şiliyan dawî hatibû yan jî gelek kêm bûbû , ew mirovên, ko ji tirsa lehî û bahoz û şiliyê xwe di şikeftan de veşartibûn, piştî, ko tirs nema daketin deşt û çolên, ko ava wan ziwa û çikiya bû. Di serê de li qiraxên ava, çema, gola, kaniya warê xwe girtin û gund avakirin. Lê dawî hinek ji qiraxê ava dûrketin û ji lehîyên çema ditirsiyan. Berebere, malbat, el, eşîr hatin meydanê û mirov têkelî hev bûn û teba, sewal xwedîkirin qad ji xwere girtin û pez û sewalên xwe lê diçêrandin û

di wê çaxê de av kêm dibû û naçare av bi piyan, kun, meşk û li ser milên xwe û pişta sewala ji dûr dikişandin. Paşê li sewalên xwe siwar dibûn û bi wan karkirin û bûne nîvkoçer, bere bere bi wan cot û gêre jî kirin, Çawa, ko di serê pêşî de gundên biçûk ava dikirin û ji ber, ko gund û avaniyên xwe hinekî dûrî av û çeman çêkiribûn, naçare bûn, ko ji xwere kûz, piyanê hasinî, kun, çêkirin û av bi wan dikişandin. Ji bo cot û paleyê û gerê ji xwere alavên kevirî, bestemî çêkirin. Ev kevirên, bestem li her cî peyda nedibûn, bazirganiyê destpêkir û kirîn û firotin çêbûn lê bazirganî bihev guherandin bû.

Herwekû xurtî û qelsî jî, di vê qunaxêde hatin meydanê. Mirovên têrmêr, têrmal çavsorî li reben û belengaza dikirin û sermiyanî, padîşahî kete nav mirovan, bi hezaran, gerdena xwe ji yekîre xwar kirin. Bavik, êl, eşîrên têrmêr û têrçek zora qels û kêmçeka birin û xistin bindestê xwe û carna mal, jin, zar û zêçê wan jî, talan dikirin.
Ev hemî di rojhilatê navînde çêdibûn, ji ber, ko deşt û çolên wî berî her şûnî ziwabûn û mirovên çiya daketin, deşt û çolan. Xelkên jêr ber bi jorve hilkişiyan. Çiyayî û xelkê cizîra Erebî li navbera herdû avan(Dicle-Firat) li hev rast hatin û gelek şerên mezin di nav wande çêbûn û gelek caran cih ji hev distandin û gelek ji her dû rexan dinav hevde winda bûn, hatin pişavtin.

4- QUNAXA ÇAREM KEVİRÎ(NUHATÎ): Ji 4500 ta 3200 berî zaynê di nav xwe de digrî. Ji vir û hade nivîsandin hatiya meydanê û ji vê qunaxêre dibêjin piştî tarîxê. Zanayên tarîxê awirên xwe li ser wê nivîsandinê datênin û ji vê qunaxêre dibêjin Kalkolîtîk yan Îtolîtîk. Di vê qunaxêde, Nuhas, Qesdîr, Bironz hatin meydanê. Lê bironz, di hezarê siyem berî tarîxê hatiye çêkirin û hasin di hezarê diwem de kete nav destê mirova. Tenê li Ewrûpa di hezarê yekem de hate xuyakirin. Ji ber, ko li rojhilat berî Ewrûpa av ziwa bûye û avanî destpêkiriye. Herwekû mirovan di vê qunaxêde gavên hêja radane, bajar ava û fireh û mezin bûne, bazirganî kete nav pez, sewal û nivîsandin hate meydanê

17.3.1967

# WELATÊ SOMER

Semoîl-Kirêmer, di nivişta ji kevnarên Somer Menelwahî Somer de dibêjî,«berî sed salî, kesî bîra navê Somer nebiribû û tiştek ji tarîxa vî gelî nasnekiribû. Her tenê bîre wer û tarîxzanên, ko dixwestin, bi kolanê û vedanê tarîxa rojhilat nasbikin zor dabûn dabaşa Aşûr û kildaniyan û heta navê Somer jî, ji bîra mirov çûbû.

Lê di îrode navê Somer, ketiye nav gelên rojhilatênavîn Mezopotamye û em gelek tiştan ji dabaşa wan dizanin, gûn, reng, çehr, girêdan, dan û sitandina wan ji mîna timsal û bermayên kolayî nasdikin, ji van elwahên Somerî, ko bazirganî, avanî, fermandarî, kar, dan û sitandina wan didin xu yakirin û naskirin di gelek cî û hindamade peyda dibin.»

Herweha Kirêmer pêde diçî û dibêjî,«berî pênc(5000) hezar sal Someriya, nivîsandin li ser qermîta danîne. Çendan ko di serê pêşîde ne tiştekî hêja û mezin bû jî lê bere bere bi pêşve birin û gihandin nivîsandina bi tîp û bi deng» (rûpel 22-24.)

Lê Cîmis Henrî Bersend, di nivişta xwe, İntîsarilhedare de dibêjî«kolanên tarîxî ji mere dane zanîn, ko kevintirên Hedaratên mezin di navbera Ferat û Dicle( Mezopotamya) de bûn û li ser destê gelekî, ko ne ji nijadê Samîye, bi peşve çûye. Çendan, ko heta îrojî, em nizanin ev gelê mezin ji ko hatiye, tenê ji ber, ko di welatê Somer de rûniştiye em ji wan re dibêjin Somerî.»

Lê Ezîz Osman dibêjî,«emê niha bidin zanîn, ko ev Somerî ji ku hatine û li ku rûniştine û çend sala fermandarî kirine û padîşahê wan çendin, çendan, ko hêj em divê babe-

têde negihane qûnaxa dawî, kok û welatê Somer.»

Firangfort dibêjî,«Somer ji çaxê ebîd(kole) Esrilebîd ve hatine vî welatî, jêrênavbera herdû çema, Mezopotamya, yanî di navbera sala 340-310 berî zayînê de hatine van hin dama.»

Lê hin dibêjin, di çaxê Cemdet Nesirde hatine, lê bi kurtî em dikarin bêjin, Somer, di destpêka tarîxê de hatiye vî welatî û kolan û vedanên di sedê bîstem de gelek ji, şop, dan û sitandina wan dane xuyakirin. Pêzanê tarîxê gelek ji, nivîsandin, tarîx, rewş û pergala wan dane zanîn û naskirine. Meger çendan berî hingî tarîxa wan winda û nenas bû.

Herwekû tê xuyakirin, van Someriyan berî herkesî bajar û gund avakirine, di rojhilatê welatê Asyade, di nivîsarên wan de navê bajarê Gecê û di nivîsarên Samiyande bi navê Somer, hatiye xuyakirin. Kolanvanên zana dibêjin, di ayîn ûnîmayên(timsalên) Someriyanve tê xuyakirin, ko ne weke Aşûrî û Babiliyane, pirên cara por, rî, simbêl kurkirîne û dibêjin, serê wan ne weke serên nijadê Samî ne. Çawa, ko em dibênin serê Samî û Ereba dirêj û enî bilind û poz fire hin.

Lê serê Someriyan, weke miletê Asya, bejin kin, ser gilover, poz mezin weka pozê berana û enîya wan kol û paşde çiwîne, li jêr serê wan teng dibî û sitiwê wan kin û dawiya serê wan pane û çavên wan fireh, di ayîn û timsalên wan de tim sing vekirîne û çermê teba li xwe dikin û xaniyên xwe li ser cihên bilind ava dikin.

Ji lewra zanayên tarîxê dibêjin, ev Somerî xelkê çiyane çawa, Heroznî zanayê çekî dibêjî,«ev Somerî ji nêzîkî gola Qezwîn, yan ji Turkistana Rûsî, yan ji pişt çiyayê Qefqaz hatine koça pêşî di Esrilebîdde hatiye û ji xelkê Asya, ko ser dirêjin. Lê koça diwem ji wan Asyayê, ko tevlî Ermen bûne û serê wan giloverin.»

Lê kirêmer, bawer dikî, ko koça pêşî, ko hatina vî welatî, welatê Somer ji Îranîyên samî ne û têkelî hev bûne, lê hêj gelek dijware ko em bighêne dawiya vê dabaşê û nasbikin, ko Somerî kîne û ji ku hatine. Tenê hin zana dibêjin, zimanê Someriyan gelek nêzîkî zimanê Turkî-Oralî ye, ko, Turk, Çîn, Teter, Mecar, Finlandî ne. Zimanê wan bi hevve tê danîn û di hevde û tîpên zêde di pêş û paş de têne danîn.

Di zimanê Samîde kirin tê guhertin bê ko tîp lê zêde bibin. Lê di nav zimanê Somerîde hin gotinê Arî peyda dibin, çawa, ko Qefqezî jî di navde hene.

Herwekû Heroznî dibêjî,«Somerî ji hindama, ko Arî û Tûrî tev li hev dibin, hatine û nêzîkî hezar salî têkelî miletên dî bûne û di nav Ermen û çiyayê Zagros û rajorê Sûriya û miletên Mezopotamya bûne û paşê çûne jêrê Mezopotamya rûniştine.»

1- MALBATA YEKEM:

Bê gomane, ko nivîsvanên Somerî di çaxa xwede gelek nivîsar nivîsandine, lê tiştekî hêja ji wan nivîsaran nemaye. Ew tiştên, ko ji tarîxa Somer gihane destên me çend perçe ji nivîsarên Babilî, Aşûrîne û hin çîrokin, ko mirov nikarî xwe bi wan bigrî, hatine xuyakirin. Tiştê, ko bi saxî û kevnare gihaye destê me, nivişta Bersos, Bersoşa, tarîxzanê Babilîye, ko piştî Îskenderê Meqdonî hatiye çêkirin û tarîxzanê Babilî di nav nivişta xwede lîstak ji navê padîşahên Somer daniye. Ev lîste kiriye du perçe.1-Padîşahê berî tofanê, 2- Padîşahê piştî tofanê
Lê eger em temaşayî padîşahên berî tofanê bikin, dibênin ko bi navên çîrokî û efsane hatine û di nav kavilên welatê Somerde yek ji wan nehatiye xuyakirin.
Lê navê padîşahên piştî tofanê ko heftê mirovin û çarde malbatin ko sîh hezar sal padîşahî kirine. Herwekû tê ber çavê mirov xuyaye ko ev çarde malbat ne li pey hev padîşahî kirine, belkî her çend malbat di çax û demekêde dibin û her yek li hindamekê padîşahî, fermandarî kiribin.
Gotina Ezîz Osman raste, ko dibêjî, di tarîxên kevnarede zêde sal şerê wan fermandar û imparatorên dane nîşandan. Herwekû, di malbata Kîşê yekem de navê Îtane- Şivan hatiye ko gernasekî Somerî ye, ko çûye Esmana û daketiye. Di nav padîşahên Ork de navê du xwedana Logalbende û Dûmozî hatine, çawa, ko navê Kelgamêş, Kergameş di çîrokê de hatiye û zêde pesnê wî hatiye dayîn û dibêjin, ji xwedê û mirovan bi hevve hatiye çêkirin, nîvî xwedêye û nîvê dî mirove. Ev gernasê çîrokê ji padîşahên Orkê, pêncem hatiye jimartin. Diriste, ko ev mirov padîşah bî, lê gelek di biwara wîde zêde pesinandine, lê Ezîz Osman dibêjî, navê kelgamêş di nav kolan û veda nêde nehatiye xuyakirin, lê gelek diriste ko bê dîtin.

2- MALBATA ORÊ YEKEM:

Di biwara vê malbatêde hin dabaşên tarîxî destê me, ko

kolanzanê mezin Olî ji mere dene xuyakirin û navê padî-
şahê pêşî ji vê malbatê, Mîsanîpadaye û navê kurê wî A-
nîpadaye.
Li ser qermîtekî herî, ko li Tilebîd derketiye, Anîpada
dibêjî«Ez, Anîpada, kurê Mîsanîpada padîşahê Or, min
mizgevtek Nînotark ava kiriye.»Bajarên Akşak û Marî ha
tine xuyakirin, ko herdû jî di çaxekî dene û digel vîqa
sî jî, ko 300 mîlî ji hev dûrin. Lê ev şop û bermayên,
ko di van herdû bajarande derdikevin wekehev û di çaxe-
kêdene û çawa tê xuyakirin mirov dibêjî belkî karê des-
tê yek mirovî bin.
Li ser sitûnê mizgevta Nînosark hin nivîsandin derketi-
ne, ko didin xuyakirin, ko padîşah Anîpada padîşahê hin
bajarên dî jî bû, weke bajarê Ebîd, Kîş û heta hin dibê
jin diriste ko padîşahê welatê Somer bî.
Çend padîşahan li bajarê Or fermandarî kirine, ji wan A
bargî Şopada, ko bixwe navê jinekêye û di kolanêde go-
ristana vê malbatê hatiye xuyakirin û gelek tiştên bi
rûmet û giranbiha têde hatine dîtin. Çawa, ko gelek tiş
tên zêrînî di nav wan de hatine xuyakirin û pirê van
tiştan di gorna Şopadade hatine dîtin.
Lê ev tiştên, ko di gorna padîşahde bûn, xuyaye ko berî
hingî hatine dizîn û xelkê birine û hestiyên gelek miro
van di navbera herdû gorna de hatine dîtin, ko yek bi
gorna padîşah û yek bi gorna padîşahêve bûn. Bê gomane,
ko ev mirov ji wan mirovên nav qesra padîşahin û tevlî
çekên şer û alavên mûsîqa hatine veşartin. Çawa, ko Ayî
na mirovekî derketiye, ko kumekî zêrîn li serê wî û xen
cereke zêr di ber pişta wîde û sêniyeke zêrînî li ser
destê wîye. Çawa, ko rewş û xemla serê padîşah û alavên
xweşik kirinê jî pêre hatine veşartin û hatine dîtin.
Ev xişr û xalê vê padîşahê ji ciwantir û giranbihatirê
tiştên, ko di rojlatê navîn de hatine dîtin û gelek tiş
tên dî giranbiha di van gornade hatine xuyanî kirin. A-
lavên mûsîqa, qeyikên zîvî çekên şer û gelek tiştên dî
hatine dîtin
Lê ji teva giranbihatir, ala welat û dewleta Ore, ko di
rojên xurtiya padîşahde dihate hildan û ji perçên sedef
biheve hatiye danîn û di navde rewşa rojên şer û ceng
hatine kolan û cêkirin û di rexê dîde, padîşah rûnişti-
ye û li dîl û girtiyên dijmina tamaşa dikî û leşkerê wî
bi çekên şerve di berve derbas dibin û diçin. Di rêza
sîyem de padîşah li şerekî temaşa dikî û hin paytonê
şerkerên çolê diber wan dene û li wê navê kuştî gêr bû-

Institut Kurde de Paris

ne û dibin simên hespade dipelixin. Di rexê diwemde padîşah, di şahiya xurtiyêde û mal, jin, serdar, mirov, fermandarên wî pêre rûniştîne. Mûsîqa û xwarin li ser destê xelkêne û ji hevre pêşkêş dikin û talanê dijmin raçavê padîşah dikin.
Bi kurtî ev perçe, Ala dewletê, gelek giranbiha û kesnediye, jiber, ko çax û rewş û pergala miletekî di çaxê kîde bicarek didî nîşandan û çek û alavên wê çaxê, kinc û vergirtin û rengê şerên wê çaxê dûr û dirêj bime didî zanîn û ji mere didî xuyakirin

3- BAJARÊ LAGAŞ: Meger çendan ev bajar ne paytext bû jî û gelek caran dibin destê hevsînorên xwede maye û carna serbixwe maye jî, lê di vî bajarîde kolanvanê Firinsî, Sarzak, di sala 1877 zayînde di bin girê Tîlode ev bajar diye û weke tê xuyakirin ji bajarên herî kevnê Somerîye.
Di vî bajarîde malbata padîşah, fermandar, fermandarî li serhev û li peyhev rabiwardine û ji destpêkirina tarîxê û heta çaxê Orê sîyem dirêj kiriye. Yanî di çaxekî wilode, ko hêj ji mere eşkera nebûye, ko mirov bawer dikî, ko ji qûnaxa diwem piştî tofanê bî û di çaxê malbata Orê yekemde bî.
Di vî bajarîde padîşah ji ber xwedanê bajêr ve fermandarî dikin û navê wî Êşak bû, bi zimanê Somerî Patas bû. Çawa, ko padîşahê kevintirê Lagaş, Logal, Şak, Engor bû Di nivisareke kevnarede, ko li ser topizekî hatiye nivîsandin û ji Nîngeso, xwedayê bajêr re hatibû pêşkêşkirin.

Padîşahê Samî bi navê, Museylem ev topiz ji Nîngersore, pêşkêş kiriye û têde dibêjî,«Museylem padîşahê Kêş êko ji, Nîngerso xwedayê Lagaşre mizgevtek avakiriye, ev topiz jêre pêşkêş kiriye. Di wê çaxa, ko padîşahê Lagaş Logal Şak, Engorê Şak bû, min ev topiz ji xwedê re pêşkêş kiriye.»
Ji vê nivîsarê tê xuyakirin, ko xwedayê Lagaş û Kîş yek bû, lê nayê zanîn kîjan ji herdû bajaran mezintir bû.
Ezîz Osman wilo dibêjî, lê çawa tê ber çavê mirov xuyaye, ko Lagaş, ji Kîş mezintir bû. Ji ber, ko padîşahê, Lagaş, padîşahê welatê Somer bû.
Ji ber, ko Museylem, fermandarê Kîş, ji xwedayê Nîngerso xwedayê mezin, ko gereke li paytexta padîşahê mezin bire. Ev topiz pêşkêş kiriye da wekû xwe li nik padîşahê mezin bi rûmet bikî.

Herwekû di piştî, Logal navê padîşah Bado hatiye xuyakirin. Padîşahê Lagaşê û li pey wî navê Anîhêgal hatiye dîtin û piştî wîre navê Ornanşa hatiye xuyakirin.
Lê kolan û nivîsarên Lagaş, didin zanîn, ko ev welatê Lagaş ji welatê Or hatiye veqetandin û serbixwe fermandarî kiriye. Çawa, ko hin nivîsandin li ser hin keviran hatine dîtin, ko didin zanîn, ko diwê çaxêde nivîsandin bi zimanê Or-Somerî, hêj ji destpêkêde bû û bi peşve ne çûbû. Herwekû Ayinên padîşah û zariwên wî, di nav şahîya, ko jibo avakirina mizgevtekê hatiye çêkirinde hatiye xuyakirin, çawa didî zanîn, ko Nîngerso, xwedayê mezin û di bin wîre Nîna, Anko û Anlîl jî hebûn.
Lê weke, ko ji navên van hersê xwedanên paşî tê xuyakirin gereke hersê jî jin bin. Padîşah dar ji çiyêanîne û mizgevtên xwedê pê avakirine, lê çawa tê xuyakirin, ev malbat xêrxwaz û dûrî şer bû û dixwest welatê xwe xweş û ava biki û bi pêşve bibî.

4- AGORGAL, kurê Ornanşa: Herwekû tê xuyakirin, xuyaye, ko ne mirovekî navdar û mezin bû û ne padîşah bû, navê êşak li şûna navê padîşah li xwe kiriye, lê kurê wî navê wî bi padîşah hildaye.

5- EBANADO(AYATANÎM): Piştî Agorgal, kurê Ornanşa, ev mirov bûye padîşahê Lagaş, lê navê bavê wî nehatiye zanîn û vîjî navê Êşak, li xwe kiriye û çawa tê xuyakirin Êşak bi daxwaza padîşaha û di çaxê vî padîşahîde tê xuya kirin, ko welatê Oma, bi zor xistiye bin destê xwe û dîwarek di navbera Lagaş û Oma de avakiriye, ko weke sînorê navbera herdû bajara bî. Xuyaye, ko ev sînor, ev dîwar bi destê Museylem hatiye danîn. Oş, fermandarê Oma, ev sînor şikandiye û kevirê sînor avêtiye û bi leşkerê xweve êrîşî welatê Lagaş kiriye.
Ji lewre Ayanatpîm, padîşahê Lagaş ketiye mala xwedê û han ji Nîngerso xwestiye û xwedanê rojê hatiye hana wî û her tişt li ber çavê wî daye xuyakirin û ronî kiriye. Anayatîm, bi leşkerê xweve êrîşî welatê Oma kiriye û zora leşkerê dijmin biriye û welatê dijmin bicarek âibin lingê leşkerê xwede pelixandiye. Wilo li wan kiriye heta, ko tilorên çolê goştê laşê wan xwarine. Bajar, bicarek kavil û wêran hişt û vegeriya û di navbera xwe û padîşahê Omade, ko navê wî Îtalkî bû, peymanek çêkiriye. Ji vir tê zanîn, ko padîşahê kevin, Oş hatiye kuştin yan winda bûye, xwe veşartiye û kevirek bi navê Ayanatîm, di sînorde danîne û sînorê kevnare dicîde hiş-

Institut kurde de Paris

tine Ciweke avê di navbera xwede kolane û ji xwere kirine sînor û piştî padîşah Ayanatîm vegeriya Lagaş mizgevt ji xwedayên xwere avakirin, ko alîkariya wî kirine. Weke, Nîngerso, Anlîl, Ankî, Baber û Nînorsak.

Ji nivîsarên Lagaş tê xuyakirin, ko vî padîşahî çend şerên dijwar bi hin bajarên dîre jî kirine û gelek ji wan xistine bin destê xwe, weke Or, Ork, Larsa, Kîş û Obîs. Çawa, ko welatên, Êlem, Marî jî bi zor xistine bin destê xwe û paşê bûye padîşahê Somer.

6- ÎNATOMÊ YEKEM: Ev padîşah birayê Ayanatîme. Çawa birayê wî serê xwe danî, bi camêrî kete şûna birayê xwe.
Di çaxê vîde padîşahê Oma, Orlak(Orlama) peymana navbera herdû hindama şikand û dirêjî welatê Lagaş kir û av ji ser wan qetand û şerekî mezin dinav wande destpêkir û Înatom, leşkerê dijmin bi paşve vegerand û şikand.

7- ANTÎMÎNA KURÊ ÎTANAMA KURÊ AGORGAL KURÊ ONANŞA: Di çaxê wîde padîşahê Oma (Olama), careke dî êrîş kire welatê Lagaş û av ji ser wan qetand û careke dî dinav wande şer destpêkir. Padîşahê Lagaş, careke dî zora dijminê xwe bir û Olama dinav şerde hate kuştin û bajarê Oma bi zor xiste bin destê xwe û yek ji cem xwe kire fermandarê bajêr ko navê wî Êlî bû.
Padîşah, ev serpêhatî li ser çend kevira nivîsiye û di mizgevt û hin xaniyande daniye û yek ji wan niha ketiye destê zanayên tarîxê û hatiye zanîn û belav bûye.

8- OLPRESTA: Piştî, ko padîşah Antîmta serê xwe danî, padîşahî kete destê olpresta û zor û setem kete nav welat û berdîberdanê welatê Lagaş roj biroj ber bi newala mirinêve gindirand. Lê bi navê Orogagîta mirovek rabû û padîşahî xiste destê xwe û dest bi avanî û sazkirina welêt û dewletê kir. Ew kêmasî û berdîberdan ji welêt rakirin û gavên hêja bi pêşve avêtin û gelek tiştên hêja bicîkirin û pêkanîn û dilê xelkê bixwe xweş kir.
Tarîxzanê mezin, Heroznî dibêjî,«ev padîşahê pêşîne, ko di cihan de qanûn û destûr pêkanîne û Hemorabî ji wî qanûn û destûra xwe sitandiye.»

PADÎŞAHÎYA OMA Û OROK: Vê sazkariya, qanûn û destûra,ko padîşah Orogagîta danîye, welatê Lagaş gelek êşand û sergêjî û berdîberdan xistin nav welêt. Dijminê wî pir kirin, olperest, kurtêlxwer, şervan, talanker, miftexwer bicarek bûne dijminê wî.

Padîşahê Oma, Logazagîsî ji xwere fersende dî û êrîş ki
re welatê Lagaş û bizor xiste bin destê xwe û xaneqah,
mizgevt bicarek talankirin û şewitandin û xwe kire padî
şahê Somer û bajarê Orok, ji xwere kire paytext û malba
teke nû bi navê Orokê siyem anî meydanê û bîst û pênc
sala fermandarî kirin û dibêjin, welatê wî ji Xelîcê Fa
risî û hetta pingava sipî dirêj dibû û xwedayên bajarên
mayîn bicarek anîne bajarê Orok. Ev xurtî û pêşveçûna
wî bizimanê Akadî hatiye nivîsandin û di bajarê Nîborde
hatiye xuyakirin. Herwekû divê nivîsandinêde navê wan
bajarên, ko bizor xistine bin destê xwe, dane xuyakirin
û hêvî ji Anlîl, xwedayê Somer kiriye, ko alîkariya wî
bikî. Lê di çaxê wîde Sergonê Akadî, êrîş kire welatê
Lagaş û Orok bizor xist bin destê xwe û ev padîşah, di
sala 2400-2350 berî zayînêde Sergon, welatê Lagaş- Orok
bicarek xistin destê xwe û padîşah Orogagîta kuşt û we-
latê Somer bicarek ji xwere hişt.

NAVÊ PADÎŞAHÊN SOMER: 1- Mîsanîpada, 2- Pada, 3- Kurê
Mîsanîpada, 4- Abarkî, 5- Şopada(jine), 6- Logal Şakan-
gor, 7- Bado, 8- Anhîgal, 9- Ornanşa, 10- Agorgal, kurê
Ornanşa, 11- Ayanatîm, 12- Îtanatom, kurê Agorgal, 13-
Antîmîna, kurê Îtanatom, 14- Orogagîta, 15- Logazagîzî.

XWEDANÊ SOMERÎYAN: 1- Nînorsak, 2- Nîngerso, 3- Tîn, 4-
Ankî, 5- Anlîl, 6- Babar, xwedanê rojê.

PADÎŞAHÊN OMA: 1- Oş, 2- Îtaklî, 3- Orloma, 4- Êlî, 5-
Logalzagîsî

## DEWLETA GÛTÎ LÎ SOMER

DEWLETA GUTÎ LÎ SOMER: Miletê gutî-Kurdî, nêzîkî sed sa-
lî li welatê Somer, navbera herdû çeman, Mezopotamya, fer-
mandarî kiriye û di sala 2225'ê berî zayînêde ev welat xis-
tine bin destê xwe.
Herwekû ji kevnarede bajarê Arabxa, li nêzîkî Kerkûk pay
texta wan bû û bi xwe ji wan miletên kevnare bû, ko ji wan
re digotin Asyewî, Qawqazîne û kes nizanî kengî di van çîyan
de bûne dewlet.
Lê Ezîz Osman gelek bi dirindî, hovî, xwînrêjî navê wan
tênî û dibêjî, Guttî, miletekî xwînrêj, talanker, şerxwaz
bû û di çaxê wande çandînî, avanî, dewletmendî gelek bi paş
ve vegeriyan û bêmrês bûn. Her tişt ji xwere talankirin û

bêş û salyan zêde avêtin ser xelk û miletên van hindama, ma lê wan dixwarin û gelek tiştên bêrê dikirin. Hetta piştî du sed salî jî hêj xelkê zor û setema wan di çîrokên xwede digotin. Çend nivîsar derketine, ko di biwara wande dibêjin, hov û xwînxwerê serê çiya bûn, xelk dikuştin û jin ji xwere dibirin û zarok ji ber sînga diya wan distandin, welat tar û mar dikirin û zêr û zîv bicarek revandin û birin serê çiya û hin nivîsarên Someriyan dibêjine wan cinê çiya û zarok di bajarande ji tirsa ranedizan û digiriyan.

Kurd heta îrojî, ji zarokên xwere dibêjin, razin, razin wê gurê manco bêne we û jin bi vî awayî zarokên xwe di xewre dibin. Herwekû cin, Bacin, Becin, Becnewî, Beşnewî navê eşîreke kurd û navdare, ko di şûna horîyên kevnarede fermandariyek li darxistibûn û kelehên Finik, Heskîf, Tor li bin destê wande bûn û tarîxzanên wek kurê Esîr, kurê Ezreq gelek pesnê wan dikin û Şerefxan dibêjî, hin dibêjin kurd bicarek ji Becn û bextin. Çawa, ko dinav hevêrkan de horîyên kevnarede navê Becnexwêr kavilekî mezin û kevnare û Becn na vê gundekîye, ko Becinî, Becnî, Becnewî têdebûn. Niha jî, hêj têdene û bi mêranî gelek navdarin û diz, mêrkuj û talan kirin.

Lê Ezîz Osman dibêjî, lê dawî vî miletê xwînrêj û hov rewş û pergal û ol û destûrên Somer û Akadî bawer kirin û bi pêşde hinek çûn. Herwekû çend bermayên Babilîyan hatine dîtin, ko navên çend padîşahên Guttî dane xuyakirin û dibêjin, ev padîşah, ji navên wan tê xuyakirin, ko weke Kaşî û Lolobîyane, ji nijadê Qawqazîne.

Guttiyan, bi zimanê Somerî dinivîsîn û gelek payedar dibûn, ko digotin padîşahên xwe Cihangîr.

Lê Ezîz Osman di cîkîde dibêjî,«mirovên, ko di welatê Îrande rûniştî bûn ne yek nijadin. Zanayên tarîxê hestiyên mirovên, ko di Îran de berî tarîxê rûniştîbûn dîne û dane ber refeşka û gotine, ev mirovên, ko berî hingî di Îranêde bûn du perçene. Yek ji wan ser gilover û di rojavayê Îran - Asyade rûniştibûn û hetta Turkistana Rusî û Sind belav bûbûn û tarîxzan ji wanre dibêjin Asyewî-Qawqazî.

Çawa, ko ev nijad ne Samî û ne jî Hind-Ewrûpîye û ev nijad jî, çend milet bûn Orarto li Erarat Kaşî li Kerkûk û Ermen, li Ermenîstan, Elamî li jêrê Ehwaz û sûs û hette pinga va Farisî Guttî Li Loristan. Horî- Mîtanî li Sûriya û Kurdistana navî Mezopotamya de bûn.

**Ev gel hemî bi yek zimanî diaxivîn û zimanê wan zimanekî wilo bû, ko di pêşî û paşiya gotinêde tîpên zêde diha-**



Institut kurde de Paris

tin danîn û xwendin û nivîsandin gelek diriste, ko Somerî, jî ji van gelan bin jî. Miletên Asyewî-Qoqazî bin û ji zûde ji birayên xwe veqetiya bin û gelê Akadê, Samî di navde hatibî pişavtin û ji ber wilo zimanê Samî têkelî zimanê Somerî-Asyewî-Qoqazî bûbî.

Herwekû Ezîz Osman di cîkî dîde dibêjî,«çawa dewleta Akad ber bi mirinêve gavên xwe sivik avêtin, miletên Gutî û Lolo weke lehîyê xwe ji çiya berdan û biser welatê Somer-Akadde hatin û berjêr bûn»û di cîkî dîde dibêjî, Guttî-Coto di dawîya sedê hezarê sîyem berî zayînê miletê Coto-Guttî-Coto, êrîşî welatê Akad kirin û dewleta Akadî windakirin û welatê Elam jî xistinbin destê xwe û nêzîkî 125 salî fermandarî, bi zordestî li navbera herdû çeman kirin. Dewlet û destûrên welêt dane bin lingên xwe û perçiqandin û bi vî awayî aboriya welêt gele li paşket û lîsta navê padîşahên wan didî xuyakirin, ko di nav wande gelek berdîberdan û bê destûrî çêbûne.

Bajarên Lagaş, Or, Orma, Salyan didan Guttîyan û hinek serbixwe dibin destê wande dijyan, lê dawî van çend bajaran Guttî ji welatê xwe derxistin û malbata Lagaşa diwem hate meydanê.

Ji padîşahên vê malbatê Logalaşûmgal, ko di dawiya fermandariya Naramsîn û di çaxê Şarkalîşarî de bûbû fermandarê Lagaş û çend padîşah di çaxê Guttî-Cotode ji wan rabûne Orbabo, koayîna wî di mûzêxana Laurede, li Firansa peyda dibî û yek binavê Gûdya-Cûdya, ko bixwe fermandarê heftaye ji fermandarên Lagaş ko di bin destê Gutiyade bûn. Herwekû ev padîşah, fermandarji mezintirînê tevaye, ko di çaxê wîde welatê Lagaş- Somer gelek bipêşve çûbû. Zanîn, Bazirganî, kar, hosteyî gavên mezin bipêşde radabûn û bixwe di dawîya padîşahîya Gutîde bû.

Herwekû ji navê wî tê xuyakirin dibî, ko ev mirov bixwe jî Guttî bî, yan jiber, ko bindestê Guttîyan bû ev nav li xwe kiribî

Vî fermandarî hijde(18)ayîn bişûn xwede hiştine, ji kevirên reş û lûs û kolayîne û hemî hatine xuyakirin û başê wan di muzexana Lauredeye, ko jêre dibêjin Hostê Gûdya. Çawa, ko di mûzîxana Iraqêde ji ayînake wî heye, ko fermandar rûniştiye û taseke hasinî li serê wiye û destên wî ser hev û li ser singa wîne. Herwekû nimêj dikî û li ser kirasê wî bi zimanê Somerî hin nivîsandin heye, ko dinav wê de navê wî tê xuyakirin û hin hêvîyên, ko ji xwedê kirine tên xuyakirin.

Çawa, ko di mûzîxana Brîtanîde jî ayîneke wî peyda dibî



Institut kurde de Paris

ko bi navê Gûdya hatiye danîn. Herwekû ko kolanvanê Firinsî di bajarê Lagaşde gelek nivîsarên Somerî dîne, ko dinav wande kar û destkerên Gûdya bazirganî, avanî didin nîşandan, ko zor û setema miletê Guttî welatê Somer bêhavil nehiştibûn, lê dinav wan nivîsarande tu karên şerkerî nehatine dîtin. Ji lewra, em dikarin bêjin, ko di bin destê Gutiyande nikaribûn serê xwe hildin.

Bi rastî, em nizanin bê kengî Gûdya padîşahê Lagaş serbixwe bûye fermandar. Lê em dikarin bêjin di çaxê wîde welatê Lagaş gavên hêja û mezin di meydana torevanî, hozanîde bipêşve avêtine. Du qermît hatine dîtin, ko du ristên xweş bi zimanê Somerî li ser wa hatine nivîsandin, ko diherdîwande jî, pesnê Gûdya dikin û dibêjin, Gûdya mizgevt ji Nîngersore avakir û ber bi ezmanave bilind kir û welat pê ronî kir parêzkerê wîbe ey xweda.

Ev didî zanîn, ko divê çaxêdejî miletê kurd agirperest bû û agir di mizgevtên xwedêde dadidan û ronî dida welêt û bajêr. Herwekû Gûdya di hêvî û nimêjên xwede dibêjî:

Ez bê dême û tu diya mina birastîye !
Ez bê bavim û tu bavê minê birastîye !

û Gûdya mizgevta Înono ava kiriye û jibo avakirina van mizgevtan ji her der dar û kevirên hişk "Riyam, lazîwed" jî Îran anîne. Çawa, ko zêr û zîv û hin alavên dî ji hin cihên dî anîne û av anîye welatê xwe û cihok çirandine, vekirine û çem kolane û ji miletê xwere gelek dilovan û qenc bû.

2- ONÎNGERSO KURÊ EÛDYA: Em gelek dabaşa vî padîşahî nasnakin, tenê sê ayînên wî mane û başa wan di mozîxana Laurêde hatiye danîn, divê ayînêde weke bavê xwe tê xuyakirin û ev ayîna ji kevirê nîvmermere û divê ayînêde, hin mirov salyana xwe didin padîşah lê tê xuyakirin, ko gelek nemaye, yan jî fermandarî ji Lagaş hatiye guhaztin û çûye bajarê Or û yekîdî li bajarê Lagaş bi navê Oraba bûye fermandar.

5- MALBATA OR YA PÊNCEM: Berî dawiya fermandarîya Gûdya di bajarê Lagaşde bê mirovekî binavê Oto Hêgal serê xwe bilind kir û ji bin destê miletê Guttî derket û di nivîsarekêde dibêjî, Guttî ejdehayê çiya, dijminê xwedê, padîşahî ji destê me derxistin û birin û birin serê çiya û welatê Somer tijî dijminahî û dilreşî kir û mêr û jin û bav û kur bizor jixwere dibirin. Enlîl, xwedanê mezin ferman da min, ko ez Ono Hêgal padîşahê Orok cîhangîr

padîşahê, ko derewa nakî, ko padîşahîya Gutî winda bi-
kim û ji welatê Somer derxim.
Vî padîşahî(Oto Hêgal), padîşahê Guttî-Tîrîkan, kuşt û
jiwê rojêde padîşahîya berberên çiya ji welatê Somer
winda bû.
Lê Mister Hol dibêjî, Serdarê Guttî ê pêşî bi navê Ana-
tom hatiye xuyakirin û ev padîşah sê hezar sal berî
zayînêde şerê Elamiyan kiriye.

2- ANOBANÎNÎ:. Li gora gotina Mister Hol, ev padîşahê Guttî
di 2800 sal berî zayînê de bûye padîşahê welatê Guttî -
Somer.
Lê pirefesor Supayzer dibêjî, li gora wekheviya nava ge
reke diçaxekî herî kevnarede miletê Guttî ketibî welatê
Somer û paşê welatê Akad xistibî bin destê xwe. Çawa tê
zanîn, ko welatê Lagaş gelek xweşî û avanî di bin destê
Guttiyade dîtine.
Lê li gora gotina Mihemed Emîn Zekî, gereke di çaxê Na-
rabsîn, padîşahê Akadde leşkerê Guttî ev padîşahê Akadî
şikandibî û ji wê çaxêde welatê Somer-Akad, ketibin bin
destê Gutîyan û padîşahên Lagaş bi xwe jî ketibî bin
destê wan.
Xuyaye, ko Gutiyan nêzîkî du sed salî li van welatan pa
dîşahî kirin û ew padîşahê Lagaş, ko navê wî Gûdya bû ,
gereke di çaxê padîşahîya Guttî de bî û.dibî, ko ew bi-
xwe jî Gutî bî.

3- TÎRÎKAN: Weke ko tê xuyakirin di çaxê vî padîşahê Guttî
de dewleta Guttî gelek weza û bêhavil bûbû. Di sedê 25
berî zayînêde padîşahê Or hate ser welatê Somer-Akad û
ev padîşahê Guttî kuşt, miletê Guttî-Kurdî naçare vege-
riya welatê xweyê kevnare, çiyaye Zagros. Lê di sedê 18
berî zayînêde Guttî bi Kasî-Kaşîyanre çûne ser welatê
Babîlstanê û ji wê rojêde û hetta bi sedê 13 berî zayî-
nêde hajî hew deng ji miletê Guttî hatiye û bicarek ser
pêhatiyên vî meletî nehatine xuyakirin.
Şelmanserê pêşî, ko di sedê 13 berî zayînê(1280-1261)de
dibêjî«Kutî, ko di vê çaxêde bi zorbazî û cengawerî nav
dar bûn li ber min rabûn û li ser vê rabûna xwe çaxekê
dûr û dirêj man» û Şelmanser pêde diçî û dibêjî,«ji sîno

Institut kurde de Paris

rê Orartirî(Orarto) û hetta Kemûxî xwîna meletê Gut weke avê dihate rijandin."
Xuyaye, ko welatê Guttî ji Ermenistan û heta Tûr Abidîn li ser destê vî padîşahê Aşûrî seranser dinav xwînêde hatiye gevizandin.
Lê Elî Ewnî di pêşîya Şerefnamêde dibêjî,«tarîxzanên nû dibêjin, Kurd ne tenê zarokên wan Kurdokên, ko Eksenîfon berî zayînê bi sed salî li wan rashatiye belkî ji kevnarede miletê Coto, ko bi daxwaza cengawer hatiye gotin. Di vî welatîde bûn, ko Aşûrîyan ji wanre digotin Kardo-Cardo. Ger çi hin bawer dikin, ko ev Kardo- Cardo ji nijadê Qawqazîne, lê tevlî miletên Arî bûne û xwe ji Arîyên kevnare dijimêrin."
Elî Ewnî, pêde diçî û dibêjî,«piştî, ko Împeratoriya Aşûrî winda bû Goto(coto) di gel pismamên xwe Mîdîya Împeratorîyek li darxistin. Coderz(Goderz), kurê Keyo padîşahê vî miletî bû, ko di îrode Goran û Kelhur xwe digîhênin ser Coderz(Goderz).»
Elî Ewnî Beg, pêde diçî û dibêjî,«ev Gohderz bavê Rehame, ko di çaxê Behmenê Keyanîde çûye ser welatê cihiwa û paşê ev reham bûye padîşahê Îran û navê malbata xwe kiriye Goran(Coran) û navê wî di tarîxên Erebade Bextenesire" Vê paşiyê li ser kevirên Behsitûn li Qesirşêrîn hatiye xuyakirin ko Gohderz(Coderz) navê mirovekîye.
Lê Supayzer dibêjî, Guttî(Kuttî-Kurtî), ji rexê zimanê xweve ji komela Zagrose. Jiber wilo nabî, ko em bi çavê Samî yan Hind-Ewrûpî lê temaşa bikin. Raste, ko di hawîra hezar salên pêş zayînêde çend bavikên Arî li Mezopotamya-Cizîrê hatinedîtin, çawa, ko di berî hezarê pêşîde gelek ji miletên Zagros jî bûne Arî, Hind-Ewrûpî. Lê em nikarin jibo vî qasî miletê Guttî ji nijadê Hind-Ewrûpayî bihejmêrin. Jiber, ko tiştek di destê mede nîne, ko xwe pê bigrin.
Mêster Mosirok, di ensîklopyadiya Îslamde dibêjî,"Tarîx bêjên filehan ji çiyayê Cûdîre dibêjin çiyayê Kurdyen, ko berî hingî navê wî Nîsîr bû û dinav welatê Kurdyende bû."
Di çaxê Aşûrîyande ji çiyayê Botanre digotin Gûtyom welatê miletê Guttî. Xuyaye, ko ev nav diserê îslamêde ne hatiye windakirin, lê bi Cûdî hatiye guhertin jiber, ko (g) bi (c) di Erebîde têguhartin.
Çawa, ko Tîglat Pelayzer di gel miletê Guttî-Kurtî li çiyayê Azo(Hazo-Hezo) şerekî mezin û dijwar kiriye û Diraver dibêjî, Azo, Hezo ye. Çawa, ko Eksenîfon dibêjî,

Kardok, welatê wî hetta bi Bextan diçî û paşê navê vî welatî bûye Kurdyen.
Bi zimanê Aramî dibêjin, hewd-Kardo û ji Cizîra Botanre dibêjin, Gizartayê-Kardo. Herwekû Ermenî dibêjin Kurdoz û Belacûrî dibêjin Bakarda. Çawa, ko Teberî jî wilo dibêjî û Yaqûtê Hemewî dibêjî Bakarda, hinek ji welatê Cizîra Bota ye(Cezîreibnilumer).
Çawa tê xuyakirin, gereke cugrafîya welatê Kurdyen -Bakarda ji jêrê gola Wanê berjêr dibî hetta çiyayê Cûdî û Cizîra Bota û ji rojhilatê Cûdî digihê heta rojhilatê Amed(Diyarbekir).
Lê ev nav bi çend awa hatiye gotin: Gudî, Kutî, Kurtî, Coto, Cardo, Kardo, Kurdoş, Kurdox, lê tevde yek nav û ji yek miletîre hatine gotin.
Herwekû Deraver dibêjî, Karda, Kardoxî, Kurtoxî, Xordî Kardak, Sêrt, Xurdayî, Xurdoenî, Kardawî tev bi daxwaze kê û navê yek miletîne. Ev kurdên îro û Kurdoxên berî zayînê bi çarsedsalî û Kardayê berî zayînê bi du hezar sal tev yek miletin.

Ji xwe ev newekheviya navê kurd îro jî heye, Ereb dibêjin, Kurd, Ekrad, Kirad, Kurdî û Turk dibêjin, Kurd , Kurdo, Kurdler, Qerekurd, Baba Kurd çawa, ko em bixwe ji hevre nabêjin, Kurd, Zaza- Dinbila, ji kurd re dibêjin, Kerdasî û kurmanc ji Zazare Dinbilanre dibêjin Zaza û her eşîrek bi navê xwe tê hildan, weke, Bota, Behdîna, Sora, Baba, Gora. Gelek diriste, ko navên kevnare jî, wilo navê bavik û eşîrên kurd bin, ko îro bicarek dinav kurdistanêde têne xuyakirin. Gûdî, navê çiyake, Kûdê navê gundekî, Gurdika navê keleheke şêrwaye, Kurtika navê eşîreke mezin li welatê Xerzaye, Gerda navê bavekî Bûbilane û deşta gerdî eşîra Gerdî li hindama Erbîlêye.
Herwekû Kasî(Kasika) û Mîtan bi sêciya navê Metîna heye Hewrî, Hewêrînî, Hevêrkî, Horî li nav kurdaxêye, navê kelehekêye. Sobarî û Somerî, So li hindama Bedlîsê navê kelehekêye. Nayrî, Nehrî, Semzînan maye. Sêrtî, sîtî li bajarê Sêrtê û li nav Omerîyan hene û li şûna Manî, Mana Almana hene.
Bi kurtî navên wan miletên, ko di kurdistanêde berî tarîxê hebûn, îrojî di kurdistanêde mane û bawer nakim ko her yek navê miletekî bin, belkî her yek navê eşîrekêye ko di çaxê xwede xwe dewlet û miletek didî û şer bi dijminê xwere bi tena xwe dikir. Weke îro nikaribûn bibin

yek û padîşahekî ji nav xwe rakin û tev serê xwe jêre xwar bikin û bibin dewleteke mezin û navdar û cihanê di nav xêr û qencîyên xwede ava bikin.
PADÎŞAHÊN GUTTÎYAN: 1- Anatom, 2- Anobanînî, 3- Şarlak 4- Tîrîkan, 5- Logalzagîs ko bûye padîşahê Lagaş.
Herwekû ji vê lîsta navên wan tê xuyakirin, ko bi zor hawîrî sed salî padîşahî li welatê Somer-Akad kiribin.

## MALBATA ORÊ SÊYEM

3- MALBATA ORÊ SÎYEM: Herwekû me derbaskir, li ser destê O tohêgal dewleta Guttî(Goddî)yan ji welatê Somer-Akad ko nê xwe pêça û vegeriya çiyayê Zagros. Lê yek ji Or bi navê Ornamo rabû û welatê Somer bicarek xiste bin destê xwe.

1- ORNAMO: Vî padîşahî bingehê malbata Orê siyem daniye. Pênc mirovan ji vê malbatê nêzîkî 122 salan padîşahî kirine û tarîxzan neweke hev dabaşa fermandarî û destpêkirina vê malbatê û dawîya wê gotine:
Dîlaborn dibêjî, 116 salan vê malbatê padîşahî kiriye. Ev di nivişta xwe Mezopotamyade gotiye, lê careke dî û di nivişta xwe Miletên rojhilatênavînde dibêjî 108 salan vê malbatê padîşahî kiriye û ji sala 2328 destpêkiriye.
Ev Ornamo ji mezintirê padîşahên Somerî ye û gelek tiştên hêja û rast ji kolana gihane destê me û li ser destê Liyûnard Olî ji kavilê bajarê Or deranîne, ko didin zanîn ev Ornamo ji ber Otohêgalve fermandarê Or bû û di sala 2130 berî zayînê Otohêgal ew kiribû fermandarê Or. Lê piştî heft sala li ber pozê Otohêgal rabû û zora wî bir û welat bicarek xiste bin destê xwe û bû padîşah.
Gelek bajar, mizgevt, avanî avakirine. Mizgevtek ji xwe danê heyvê Nenar û yek ji jina wî Nînkalre avakirine û ji xwere qesrek, qesra padîşahî li bajarê Or û bircek ji xwere û bedena bajêr bicarek avakirine. Çawa, ko gelek avanî li bajarên Lagaş, Êrîdo, Oma, Larsa, Ereb ava kirine û gelek ciwên avê kolane û ew birca, ko hetta nîha li Or sax maye û navê wî li ser nivîsandiye, ji sê qata li ser hev hatiye avakirin. Destûr û qanûn danîne, ko Hemorabî ji wan destûr û qanûnên xwe sitandine, ev destûr û qanûn li İstanbolê peyda dibin.
Padîşahîya Ornamo 18 sala direj kiriye, ji sala 2123-2106 maye.

2- ŞOLKÎ KURÊ ORNAMO: Berî bibî padîşah, navê wî bi Donkî, dihate gotin,nêzîkî 50 salî padîşahî kiriye ji sala 2106 ta bi sala 2057 maye. Weke bavê xwe zor daye avanî û pêşvebirina welatê xwe û gelek guhê xwe daye bajarê Erîdo, ko li ser peravê ava Ferat dikevî û di îrode bi sed mîlî dûrî avê bûye û ev bajar ji kevnebajarên Somerî ye Çawa, ko mizgevta Aba di vî bajarîde pîroztirê mizgevtên welatê Somerîye. Herwekû di gelek bajarên welatê xwede mizgevt avakirine û mizgevta Neynewa wêran kiriye û li Êlam mizgevtek avakiriye.

Lê serbestî gelek nedida wan fermandarên bin destê xwe û hin ji mirov û peyayên xwe rêdikirin wan hindaman û salyan û bêş didane hev û jêre tanîn. Jiber wilo fermandarên bin destê wî nikaribûn serê xwe rakin û desthilênin.

Gelek şerên xwîndar bi berberên çiyayê Zagros re kirine û navê xwe kiribû padîşahê çar hindama. Somer , Akad, Sobarto, Omoro.

Piştî 20 sala ji fermandariya xwe çend caran leşkerê xwe şande ser welatê Sobîro û çiyayê Zagros. Ji ber ko serê xwe li ber radikirin û agirê şoreşê vemirandiye.

Çawa, ko leşkerê xwe şande ser welatê Enşan Êlamî û bi zor xiste bin destê xwe, tevlî, ko keça padîşahê Enşan, jina wî bû, lê dîsa li ber desthiltanîn û çend caran çûye ser xezûrê xwe. Çawa, ko gelek cara êrîş dibirin ser welatê Lolo û Sîmorî. Herwekû gelek tiştên hêja bi bazirganî di avêre tanîn welatê xwe.

3- AMOSÎN BORSİN: Padîşahê çar hindama, gelek cara çûye şerê gelên Sobarto çiyayê Zagros û gelek ji wan xistine bin destê xwe.

4- ŞOSİN KURÊ BORSİN: Di çaxê wî de Amorî, ji hêla Ferat xwe berdane jêrê Cizîrê û Şosin ji tirsa bedenek li hawir bajarê xwe avakir û navê wê kire bedena Amoro.

Lê Herzonî, bawer dikî, ko Amorî ji ber Hêtîtan direviyan û ber bi jêrê Cizîrê ve diçûn û gihane sînorê welatê Somer, ko gelek ava û pêşve çûyî bû û qad û zeviyên wan gelek hêja bûn û dihatin avdan.

5- EBÎSİN KURÊ ŞOSİN:(25): Nêzîkî çaryeka sed salî fermandarî kiriye û di çaxê wîde Êlamî li ber rabûn, lê bizor vegerandin bin destê xwe û ev eşîrên Amorî koçer jî xistin bin destê xwe. Lê dawî Amoriyan bi Êlamîyan re peymanek girêdan û bihevre êrîşî welatê Somer kirin û leş-

kerê Abîsin şikandin û bi dîlî xistin nav lepê xwe û Êlamiya ew bixwere birin bajarê Soza, paytexta xwe. Çawa, ko Ayina Nenar, xwedanê heyvê jî birin paytexta xwe û bivî rengî padîşahiya malbata Orê siyem dawî hat.

Êlamiya û Amorîya welatê Somer dinav hevde parvekirin Êlamiyan li bajarê Larsa dewletek çêkirin û Aramiyan li bajarê Îsin ji xwere dewletek danîn û ji wê rojêde rûmeta zi manê Somerî nema û tenê di nav devê pîr û nimêj û hêvîyan de dihate xwendin.

Di kavilên bajarê Nîborde çend sitiran û rist hatine dîtin, ko ristevan û dengbêjên Someriyan li ser pergal û rewşa, talan û wêrankirin û perçekirina welatê xwe gotine. Lî ser destê Sêr Lîyonard Olî hatine dîtin:

Êlamî xurt bûn, destûr winda bûn.
Wek tofanê hatin.
Her tişt pelixandin,
Ey Some kengî bê gorandin?
Malbata pîroz ji mezgevtê derxistin.
Bajar, mizgevt, kavil hiştin.
Tiştek ne hiştin.
Padîşahî ji me sitandin.
Fermandarî revandin.
Bi canê Anoyê destûr perçiqî.
Anlîl berê xwe da welatekî dî.
Her tişt bênakam.
Ebîsinê pîroz ajotin Êlam.

Dijminê çepeî rûmet tev şikand.
Zar û zêrç û mal bi carek revand.
Ji ber sawîran ez tême kuştin.
Ne rûmet ne bext tiştek nehiştin.
Kincên min birin dane jinên xwe.
Rewş û xemla min dane xwehên xwe.
Di zindanande em mane girtî.
Em dan ber lingan, dijmin bi xurtî.
Tirsa kuştinê min dihejênî.
Di mala minde min ditirsênî.
Wek kevokê dihindirwê xwe de dihejim .
Wek bûm xwe di şikeftade vedişêrim.
Di gora minde dirêjî min dikin
Ji bajarên min bera min didin, ez dizûrim.
Mizgevta min li pey min ma, ev ji hev dûrin.

Çawa, ko Lîyonardwolî, dibiwara pêşveçûna welatê Somer-

de dibêjî, ew dem û çaxên, ko xelkê bawer dikir, ko Avanî, zanîn, pêşveçûn ji welatê Exrîq derketine çûne û niha em dibênin, ko Exrîqiyan bi xwe ji Hêtît, Mîdî, Finîkî, Kirît Babîl, Misir sitandine û berî wan bingehê Avanî û pêşveçûnê ji welatê Somer hatine belavkirin û pijikîne. Êrîşên Somerî, Avanô, Piyan, Çek, Kinc vekirine, ciwên avê çêkirine destûr peydakirine. Olperestî bi carek ji welatê Somer derketine. Gelek hêjaye, ko em lê temaşa bikin û baweriya xwe pê bênin û pesnê wan gelên berî xwe bidin.

Herwekû Olrêwart, di nivişta xwe, Çiroka Avanî de, bi kurtî dibêjî, peşveçûn û avaniya Somer ji piyanê axînî, ko hêj di destpêkêde bûn. Wan xeml û hêzên, ko dûr û dirêj hatine çêkirin û birindî û ciwanî ronî dane, têne xuyakirin.

Di navbera, tiştekî, destpêkî û tiştekî gelek pêşveçiwî de tê xuyakirin, ko di welatê Somerde çawa bîreweriya mirovan gihaye, ko dewleta pêşî û imperatoriya yekem û avê bikişênin welatê xwe û çêkin. Cara yekeme, ko zêr hatiye meydanê û ketiye nav xeml û xêza gelên rojava. Bazirganî û qanûn nivîsandin, çîrokên tofanê xwendegeh, niviştxane, hozanî, rist, sitiran, alavên xweşikkirinê, kolan, nexweşî bicarek ji welatê Somer derketine.

Çawa, ko koletî, zordestî, bindestkirina welatê xelkê, dêr, mizgevt û şerên koledarî tev ji welatê Somer derketine û hatine meydanê di hin bajaran de.

Bê gomane, ko bindestiya welatê Somer, Ora siyem ji Êlam û Amoriya re welatê Somer perçe perçe kir û dewleteke navdar û hêja, serbixwe nehişt, bicarek ji hevde ket û bû çend perçe û diher perçakîde dewleteke biçûk, bindest, bê nav û deng hate li darxistin ji wan dewlata.

1- DEWLETA EŞNONA: Bajarê Eşnona, ê kevnare bi 70 kîlometirî dikevî rajorê rojhilatê bajarê Bexda, ko di îrode jê re dibêjin Til Esmer.
Seydayê kolanê Firengfort, ji sala 1930 de hetta sala 1936 li vî bajarî vedaye û gelekî kolaye û divê kolana xwede li mizgevt û qesrekê rasthatiye, ko bêtir ji 20 caran hatiye perçîmkirin. Dibî cara yekem di çaxê Cemdet Nesîrde bî û di çaxên malbatên pêşîde gelek bi pêşve çûbî û çend padîşahên dî jî fermandarî lê kiribin. Di çaxê Sergonê Akadî de ketibî destê Akadiya û paşê malbata Orê siyem fermandarî lê kiribin.
Lê çawa malbata Orê siyem di bin zor û sêtema Êlamî û Amorîde hate perçiqandin, divî bajarîde dewleteke biçûk û serbixwe hate çêkirin û Xefagî û Sadoyo ketin bin des

Institut kurde de Paris

tê vê dewleta biçûk.

1- BÊLALOMA: Ê pêşî ji padîşah û fermandarên vê dewletêye çend qanûn binavê xwe çêkirine, ko ji wanre dibêjin Qanûnên Eşnona.

Herwekû serkarên kolanê li sadobo Tilhermel, gelek tiştên hêja û giranbiha dîtine. Ji wan bedena, bajêr û miz gevta xwedanê paleyê Nisaba û çend qat avanî hatine dîtin. Çawa, ko çend hezar perçên axînî, qermît derxistine, ko di wande hin nivîsandin hene, ko bazirganî û hejmareke hêja û birûmet hatine nivîsandin.

Çend qanûnên Eşnona jî dane xuyakirin, ko ji kevnarê cihanêne. Di wan qanûnade mafê mirovan, ên bajarî, bazirganî, nifûs nivîsîn û jimar cebîr, hendese tiştên hêja di navde têne xuyakirin.

Herwekû dabaşên ziman, cugrafî, hozanî di nav wan nivîsarande hatine xuyakirin û didin zanîn, ko 7 padîşahan, li vî bajarî fermandarî kirine û padîşahê diwem Bêlalamaye û piştî 32 salan Hemorabî ev hindam xistiye bindestê xwe.

2- DEWLETA ÎSÎN: Di çaxê erîşên gelen Arîde, ko Hêtît û Mîtanî bûn û di serê hezarê diwemde berî zayînê dirêjî rajorê Sûriya kirin.

Naçare Amorî ji ber wan reviyan û ketin jêrê Cizîrê(Mezopotamya) û ji xwere bajarê Marî nêzîkî Ebû Kemal, ko îro jêre dibêjin Tilherîrî avakirin û bere bere ji rewşa koçerî, hovîtî derketin û ketin pergala avanî û bipêşve çûn û çavnêriya pelixandina dewleta Somerî, Orê siyem dikirin û dawî bi Êlamiyanre peymanek girêdan û bihevre êrîşî ser welatê Orê siyem kirin û welatê somer ji hev perçe kirin û ji xwere dewletek li bajarê Îsin lidarxistin û Êlamî di bajarê Larsade dewletek danîn û ji padîşahê Amorî ê yekemre dibêjin Îşbî Ara.

1- ÎŞBÎ ARA: Ji sala 2023 ta bi sala 1990 berî zayînê. 33 sala fermandarî kiriye û ji welatê Êlamî pêve hemberê wî nema bûn. Lê nikaribû êrîşên Êlamiyan ji ser welatê, Somer vegerênî û bicarek welatê Somer bixî bin destê xwe.

Çend şerên mezin û hin tiştên hêja di welatê xwede kirine, çend car êrîşî welatê Saboro, ko dirajorê rojava de bûn kiriye, çawa, ko çend caran berê xwe daye şerê hevalbendê xwe Êlamiyan, lê ne gelek xurt bû û nikaribû zora dijminê xwe bibî û navê xwe kire padîşahê Or, padîşahê Somer-Akad.



Institut kurde de Paris

2- ŞOÊLÎŞO KURÊ ÎŞBÎ ARA: Deh sala fermandarî kiriye û di çaxê wîde şerekî giran dinavbera Amorî û Êlamiyande destpêkir û zora dijminê xwe bir û Nenar xwedake heyvê, ko Êlamiyan ji welatê Somer biribûn sitand. Herwekû navê xwedakî wî Dagan hatiye xuyakirin û navê du padîşahan bivî navî hatine. Îdîdagan û Îşmîdagan.
Îdîdagan, bi navê padîşahê Somer-Akad hatiye navdan û bajarê Siyar xiste bin destê xwe. Û di çaxê Îşmîdagande bajarên Nîbor, Orok, Or, Erîdo jî xistin bin destê xwe. Li bajarê Or, nivîsarek derketiye, ko didî zanîn ev mezinê padîşahên Orok e û xwedêya Orok Nînî mar kiriye û Nînî gelek li ber dilê wî şêrîn e û navê kurê xwe kiriye Îtanatom, ko berî hingî ev navê padîşahê Somerî bû û ev kurê xwe kire serdarê olperestî û li bajarê Or danî.

3- LÎBÎT AŞTAR: Mezinê padîşahê vê malbatêye û di çaxê wîde çend qanûn hatin civandin. Ev çend qanûn di bajarê Nîborde hatine dîtin û niha di mozîxana zanîngeha Pensilvanyadene.
Dibêjî, min bi wekheviya, ko min ji Ono, xwedayê rojê girtiye. Min kiriye, ko welatê Somer-Akad bihevre dinav dilovanî û wekhevîyê de bimênin û min Eştarlîbît bi fermana Enlîl xeyd û zor û setem rakirine. Ev çend qanûn bi zimanê Somerî hatine danîn.
Ji lewra gelek diriste, ko ji qanûnên kevnare bin û tenê Eştar ew civandibin û bi pêşve biribin û bi zimanê Somerî hiştibin.

4- GÛNGENÎM: Vî padîşahî xwestiye, ko welatê Îşîn bixî bin destê xwe û diriste, ko çend salan dibin destê wîde jî mabî.

5- ÎNATOM KURÊ ŞOÊLÎŞO: Bixwe di çaxê bavê xwede li bajarê Or serdarê olperestî bû û mizgevtek ji rojêre jibo, ko Gûngenim biparêzî, lê yekî di bajarê Îşîn de serê xwe ji Gûngenimre xwar nekir û bixwe bû fermandarê bajêr û navê xwe kire Nîtorta û çend bajarên Somer Erîdo, Or, Orok, Nîbor xistin destê xwe û 28 sala fermandarî kir û kurê wî, Borsîn şûna bavê xwe sitand, lê padîşahê Larsa dirêjî welatê wî kir û bi zor xiste destê xwe.
Ev padîşah Ebîsara, ko piştî Gûngenim bû padîşahê Larsa û bajarê Îsin ji Borsîn sitand.

6- EBÎSARA: Piştî Gûngenim bû padîşahê Larsa û welatê Îsin ji Borsîn sitand lê yekî dî bi navê Somoêlo bû padîşahê Îsin û dijminahî li ser Or kete navbera Larsa û Îsin û

padîşahê Larsa welatê Somer bicarek xiste bin destê xwe Di piştî Borsînre pênc padîşah ji bajarê Îsin rabûn, lê tev weza û sefîl bûn, ji lewra berdîberdan pêlakê ke te nav welêt û padîşahê Êlam, Larsa, ko navê wî Rîmsîn bû êrîş kire welatê Somer, Îsin û padîşahê paşî Damîqê-lîşo xiste bin destê xwe û pirê bajarên Somer jî xwe re girtin.
Şazde(16) padîşahan nêzîkî dused salî li Îsin fermandarî kirine, ji sala 2023 û hetta sala 1791 berî zayînê fermandarî kirine.

3- BAJARÊ LARSA: Bi rastî ev ji fermandariya Êlamiyan tê jimartin, çawa, ko me derbaskiriye Êlamiyan divî bajarî de dewletek lidar xistin û Amoriyan di bajarê Îsin de dewletek çêkirin.
Ji Êlamiyan di vî bajarî de çardeh(14) mirovan padîşahî kirine û ji sala 2023 û hetta sala 1791 berî zayînê mane.
Herwekû hate zanîn, ko padîşahê Îsin ev bajar xiste bin destê xwe û wilo ma. Heta, ko Gûhgenim ji Larsa rabû û bajarê Or xiste destê xwe û bû padîşahê Somer û Akad û piştî wî re Ebîsara rabû û piştî wî Somoêlo rabû û bajarê Or xiste destê xwe. Çawa, ko Lagaş, Kîş bi xwe jî di bin destê wîde bûn û ji padîşahê vê malbatê Sînîdînam bajarê Îsin xiste destê xwe û padîşahê Îsin Ziba şikand û çaxê wî gelek xweş bû û dest bi avanî û xweşiya welatê xwe kir û çemê Dicle kola û kûr kir û gelek tiştên hêja çêkirin.
Lê di sala 1833 berî zayînêde Kormayok, ji welatê Êlam, rabû û bi padîşahê Babilre peymanek girêda û dirêjî welatê Sîlîheded kirin, ko ev Sîlîheded padîşahê Larsa ê paşî bû û bajarê Larsa xiste bin destê xwe û kurê xwe Waradsîn, têde danî û çû ser welatê Or û xiste destê xwe. Piştî wîra birayê wî Rîmsîn bû padîşah û nêzîkî 60 salî padîşahî kir û zora padîşahê Aşûr bir û padîşahê Orok xiste bin destê xwe. Lê diwê navêde padîşahê navdar Hemorabî rabû û hate ser welatê Somer û naçare bi Êlamiyanre li hev hat û êrîş kirin welatê Sobaro û welatê Babil perçe kirin. Lê Hemorabî, zû welatê xwe saz û tekûz kir û êrîş kire welatê Îsin û piştî şerekî pazdesalî welatê Êlam jî xiste bin destê xwe û berê xwe da Larsa û leşkerê Rîmsîn perçe kir û di sala 1751 berî zayînêde bicarek welatê Mezopotamya yan jêrê Cizîrê xiste destê xwe û dewleteke mezin li dardanî.

# DEWLETA ELAM

Ezîz Osman dibêjî, gelên Îran Êlam, gotto, Lolo û Kaşî, her çar ji yek nijad û yek bingehîne. Tim dixwestin êrîşî gel û dewletên navbera herdû çeman(Mezopotamya) bikin. Van gelên serê çiya çavê xwe berdan talan û kuştina wan gelên pêşveçûyî, ko xwedî dewlet bûn, pêşveçûyî bûn.

Dektor Ezîz Osman, gelên navbera herdû avan didî xuyakirin û dibêjî, gelê Mezopotamya, Şobarî, Horî, Somerî, Mîtanî, Akadî, Aşûrî, Kildanî bûn û çawa tê xuyakirin her çarên pêşî kurdin û hersiyên paşîn Erebin yan ji Cizîra Erebî hatine. Lê weke ji gotinê wî tê xuyakirin Aşûr tevlîhevin.

Dektor Ezîz Osman dibêjî, Êlam, ko yek ji van gelaye ji destpêka hezarê siyem berî zayînê dewlet li darxistine. Welatê Êlam, hindameke fireh û mezine, ko ji deşt û çiya bihevve hatiye danîn. Heta pingava Hirmiz, Benderboşîr berjêr dibî û paytexta wan bajarê Sûsa bû. Pêzanê lêkolanê li ser navê padîşahekî Êlamî û bi zimanê Somerî nivîsarek dîtine, ko dibêjî, xuyaye Êlam tevlî, ko bi zimanê xwe dinivîsîne bi zimanê Somerî jî dinivîsîn.

Lê çawa Sergonê Akadî bû padîşah êrîşî welatê Êlamîyan kir gelê Êlamî bi gernasî li ber xwe da û dixwestin welat û dewleta xwe biparêzin, lê ji ber, ko herdû neweke hev bûn çend caran Sergon welatê Êlamî xiste bin destê xwe û kete bajarê Sûsa.

Lê Manîştiso piştî Sergon bêtir dijminahîya Êlamîyan kir û di çaxê Naramsînde miletê Êlam hetta çemê Zab xiste bin destê xwe. Lê vê carê miletê Lolobî bi hevalbendiya Gu

Institut Kurde de Paris

tîya ajote ser welatê Babil û Akad-Somer û leşkerê Êlamîjî di nav vê êrîşê de bû û diwê çaxêde ji bin destê Akadîyan derket û serbixe bû.

Lê Naramsîn, bi gernasî zora hevalbenda dijminên xwe bir û bixurtî perçiqandin. Naramsîn ev serpêhatî li ser la tekê nivîsîye, ko ew welat di hindama Şehrezarêdeye û yek ji cem xwe kiriye fermandarê welatê Êlama, li Sûsa danîye. Hetta zimanê Akadî jî kiriye zimanê Êlamîyan û hetta navên samî li Êlamîyan kirine, ji ber, ko Akadîyan dixwest Êlamî yan dinav xwede winda bikin. Lê di serê çiyande zimanê xwe parastin û xwe winda nekirin û gelek bi hostayî bi dijminê xwere derbaskirin.

Naçare Naramsîn, yek ji wan kire fermandarê Sûsa û bi zor Enşoşîşak vî fermandarê miletperwer, welatê xwe gelek berepêş ajot û tekûz kir û bivî rengî di dilê miletê Êlamde cihekî bilind ji xwere girt û şêrîn û mezin bû û bi navê Naramsîn welatê xwe fireh û mezin û ava kir. Naçare hev sînorên wî serê xwe jêre xwar kirin.

Lê piştî mirina Naramsîn leşkerê xwe ajote ser welatê Akad û serxwebûna welatê xwe eşkere kir. Lê piştî çend şerên xwîndar û dijwar leşkerê Bizorenşo bi paşde vegeriya û welatê xwe parast.

Lê çawa miletê Akad berepaş vegeriya û dewleta Akadî sêfil û weza bû. Miletên çiya, Lolo, Gutî berê xwe dane welatê Akad û ji çiya û newalên xwe weke lehîyê xwe berdane Mezopotamya û welatê Somer-Akad bi zor ji xwe re girtin.

2- DEWLETA SÛSA: Sûsa paytexta Êlamîyan, 3500 salî berî zayînê ketibû qûnaxa avanîyê û sivik gavên xwe avêtin. Ji berko Êlam bêtir bi milet û dewletên Mezopotamyave hati bû girêdan zû, Hedaret kete nav wan û ji nişkave piyanên axînî reş li welatê Êlam hatin xuyakirin û zû hatin guhertin. Rengên sor û xakî kete nav piyan û blavên wan şûna rengê reş girtin. Lê ji welatê Orok hatine welatê Êlam-Sûsa.

Hedareta Orok zû gavên xwe avêtin û xwe gihande qûnaxa nivîsandinê û Êlamîyan navê nivîsandina xwe kiribû Berî Êlam.

Dibêjin Hedaret, ji navbera herdû çeman çûye welatê Êlam û têkelî hev bûye, Êlamî 3000 sal berî zayînê gihane nivîsandinê.

Ji ber ko em dibênin xanî gelek ciwantir hatine avakirin, tevlî ko hêj derên wan teng û nizim mane û miriyên xwe di hindirwande vedişêrin û gelek tiştên dî biwanre,

dixin gornê, binaxê. Weke, piyanên mermer, ko di wande bihnok hebûn û hin piyanên kevirî û neynikên sifrînî û xwarin û morîk, gerdenî yên lazwerdî, eqîq, sedef, zêr, guharên zêr, bazinên zîv, bi mirîyên xwere dixistin bin axê.
Çawa tê zanîn, ev tişt hemî li Sûsa çêdibûn yan ji navbera herdû çeman dihatin. Tenê Hedareta Sûsa rûmeteke zêde heye, ko di wî çaxêde hêj nivîsandin neketibû Îranê.
Girîşman dibêjî, li Sîyalk, rojhilatê Îran hin perçên biçûk hatine dîtin, ko nivîsandina Êlamî, berî Êlem li ser wan hatiye xuyakirin. Hin zanayên rojava hin ji wan perçan dane xuyakirin û dibêjin, jimar di wande hatine nivîsandin, ko bi bazirganîve girêdayîne. Xuyaye, ko bi hin pertalve hatine girêdan, jiber, ko bi qulin kunkirîne.
Ji ber ko bajarê Sîyalk bi awayê bazirganî bi Êlamîyan ve girêdayî bû. Zû Hedareta Êlam gihaye vî bajarî, lê çawa Êlamî ketin bin desta xwendin û nivîsandin ji wela tê Êlamî winda bûn.

3- DEWLETA ÊLAMÎ Dİ BAJARÊ LARSA DE: Herwekû me derbas kiriye, di bajarê Larsade dewletek li darxistin û çarde mirovan li vî bajarî fermandarî kirine. Ji sala 2023 û hetta sala 1761 berî zayînê padîşahî kirine. Lê herwekû me derbas kiriye padîşahê Îsin bajarê Larsa xiste bin destê xwe.
Lê çawa padîşahê pênca Gûngenim hate meydanê, zora dijminê xwe bir û bajarê Or jî xiste bin destê xwe û bû padîşahê Somer

2- EBÎSARA: Di piştî Gûngenim bû padîşahê Larsa û bê nav û deng maye.

3- SOMOÊLO: Piştî Ebîsara bû padîşahê Larsa û bajarên Or, Lagaş, Kîş xistin bin destê xwe û padîşahê Îsin, Ziba, şikand û dest bi avanî û pêşvebirina welatê xwe kir û gelek tiştên hêja bicikirin û çemê Dicle kûr kir û kola

4- KOROMAYOK: Ev mirov ji padîşahên Sûsa bû û padîşahê welatê Êlam bû. Bi padîşahê Babil re peymanek girêda û êrîş kire ser bajarê Larsa û ji Sîlîeded sitand.

5- SÎLÎ EDED Ê ÇARA Jİ PADÎŞAHÊN LARSA: Ko Koromayok padîşahê Sûsa-Larsa jê sitand û piştî wîre birayê wî Rîmsîn bû padîşah û li larsa rûnişt.

6- RÎMSÎN: Nêzîkî şêst(60) salî fermandarî kir û li ser destê Hemorabî di sala 1761 berî zayînêde welatê Larsa û Mezopotamya bicarek kete destê Hemorabî
Di çaxê Keyxesriwê Farisîde yan di sala 640-600 berî zayînê de şer di navbera Aşûr û Êlam de destpêkir. Aşûr Banîbal bajarê Sûsa li jêrê welêt û bajarê Madakato, li jor je Êlamîya sitandin.

7- TAMARÎNO: Li ser destê Aşûrîya bû fermandarê welatê Êlam, lê piştî pêlakê hate danîn û welat bicarek hate talankirin, Sûsa hate şewitandin û bajarên Madakato, Dor Entaş, ko ji avanîyê padîşahê Êlamî, Ontaş,Gale ketin destê Aşûrîyan û ber bi rojavade çûn. Hetta ko gihane bajarê Parsomaş, paytexta Faris, gelê Arîyê nûhatî û çiyayê Bextyarî û padîşahê Farisî kurê xwe Aroko, girawda Aşûrbanîbal ko pê bawer bibî û ji ser welatê xwe vegerand.

ÊLAM Û SOMER:

Di çaxê Ebîsinde, ko padîşahê Orê siyem bû, Amorî û Êlamîyan bi hevre peymanek girêdan û êrîşî welatê Somer, Orê siyem kirin û Ebîsin bi dîlî kete destê Êlamîya û tevlî xwedayî heyvê Nenar birin Sûsa, paytexta xwe û ji wê rojêde dewlet û hetta zimanê Somerî jî winda bûn. Tenê di devê pîr û xwendewarên mizgevtade ma û Êlamîyan ji xwere di bajarê Larsa de dewletek li darxistin. Amorîya di bajarê Îsin de dewletek çêkirin û ristevanekî Somerî li ser vê şikestinê risteke bi şewat çêkiriye.

Êlamî xurt bûn û destûra me şikandin.
Weke tofane^hatin û her tişt pelixandin.
Ey Somer, hetta kengî serê xwe rakî.
Malbata pîroz ji mizgevtê derxistin.
Bajar, mizgevt hilweşandin.
Fermandarî bi zor ji me sitandin.

Herwekû di dabaşa Orê siyem de hatiye gotin, ko di çaxê Amosedûq padîşahê Babilîde şer bi Êlamîyanre kiriye û zora wan biriye. Çawa, ko di çaxê padîşahê Êlamî Şotroknaxuntîde welatê Kardonî ya Babil bi zor xiste destê xwe û di sala 1170 berî zayînê de Kardonîyaş kete bin destê Êlamîyan.
Lê gelek neçû Bext û Nesir, ji Êlamîyan sitand û zora wan bir. Horzing dibêjî, zimanê Lolo, weke zimanê Êlamîya, ji zimanên Qawqazî-Asyewîye û tevlî wîqasî, ko mirov li navên padîşahên Lolobî binêrî, dibênî, ko gelek nêzîkî zima-

nê Horîye.

Lê weke, ko ji nivîsarên Ezîz Osman û Mihemed Emîn Zekî tê xuyakirin, gelên Horî- Mîtanî, ji Saborî têne jimartin û paşê navê Nayrî ketiye şûna Sobarî(Sobarto). Sobar, Nayrî, Gutî, Lolo, Kasay, Êlam ji miletên Zagros têne jimartin û komela pêşîne û hemî bingeh û koka miletê kurdin yan jî êl û eşîrên kurdên kevnarene.Qawqazî, Arî tevlî hev bûne û navê van milet, eşîran hetta niha jî di kurdistanêde têne xuyakirin.

# DEWLETA KASÎ

DEWLETA KAŞÎ(KASÎ):

Ev navê ha bi gelek awa tê gotin. Kaşî, Koşî, Kaşo, Kasî, Kasay, Kûsî. Serê pêşîde li hindama Loristan(Kurdistana rajêr) rûniştîbûn. 1600 sal berî zayînê de, welatê Somer kete nav sergêjiyan û hin êl û eşîrên koçer ji welatê Rûsiya berjêr bûn û Hetît hatin jorê Sûriya. Ji destê Mîtanên kurd derxistin û êrîş kirin welatê Babil û talankirin. Ji rexê peravê leşkerê dewletaDorava êrîş kirin welatî Somer, ko di bin destê Babiliyan de bû. Lê gelek neçû êl eşîrên berberên serê çiyayê Zagros berjêr û weke lehîyê xuşiyan û welatê Somer-Babil xistin destê xwe û dewleta Kardonî(Kardoniyaş) liderxistin. Ji sala 1530 hetta sala 1170 berî zayînê, 360 salî divî welatîde bi fermandarî rûniştin Çawa, ko berî hingî û di sala 1740 berî zayînêde dewletek di çiyayê Zagrosde lidarxistibûn, yanî 570 salî fermandarî kirine. 210 sala li Zagros û 360 salî li Somer fermandar mane.

Lê Mihemed Emîn Zekî Beg dibêjî, di sala 1760-1746 berî zayînê de dest bi çêkirina vê dewleta Kaşî(Kasî) kirine.Ca eger ev rast bî gereke heştsed(800) salî fermandarî kiribin.

Dektor Ezîz Osman dibêjî, tarîxzan dibêjin, ev gelê Kaşî weke gelên Guttî, Horî, Mîtanî, ji gelên Asyewî-Qawqazîye û têkelî gelên Hind û Ewrûpî bûne, yan gelên Hind û Ewrûpî têkelî wan bûne û bicarek bûne Arî û zimanê wan birine ser zimanê Hind û Ewrûpî-Arî. Çawa, ko hin bawer dikin, ko padîşahên wan ne ji wane.

Lê bi rastî hêj em baş nizanin berî hingî çi nifşê zimana bû. Jiber, ko çawa ketin welatê Somer zimanê xwe şemirandin û zimanê Babilî ji xwere kirin zimanê dewletê. Çawa

ko berber û hov bûn û welatê Babil-Somer di çaxê wande gelek bi paşde vegeriya, tenê her çiqas zimanê babilî kirin zimanê dewletêjî. Lê navê xwe parastin. Gelek têkelî gelên bêgane nebûn û xwe raserî van gelan didîtin û digirtin.

Lîsta navê padîşahên Kaşî bime didî zanîn, ko ê pêşî bi navê Kandîş bûye padîşahê Babil-Somer û bajarê Babil jixwere kiriye paytext û tarîxbêj dibêjine vê dewletê, dewleta Babilî ya diwem dihejmêrin.

Çawa, ko padîşahên Kaşî jî navê xwe dikirin padîşahê Somer-Akad padîşahê çarhindama Cihangîr meger çendan di serê pêşîde dewleta peravê xwe nexiste bin destê wan jî, lê dawî bizor xistin bin destê xwe û rajorê welatê Babil jî bizor xistin bin destê xwe û di çaxê Agomê diwem di sala 1530 berî zayînê de çû ser welatê Hetîta û zora wan bir û ayîna Mirdox, ko ji welatê Somerî bizor biribûn, bizor ji wan sitand û vegerande welatê Kardonî û gelek tiştên hêja bixwere anîn welatê xwe.

Lê ji padîşahên herî mezinê Kardoniya, Borna(Boryaşê)ye keme.

BORNABORYAŞ: Di sala 1440 ê berî zayînê de piştî Agomê diwem bû padîşah û çû şerê Bizoraşûr padîşahê Aşûrî yê çarem û di navbera xwede peymanek çêkirin.

KİŞTİLYAŞÊ DİWEM:

OLAK BORYAŞ: Ko di sala 1440 de xwest, ko welatê peravê bixî bin destê xwe yan xiste bin destê xwe û careke dî ji bin destê wan derket û Agomê siyem bi zor xiste bin destê xwe.

AGOMÊ SİYEM: Welatê peravê bizor xiste bin destê xwe û bajar wêran kir û mizgevtên wan hilweşandin, herivandin Lê dawî Kaşiya paytexta xwe guhaztin bajarê Dor, Kolî, Karzo, ko Kaşiyan bixwe avakiribû li ser destê padîşah Korîkalzo hatibû avakirin, ko nêzîkî sala 1400 berî zayînê padîşahî kiriye.
Ev bajar dikevî şûna bajarê Eqirquf(Aqrê), ko mezinê kolînvanê rojhilata İraqê, di sala 1942 zayîn de li vî bajarî kolay- û gelek tiştên hêja derxistine.
Ji sedê pazdehê zayîn û heta dawiya dewleta Kaşî(Kardonî) bivan bermayên Aqrê hatiye xuyakirin û zanîn. Ji van bermayên, ko hatine xuyakirin, birceke mezin û hin mizgevtin ko di sala 1330 berî zayînê de hatine avakirin û li ser destê padîşahê Kaşî, Korîkalzo ê siyem hatine çêkirin. Hin nivîsarên ser wan mizgevt û hin qes-


rên bajêr didin zanîn, ko navê çêkroxê van avanîya û vî bajarî padîşah Korîkalzoyê yekeme.
Herwekû ev nivîsarên kevnare didin zanîn, ko navbera Kaşî û Misriya gelek xweş bû. Lê ji Til Emarînê, hin berma û nivîsar derketine, ko didin zanîn, ko padîşahê Babil, Kardonî, Enlîlkedşimanê yekem, kurê Korîkalzo ê yekem nivîsarek ji padîşahê Misrê Emtehotibê siyem re rêkiriye û gazin jê kirine û gotiye " Çawa te keça xwe ji min re rênekiriye, ko ez mar bikim".
Herwekû di nivîsareke dîde tê dîtin, ko birayê Korîkalzoê yekem Bornaboryaşê diwem nivîsarek ji padîşahê Misrê Exnatûm re bi xeyd şandiye û gotiye "Te çawa peykê Aşûrî bi rûmet kiriye û tu bi xwe çûye pêrgî wî?. Bavê min destê xwe neda destê Kenenîya, ko şerê we bikin û biwande xeyidî û got, ma win nizanin, ko ez û padîşahê Misrê birayê hevin û nehişt, ko bêne şerê we".
Çawa, ko di navbera Kaşî û Misriyan de bazirganî jî bûye, Kaşiyan hesp û gewher, cewahir dişandin Misrê û zêr ji Misrê tanîn welatê xwe.
Çawa, ko di navbera Kaşî û Hetîtade gelek dilxweşî û dostanî hebû, meger çendan çend caran sergejî çêbûnjî , lê zû lihev dihatin û herdû alî dostên hev û aştîxwaz bûn û herdû dejminê Aşûriya bûn. Lê Kaşî û Aşûrî carna haşt û carnajî şerê hev dikirin. Lê yekî zora yekî nedi bir. Bornaboryaşê diwem di sala 1350 de keça padîşahê Aşûr, Aşûrobalît markir. Çawa, ko Korîkalzo kurê Bornaboryaş çawa bû padîşah, xelkê Babil serê xwe hildan û padîşahiya wî nexwestin. Lê kalikê wî Aşûrobalît, padîşahê Aşûr hate hana wî û bi zor neviyê xwe kire padîşahê Babil û vegeriya welatê xwe.
Lê Hetît û Kaşî bûne hevalên hev û şerê Aşûriyan kirin û dawî padîşahê Aşûrî, Tokoltî Nînorta, welatê Babil bi zor xiste bin destê xwe.
Bi zimanê Kaşî navê welatê Babil Kardoniyaş bû. Kardonî bi daxweze welatê kurd hatiye, lê yaş alaveke, ko gelek diriste ji zimanê bêgana hatibî ser vê gotinê û diriste yaş bi daxwaza yak bî.
Lê em dibêjin Kardonî-Kardoniyan-Kardokî-Kardokiyan-Kardoşî-Kardoşiyan. Herwekû gelek diriste, ko "ş" ji bo peyhevî bî, weke kurd dibêjin, Kardoniya jî û bi zarî soranî Kardonîş tê gotin.
Lê piştî wîre, piştî Tokoltîre mirovek ji Babil rabû ko navê wî Hededşomasir bû û welatê Kaşî ji Aşûrîya sitand û xiste bin destê xwe. Piştî wîre padîşahên Kaşî xwe pa

rastin û serbixwe man. Lê di çaxê Aşûrdanê Aşûrî de careke dî welatê Kardonî xiste bin destê xwe û Mihemed Emîn Zekî dibêjî, padîşahê Kaşî ê dawî navê wî Êgamîl bû. Lê piştî pêlakê padîşahê Êlamî, Şûtroknaxuntî di sala 1170 de welatê Kardoniyaş xiste bin destê xwe û padîşahê dawî winda kir û her tiştên hêja birin paytexta xwe Soza. Qanûna Hemorabî kêlika xurtemêrî, ko Naramsîn çêkiribû û sitûna Mantiştoso bi carek birin Soza û vê paşiyê lêkolînerê Fransî ev tişt hemî li bajarê Soza dîtine.
Xwedyê nivişta Rafidan dibêjî, dewleta Kaşî gelek xurt û mezin û dijwar bû. Weke Mîtaniya bê Hedaret bû. Lê Hedareta miletên kevnare ji xwere girtibûn.

PADÎŞAHÊN KARDONÎYA:
1- Kandaş, 2- Agomê yekem, 3- Agomê diwem, 4- Bornaboryaş, 5- Kiştilyaş, 6- Bornaboryaşê diwem, 7- Agomê siyem, 8- Korîkalzoyê yekem, 9- Korîkalzoyê diwem, 10- Korîkalzoyê siyem, 11- Kodişman Enlîlê yekem, 12- Kodîşman Enlîlê diwem, 13- Hededşomaser, 14- Êgamîl.

Lê tarîxzana bi firehî tarîxa jîn garîya her padîşahekî nedane zanîn û ev navên jorîn çardeh ji hevtê padîşahîne . Jiber, ko carna yekem tê gotin, xuyaye, ko diwem jî heye û çawa siyem tê xuyakirin, ko diwem, yekem jî hene. Ez bi xwe hêj bi ser lîsta navê wan venebûme, ko karibim tevan bidim xuyakirin

Dawiya dewleta Kardonî-Kurdî li navbera herdû çeman li **vir hat** lê kardoşî vegeriyan welatê xwe, Loristan.



*Sembolek ji bo xudayekî Kasîyan.*

# DEWLETA AKAD

DEWLETA AKAD:

Dewleta Akadî li jêrê Cizîrê(Mezopotamya) hatiye li dar xistin û padîşahê yekem ji vê dewletê Sargone.

Çawa, ko dibêjin ev Akadî di koka xwede Samîne û berî, zayînê bi 300 salî hatine jêrê Cizîrê û lihhêla Babil, Bex da rûniştine. Di rajorê welatê Şanarde bûn, di serê pêşîde bi koçerî hatine, lê paşê bûne cotkar û dawî bûne fermandar.

Ev Sargon yek ji serdarên dewleta Kîş bû û di bin destê Orzimamade bû û paşê bi zor welatê Kîş xiste bin destê xwe û ji dubendiya Someriyan kar kir û ji xwere fersende dît û çû ser wan. Welat bi carek xiste bin destê xwe û bû padîşahê cihangîr û welatê wî giha hetta pingava Sipî. Gelek şerên xwîndar bi Guttiyanre kirin.

Herwekû Ezîz Osman dibêjî, Sargon êl û eşîrên Guttî, ko di çiyayê Zagrosde rûniştî bûn û herdem êrîşî welatê Mezopotamya dikirin, şikandin û Logalzagîsî padîşahê Orok ê Somerî dîl girt û bajarê Akad li cem bajarê Kîş avakir. Lê hêj em nizanin ev bajar li kuye.

Lê di dawiya fermandariya wîde miletê Aşûr, bajarên Aşûr û Nînova avakirin û serê xwe hildan û xwe dane naskirin û diwê çaxêde Sargon serê xwe danî.

2- RÎMOŞ KURÊ SARGON(9): Çawa Sargon serê xwe danî kurê wî Rîmoş kete şûna bavê xwe. Di çaxê wîde Êlamiyan, Someriyan serê xwe rakirin, lê Rîmoş zora dijminê xwe bir û talanê wan anî û gelek ji vî talanî pêşkêşî Anlîl xwedayê xwe kir û li bajarên Nîbor, Or. Oma heşt hezar ji

leşkerê Someriyan kuştin û 5500 bi dîlî ketin destê wî. Herwekû di şerekî Oma û hevalbendên wî 9000 mirov di meydana şer de dane kuştin û 3500 dîl ketin destê Rîmoş.

3- MANÎTŞO KURÊ SARGON(15): Çawa birayê wî serê xwe danî, Manîtşo, kete şûna birayê xwe. Çawa tê xuyakirin Aşûr û Êlam jî di bin destê wîde bûn. Ji lewra li Nînova mizgevtek avakiriye û fermandarê Êlam, Aînake, nîvçe li cem xwe jêre çêkiriye û li paytexta Êlam Soza daniye. Herwe kû, ko li mûzexana Lour kevirekî dirêj heye, ko vî padîşahî hin qad kiriye

4- NARAMSÎN, KURÊ MANÎTŞO(37): Di serê pêşîde gelek êrîşên mezin û xurt hatine ser welatê wî û şerên dijwar bi miletê rajorê rojhilatre kirine, ko ew milet giha bûn çemê diyalê û hindama Sobarto û jêrê çemê Dicle xistibûn destê xwe. Çawa, ko zora Êlamiyan bir û welatê İnşan xiste bin destê xwe û Ayîna xwe, ko têde zora miletê Lo lobî biribû ko bi xwe li çiyayê Zagros bûn ji xwedayê xwe Aştar, xwedayê Êlam re pêşkêş kir. Di vê Ayînêde Na ramsîn bi kincê şer, taseke asinî li serê wî û du quloçên wî berjêr bûbûn û balte di destê wî de, bi tîr û kevan û leşkerê wî li pey bi çiyade berjêr dibûn û hin jî leşkerê wî birim û ala leşkerî hilda bûn û dijmin ji ber wan direviyan û diketin ber lingan û laşê hina ji wan ber bi newalan ve berjêr dibûn. Herwekû hina ji wan hêviya azadiyê jê dikirin û di jorê vê ayînêde du sitêrên bilind xuyadibin û niha ev ayîne di mûzexana Luor deye.
Çawa, ko li hêla Amed(Diyarbekir) jî Naramsîn, kêlik û nîşanên xurtiyên xwe û girtina vî welatê mezin danîne kolane û nivîsandine, ko didin zanîn, ko welatê wî heta welatê Ermenistanê fireh bûye.
Herwekû Naramsîn, bi padîşahê Somero, Somerîre şerekî mezin û dijwar kiriye, welatê Awan û welatê Faris bizor xwe liser xwe ragirtine û serbixwetiya xwe parastine û peymanek dinavbera xwe û Naramsînde çêkirine. Li gora vê peymanê padîşahê Awan, serê xwe ji padîşahê Akadîre daniye û ketiye bin siya dewleta wî.
Di çaxê wîde, rewş, wergirtin û pergala welatê Akad ketine nav welatê Êlam. Herwekû bajarê Nûzî, ko li hindama Kerkûk dikevî ji destê Horiya derxist û divî bajarîde bermayên Naramsîn derdikevin. Çawa, ko li welatê Misir û Kebadokya hin bermayên Naramsîn tên dîtin, çawa, ko di dawiya padîşahiya wîde hevalbendiyek dinavbera Fa

ris, Êlam, Kîş û welatê Erz de li hember Naramsîn hate çêkirin û hatin şerê wî. Tenê Naramsîn bi zor ew ji hev belav kirin û şikandin. Lê dawî li welatê Orok malbatek rabû û sîh salî serbixwe fermandarî kirin û pênc padîşah ji wan rabûne. Bi vî rengî welatê Akad berî mirina Naramsîn kete nav şek û pekan û di nav tirs û sawîrande hate gevizandin.

5- AŞARKALÎŞARÎ: Kurê Naramsîn yan neviyê Naramsîne. 25 sala fermandarî kiriye û di çaxê wîde gelek sergêjî ketin nav welatê Akad, ji rexê jêrîve Somer û ji rexê rojavade Amorî û ji rexê rojhilatve Êlamîyan dirêjî welatê wî kirin. Lê dijminê mezintir, ko li welatê Cotyom bûn û diçiyayê Zagros de bûn Gutî bûn.
Ev Gutî, ji wan êl û eşîrên xwînrêj, dijwar û hov bûn. Meger di serê pêşîde padîşahê Akad zora wan dibir û padîşahê wan dîl girt. Lê dawî êrîşî welatê Akad kirin û bizor xistin bin destê xwe. Piştî mirina padîşahê Akad, welat û dewlet bicarek kete bin destê Goto. Dewleta Akad, piştî, ko dused salî fermandarî li welatê Somer-Akad kirin, konê xwe pêçan û ji cihanê bêveger pişta xwe dane me û çûn.

PADÎŞAHÊN AKAD: 1- Sergon, 2- Rîmoş, 3- Manîtşo, 4- Naramsîn, 5- Şalkarîşalî.

Weke ko ji vê jimara salên wan tê xuyakirin, gereke her pênca bi hindikî ji sed salî bêtir fermandarî kiribin, ne nêzîkî du sed salîye. Eger jimara wan rast bî.

Institut kurde de Paris

# DEWLETA BABÎL

DEWLETA BABİL:

Dibêjin, Babilî di kok û bingehê xwe de ji êl û eşîrên, Amorîne, ko bajarê Îsin, di serê pêşîde xistibûn destê xwe.

Ezîz Osman dibêjî, Amorî, Erebin, ji Cizîra Erebî berjor bûne. Di sala 2500 berî zayînêde hatine rajorê rojhilatê Sûriya û çend derebegî li darxistine. Somerîyan ji wanre digotin Marto û Samîya digotin Amorî, bi daxwaza rojava ji ber, ko li rojavayê Ferat rûniştî bûn. Çawa, ko pêzanê tarîxê yên kevnare dibêjin Babilî, Amorî û navê padîşahên wan jî Erebî ne.

Di serê pêşîde ev Amorî di Sûriya de koçer bûn, paşê bajarê Marî, li hindama Ebû Kemal avakirin, bere bere xwe kî şandin Mezopotamya û bajarê Îsin ji xwere girtin û paşê dewleta Babilî lidarxistin. Dengbêjekî wan di vê babetê de gotiye:

Çek hevalê Amorîyane.
Ji kesîre serê xwe danayênin.
Goştê xav dixun.
Bê xanî û mal û cî ne.
Miriyên xwe venaşêrin.
Lê niha Marto ketin xaniya.

Ji dewleta wanre dibêjin Babilî. Jiber ko di Babilde rûniştin û ji xwere kirin paytext. Babil, bi daxwaza Bab-êle derê xwedê ye. Di dawîde ev nav hate guherandin û firehtir kirin û ji xelkê Cizîrê re, yan xelkê rojhilatênavînre digotin Babilî. Di çaxê vê malbatêde Babil bûbû cihê pêşve-

Institut Kurde de Paris

çûn, zanîn, xwendin û avanî, hedaretê û ketibû pêşiya rojhilat û rojava û gavên xwe sivik û xweş bi pêşde davêtin .
Tarîxzan dibêjin , di sala 2105 û hin dibêjin, di sala 1905 de berî zayînê dest bi padîşahiya xwe kirine. Hin dibêjin di sala 1893 de Amorî bûne padîşah, yazdeh padîşah ji sala 1893 heta sala 1595 berî zayînê padîşahî kirine.

1- SOMOAPO: Di sala 1893 berî zayîne de bûye padîşah. Lê tênê li bajarê Babil fermandarî dikir û di çaxê wîde padîşahê Aşûr, Êloşûma êrîş kire welatê Babil û çendan ko bajarên Somer girtin jî lê padîşahê Babil di bajêr de asê bû û xwe neda destê dijminê xwe. Lê dawî Somoapo bajarên Siyar, Kêş xistin bin destê xwe û çarde sala fermandarî kir.

2- SOMOLAÊL: Di çaxê wî de bedena bajêr û mizgevta Hided, hatin avakirin û 36 sala fermandarî kiriye.

3- SABOM: Kurê Somolaêl, çarde sala fermandarî kiriye.

4- EBÎLSÎN: Di çaxê wî de û di çaxê berî wî de avanî bi pêşve çû û welatê Babil tekûz bû.

5- SÎNMOBALÎT: Di sala 1810 de bû padîşah û di çaxê wî de bajarê Or kete destê wî. Li ser bajarê Îsin kete gewriya padîşahê Larsa, Êlamî, lê dawî Îsin kete destê padîşahê Larsa Êlamîya.

6- HEMORABÎ: Kurê Sînmobalît, çil û du salan fermandari kiriye. Bi rastî eve ê , ko dewleta Babil li darxistiye , mezin û fireh kiriye û ji mezintirê padîşahê Babile. Welatê Somer-Akad xistine bin destê xwe û xelkê wan nava tev kirine yek milet û yek dewlet. Paşê bajarên Orok Îsin bi zor xistine bin destê xwe.
Lê piştî pêlakê padîşahê Larsa, Rîmsîn û padîşahê Sobarto û Gûtyom-Gutî bûne hevalbendên hev û bihevre êrîşî welatê Babil kirine, lê Hemorabî bi gernasî li hember dijminê xwe rawesta û piştî 30 salî Hemorabî bajarê Larsa, ji Êlamîyan sitand. Gelek dengbêj ristevana jibo vê xurtîya wî liser rist û sitiran gotine. Çawa, ko bajarê Marî xiste nav welatê xwe û pirê welatê Somer ji xwere girt û ji nûve berê xwe da welatê Aşûr û Sobarto.
Şemsîheded, di wê navêde sînorê xwe gelek fireh kiribû, lê di çaxê Şemsîdagan, kurê Şemsîheded padîşahê Aşûrîde Hemorabî welatê Aşûr bizor xiste bin destê xwe û bajarên Nînova, Aşûr bi ser welatê xwe ve berdan. Çawa tê xuyakirin Someriya bêşer xwe xistine bin siya Babilîya

û bûne dostê Hemorabî.
Bi vî rengî Hemorabî di navbera herdû pingavande dewleteke mezin pêkanî û çêkir û li cihanê dengdar bû. Navê wî bû padîşahê Somer û Akad, padîşahê çar hindama, cihangîr. Jêre digotin bavê Amorîya û destûr û qanûna xwe ya navdar ji nûve danî.
Bê weke qanûn û destûrên kevnare bi carek civandin û pêkve kirin yek destûr û navê wê kire Destûra Hemorabî. Vî padîşahê navdar gelek tiştên navdar û hêja di welatê xwede pêkanîne, çêkirine û dewleta xwe gihande rêza dewletên mezin û navdar û milet û welatê xwe gelek bipêşve birin.

7- ŞEMSOÊLÛNA: Kurê Hemorabî. Vî mirovî 37 sala fermandarî kiriye, di serê pêşîde bi xweşî rabiward, lê paşê ji rexê rojhilatve miletê Kaşî serê xwe hilda û ji jêrve Êlamîya êrîşî bajarê Larsa dikirin. Bajarên Or, Orok, ji bin destê wî derketin.Çendan hin bajarên Somerî vegeran din bin destê xwe lê dawî Someriyan di peravêde dewletek li darxistin. Somerî û Akadiyên, ko ji ber zor û setema Babilîyan direviyan diçûne nav wê dewletê û bi zor çend bajarên xwe vegerandin bin destê xwe. Çawa, ko Aşûrîyan serê xwe hildan û berê xwe dane dijminahîya Babilîya.
Lê di wê navêde Horîy-Hevêrkiyan ji jorve êrîşî welatê Aşûr kirin û bi zor xistin bin destê xwe û ji dewleta Babilî veqetandin û Şemsoêlûna di nav van sergêjiyan de serê xwe danî.

8- EBÎÊŞÛ: Kurê Şemsoêlûna, di çaxê wî de şer di navbera wî û dewleta peravêde gelek çêdibûn bêko yek zora yekî bibî.

9- AMÛDÎTANA: Di çaxê wî de careke dî bajarê Îsin, Nîbor, ketin destê Babilîya.

10-AMOSEDÛQA: Di çaxê wî de Babilîya zora Êlamîya birine.

11-ŞEMSO DÎTANA: Ev padîşahê davîye, ko di çaxê wî de Hetîtan ji jorê rojavade êrîşî welatê Babil kirine û di sala 1595 de Morsîlê yekem welatê babil bi zor xiste bin destê xwe, lê gelek nema Babil talankir û vegeriya welatê xwe. Lê leşkerê Babil şerpeze û bêhavil bû û welatê Babilîya ji hevde ket û ji hev perçe bû.
Ji lewra Kaşîya, ji xwere fersende dîtin û êrîşî welatê Babilîyan kirin û bi zor ji xwere girtin. Herwekû, ferman-

dariya vê malbatê ne gelek eşkere û xuyanîye û di biwara çax û sal û destpêka vê malbat û dewletê de neweke hev hatine gotin. Em çavnêrê hin nivîsar û bermayên kevnarene ko ji mere hê xweştir bidî xuyakirin. Dawîya vê dewlet û malbatê li vir qediya û dawî hat.

DEWLETA PERAVÊ:

Herwekû me derbas kir, çend cara navê vê dewletê hate xuyakirin û gotin. Lê gereke niha em dûr û dirêj bidin xuyakirin, ka kê çêkiriye û çend sala fermandarî kirine û çend padîşahan lê fermandarî kirine û bi kok û bingehê xwe ji ku hatine û ji kune.

Ev dewlet di çaxê padîşahê Babilî Şemsoêlûnade, li ser destê Êlûmaêlûm di nêzîkî sala 1740 berî zayînêde hatiye li darxistin. Çawa, ko ew bixwe dibêjî, ez neviyê Demqêlûn padîşahê Îsinê Somerîme, herwekû tê xuyakirin Somerî û Aka diyên, ko ji ber Babilîyan direvîyan diçûne vî bajarî û dî bî hin eşîrên Kildanî jî têkelî wan bûbin, bi hevre ev dewlet çêkiribin. Ji ber ko li qiraxa pingava Farisî ev dewlet hatiye çêkirin, jêre dibêjin, dewleta peravê û xelkê vê dewletê Somerî û Samî tevlî hevin.

Yazde padîşahan 350 salî li vê hindamê padîşahî kirine. Her çiqas Şemsoêlûna Babilî, dixwest, ko vê dewletê bixî bin destê xwe, lê nikaribû zora wan bibî. Bi gernasî Êlûmaêlûm welatê xwe parast û dawî bajarên Larsa, Nîpor jî xistin bin destê xwe.

Herwekû di çaxê Ebîyeşûde careke dî Babilî çûne ser vî welatî, lê pozşikestî vegeriyan. Çawa, ko di çaxê Amodîtanade bedena bajarê Îsin herivandin lê nikaribûn tiştekî bikin. Di çaxê Demeqêlûnde, ko padîşahê siyem ji padîşahên, dewleta peravê bû carek dî bajarê Îsin vegerand û bedena wê avakir.

Lê çawa Kaşî, ketin welatê Babil û dewletek li darxistin ev dewlete peravê jî xistin bin destê xwe û paytexta wan, Dorava hilweşandin û mizgevta Eya wêran kirin.

Institut kurde de Paris

# KARDOŞÎ LOLO HORÎ Û MÎTANÎ

## DEWLET YAN MİLETÊ NAYRÎ:

Di berî hatina miletên Arîde, hin miletên kevnare divan hindaman de hebûn. Ji wan miletên kevnare Nayrî bû, ko hin dama Bota, Şemdînan dibin vî navîde girtibûn. Lê çawa koçe-rên Arî hatin kurdistanê Nayrîyan weke hemû eşîrên mayîn, xwe tevlî eşîrên Madî kirin yan jî tevde bi navê dewleta Madî gihane hev.

Ji lewra Mêcer-Son dibêjî, miletê Nayrî bapîrê miletê Madî ye. Lê welatê Nayrî piştî windakirina dewleta Madî(Mî-dî) bi navê kurdîyan hate navkirin, ko bixwe bapîrê kurdên îro ne û neviyên Madiyên kevnare ne.


Herwekû tê xuyakirin berî, ko eşîrên Arî bêne kurdista-nê, hin bavik, eşîrên kevnare weke Kasî Nayrî, Lolo, Guttî Kurdîyan hebûn. Tevan xwe têkelî eşîrên nuhatî kirine û xwe di nav wande windakirine.

Lê hin dibêjin, Kardokî-Kardosî-Kardoxî ji wan koçerên nûhatî, koçerên Arî ye û piştî miletê Madî hatine kurdista-nê û dibêjin Mad, Pars, Manî, Sît, Kardoşîne.

Mad di welatê Mîdya û Manî di jêrê rojhilatê gola Ormi-yê û Paris di hindama Şîraz û Kardoşî di hindama Hekarî û Botan de rûniştine.

Sîdnî Simît dibêjî, heta niha welatê Sît ji meve eşkere nebûye, lê Sît di îro de xuyaye.. Lê di êrîşên Madîyande Sît jî biwanre diçûne şerê Aşûrîyan û di biwara, Manî de dibêjî, herwekû hetta îrojî, hêj zimanê Manî nehatiya za-nîn, ka ji kîjan nifşê zimanaye.

Institut kurde de Paris




XARÎTE HATÎNA MÎTANÎYAN PÊŞAN DÎDE.
(Li dor 1600 sal berî Îsa.)



*Nivîs û heykelê şêr di zemanê Horîyan da hatîye çêkirin.*

Institut kurde de Paris

Lê gereke em bidin zanîn, ko Sîtî di îro de li nav eşîra Omerıyan, li jorê bajarê Nisêbînêde rûniştîne. Gelek diriste, ko Omeriyan hemî ji miletê Sîtî bin, yan jî bermayê Omo bin.

Çawa, ko eşîrek bi navê Elmana li jorê welatê Xerza-Bedlîs tê xuyakirin û gelek diriste, ko bermayên Manî, manayên kevnare bin. Lê Simît, pêde diçî û dibêjî, bi rastî ji van çend miletan, Mad û Kardoşî hêjane, ko mirov ji wan bi peyivî.

Herwekû pirê tarîxzana gotine, miletê Nayrî, bermayê miletê Sobarîye û di çaxekîde welatê Nayrî ji jorê Sûriya û hetta jorê gola Wanê dirêj û fireh dibû. Di îrode li şûna Nayrî eşîrên Nehrî mane, ko ji wanre dibêjin Şemdînan, ji ber, ko navê mezinekî wan Şemseddîn bû.

KARDOŞÎ-KARDOXÎ-KARDOKÎ:

Çi ji komela kevnare û çi ji komela nûhatî bin di sala 401 berî zayînêde ev gel hatiye xuyakirin

Ksenefon, ko bixwe yek ji Şagirdên Soqrat bû dibêjî, miletê Kardoşî(Kardoxî) bicarek xwe nedaye ber siya îraniyan û di bin destê wande nemaye. Gerekê padîşahekî îranî, Exmenî, bi leşkerekî mezinve hatiye ser van Kardoxiyan lê, yek ji leşkerê îran sax neçûye mala xwe û tev hatine kuştin.

Ev Ksenefon di sala 401 berî zayînê de niviştek bi navê Anasasîs çêkiriye, ko têde dûr-dirêj, dabaşa vegera deh hezar leşkerê Yewnanî kiriye û dibêjî:

Di sala 401 de Keyxesro, ko jiber bavê xweve padîşahê Kebadokya bû, dixwest padîşahiya îran ji birayê xwe Erdeşêr bistênî. Ji bil ordiya Farisî, ordiya Kurtêlxwerên Yewnanî 13 hezar mirov di nav leşkerê Keyxesrode bûn. Çawa Keyxesro û serdarê Yewnanî Qelerxos hatin kuştin, Yewnanîyan ez kirim serdarê leşkerê xwe yewnanî. Lê ordiya Farisî xwe siparde padîşahê xwe Erdeşêr û em di çiyayên Kurdistanê, Kardoxî, çiyayê Zagrosve vegeriyan welatê xwe û me berê xwe da Pingava Reş û çûne Terebzûn.

Lê ji derbendê Zagros, Zaxo û hetta nêzîkî Terebzûnê miletê Kardoxî bi şer û talan û kuştin ji me venebûn û ji 13 hezar mirov, em deh hezar ji nav lepên wan hatin parastin. Gernas û tîravêjên dijwar bûn û dibêjî:

Em gihane devê gelîkî teng, ko gereke em têve derbas bin, tenê hate bîra min, ko eger em di gelîve derbas bin Kardoxî di karin me tevan bikujin. Lê dextê me sipî bû, ko me du mirov ji wan di serê gelî de girtin û min ji wanre got, egerwin rêkê di serê çiyêve rê me nedin, ezê we herdi

Tenê gelek li ber xwe dan û nedixwestin rê nîşanî me bidin. Lê min ew xapandin û vîlikek li wan çêkir, min yek girêde û xiste berçend leşkerên xwe û got, wî bibin pişt vî diyarî û bikûjin, lê bi dîzî min ji leşkerê xwere got, wî girêdin û werin û bêjin me ew kuşt. Ji tirsa, hevalê wî em di serê çiyêre birin û piştî ji gelî derbas bûn me ew berda û jêre got, hevalê xwe berde.

Mînorûskî dibêjî, di sedê heftê berî zayînê de di nav cugrafıya Ermenistanêde, tiştekî hêja hatiye dîtin, ko dibêjî, welatê kurçîx perçakî biçûk û nêzîkî bajarê Selmasê bû. Lê vê paşiyê bû navê hindamekî, ko ji Çolemêrgê û hetta Cizîra bota di nav xwede digirt. Ev çend bajarên ha di nav wê cugrafiya Kurçîxde bûn; Kurdox,Sîkurdox, kurdzîx, kurdîx, îtiwanx, îkarx, Moslox, Osolanx, Osîrox, Orsiyanx, Karasonîx , Sarabotîx, Çahok, Albak, Biçûk.

Mînorûskî, pêde diçî û dibêjî, Fostos, zimanzanakî navdar dibêjî, Kurdox, Kurdwîx, Temorîx li şûna welatê Kurdyenê kevnare hatine gotin.

Lê herwekû tê xuyakirin ji zimanê Ermenî ev navên ko Mînorûskî dibêjî, derketine, hatine guhastin û weke van navan Şerefxan jî çend navên wilo, yan nêzîkî van navan didî xuyakirin.

Korçikan, Oçikan, Çixûr, Kevendûr, Axtemar, Omok, Kelhok Kelxar, Tatîk, So. Çawa tê xuyakirin ev hindamên ha tev di welatê Rojkadene û gelek nêzîkî navên Ermenîne. Kurçîkan, Oçîkan ne dûrî navê Kurçîxîn û gelek diriste, ko kurmanciya kevnare bin.

SÊRTÎ:

Fon Mînorûskî dibêjî, miletek bi navê Sêrtî di kurdistanêde hebû û vê gotinê ji devê sê mirovên mezin diguhêzî, Lîway, Polîpîmoz, Wîsbax û dibêjî, di sala 220 berî zayînêde, ta bi sala sed û hivdehan(117) berî zayînê, ko şerek di nav bera Roman, Siloqîya û padîşahê Pîrxamûnde çêbû. leşkerê Sêrtî jî di nav şerde bû.

Mînorûskî, li pey gotina xwe diçî û dibêjî, Sêrtî, kurdên, ko ji welatê îran hatine û li welatê Kurdistanê, rojavayê welatê Zagros rûniştine û li şûna Kardoyên kevnare cî girtine û hin ji wan li bakûrê Sûriya jî rûniştine. Çawa, ko li çiyayê Antîtoros jî hene.

Lê Mihemed Emîn Zekî Beg dibêjî, diriste, ko Sêrtî navê bavikekî kurd bî, ko vê paşiyê bûye Sipayrd û Mark Saykes li bakurê Zaxo li wan rasthatiye.

Raste Sipayrd, navê eşîreke kurde, lê Sêrt, Sêrtê, navê bajarekî kurde, ko dikevî kurdistana bindestê Turka û di sî norê Bota û xerzan de ye û sierta navê bajarekî biçûk lî nav xerzaye. Lê ew ên li çiyayî Antîtoros Sîtî ne, ne Sêrtî ne.

MÛSRÎ- MİZÛRÎ:

Sêr Olmistîd dibêjî, Mûsrî, ko navê bavikekî kurd, Misûrî ye, ev Mizûrîyên îrone, ji çaxê Senharîbê Aşûrî, 705-682 berî zayînê. Hetta îro jî di navbera herdû çemên xazerde rû niştîne.

Mînorûskî, ji nivîsara, ko di sala 1907 de, li bajarê London hatiye çapkirin, derdixî û dibêjî Asagartiya ji welatê Sîstan rabûne û li welatê Aşûr, hindama Erbîl rûniştine. Navê mezinê wan Çatratexma bû, ko bi destê Dara padîşahê îran hatiye kuştin.

Li ser lateke bilind ji çiyayê Behsitûn, ayîna wî di gel ayîna Dara û hin padîşahên dî hatiye xuyakirin, rewş û pergala wî didin zanîn, ko mirovekî kurde.

Gelek diriste, ko Sertî-Sierdî, asagarta bin. Sêrt-Sierda heryek navê bajarekîne û Sierda navê bajarekî biçûk lı nav xerza ye. Espayrd navê eşîreke kurde li nav şêrwan dikevî.

Lê çawa tê xuyakirin kurdistana kevnare jî weke kurdistana îro perçe perçe bû û her perçak yan her eşîrek xwe dewletak nas dikirin û bi navê xwe dihatin hildan, weke, Botan, Behdînan, Soran, Baban, Erdelan.

ALAN:

Hin dibêjin, ev Alan di serê pêşîde li derbendê, Daryal, rûniştibûn. Bere bere gihane hetta Êlaxa Zozana û dawî ji ber Mexolan reviyabin û çûbin rojava û bi xwe ji nijadê Arîne û di êrîşên wande Kurdistan di nav xwînêde hate gevizandin.

Di Kurdistana rojavade şop û bermayên Alan têne xuyakirin, weke Memê Alan, gernasê çîroka Mem û Zîn, ko çîrokvan dibêjin ji weltê Mexrebzébînê hatiye Cizîrê û Aliyan û Alikan û Elikan.

## DEWLET Û WELATÊ LOLO

Welatê Lolo, baş nehatiye xuyakirin, lê weke, ko ji cog-



Institut kurde de Paris

rafiyên kevnare tê xuyakirin, ji rexê bakûrve, Zamwa, Namrî
û ji rexê jêrîve welatê Êlam û ji rojhilatve, Somî, Haşmar,
Harhar, Halman û ji rexê rojavade welatê Arapxa, Kerkûk bûn
ko diketin çar sînorên welatê Lolo.

Herwekû dinav vê hindamêde bajarên, Babît, Dagar, Bara,
Kakrî, Zîmrî, Hodon, Mesd, Meso, Arzîro, Ûzî, Kînya hebûn.
Çawa, ko çiyayên navdarên vî welatî Tîsîr, Kînya, Zergoyî,
Nîkdîm, Nîkdî, Êra, Sîmakî, Azîro, Kolar, Lalar, Sîwanî, Tî
şî Horman bûn.

Çemên navdar tenê Radno, Edîr bûn û welatê Lolo gelek
xweş û ava bû û Aşûrnasirbal padîşahê Aşûr gelek pesnê vî
welatî daye. Herwekû hin ji Lolobîyan anîne welatê xwe, ko
kar bi wan bikî.

ZÎMANÊ LOLO:

Hozîng, ko yek ji pêzanê zimanên rojhilata kevnareye, di
bêjî, gelek diriste, ko zimanê Lolo, weke zimanê Êlamî, ji
zimanên Qawqazî-Asyewî bî, lê eger em çê bala xwe bidin na-
vê padîşahên Lolo wê bê bîra me, ko zimanê Lolo gelek nêzî-
kî zimanê Horî, Mîtanî, Sobarî ye.

Lê bi rastî hêj zimanê Lolo baş nehatiye zanîn. «Kurd û
Kurdistan. Lê Ezîz Osman dibêjî, welatê Lolo, ew hindama ko
riya Bexda-Hemedan-Tahran di navre diçî, di nav xwede digrî
û miletê Lolo baca rîyan ji rêwî û kerwanan disitandin. Tev
lî, ko dijminê wan miletên, ko dinav Mezopotamya jêrê Cizî-
rê de hin dewlet çêkiribûn, lê hatin û hebûna welatê xwe di
firotin wan miletan û bazirganî bi wanre dikir. Hinek ji He
dareta wan miletên pêşveçiwî ji xwere girtibûn û hinek şi-
yar û pêşveçûbûbûn.

Di Sarîbol, Zihaw, Helwan de li hin şop û bermayên kevna
re rasthatine, ko gelek bi rûmet û giranbiha ne, çawa, ko
ew sitûna, ko Naramsîn, ko ji bo serdestî û xurtiya xwe ava
kiriye dîtine û di vê sitûnêde dûr û dirêjî serpêhatiya şe-
rê xwe di gel miletên Lolo, Gutî daye xuyakirin û nivîsiye.

Herwekû di latekêde hatiye xuyakirin, ko padîşahê Lolo-
bî divê bi kevanê bi destê xwe girtiye û lingê xwe daniye
ser pişta yekî dijmin û dixwazî tîrekê bavêjî, lê nivîsan-
din bigir winda bûye. Tenê navê padîşah Tarlonî, padîşahê
Lolobî daye nîşandan. Xweş tê zanîn û xuyakirin.

Herwekû di vedaneke dîde hatiye xuyakirin, ko li Sarîbo
lî derketiye, didî xuyakirin, ko ayîna padîşahê Lolobî, A-
nobanînî di latekêde hatiye kolan, sîng vekirî, riheke çar
goşe, kum gilover, bilind,kiras kin, ji çermê teba hatiye



Institut kurde de Paris

çêkirin. Li pêşber xwedê Nînî rawestiye, destek bi kevan û destek bi balte lingê xwe daniye ser pişta dijminê xwe û Nînî, ko jineke, taceke giranbiha daye serê xwe, kinc direêj, ji çermê teba, destê xwe dirêj kiriye destê padîşah û bi destekî serê werîsekî girtiye, ko du kirovên dîl pê hatine girêdan û serê xwe ji xwedê re xwar kirine û gerdanxwariya xwe ji padîşahre dane xuya kirin.

Çawa, ko di jêrê latêde şeş mirovên dîl destên wan li pişt sitiwê wan girêdayî û tazî rawestiyane, hêvîyan ji xwedê dikin.

Ev reng nivîsar gelek bi rûmet û giranbihane. ji ber ko diwê çaxêde nivîsandin hêj neketibû welatê Îran û gelek diriste, ko Lolo ev hedaret ji Akadiya sitandibî.

Lê Mihemed Emîn Zekî Beg dibêjî, ev miletê Lolo di serê pêşîde li hindama Zihaw-Helwan û Şehrezûr û Suleymanîde rûniştî bûn û em nizanin kengî hatine vî welatî û tiştê, ko hatiye zanîn eve, ko Lolo di gel miletê Gutî, Goto, Coto ser bi xwe divî welatîde bû.

Lê nivîsarek di hindama Zihaw-Helwan de derketiye, ko di sala2800 berî zayînê hatiye nivîsandin û ji Anobanî, padîşahê Gutî û Lolobî, mijûl dibî û dibêjî, welatê Helwah - Zihaw jî di destê miletê Lolo de bû.

Li gora gotina dektor Sipayzer dibî, ko çend padîşahên Aşûrî di sedê 19 û 18 ê berî zayînê de ji vî miletê Lolo bin û hinek ji van Lolobîyan di welatê Sûriyade rûniştîne.

Di çaxê Sargon, padîşahê Akadî de navê padîşahê Lolo Lasîrab bû û li gora wê nivîsara, ko li ser destê Mêcer Son, li çiyayê Qeredax derketiye û ji padîşahê Akadî Naramsîn, mijûl dibî û dibêjî, Naramsîn, bi leşkerê xweve çûye ser welatê Lolo û bi carek xistiye bin destê xwe, lê leşkerê Guttî hatiye hana Lolo û leşkerê Akadî şikandiye. Gereke, ji wê çaxêde miletê Lolo, bi alîkariya miletê Guttî serbixwe û gerdenazad mabî.

Lê piştî vê serpêhatiyê bicarek serpêhatiyên Lolo serbixwe nehatine xuyakirin û dîtin. Tenê di gotinê hin padîşahên Aşûrî de tê xuyakirin, ko Lolo, digel Kasî, Guttî, Sobarî jî çend çax û demên'xwe rabiwardine.

Herwekû di çaxê Naramsînde navê padîşahê Lolo Satanî bû û diriste, ko Naramsîn ev padîşahê Lolo şikandibî.

Mihemed Emîn Zekî Beg, pêde diçî û dibêjî, di çaxê Tîglat Pelayzer û Edadnîrarî û Tokoltînînorta, padîşahên Aşûrî de şerên xwîndar û talan û şewat li ser destê Aşûr di welatê kurdistande çêbûne û Lolo gelek zor û setem ji destê wan dîtine.

Herwekû Nasirbalê diwem, hatiye ser welatê Lolo û di navbera sala 884-880 de, yanî di çar salande çar cara hatiye ser Lolobîyan. Di wê çaxêde di bin destê padîşahê Kardoniyaşî-Babilîde bûn û di derbendê Babît Bazyanve ketiye welatê Lolo û bajarên Babît, Dakar, Bara, Kakrî û 20 bajarên dîjî xistine bin destê xwe, çawa, ko bajarê Zîmrî paytexta Lolo jî talan û wêran kirin.

Li gora gotina Olmîstîd, ko ji tarîxa Aşûr diguhêzî, di bêjî, padîşahê Lolo Amêxa bû, ko di gel leşkerê xwe jî ber Aşûrîya şikest û ketin serê çiyayê Nîsîr, Kînîya, Pîremegrûn, lê paşê li ser destê kurê Nasirbal û li ser bextê wî hatin rayê û xwe dane destê dijmin û kurî Nasirbal, ji bo vî şerî sitûnek avakirye û ev serpêhatî têde nivîsîye.

Çawa, ko Şelmanser di sala 859 de hate ser welatê Lolo û bajarên Zamwa, Namrî xistin bin destê xwe û navê fermandarê Namrî Merdok bû, ko ji ber Aşûrîya reviya û kete serê çiya û di sala 829 de bi vî padîşahî bajarê Kurxî jî xiste bin destê xwe.

Şelmanserê siyem, di sala 773 berî zayîne ji ber Sarodîs padîşahê Orarto, Xalidî reviya û welatê Lolo kete destê Orarto Xalidiyan.

Herwekû di sedê heştê berî zayînêde, welatê Zamwa kete destê Aşûriya û yekî Aşûrî bi navê Apîla bi fermandarî têde rûnişt û navê vî welatî kire Lolom.

Xuya dikî, ko Zamwa, perçak ji welatê Lolo bû, lê axakî xweser têde fermandarî dikir, herwekû diriste, ko Namrî jî cihê axakî bû. Gelek diriste, ko Lolo bixwe navê eşîreke mezin bî û Mihemed Emîn Zekî Beg dibêjî, Diriste, ko Namrî hindama pêşdar û serdeşt bî. Belam navê Nemîrî, Nemêran,Nemirî navê xelkê hindama Hîzanêne, lê diriste, ko ji cîkî dî hatibin vê hindamê.

Di kurdistanêde bivî navî Lolan, Loran navê du eşîrên ku din û liwî navê hindamekêye û Lololan, navê eşîreke kurde, ko dikevî sînorê Barzan û mala şêx Reşîtê Lolan û navdarin.

XALDÎ Û MÛŞKÎ:

Sîdînî Simît, dibêjî, li hawîr Gola Wanê miletekî taze, bi navê Xaldî hate xuyakirin, ko di sala 1260 berî zayînêde, Şelmanser padîşahê Aşûr ji wan mijûl bûye. Navê welatê wan Orarto yan jî Erarat bû. Gerçî rasta rasta navê wî ji meve nehatiye xuyakirin. Lê li gora baweriyeke tevayî, ko navê xwedayê wan Xaldiyan bû. Ji lewra pêzanê tarîxê dibê-

jin, gereke navê vî miletî jî Xaldî bî û dibêjin, gereke ji miletên Qawqazî-Asyewî bî.

Lê Fon Mînoroskî dibêjî, ev navê Xaldî di nav Orarto yan Aşûrîde bêtir hatiye naskirin. Di serê pêşîde li çiyayê Erarat bûn û ev miletê Xaldî ye, ko di sedê nehê berî zayînêde di welatê Ermenistande dihate xuyakirin. Lê paşê di welatê Wanêde dewletek li darxistin û hetta bi sedê şeşê(6) berî zayînê jî her bivî navî xwedî nav û nîşan û bi rûmet bû.

Lehmanhopt, dibêjî, li gora nivişta Gotîgen dibêjî, gereke di nav van Xaldiyande hin miletên bêgane jî hatibin. Ev nivişt di sala 1907 zayînde hatiye çapkirin.

Ehmed Refîq Beg, di tarîxa tevayîde dibêjî, ev Xalidî, hêj li welatê xwe rûniştîne û têkelî miletê Ermenî bûne.

Fon Mînorûskî, li ser gotina wî diçî û dibêjî, di sedê heftê zayînêde û di çaxê hatina miletê Ermenîde Xalidî ketine serê çiya û belav bûne. Lê li hêla Wanê, hêj navê wan winda nebûye û bajarê Xelat dibî, ko ji bajarên Xalidiyan mabî.

Lê navê Xalidî niha bûye navê çend eşîrên kurd, ko bi mêranî deng dane û pirên wan Êzdî-Yezdanî, li ser ola Zardeşt mane. Li nav Bota, Xerza û di hindama Bedlîsde eşîrên Xaldî-Kurdî bi payedarî xwe dane nîşandan, herwekû dibî,ko li Şengalê jî hebin û li nav Xerza jî mabin û dibêjin malê mîrê botan.

ZİMANÊ XALDÎYAN:

Xwediyê nivişta tevayî Ehmed Refîq Beg, dibêjî, zimanê Xalidiya nêzîkî zimanê Gurcî, Lazî ye.

Lê bê goman ji kurmancî pêve tiştekî dî nizanin û paytexta wan bajarê Toşpa-Wan bû û padîşahê Aşûrî Tîglat Pelayzerê diwem, di sala 743 berî zayînede bi leşkerekî giranve hatiye ser van Xaldîya û gihaye hetta bajarê Toşpa - Wan, Porsîba, Toroşpa. Lê van Xaldiyan şerekî giran bi dijminê xwere kirine.

Lê paşê ev dewlet li ser destê miletê Mîdî, hate hilweşandin û gelek diriste, ko bi xwe wan mezinahiya Madiyan li ser xwe kêmasî nedîbin û xwe sipardibin pismamên xwe û bi hevre çûbine şerê dijminê xwe, dewleta Aşûrî.

MÛŞKÎ:

Sîr Sîdnî Simît, dibêjî, di sedê yazdah(11)ê berî zayînêde, di çaxa wêrankirina Împaratoriya Hêtîtde welatê Kur-



Institut kurde de Paris

distana jorı kete bin destê miletê Mûşkî û nêzîkî pêncî sa lî di bin destê wande ma.

Vî miletê nûhatî, ji jêrê welatê Kebadokya-Kilîkya jî xistin bin destê xwe. Roman ji vî miletîre digotin Mûşî û paşê van mûşîyan xwestin, ko rojhilatê Gola Wanê jî bixin destê xwe. Lê ji wan re li hevnehat û di sala 1110-1100 berî zayînê li ser destê padîşahê Aşûr, Tîglat Pelayzerê yekem, ev Mûşkî şikestin.

Belkî daxwaza Sîr Simît, ev şerê ko di sala 1110 - 1100 berî zayîne, ko Tîglat Pelayzerê yekem, hatiye ser welatê Sobar bajarê Şereş, Şêrş yan Şûş û Mûşkî, Sobarî, Kartî bi hevre şerê dijminê xwe kirine, çi di kurdistande bi van navan maye.

Şêrş, navê gundekî li deşta Hesarê heye. Şûş, navê Keleheke navdare li nav Badînan heye, Şorş, navê paytexta Dinbila li çiyayê mazî heye û Kurtika, navê derebegiyeke kurd li nav Silîva-Xerza heye û Gurdika, navê keleheke hindama Şêrwaye, Gurnî, navê keleheke kurdî li hêla Xerza heye, Kûdê, navê gundekî li nav Omerîya heye, Gerda, navê bavikekî ji eşîra Bûbilaneye û deşta Gerda li rajorê Diyarbekire.

Çawa, ko Mûş, navê bajarekî kurd li jorê Wanêye, Mûşîka navê eşîreke kurd li nav Qewma dikevî, Meşkîna navê eşîreke kurde li hêla Mardînê li rojavayê Mardîn rûniştine.

## HORÎ-HORANÎ-HEVÊRKÎ

Horî, kîne, ji ku hatine?

Berî sê hezar sal pêş zayîn, ev miletê Horî di hindama, ko dikevî navbera çiyayê Zagros(Zago) û Feratde rûniştîne, ko ji hindama Mezopotamya tê jimartin. Lê bi navê Sobar-Sobaro-Sobarto hatiye xuyakirin, lê paşê navê Horî, ketiye şûna Saboro.

Zanayên tarîxê gelek li ser navê Horî xebitîne, ko jimere bidin zanîn û dawî dane xuyakirin, ko zimanê Horî, weka zimanê Somerî-Asyewî ye. Hin dibêjin, Arî ye û bi tîpên mîxî hatiye nivîsandin, çawa, ko di zimanê Kaşî-Kasîde jî, wilo hatiye xuyakirin.

Ji lewra hin zana dibêjin, Gotî, Kaşî, Somerî, Horî yek miletin û koka wan yeke û mezinên Horî,Kaşîyan ji miletê Arîne. Lê hin dibêjin, ji ber, ko di sînorê Ariyande bûn, yan ji ber, ko Arî ji welatê xwe rabûne û hatine vê hinda-

mê û têkelî miletên kevnareyên vê hindamê bûne, rengê Arîtî biser van miletên kevnare û zimanê wande hate berdan û xwe di bin navê Arîde winda kirin û tev bûne Arî. Lê hêj zana divê meydanêde negihane dawî û gelek divê, ko em zimanê Horî qenc nasbikin û çavnêrîya pêzanên tarîxê dikin, ko wan nivîsarên, ko bi zimanê Horî hatine nivîsandin ji hev vewejêrin û rastiyê bidin xuyakirin, bêka ji çi nifşê zimanaye, wê çaxê kok û bingehê miletê Horî jî tê xuyakirin.

Dinav kolan û vedanên Ogarît-Rasişemer de hin nivîsar û bermayên Horî hatine xuyakirin, ko didin zanîn, ko berî hingî Sûriya-Ogarît ketibûn bin destê miletê Horî, Sobarî, Mîtanî.

Berî zayînê bi hezar û pêsed (1500) salî,miletê Horî welatê Sûriya bicarek xistibûn bin destê xwe, yanî berî îro bi 3400 sal Horiyan Sûriya, xistibûn bin destê xwe, Yan ji jêrê Sûriya û heta çiyayê Zagros ketibû bin destê Horiyan. Çawa, ko Misriyan ji Felestîn, Sûriyare digotin welatê Horî û Heksûs jî, ji welatê Horiya dijmartin û di serê şazdehan(16) berî zayîn de ev Horî gelek xurtbûn û welatê wan gelek fireh bû.

Tenê di vê navêde Horî bûne du perçe û bi navê Mîtan û Horî du dewlet li darxistin:

Horî, ketin rajorê Hilal il xesîb û paytexta wan li şûna bajarê Ûrfa(Riha) îro bû û welatê wan ji çiyawê Zagros û rajorê Cizîre, navbera herdû avan û heta bi çemê Xabûr, fireh dibû. Tenê sînorê welat û dewleta wan ne gelek eşkeraye, lê bajarê Nûzî, ko dikevî hindama Kerkûk, di destê wande bû û carna dibû paytexta wan jî. Çawa, ko bajarê Rezîna, ko îro em jêre dibêjin, serêkanîyê, yek ji bajarên wanên navdare û di Kerkûkêde vê paşiyê hin nivîsar û bermayên Horiya hatine dîtin, ko gelek giranbiha û bi rûmetin. Ji mere di tarîxa Horî de awireke xurt didin şanîdan lê hê jî têrê nakî. Ev nivîsar bi tîpên mîxî hatine kolan û nivîsandin.

Van Horiyan welatê Sûriya peravên avê Ogarît xistine destê xwe. Herwekû Qetena, ko niha jêre dibêjin Til jî girtine. Nêzîkî bajarê Himis û Felestîn jî bi ser welatê xweve berdane. çawa, ko vê paşiyê pêzanên tarîxê hin qermît dîne, ko bi gelek ciya navê miletê Horî li ser wan hatiye nivîsandin.

Lê heta îrojî, tarîxa welatê Horî veşartî û nenas maye û baş nehatiye zanîn. Lê dibî, ko dinav wan nivîsar û kolan û vedan û bermayên Horiyande, ko li hindama Ogarît der

ketine zêde tarîxa Horî û zimanê Horî bêne xuyakirin û ji mere bidin zanîn.

## WELAT MİLET Û ZİMANÊ MÎTAN

1- WELAT, MİLET Û ZİMANÊ MÎTAN:

Sînorên welatê Mîtanî bêtir xuya û eşkeraye. Jiber, ko dinavbera Xabûr û Feratde bûn û carna ber bi rojava û rojhilatvejî ev welat fireh dibû. Paytexta wan Waşoganî-Wasoganî nêzîkî serê kanîyê bû.

Tarîxa Mîtanîya, yan Horê rojava, ji tarîxa Hora bêtir, xuya û eşkeraye. Di şerê Tehotmisê siyem, ji padîşahê Misrê de ev Mîtbi leşkerê Sûriyave şerê leşkerê Misrîyan dikirin û dixwestin leşkerê Misrî ji Sûriya derxin. Lê naçare, herdû leşker Mîtî û Sûtrî ji ber leşkerê Misrê bipaşde vekişiyan û xerac dane Misriya.

Di sala 1450 berî zayînêde padîşahê Mîtanî Şûştar êrîş bire ser welatê Aşûr û bizor xiste bin destê xwe û sînorê welatê Mîtanî, giha hetta welatê Guttî-Goto yan çiyayê Zagros, ji rexê rojhilatve. Çawa, ko ji rexê rojavave Pingava Sipî û ji rexê rajorve sînorê vî welatî giha Pingava Wan û ji rexê rajêrve welatê Misrê bû. Yanî ji sînorê Misrê jêrê Felestîn û heta Gola Wanê berjor dibû û ji Pingava Sipî û hetta çiyayê Zagros fireh bûbû. Yanî Felestîn, Sûriya, Libnan, Cizîre, rajorê İraq, rojhilatê Turkiya îro, dibin destê dewleta Mîtande bûn.

Lê çawa Şoştar, padîşahê mezin, serê xwe danî, kurê wî, Ernatama, kete şûna bavê xwe.

2- ERNATAMA, KURÊ ŞOŞTARÊ MEZİN: Di çaxê vî padîşahîde dostanîyeke xurt di navbera Mîtan û Misriyande çêbû. Tehotmiê çarem, keça Ertanama ê yekem ji xwe re xwest û anî û di hember miletê Hêtîtde destê xwe dan hev.

Ji vir tê xuyakirin, ko di wê çaxêde miletê Hêtît serê xwehilda bû û herdû alî gelek ditirsiyan û dixwestin tenê karibin welatên xwe biparêzin

Lê di wê navêde herdû padîşahên Misr û Mîtan, serê xwe danîn û mirin û Emnehotib, kurê Tehotmis bû padîşahê misrê û Şoştarna, kurê Ernatama kurê Şoştarê mezin bû padîşahê welatê Mîtan.

Institut kurde de Paris

3- ŞOŞTARNA, KURÊ ERNATAMA KURÊ ŞOŞTARÊ MEZİN: Çawa Ernatama serê xwe danî, kurê wî Şoştarna, kete şûna bavê xwe. Padîşahê Misrê, Emnehotib kurê Tehotmis, keça xalê xwe anî û markir û padîşahê Mîtan, Şoştarna gelek diyarî û perwa xeml û xêz bi bûkêre ji xwarziyê xwere şandin, tenê gelek neçû Şoştarna serê xwe danî. Piştî mirina Şoştarna, zariwên wî bûne du perçe, Hetîtan alîkariya Ertanama kirin.

4- ERTANAMA, KURÊ ŞOŞTARNA, KURÊ ERTANAMA, KURÊ ŞOŞTARÊ MEZİN: Çawa bavê wî, Şoştarna, serê xwe danî Ertanama bi alîkariya Hêtîtan bû padîşahê Mîtaniyan. Lê Misrîya bi destê, Toşrana kurê Şoştarna girtin û li ber birayê wî rakirin û kirin padîşahê Mîtan.

Di vir de welatê Horê mezin perçe kirin, kurek bi alîkariya Hêtîtan bû padîşah û navê welatê xwe kire Horî û kurek bi alîkariya Misrîyan bû padîşah û navê welatê xwe kire Mîtan .

5- TOŞRANA, KURÊ ŞOŞTARNA: Çawa, Hêtîtan destê xwe dane Ertanama, kurê Şoştarna, Misrîyan ji tirsan destê xwe dane, Toşrana, kurê Şoştarna û kirin padîşah û şerên xwe bi xwetî di nav herdû birande destpêkirin û welat di nav xwînêde hate gevizandin û talan û şewat bi ser welatê Mîtan-Horîde hatin barandin û rijandin.

Herwekû ji kevnarede ev karê miletê kurde, ko dijmin ew berdidane hev û dawî welatê wan dikete destê dijmina. Padîşahê Misrê keça Toşrana markir û padîşahê Mîtanî keça xwe bi xeml û xêz û diyarî şande ji padîşahê Misrêre.

Herwekû çawa Emnehotib nexweş ket û şende cem xezûrê xwe, ko Aştar bişênî, Aştar xwedanê Aşûriya bû, ji lewra tê xuyakirin heta wê çaxê jî, welatê Aşûr di bin destê Mîtaniyande bû. Padîşahê Mîtanî Toşrana, Aştar ji zavayê xwere şand, ko wî xweş û sax bikî.

Lê Emnehotibê siyem, serê xwe danî û kurê wî Emnehotisê çarem, kete şûna bavê xwe û jinbava xwe ya ciwan û xweşik Tadokya, keça Toşrana padîşahê Mîtan markir. Hin tarîxzan dibêjin, ev Tadokya, padîşahê Misrê ya navdar Nefertîtîye.

Çawa Emnehotibê çarem hate ser textê dewletê, padîşahê Mîtan, Toşrana nivîsarek ji bo serxweşî û dilxweşî rêkire Misrê ji zavayê xweyê nûre.

Lê di sala 1370 berî zayînêde ev padîşahê Mîtanî bidestê kurê xwe hate kuştin û careke dî şerê xwe bi xwetiyê kete navbera ap û birazî. Ertanama, kurê Şoştarna, ko bı padîşahê Hor navdarbû, doza padîşahiya Hor û Mîtan kir û dirêjî welatê biraziyê xwe kir û bû hevalbendê Aşûriya û bi-

zor welatê Mîtan bi ser welatê Horîve berda û weke bavê xwe bû padîşahê herdû welatan û sînorê welatê xwe careke dî fireh kir.

Lê kurê Toşrana ê biçûk Matîweza reviya û çû Babil.Çend mirov û mezinên welêt û dewletê pêre çûn, lê padîşahê Kardoniya ê Kaşî, bi çavê dijmina lê nerî û dixwest wî bikujî.

Ji lewra bi hêla linga xwe, ji nav lepê wî derxistin û çûne cem padîşahê Hêtît Şobî Loloma. Padîşahê Hêtîta gelek rûmeta wî girt û keça xwe lê markir û serdariya kurê xwe leşkerekî mezin şande ser welatê Hor-Mîtan û zora Ertanama birin û welat careke dî kirin du perçe Horî û Mıtanî.

6- MATÎWEZA, KURÊ TOŞRANA: Bû zavayê padîşahê Hêtît Şobîloloma û bû padîşahê welatê Mîtan. Lê diwê navêde Şobîloloma serê xwe danî û kure wî Basîl bû padîşahê Horê rojava, yanî nîvê welatê Mîtan kete destê kurê padîşahê Hêtît, Basîl kurê Şobîloloma. Li ser vî awayî peymanek di navbera xwede girêdan. Zanayê tarîxê vê paşiyê ev peyman li Boxazköyî bi zimanê Akadî dîtine.

Tenê gelek neçû Aşûriya herdû perçe jî xistin bin destê xwe.

## ŞERÊN HÊTÎTAN Û KURDÊN HORÎ Û MÎTAN

Herwekû ji nivişta Dektor Ezîz Osman, tê xuyakirin, welatê Mîtan-Horî-Horanıyan, ji rexê jorîve Gola Wan û ji rexê jêrîve Misrî û ji rexê rojhilatve çiyayê Zagros û ji rexê rojavave welatê Hêtît û Pingava Sipî bûn. Di wê çaxêde welatê Aşûr, Nînova di bin destê Horî û Mîtaniyande bû.

Welatê Babil di bin destê Kurdên Kaşî-Koş-kasîde bû. Ji lewra gereke em hinekî ji serpêhatiyên sînordaşên dewleta, Mît-Horî jî bidin xuyakirin.

1- HÊTÎT: Herwekû tê zanîn, ev Hêtît ji miletên Arî ne. Çawa, ko dibêjin, hin ji êl û eşîrên Arî, ji jêrê welatê Rusiya rabûn û bûne du bir. Yekê berê xwe da welatê rojhilat û gihane heta Hind û Îran, Kurdistan, Efxanistan. Bira dî ber bi rojavade berjêr bûn û li Ewrûpa, Belqan belav bûn . Eşîrek bi navê Nîz hate rojhilatê Enadol û di wirde rûniştlê berî wan miletek bi navê Xatî-Hêtît rûniştîbû û bere bere mêvanên nûhatî tevlî miletê kevnare bûn û navê xwe dinav wande winda kirin û bûne Hêtît. Li ser çemê Halîs( Qi-

zilêrmeq) paytexta xwe ava kirin û ev milet bizor xistin bin destê xwe û navê Hêtît ji xwere sitandin.

Lê hetta îro jî, hêj serpêhatiyên Hêtîtên kevnare bi destê me neketine û tarîxzana nedane xuyakirin. Tenê di ça xê Naramsînê Aşûrîde, ko bi leşkerekî mezinve çûye şerê 17 padîşah, serekên eşîran, ko li welatê Zagros şerê Aşûriya dikirin, bi navê Bamba, navê mezinê Hêtîta tê xuyakirin,ko ew jî, yek ji wan hivde(17) serekan bû, ko şerê Aşûriyan bi hevre dikirin. Lê weke, ko tê xuyakirin ev hivdeh serek ne padîşah bûn, belkî hemî serekê eşîrên kurd bûn û dibî jî,ko hin bêgane jî dostê wan kurdan bin û bi wanre şerê dijminê xwe kiribin.

Vê paşiyê li Qebadoqya, hin nivîsar derdiketin, ko bi zi manê Babilî bûn, ko didin xuyakirin, ko bajarek bazirgani , li vê hindamê hebû, ko di bin destê Aşûriyade bû. Lê eşîra Nîz bizor ji wan sitand. Berî zayînê bi 2000 sal miletê Nîz ev bajar ji Aşûr sitandiye û dewleta Hêtîta kevnare tevlî-hev hate li darxistin.

Navê padîşahê pêşîyê dewleta Hêtîta kevnare, Bîtana bû. Piştî wîre navê kurê wî Anîna bû, ko di çaxê vîde welatê Hê tît hinek fireh bûye û ji Pingava Sipî, gihandiye Pingava Reş û paytexta wî Hatûşa, yan Hatay bû, ko îro de kavilê vî bajarî li hindama Boxazköyî têne xuyakirin.

Navê Anîna bû padîşahê mezin û bajarê Nîza fireh û mezin kir û xaniyek ji xwedanê Ezmanare li paytexta xwe avakir.

TODİLYAYÊ YEKEM:

LABARNAŞ: Di çaxê Labarnaşde welatê Hêtît gelek ava û fireh bû. Bi rastî ev mirovê, ko hîmê dewleta Hêtît bi xur tî daniye. Jiber, ko vî welatê Hêtît li hev ragirt û kir yek perçe û bicarek xist bin destê xwe.

HATOŞÎL, KURÊ LABARNAŞ: Wî jî daser şopa bavê xwe û xwest, ko welatê Heleb, bixî bin destê xwe. Lê jêre li hev nehat. Jiber, ko şer û sergêjî gelek di riwê wîde rûdan û serê xwe danî.

MORSÎL, KURÊ HATOŞÎL : Çawa bavê wî serê xwe danî, bi gernasî kete şûna bavê xwe û di çaxê wîde sê şerên mezin bi dijminên xwere kirin.

Di şerê pêşîde Heleb, xiste destê xwe. Di şerê diwemde, Horî-Kurdî, ji Sûriya leşkerê xwe kişand û ji ber Hêtîta re viyan û welatê Sûriya ji dijminê xwere berdan. Di şerê si-yemde dirêjî welatê Babil kir û leşkerê dijmin şikand û we lat talankir û wegeriya welatê xwe.

TİLBÎNO: Lê tiştek ji serpêhatiyên vî padîşahî nehatiye xuyakirin, tenê weke, ko tê xuyakirin, di çaxê vîde dewleta Hêtîta kevnare winda bûye û vî padîşahî nikaribû welatê xwe biparêzî.

2- DEWLETA HÊTÎTA NÛHATÎ:

Nêzîkî sed salî welatê Hêtît bê deng û dewlet maye. Xuyaye, ko ew jî ketine bin destê Aşûran.

Lê di sala 1420 de berî zayînê Todalyayê diwem bû padîşah û careke dî welatê Heleb xiste bin destê xwe û ji kurdên Horî sitand. Lê piştî mirina wî careke dî Heleb kete destê Horiyan(Mîtana). Lê careke dî û li ser destê Hatûşîlê diwem Heleb kete destê Hêtîtan û padîşahê Helebê Mîtanî Horî xwe da ber siya dewleta Hêtît û jêre sûnd xwar û bû yek ji fermandarên wî.

TODALYAYÊ SİYEM:

Piştî, ko Hatoşîl, serê xwe danî, ev Todalyayê siyem hate ser text û di çaxê wîde gelek sergêjî û lephilanîn Şowreş di welatê wîde rûdan û di nav wan sergêjîyan de hate kuştin.

ŞOBÎLO-LOBOMA:

Piştî Todalyayê siyem, bû padîşahê Hêtît. Ji mezinê padîşahê Hêtîtên navdare. Ji sala 1388 û heta sala 1347 ê berî zayînê padîşah maye. Li gora nivîsarên kurê wî Morsîl, çax û demên wî bi sê perçan hatiye parvekirin:

Di serê pêşîde êrîşên xurt birne ser rajorê Sûriya, ko dibin destê padîşahê Mîtanî-Horî, Torşanade bû, lê hate şikandin û bi paşde vegeriya û hate bîra wî, ko ji rarojve êrîşî welatê Hor-Mîtan bikî. Dubendiya Hor û Mîtanîya jixwere pîrozî dît û ji bo vê yekê, destê xwe dirêj kire destê Ertanama, padîşahê Mîtan-Horî. Bi vî rengî, hinek ji rajorê welatê Mîtan xiste bin destê xwe û paşê êrîş bire ser paytexta welêt Waşoxana.û bizor xiste bin destê xwe. Lê Kelgamêş-Cerablus, di destê Mîtanîyade ma. Heleb careke dî kete destê Hêtîta û bajarên Walalax, ko nêzîkî gola Umiq dikevî, bizor xiste destê xwe û Atakama, kurê Toşrana, padîşahê Mîtana di bajarê Qetenede dîl girt û paşê li hev hatin.

Lê Mişto, padîşahê Mîtanî, ko li Ogarît bû, reviya û çû welatê Misrê û Hêtîta, Ogarît bê şer xistin destê xwe. Şobîlo-loma, welatê Sûriya ji Mîtana sitand û biser welatê xweve berdan. Herwekû padîşahê Misrê Emnehotib, jibo vê

xurtî û pêşveçûnê pîroznamak jêre rêkir û di binve, bin lingê wî dikola û vîlik lê digerandin.

Çawa, ko padîşahê Amoro, ko navê wî Azîzo bû, bû hevalbendê Hêtîta û welatê xwe liser kelaşê Mîtanîya hinek fireh kir û hin ji Sûriya biser xweve berda.

Ebdeştra, kurê Azîzo, bû hevalê Hêtîta û dijminîhiya Misriyên, ko li Sûriya mabûn kirin. Bi vî rengî, Hêtîta welatê Sûriya perçe kir û roj biroj cihê lingê xwe têde xurt û fireh dikir.

QÛNAXA DÎWEM:

Ev qûnax ji 1378 û hetta sala 1358 berî zayînê dirêj dikî. Di vê navêde Şobîlo-loma, ji Sûriyê vegeriya û berê xwe da welatêrajor. Misriya, jêrê Sûriya ji xwere asêkirin û têde man. Lê Şobîlo-loma digava siyemde, ko Toşrana serê xwe danî bû yan bi destê kurê xwe hatibû kuştin, destê xwe xiste nav welatê Mîtan û Hor û berê xweda dijminahiya padîşahê Mîtan, Ertanama, birayê Toşrana, ko bi alîkariya Aşûra bûbû padîşahê Hor û Mîtan û alîkariya Şotarna kir û ew kire padîşahê Mîtan û jiber xweve bi fermandarî danî û bivî rengî şerê xwe bi xwetî di welêtde destpêkir. Şobîlo loma li wan temaşa dikir û dikeniya û dixwest dijminê wî, wîlo xwe bixwe hevdî bikujin.

Lê çawa Matîweza, kurê Toşrana, ji Babil reviya û hate cem Şobîlo loma, Şobîlo loma keça xwe da Toşrana û bi serdariya kurê xwe, Basîl, leşkerekî mezin pêre şande ser Ertama, ko bi alîkariya Aşûr welatê Hor û Mîtan bizor xistibû bin destê xwe û bira û birazayên xwe ji welêt derxistibûn. Leşkerê Hêtîtan welatê Hor û Mîtan bi zor ji Ertama sitandin û Basîl bû padîşahê Hor û Matîweza, bû padîşahê nêvî ji welatê Hor û Mîtan, lê di bin siya padîşahê Hêtît de rûnişt. Telbîno, kurê Şabîlo loma, padîşahê welatê Heleb, lê bi kurtî.

Di sala 1180 berî zayînê, welatê Hêtît û welatê Mîtan û Hor û jorê Sûriya bicarek ketin destê Aşûriya.

Matîweza, bi kurdî, bi daxwaza mirî û sêfîle. Herweku, ev pesinê ha gelekî xwe li vî padîşahê kurd dixun, bi rastî jî mat û weza bû mirî û sêfil bû.

HEVSÎNORÊ MÎTAN, MİLETÊ AŞÛR :

Jiber, ko gelek serpêhatî û şer di navbera kurd û Aşûrde çêbûne, gereke em divirde hinek ji Aşûr bipeyivin û sînordaşê xweye kevnare nasbikin û hina ji wan serpêhatiyan, bidin naskirin.

# KOKA MİLETÊ ASÛR Û WELATÊ ASÛR

Di rajêrê welatê Sobar, kurdên kevnarede çend bajar he-
bûn, ko Aşûr li hêla Mûsilê di wan kevnebajarande rûniştî-
bûn. Gava em bixwazin welatê Aşûr rast bidin zanîn, em di-
karin bêjin, li rajorê Aşûr welatê kurdê Sobar û li jêrê
wan welatê Babil û li rojava welatê Hor û Mîtan û li rojhi
lat welatê Gottî bû.

Lê çawa hate zanîn, di serê pêşîde, ev çend bajarên A-
şûr di bin destê Mîtan û Horiyande bûn. Lê çawa tê xuyaki-
rin, ko wan jî ji berberî û dubendiya Hor û Mîtan kareke
mezin dîtine û fersende ji wan re hatiye, ko xwe pêk bênin
û tekûz bikin. Piştî pêlake dirêj leşkerê Aşûr pijiqî û
rojhilatê navîn bicarek xiste bin destê xwe.

Lê bi koka xwe dighên Somariyan, ko di jêrê welatê wan-
de xwedî dewlet û bi nav û deng bûn. Ev Somerî, mirovên he
rî kevnarene, ko di vê hindamêde rûniştine û herdû yek ni-
jadin.

Lê hin dibêjin, Somer berî hingî di jorê welatê Aşûrde,
di çiyayê Sobarde bûn û paşê daketin ber ava Pingavê vî we
latî.

Di sala 3000 berî zayînê Aşûr ji Cizîra Ereb berjor bû-
ne û hatine jêrê welatê Sobar yan jêrê Mûsilê cî girtine.
Navê welatê xwe kirine Aşûr, herwekû navê paytexta wan jî
Aşûr bû. Lê hin dibêjin paytexta wan Nînowa bû, lê diriste
ko piştî Aşûr, Nînowa bûbî paytext.

Ji kevnarede avanî, pêşvaçûn, di jorê welatê Mûsil, we-
latê Somerde bû, yan ji wir destpêkiriye. Lê dawî kete jê-
rê Mûsil, Nînowa û welatê Sobar kete nav şer û sergêjîya û
bi paşde ma. Carna xwe li ber êrîşên dijminê xwe, Goto, Ka
şî û carna jî , Somer û Akad û Babilî, yan êrîşî wan çend
eşîrên paşde mayî dikirin û zor û setem biser wan de diba-
randin. Herwekû Mîtan û Hêtîtan carcar erîşî wan dikirin û

Institut kurde de Paris

dixwestin bixin bin destê xwe.

Lê çawa Aşûrî hatin jêrê welatê Sobaro(Sobarto) tevlî wan êl û eşîrên weza û sêfil bûn. Hin eşîrên Samî jî, hatin nav wan û teva hevdî girtin û bihatina êl û eşîrên nûhatî gelek xurt bûn û ji van gelan tevan gelê Aşûrî hate meydanê.

Ji serhişkiya wan gelên çiyayî û sernermiya wan gelên deştî gelekî serhişk, dijwar, dirinde, xwînrêj derkete meydanê.

Ev Aşûr, piştî, ko çaxekî dûr û dirêj dibin zor û setema hevsînorên xwe, kurdên Sobarî û Kaşî û Mîtanî û Horî de maye û bargiraniya zor û setema wan hilgirtiye dawî naçare serê xwe hildaye û ji fersendê kar kiriye û çavên xwe berdane hevsînorên xwe, ko ji hevdeketî, perîşan û perkende di nav şer û talan û berberî û paşveçûnêde hetta serê pozê xwe ketibûn nav çirava gewşekiyê.

Paytexta Aşûriya li ser hindameke bi çiya, ko raserî çemê Dicle hatiye avakirin û di cihê Şergata îro deye û çemê Dicle dibin kelehêve derbas dibî.

Tarîxa Aşûr çend şer û serpêhatiyên xwîndar û dijwar û xwînxwariye, bi hovî şerê hevsînorên xwe dikirin. Du bajarên dî jî Kalih û Nînowa avakirine lê Aştar xwedanê Aşûr li Nînowa bû û şeş(6) malbata fermandarî li welatê Aşûr kirine, Lê hin dibêjin, sê(3) malbatin, jiber, ko sê dewlet ji wan rabûne kevnare navîn, dawî:

1- DEWLETA KEVNARE PÊŞÎ:

Du malbata di vê dewletêde fermandarî kirine û nêzîkî 1900 salî vê dewletê berî zayînê destpêkiriye û padîşahê vê dewletê ê navdar Bozor Aşûre, ko hinekî welatê xwe fireh kiriye û piştî wîre Êloşûma, hatiye. Piştî wî du padîşahên dî weza û gewşek hatine. Lê bêdeng û perîşan, bindest mane.

Lê piştî vanre Sergon, padîşahê navdarê Aşûrî rabûye. Di pey wîre Şemsî Edad, ko di çaxê Hemûrabîde bû rabûye û di çaxê wîde welatê Aşûr gelek fireh bûye, hetta, ko di çemê Ferat, derbas bûye û li Nêrka mizgevtek avakiriye, ko îro jêre dibêjin Êşare. Çawa, ko mizgevtek li Aşûr paytexta xwe jî avakiriye, lê di çaxê wîde Hemûrabî welatê Aşûr xistiye bin destê xwe.

2- MALBATA DİWEM:

Navdarê padîşahên vê malbatê Şemsî Heded, ko piştî Faris welatê Babil xistin bin destê xwe, serê xwe hilda û

serbixwe bû padîşahê welatê Aşûr, lê gereke em zanibin, ko welatê Aşûr berî vî padîşahî çaxekî dûr û dirêj dibin destê Babiliyande maye.

Lê Şemsî Hedadê diwem, piştı, ko welatê Babil kete bin destê Îraniyan, serê xwe hilda û hawir pijiqî û welatê Sûriya, Ermenistan jî xistin bin destê xwe.

Herwekû piştî wîre, Aşûrnînarî rabû û li pey wî bi zora şûr kurê Nînarî rabû. Di çaxê van herdûwande rojperestî bû ola welatê Aşûr, ji rojêre mizgevt avakirin, navê xwedayê Aşûr Sînsemaş Eştar bû. Lê bi zora şûrê çarem bizor sînorek di navbera welatê xwe û padîşahê Kaşî-Kurdî Bornaboryaşde danî û di danîna vî sînorîde, wî tenê kar kir. Tenê padîşahên, ko li pey wî hatin gelek mat û weza bûn û dinav bera herdû dewletên mezinde, Kaşî, Mîtanî herdû bavikên kurd de hatin perçiqandin. Mîtanîya welatê Aşûr xiste bin destê xwe û paytexta wan Aşûr bizor girtin û Aşûr ketin bin siya padîşahê Horî-Mîtanî

Hetta çaxê Ertana ê yekem û toşrana, ko keça xwe dabû padîşahê Misrê û xwedanê Aşûr, Aştar jêre şandiye jibo, ko wî xweş û ji nexweşiya wî sax bikî, ji hêj welatê Aşûr dibin destê Hor-Mîtan, Sobarîde bû.

Lê di çaxê Aşûrbîl Nîşîşo neviyê Bizor Aşûrê çaremde hi nek welatê Aşûr bi serxwe hat û ji nûve Aşûr paytexta wela tê xwe avakir. Lê careke dî kete bin destê Mîtana. Tenâ, piştî mirina wî, hinek dostanî dinavbera Aşûr û Misriyande çêbû, lê dewleta Kaşî, Babilî nedixwest ev dostanî bi pêşve herî û ji Aşûra ditirsiya.

3- MALBATA SİYEM:

Mîtanî di vê navêde bêhavil û weza mabûn û xwe bixwe bû ne dijminê hev û bûne du perçe Horî û Mıtanî. Destê Aşûr û Hêtîta ketin nav wan.

1- Padîşahê navdarê pêşî, jivê malbatê Erîbahededê yekem bû, ko jinav welatê Aşûr serê xwe hildaye û welatê xwe ji destê Mîtana deranîye. Lê berî bighê armanca xwe serê xwe danî û kurê wî Aşûrobalît kete şûna bavê xwe û di sala 1392 berî zayînêde padîşahê Misrê Exna-tûn, destê xwe ji dostaniya hevalbendên xwe Mîtanîya kişand û bû olperest.

Di wê navêde Aşûr obalît, bi Hêtîtanre peymanek girêda û bi hevre êrîş kirin ser welatê Mîtanî û Ertanama, padîşa hê Mîtan şikandin û di sala 1370 berî zayînêde welatê Aşûr serbixwe bû

2- AŞÛR OBALÎT :

Keça xwe da padîşahê Kaşî-Kurdî, padîşahê Babil, Bornaboryaşê diwem piştî mirina wî, kurî wî xwarziyê Aşûra kete şûna bavê xwe û xelkê welêt li ber rabûn û kuştin.

Lê padîşahê Aşûr bizor fermandariya Babil xiste destê neviyê xwe, ko navê wî Korî-Kalzo, bû û padîşahê Aşûr bawer dikir, ko sînordaşên xwe bi carek kirine dost û hevalbendên xwe.

Belam Korî-Kalzo, xewna kalikê xwe pûç derxist û gerdana xwe ji Aşûrîyanre xwar nekir û piştî mirina kalikê xwe Aşûrobalît bêtir li ber Aşûra serê xwe radikir.

3- ANLÎL NÎRARÎ:

Di çaxê wîde û piştî mirina bavê wî, careke dî şerên dijwar dinavbera wî û xwarziyê wî, padîşahê Babil-Kaşî-Kurdîde destpêkir.

Tenê Nîrarî zora xwarziyê xwe Korî-Kalzoyê siyem bir û erîş bire ser welatê Babil-Kardoniyaş. Herwekû ji rexê jêrîve Êlamiyan bi xurtî ajote ser welatê Kardoniyaş.

Lê Korî Kalzo serê xwe ji xalê xwere danî û xwe ji Êlamiyan parast. Lê di vê navêde Anlıˆ Nîrarî serê xwe danî û Hedad Nîrarî bû padîşahê welatê Aşûr.

4- HEDAD NÎRARÎYÊ YEKEM:

Di çaxê vîde û di sala 1310 berî zayînê de bi leşkerekî giran ve berê xwe da rojavayê Ferat û Kelgamêş, Cerablûs xiste bin destê xwe. Bi vî rengî riya bazirganîya welatê Anadolê ji welatê xwere vekirî hişt û gelek çek, hasin kişandin welatê xwe. Padîşahê Kardoniya, Karîkalzo, kire dostê xwe û peymanek di navbera xwede çêkirin.

Lê çawa tê xuyakirin padîşahê Kardoniya xwe daye ber siya xalanên xwe yên Aşûrî û serê xwe ji xalê xwere pêl kiriye.

5- ŞELMANSERÊ YEKEM:

Di sala 1280 berî zayînêde Şelmanserê yekem padîşahê Aşûr, zora Hêtît û Aramiyan bir û welatê xwe gelek fireh kir û bajarê Kalih, li jêrê Nînowa rexê çepê çemê Dicle, avakir, ko di îrode, em jêre dibêjin bajarê Nemrûd.

6- TÎKOLTÎ NÎNORTA:

Di sala 1218 berî zayînê de Tîkoltî, bû padîşah û zora Hêtîta bir. Heta gola Wanê xiste bin destê xwe û Kaştîlaşê

siyem, padîşahê Kardonîya di Babil de dîl girt û Babil talankir û şewitand û xwedanê Kaşî Merdox, ji xwere anî. Lê kurê wî kuşt û welatê Aşûr piştî kuştina vî padîşahê dijwar kete nav sergêjiya. Şerên xwebixwetî destpêkirin û Êlamiya êrîşên dijwar ji jêrve anîne ser welatê Aşûriya.

Padîşahê Êlamî, Şotirok Naxunta di vê navêde welatê Babil Kardonî xiste destê xwe û êrîşên dijwar dibirin ser welatê Aşûr. Di sala 1170 berî zayînê de welatê Kardoniya kete destê Êlamiyan.

Herwekû di vê navêde malbateke nû dibû fermandarê welatê Babil û Neboxuznesirê yekem-Bextûnesir, êrîşên xurt û dijwar dibirin ser Aşûriya. Lê padîşahê Aşûrî Reşîş Aşûr, weke mîra li ber xwe dida û welatê xwe parast û dijmin her car pozşikestî bi paşde vedigerandin.

7- AŞÛR REŞÎŞ :

Herwekû me derbaskir, di çaxê wî de welatê Aşûr ketibû, ber şek û peka. Ji hawirve êrîşên xurt dihatin ser wan lê padîşah Reşîş, bi gernasî li ber xwe dida, lê gelek neçû serê xwe danî.

8- TÎGLAT PELAYZER Ê YEKEM:

Çawa Îşreş, serê xwe danî ev Tîglat kete şûna wî û dinivîsarên xwe de dibêjî"di serê pêşîde min gelek şerên dijwar û mezin kirin û welatê Kemoxî-Komacî, ko miletê Mûşkî, Mûşî, bi bîst(20) hezar peyave êrîşî vî welatî, welatê Komocîn dikirin û serdarê van bîst hezar Mûşkiyan pênc(5) mirov bûn û leşkerê Aşûr ew bi paşde şikandin, hetta, ko gihandin rojhilatê çemê Dicle û leşkerê Aşûrî kete çiyayên hêla Letya û min çil û du (42) dewlet, eşîr di pênc salande bi zor xistin bin destê xwe".

Çawa di çaxê wî de leşkerê Aşûr di Ferat derbas bû û welatê eşîrên Exlamû, Aramî bi zor şikandim û welatê Amoro, rajorê Sûriya xiste bin destê xwe. Leşkerê Aşûrî giha peravê Pingava Sipî û ji Libnan darên Erz birin welatê xwe û mizgevta Enohedad, xwedanê Aşûrî pê avakirin û welatê Babil xistin bin destê xwe.

Ano, xwedayê Ezmana bû û Hedad, xwedanê Birûşka bû û ji herdiware mizgeft vakirin. Lê piştî wî re yazde(11) padîşahên Aşûr rabûn, hemî mat û weza bûn, bênav û nîşan û deng bûn. Ji lewra Aramiyan xwe zû saz û tekûz kirin û berê xwe dane şerê Aşûriya û bi xurtî şikandin û dewleteke mezin ji xwe re li darxistin. Lê ji ber, ko nikaribûn bighêne hev,

bibin yek carekî dî Aşûriya ew xistin bin destê xwe. Lê Aşûr bi xwe ber bi paşvaçûnê ve gavên mezin tavêtin, tenê welatê Aşûr di destê wande ma û miletên hawir wan dilê xwe bijandin, ko welatê wan bixin bin destê xwe.

3- DEWLETA AŞÛRÎ YA SİYEM:

Di vê dewletêda sê malbata fermandarî kirine.

4- MALBATA ÇAREM:

ji şeş malbatên, ko fermandarî li welatê Aşûr kirine. Herwekû hetta zanîn, ko çawa dawiya malbata siyem kete nav nexweşî û ber bi windabûnêve digindirî û nêzîkî sed, sed û pêncî salî ev paşdamayî dirêjkir. Lê di sala 932-910 de Aşûrdan ê yekem rabû û binê malbateke nû danî.

1- AŞÛRDAN Ê YEKEM:

Di sala 932 berî zayînê de binê malake nû danî û deng pêket û bi xurtî sînorên xwe parastin û di gelek şerande rûsipî derket. Navê xwe kire padîşahê cihan(Cihangir) û piştî bîst û du sala serê xwe danî û kurê wî kete şûna bavê xwe.

2- HEDAD NÎNORTA Ê DİWEM(909-889):

Di çaxê vî de gelek şer û sergêjî di navbera Aşûr û hev sînorên wande çêdibûn û herdem xurtî dost û hevalê Aşûr bû ji hawir ve hinek welatê xwe fireh kir û zora Aramî û Babiliyan bir. Padîşahê Babil naçare serê xwe jêre danî û peymanek di navbera xwede çêkirin.

3- TÛKOLTÎ NÎNORTA Ê DİWEM(888-884):

Di nivîsarên xwede dibêjî,«di êrîşên xwede ez gihame hetta welatê Ermenistanê û gelên ser çemên Dicle. Bicarek, min xistin bin destê xwe, çawa, ko navbera Zab-Dicle, Zabê Mezin û Zabê Biçûk jî, tev kete bin destê min û ji rexê rojava de, Xabûr, Nisêbîn û ji Ferat, Hît, Ana jî min bizor girtin.»

4- AŞÛR NASİRBAL Ê SİYEM(883-859):

Di çaxê vî de gelek zor, setema Aşûr, bi ser hevsînorên Aşûr de hatin barandin û paytexta xwe ya kevnare berda û kete bajarê Kalih, ko Şelmanserê yekem, avakiribû. Li ber vî bajarî çemê Zab, tevlî çemê Dicle dibî. Ev bajar gelek xweş û fireh kir û qesrên mezin têde avakirin û bajar gelek bi pêşve bir.

Herwekû, di çaxê wî de alavên şer gelek bi pêşve çûbûn. Beran, debabe bûne alavên şer û tîravêj û şûrbaz di nav leşkerê xwede gelek bi pêşve birin û hînî şervanî kirin. Bi xwe mirovekî xwînxwar û pir ji zor û setemê hez dikir. Di xwînrijandin, talan, şewat û setemêde dilxweşî didît û gelek pê şadibû.

Aşûr Nasirbal, dijminê xwe bicarek hawîr şikandin û tişt ên kesnedî bi serê wande anîn. Karên bêrûmet dikirin û leşkerê wî sivik li hawîr şer dikirin û ji çiyayê Zagros û hetta çiyayê Libnan û Abanos di nav şer û şewatêde hiştin. Leşkerê wî tiştek bi şûn xweve ava û sax nedihiştin û bicarek welatên hawîr xwe dane ber talan, şewat, kuştin û wêraniyê û cihekî ava nehiştin. Lê gereke par û pişka gelê kurd, Sobar, Mîtan, Kardo, Hor, Kaşî, Kardoxî ji hevsînorên xwe bi gelekî bêtir bî.

Bi vî rengî tirsa leşkerê Aşûr, di nav dilê xelkêde cîkî mezin girtibû û nema kesî wêrabû destê xwe li ber Aşûriyan hildin. Dest û lingê mirovan dibirin û li ser hev dikirin kom û li ber tava havînî dihiştin û tilûr û tebayên goştxwer bi saxî çavên wan dirijandin û goştê wan dixwarin. Çermê padîşahên mezin ji ser laşê wan hiltanîn û li ber mêşa bi saxî bidarvekiri dihiştin û bi wan dikeniyan.

## 5- ŞELMANSERÊ SÎYEM(858-824):

Di nivîsarên xwede, gotiye,«ez, Şelmanser, Cihangîr, Ejdehayê mezin, mezinê mezina, padîşahê cihan, min serê dijminê xwe pelixand, weke kûpika dişkandin. Ez ew mirovê dijwarim, ko di şerande hîç dilovanî nasnakim. Kurê Aşûrnasbal, neviyê Tokoltî me.»

Herwekû ayînên padîşahên cihû û fermandarên jorê Sûriya di bajarê xwede çêkirine, ko çawa salyanê jêre dibin û li hember wî gerdenxwar, perîşan serê xwe dibin ber lingê wî. Di sala 27 de ji padîşahiya xwede, leşkerek bi serdariya, Diyan Aşûr şande ser welatê Orarto û rojhilatê çemê Zab û çiyayên kurdistan.

Dektor Ezîz Osman, di pesnê dijwariya vî padîşahîde dûr û dirêj dibêjî, lê ji ber, ko dixwazim tarîxa Aşûr bi kurtî di virde bidim xuyakirin, naxwazim dirêj bikim, jiber, ko ev tarîxa welat û gelê kurde û hevsînorên kurd jibo agahdarî bi kurtî dibêjim.

Lê di dawiya padîşahiya wî de welat kete destê herdu kurên wî û nêzîkî du salan şer di navbera wande bi xurtî çêdibûn. Lê dawî kurê wî Şemsî Hedad di sala 823 de zora birayê xwe bir û welat xiste destê xwe.

6- ŞEMSÎ HEDAD Ê PÊNCA(823-810):

Di çaxê wî de çend şerê mezin çêbûn û gelek ji wan welatên, ko dibin destê bavê wîde bûn, bi zor xistin bin destê xwe û leşkerê Akadî li Babil şikand. Çawa, ko di şerekîde, leşkerê Êlamî, Babilî, Kildanî, Aramî, ko hevalbendên hevbûn, bi hevre şikandin. Lê di çaxê wîde ev welatê Aşûr bi paşde vegeriya û nema karibû mezinahiya Aşûr vegerênî û di sala 810 de serê xwe danî. Jiber, ko kurê wî biçûk bû, jina wî Samoramat li şûna kurê xwe bû padîşah, ko navdare bi navê Semîramîs.

7- SEMÎRAMÎS(810-806):

Lê kurê wê Hedad Nîrarî, piştî çar salan welatê xwe ji diya xwe sitand û xiste bin destê xwe.

8- HEDAD NÎRARÎ Ê SİYEM(806-782):

Di çaxê vîde, çend caran leşkerê Aşûr çûye ser welatê, Mîdya, Kurdistana Azerbaycan û çûye ser padîşahê Meletya û bajarê Xozana, Tilhelef, xiste destê xwe û êrîşî welatê Mîtanî, hêla gola Wanê kir.

Ji vir tê xuyakirin, ko dewleta Mîtan ya mezin çendan winda bûye, lê hêj Mîtan di hindama Gola Wanêde xwedî dewlet bûn. Dibî, ko welatê wan teng û biçûk mabî

Piştî wîre sê kurên wî li pey hev bûne padîşahê Aşûr.

9- ŞELMANSERÊ ÇAREM(781-772)

10-AŞÛRDAN(771-754):

11-AŞÛR NÎRARÎ PÊNCEM(753-745):

Şelmanserê çarem, şeş caran êrîş kiriye ser welatê Orarto û welatê Şam, Dimişq liber serê xwe hildaye û newêrabû, herê şerê wan.

Lê çawa Aşûrdan hate ser text, du caran êrîş kire ser Orarto û carekê çû ser welatê Mîdya û di sala 763 de roj hate girtin û gelek sergêjî di welatê Aşûrde çêbûn. Lê dawî şerên xurt di hindama Arabxa-Kerkûk û Xozana Tilhelefde destpêkirin. Di çaxê Aşûr Nîrarîde li her der sergêjî diri wê wîde hatin meydanê. Aşûr gelek bi paşde vegeriyan û li Orarto, li hêla gola Wanê hin miletên şervan serê xwe hildan û welatê Aşûr bi xwe xistin nav tirs û sawîra.

Çawa, ko di sala 746 de leşkerê Aşûr, ko di Kalih de bûn, serê xwe li ber hildan û kuştin.

5- MALBATA PÊNCEM:

Bi serdariya Tîglatpelayzerê siyem, leşkerê Aşûr li bajarê Kalih, serê xwe hildan û Aşûr Nîrarî kuştin. Tîglatpelayzerê siyem, serdarê leşkerê Aşûr bû, padîşah û binemale ke nû anî meydanê.

1- TÎGLATPELAYZERÊ SİYEM(745-727):

Bi rastî, ev mirov ji padîşahê navdarê Aşûr tê jimartin. Di çaxê wîde welatê Aşûr gelek fireh bû û gelek bi pêşve çû û padîşahê Babil xiste bin destê xwe û berê xwe da welatê rajorê Aşûr, kurdistana îro û welatê Orarto jî, xiste bin destê xwe û giha hetta Gola Wanê û Ermenistan jî xiste bin destê xwe.

Herwekû di sala 739 de pareke mezin ji Sûriya sitand û Aramî şikandin, lê naçare Sûriya berda û leşkerê xwe rêkire ser welatê Mîdya û leşkerêkî dî rêkire ser Orarto û gelek êrîşên dijwar birin ser welatên Komacî, Kemûx, Kilîkya Kelgamêş, Melatya, Gurgûm û Hema.

Herwekû Dimişq û Felestîn, jî xistin bin destê xwe û di sala 728 de berî zayînê Babil bi carek xiste bin destê xwe û padîşahê Babil Okînze dîl girt û xwedanê Babil Merdox ji xwere anî. Di 727 de berî zayînê serê xwe danî.

Di çaxê wî de, gelek ji welatê Zagros, Kurdistan û Ermenistan rihakirin, jêrê welatê Sûriya û miletên rojhilatê Navîn têkelî hev kirin û kevn û nû şerê hev dikirin.

2- ŞELMANSERÊ PÊNCEM(727-722):

Babiliyan jêre digotin Olalo. Di çaxê wîde, welatê Îsraîl, bi carek kete destê Aşûra û padîşahên wan Hoşa, bi dîlî kete destê Aşûr û birin welatê xwe û kirin kole. Samîre paytexta cihiwa, herivandin. Piştî du salan serê xwe danî.

Piştî wî serdarekî dî bi zor bû padîşahê Aşûr û navê xwe kire Sergon(Şerokîn).

6- MALBATA ŞEŞEM- ŞER Û KÎNÎ :

Di çaxê wîde Merdox Baladan, padîşahê Babil û Hombanecaşî, padîşahê Êlam bi hevre peymanek girêdan. Ji welatê Aşûr, cihêbûn û piştî şerekî dijwar leşkerê Aşûrî, pozşikestî bi paşde hate şikandin.

Herwekû di çaxê wîde, careke dî gelê Sobaro, xwe ji bin destê Aşûriyan derxistin û serbixwe bûn. Lê Şerokîn, bi leşkerekî giranve çû şerê wan û bi zor careke dî ew vegerandin bin destê xwe.

Ji welatê Refah, nêzîkî Misrê neh hezar(9000) girtî birin welatê xwe. Herwekû êrîşên xurt birin ser welatê Orarto, Manî, ko li hawîr gola Wanê bûn. Berê xwe da çiyayê, Toros û Kelgamêş, xiste bin destê xwe. Herwekû Hêtît birin Dimişq û Aşûrî xistin şûna wan, êrîşkir Kilîkya û Kurdistan, Şemel, Gorgom û ser bi padîşahê Vêrcî û Lîdî rekir. Geleka ji wan salyan dane Aşûr û xwe parastin.

Herwekpu keleha Karşerokîn, di sînorê Mîdyade ava kir û şerekî mezin û dijwar bi padîşahê Mîdî, Diyokis-Dayako re kir. Piştî salekê çû şerê Orarto, ko padîşahê wan gelek xurt û dijminê Aşûr bû. Jiber, ko Roşa Orsa, padîşahê Orarto, padîşahê Manî, ko hevalbendê Aşûriya bû kuştibû. Jibo, ko tola dostê xwe bistênî, di sala 714 berî zayînê de Şerokîn, bi leşkerekî giranve çû ser dijminê xwe Orarto. Ev şer dûr û dirêj di nivîştên Aşûrde hatiye nivîsandin. Çawa ji Kalih, derket û di Zabve çû kurdistan. Di jêrî rojhilatê gola Ormiyeve çû welatê Manî û dikûre çûye, navê wan bajar û cihên, ko wêran kirine, şewitandine, li lat û kevira nivîsîne aştî û zor û setema, ko li xelkê kirine dane xuya kirin û di bajarê Bedlîsve vegeriyane welatê xwe.

Çawa, ko careke dî çûye ser welatê Motsansîr Misûrî, ko dikevî raserî çemê Zabê Mezin û padîşahê wan bi navê Orzana, şikand. Bi kurtî ji sala 713 ta bi sala 711 berî zayînê şerên xwîndar digel Mîdya, Manî, Kilîkya, Şemel, Gorgoma kirine. Ji sala 711 virde şer bi fermandarên Sûriya, Misirê re kirine û Babilî, Kildanî perçe perçe şikandine û xistine bin destê xwe û fermandarekî Aşûrî, daniye ser wan.

Şerokîn, berî hingî li bajarê Aşûr, rûdinişt, lê dawî çû bajarê Kalih.

Lê dawî Nînova kire paytexta xwe û bajarek bi navê Dorşerûkîn, ko 20 kîlometir dûrî Nînova bû avakir û dawî navê wî bajarî bû Mûsil.

Li entîkexana Lour, dûr û dirêj dabaşa vî bajarî tê xuyakirin. Herwekû Ezîz Osman, dûr û dirêj di nivişta xwede nivîsiye, lê ez naxwazim biguhêzim vir, tenê ev bajar di sala 707 de hatiye avakirin û di sala 705 de hate kuştin û padîşahên piştî wî vegeriyan Nînowa

2- SENHARÎB, KURÊ ŞEROKÎN SERGON(704-681):

Ji mezintirê padîşahên Aşûr tê jimartin. Di çaxê wîde Nînowa gelek bi pêşve çû û qesrên mezin têde hatin avakirin û gelê hawîr xwe, bi zor xistin bin destê xwe.

Lê şerên pir dijwar û giran bi gelê Kaşî re kirine, ko di çiyayê Zagrosde bûn. Di van şerande gelek dijwarî dîne. Jiber, ko çiya pir asê û dijwar bûn, rê dinav wanre bi dijwarî derbas dibûn. Ji lewra gelek caran peya diçû û texte rewana xwe li ser milên peya dikir û tev vî qasî jî, zora dijminê xwe bir û paytexta wan kire bajarekî Aşûrî û sitûnek têde avakir û Salyan ji padîşahê Mîdî sitand û dibêjî, "bav û kalê min hêj navê vî welatî nebihîstbûn." di sala 701-700 ê pêşzayîn de, welatê Hêtît, Sûriya bizor xistin bin destê xwe û giha sînorê welatê Misrê.

Lê nêzîkî Cizîra Bota, İbin Umer, ayîna Senharîb bi kincên padîşahî gerdanxwarê mizgevtekê hatiye dîtin û kolan. Çawa, ko ayîna wî, li gundê Bafiyan, jorê rojhilatê, Mûsil û li gundê Maltayî, nêzîkî Bafiyan, hatiye kolan û dîtin.

3- AŞÛRAXADÎN, KURÊ SENHARÎ, KURÊ SERGON-ŞERÛKÎN:

Di piştî bavê xwere bû padîşah û ew welatên, ko di bin destê bavê wîde bûn, bizor xistin bin destê xwe. Lê padîşahê Mîdya, Tîrşiya, bi leşkerekî mezin ve êrîşî welatê Aşûr kir, lê Aşûraxadîn, dijminê xwe bizor ji welatê xwe vegerand û careke dî welatê Zagros xiste bin destê xwe û êrîşên xurt birin welatên Sûriya, Misr û Ereb jî xistin bin destê xwe. Lê careke dî Mîdî û hevalbendên xwe hatin ser welatê Aşûr.

Naçare Axayedîn, vegeriya û çû şerê wan û carake dî dijminê xwe şikandin û sala 672 de çû şerê Şobariya, Soboro, rojhilatê bajarê Amed(Diyarbekir) û gelek ji wan Aşûriyên, ko bûbûn hevalê dijmina, bi darvekirin û kuştin. Ew mirovên, ko ji welatê Orarto bûn dane destê padîşahê Orarto, Roşa, ko wan bikujî. Di sala 671 de welatê Misir bi carek xiste bin destê xwe û jin û zarokên Firewîn bi dîlî rêkirin welatê Aşûr de sala 669 de serê xwe danî.

4- AŞÛRBANÎBAL(668-626):

Di saxiya bavê xwede bû padîşahê Nînowa, birayê wî ê mezin bû fermandarê Babil. Di nav herdû birande, li ser padîşahiya welêt gelek şer û sergêjî çêbûn. Li Misir û Sûriya xelkê serê xwe hildan û naçare bi leşkerekî giranve çû ser wan û xistin bin destê xwe. Di sala 660 de çû şerê Maniyan ko li nêzîkî gola Wanê bûn û padîşahê Manî, Axşerî, hate kuştin û kurê wî, Walî, bû dost û hevalbendê Aşûriyan û çû şerê Mîdîya û nêzîkî 75 kelehên wa girtin û paşê çû ser jêrê welatê Aşûr û padîşahê Êlamî kuşt û welat xiste bin des

tê xwe. Eşîrke Aramî bi navê Kambolo, bire Erbîl û zimanê wan birin û çermê wan rakirin û di sala 648 de birayê xwe, Şemaşşûm Okîn, di Babil de şewitand û gelek ji xelkê nav bajêr serjêkirin û di sala 643-641 de Persa, paytexta Êlam xiste bin destê xwe û welat bi carek talan û wêran kirin. Xelkê welêt rakirin û birin cîkî dî û welatê wan çol hiştin.

Lê di çaxê Kohreşde careke dî bajarê Sûs hate avakirin û kenanîyan welatê Êlam gelek bi pêşve birin. Lê vî padîşahê xwînrêj, di dawiya jîna xwede, berê xwe da xwendin û avanî, tore, xweşkirina welatê xwe û hew çû şerê hevsînorên xwe.

Herwekû tarîxa bav û kalên xwe, li ser kevirên axînî-herînî, dane nivîsandin û serpêhatiyên Aşûr dane xuyakirin. Di sala 626 de serê xwe danî.

5- AŞÛRETILÊLAN, KURÊ BANÎBAL(626-621):

Di çaxê vîde sergêjî ketin welatê Aşûr. Di sala 625 de Nebûpolaser padîşahê Babil, welatê xwe ji bin destê Aşûr deranî û serbixwe bû. Padîşah û welatê Mîdya bi serdariya padîşah Key Axsar(Keyxesro), serê xwe hildan û welatê Sûriya ji bin destê Aşûriya derket û di wê navêde Aşûratilêlan serê xwe danî û yekî dî bû padîşah.

Lê careke dî, yek ji vê malbatê bi navê Sînşaraîşkûn bû padîşah û ji sala 620 û hetta sala 612 de maye. Lê di çaxê wîde welatê Aşûr gelek bi paşde çû û fermandarî kete destê fermandarên leşkerê Aşûr. Tenê padîşah zor da avakirina mizgevtên xwedê û xwendin û tore û gelek bi pêşve bir. Lê welatê Aşûr di sala 612 de bi carek perçe bû. Mîdya û Babilî bûne hevalbendê hev û dirêjî welatê Aşûr kirin û Aşûr Nînowa, bi zor xistin destê xwe û padîşahê Aşûr bazda û çû Urfa(Riha) û di kelehêde asê bû. Lê di sala 610 de welatê Reha, ko di bin destê Aşûrde bû bizor sitandin û navê dewleta Aşûrî ji rûpelê tarîxê hate rakirin û bi carek winda bû.


5.3.1967 Cigerxwîn

# DEWLETA MÎDYA

GELÊ SOBARÎ:

Ev navê Sobarî, berî hingî navekî cugrafî bû. Ji bakurê
rojavayê welatê Êlam û heta bi çiyayê Amanos, Edenê, ko ri
ya tirênê di berva tê Helebê, dirêj dibû.
Lê vê paşiyê, bû navê gelekî mezin, Şobarî, Sobarî, So-
barto, ko yek ji gelên Zagrosê û herî kevnareye. Ji rajorê
Gola Wan û hetta Mezopotamya di nav xwede girtibû.
Sir Sidnî Semîs, dibêjî, ev welatê, ko dikevî navbera,
Gola Wan û Kerkûk û Xabûr û Babil, di bin destê miletê Şo-
barîde bû. Lê di sala 2500 berî zayînêde miletê yan eşîrên
Aşûrî, hatin jêrê vî welatî û ji xwere cî girtin.
Ev Şobarî bixwe ne Samî û ne jî Hind û Ewrûpî ne, belkî
tenê Qawqazî-Asyewîne, herwekû ji zimanê wan tê xuyakirin.
Ev navê Sobarî, di berî qirnê 30 ê berî zayînê de di ni
vîsarên dewleta Logal Anîmendode bi Sobîr, hatiye xuyaki-
rin û nivîsandin.
Di çaxê Naramsîn, padîşahê Akadde, jêre digotin Sobar-
tîm. Çawa, ko Hemorabî jî, ev nav ji bo welatekî serbixwe-
re daniye.
Tîglatpelayzer, padîşahê Aşûr, di sala 1110-1100 berî
zayînêde hatiye ser bajarê Şereş, ko ji mezinê bajarên So-
barî bû. Sobarî û Mûşkî, Kartî, di hember vî leşkerîde des
tê xwe dane hev û bi gernasî şer kirine.
Lê Mînorûskî, dibêjî, miletê So, li jêrê gola Wanê bû.
Çawa, ko Şerefxan, jî dibêjî, keleha So, yek ji hindamên

Institut kurde de Paris




ÎMPARATORÎYA MEDYA
(Li dor 560 sal berî buyîna Îsa)




ÎMPARATORÎYA ÎSKENDER
(Li dor 323 berî bûyina Îsa)

dewleta Bedlîs bû. Gelek ji tarîxzana dibêjin, miletên Horî, Mîtanî jî, ji miletê So derketine û têne hejmartin. Gelek tarîxzanên navdar, weke Fon Mînorûskî û Torodanjen miletê Nayrî ji miletên Zagrosên kevnare dihejmêrin û didin zanîn, ko şûna miletê So, Sobarto, Sobarî girtiye. Dixwazim di virde bidim xuyakirin:

NAYRÎ SOBARÎ :

Torodanjen, dibêjî, Nayrî, Hobşîka welatê Botaye. Berî hingî miletekî serbixwe bû.

Lê hinek ji tarîxzanên mezin, miletê Nayrî ji komela diwem dihejmêrin. Ji lewra Mêcer Son, dibêjî, eger em li sedê 11-12 berî zayînê temaşa bikin dibênin, ko miletê Nayrî di kurdistana kevnarede, berî miletê Madî, gerdanazad û serbixwe bû û ji sînordaşên xwe xurttir û mezintir bû û ne tenê welatê Nayrî serçavê ava çemê Zabê Mezin bû.

Çawa, ko Tîglatpelayzer, padîşahê Aşûr û nevîyên wî, ji wî miletê, ko li hawîr Kaniya Dicle, Kaniya Ferat, hêla Diyarbekir û Xerpût, Dersim, Bedlîs, Torosde rûniştîbûnre dîgotin miletê Nayrî.

Tîglatpelayzerê yekem, padîşahê Aşûr, li deşta Melazgir (Melazkurd) bi 23 fermandarên Nayrîyanre şerekî dijwar û mezin kiriye, ko diriste hin ji van serdaran, ji hevalbendên Nayriyan bin û li ser kaniya çemê Dicle, sitûnek avakiriye. Ev serpêhatiya ha bi dirêjayî têde nivîsandiye.Herwekû di sala 910 de leşkerê Aşûrî çûye ser welatê Kotomox û li navbera çemê Dicle û çiyayê Cûdî bi miletê Nayrîre şerekî dijwar û dûr û dirêj kiriye. Paşê ev welat bi zor xistiye bin destê xwe.

Çawa, ko Tokoltî Nînîbê diwem, di sala 990 de berî zayînê bi miletê Nayrîre şer kiriye. Kêm padîşahên Aşûrî hene, ko şerê Nayrîyan nekiribin.

Herwekû tê xuyakirin, ko gelek caran jî, miletê Nayrî, zora dijminê xwe biriye û leşkerê Aşûrî şikandiye. Di sala 723 berî zayînê miletê Nayrî, di bakurê rojhilatve hate ser welatê Aşûr û Tîglatpelayzerê çarem bi hezar dijwarî, leşkerê Nayrî ji welatê Aşûrî derxistiye û hetta bi çiyayê Cûdî ajotiye.

Herwekû Senharîb, padîşahê Aşûrî navdar, di sala 705-682, 699 de li hawîra çiyayê Cûdî şerekî giran û dijwar û dûr û dirêj bi miletê Nayrî re kiriye, ev şerê ha di nivîsarên xwede li Seferaxamis, civîna pêncem jimartiye.

Mêcer Son, dibêjî, ev deşt û çiyayên raserî Mûsil, Orfa

ko di derketina tarîxêde sînorên Cizîra jêrî û Cizîra jorî bûn. Di çaxê Tîglatpelayzer, padîşahê Aşûrîde, sala 1100 berî zayînê sînorê jorê welatê Aşûr bû û di pişta van çiya û deştande welatekî veşartî bi navê Nayrî hebû, ko vî padîşahî herdem dixwest bixî bin destê xwe.

Lê vê paşîyê navê Nayrî, winda bû û navê kurdyen, kete şûna wî. Tê zanîn, ko miletê kurd, di derketina tarîxêde, ji nijadê Arî ye û li kurdistanê rûniştî ye.

Xuya dikî, ko daxwaza Mêcer Son, ji deşta navbera çiyayên Şengal(Ebdilezîz) û çiyayên pişta Nisêbîn, Mardînê, evê, ko jêre dibêjin Cizîra jorî, Mezopotamya jorî, ko gere ke em bêjin Cizîra kurda.

Lê zimanê Nayrî, bi rast û ronî nehatiye zanîn. Tenê ji ber, ko di îrode Nayrî, bi kurdî diaxivin û ji miletên Arî têne jimartin, gerek zimanê wî gelek nêzîkî zimanê Sobarî, Horî bî, ko hemî şîweyên zimanê kurdî bin. Di îrode ev miletên kevnare hemî bûne eşîrên kurd û di îro de jî peyda dibin. Ji kurdî pêve bi zimanekî dî nizanın bipeyivin, yan zimanê kurdî, zimanê wayê kevnare û bingehîne.

Herwekû, li şûna Nayrî, Nehrî li hindama Şemdînan maye. Çawa, ko li şûna Sobar, Zêbar maye û Nemîran, Nemeran li nav hindama Hîzan heye û di cihê Horî de Hevêrka, Hewêrî , li nav Bota û li raserê Nisêbîn mane û keleha Horî, li çiyayê Kurddax maye. Û gelek diriste, ko Haranî jî, ko dikevin jêrê Şam, Dimişq, bermayê wan Horîyan bin.

DEWLETA MÎDÎ:

Herwekû hatiye gotin, berî du hezar sal, hin koçerên Arî, Hind-Ewrûpî ji rajêrê welatê Rûsiya hatin û di welatê, Îran de rûniştin. Bigir di nav miletên kevnarê Îran-Zagros de windabûn.

Lê di sala 1200 berî zayînêde hin koçerên nû hatin. Vê carê di Balqan ve hatin û bi xwe re alavên şer, hesp, payton anîn û tevlî zar û zêçên xwe koçemal hatin.

Çawa, ko di destpêka hezarê yekem de miletek ji van koçerên nûhatî yan zorkerên nûhatî li nêzîkî çiyayê Zagros, rûniştin û têkelî wan miletên kevnare bûn.

Lê bere bere bûne xwedî qad û cot kirin û di çarsedê pêşî ji hezarê pêşî, rojhilatê kevnare gelek ser û binî hev bû û gavên hêja bi pêşde avêtin. Şehristanî ji Misr û Mezopotamya berjor bû welatê Îran û çiyayê Zagros, Kurdistan.

**Çawa, ko hin şerên dijwar, xwîndar di navbera Aşûr, Orartode çêdibûn û Orarto çend caran zora dijminê xwe dibirin û dewletek li dar xistin.**



*Relîfek - Ji zemanê Lolo'yan.*



*Relîfekî Gutî li ser zinar.*



*Gor relîfekî Asûrî tîpekî medî*

Institut kurde de Paris

Di sala 842 berî zayînêde Şelmanserê padîşahê Aşûr, dibêjî û navê Parsêwî û Mad tênî meydanê û didî xuyakirin. Tenê navê Mad di sala 836 de hatiye xuyakirin û çawa ji ni vîsarên padîşahê Aşûrî tê xuyakirin.

Welatê Parsêwî, dikevî rojava û jêrê gola Ormiyê. Weletê Mad dikevî nêzîkî Akbatan, Hemedana îro. Lê çawa tê xuyakirin ev her du nav jî cugrafî bûn û ne navên miletan bûn. Fermandarê Mad ji padîşahê Aşûrîre hin diyarî rêkirine.

Lê Pirefesor Says, dibêjî, Mad çend êl û eşîrên kurd bûn. Di rojhilatê welatê Aşûrde cî girtibûn û hetta pingava Qezwîn di bin destê wande bû. Ji aliyê zimanve pirê wan Hind û Ewrûpî û ji rexê nijadve Arî bûn.

Lê hinek ji zimanzanê rojava, ko bi kevnezimanên rojhilatê dizanin, dibêjin, zimanê Mad, zimanê kurdên îro bû, yan jî bingehê zimanê kurdê îro bû.

Tarîxzanên mezin dibêjin, piştî herivandina dewleta Mad êl û bavikên Mad di nav miletên Kurd û Faris de hatin pişavtin. Çawa, Sît, Manî jî xwe di nav miletê Kurd û Faris de winda kirin.

Lê di îrode Sît, di nav eşîra Omerîyande tê xuyakirin, lê tenê navê du gundan Sît û Sîtol mane û gelek diriste ko eşîra Omerî, ji bermayê miletê Sît bî

Lê Heredot, tarîxzanê Yewnanî, dibêjî, padîşahê yekem, ji miletê Madî, Diyako-Diyosîs bû, ko padîşahî kiriye, lê tarîxzanê rojhilat dibêjin Keyqubade.

1- DİYAKO-DİYOSÎS:

Ê yekeme, ko di Îrande dewletek li darxistiye. Miletên kevnê welatê Zagros, Îrana kevnare, di bin siya Aalekêde civandine hev. Di welatê Aşûrîde û di sala 745-727 de, padîşahê navdarê Aşûrî Tîglatpelayjer, bi alîkarîya Orarto, Xalidîyan çû ser welatê Mad, Mîdya û bi xwe dibêjî:"Ez li pey wan çûme heta çiyayê Demawend û min zora wan bir û xistin bin destê xwe û Salyan ji wan sitand û min 65 hezar dîl ji wan rêkirin welatê xwe û min girtiyên Aramiyan berdan."

Lê careke dî çend fermandarên hevalbend weke Dayoko, padîşahê Madî û padîşahê Orarto Roşa, destên hev girtin û li ber Aşûrîyan serê xwe hildan.

Di çaxê Aserheded, padîşahê Aşûrî sala 681-669 berî zayînêde Mad û bavikên mayîn Sît, Manî, Kasay xwestin, ko welatê Aşûr wêran bikin û bi carek winda bikin û bixin bin destên xwe.

Lê padîşahê Aşûrî, miletê Sît kire hevalê xwe û dijminê xwe ji ser welatê xwe vegerandin û welatê xwe parast. Lê çawa Sergonê diwem, padîşahê Aşûrî bû padîşah û welatê Samîre xiste destê xwe, 30 hezar mirov ji xelkê Samîre birin welatê Mîdya û tevlî miletê Mîdî kirin. Ji wê rojêde miletê Madî têkelî hev bûye. Kurdên kevnare, kurdên nûhatî û Samîyên nûhatî.

Sergonê diwem, pêde diçî û dibêjî "min 24 fermandarên, Mîdî, bîst û çar axa xistin bin destê xwe û Salyan dane min." Lê careke dî Dayako, padîşahê Mîdî û Roşa, padîşahê Orarto, destê hev girtin û çûne şerê Aşûrıyan.

Lê di sala 615 de careke dî Sergon, dijminê xwe şikandin. Dayako, bi dîlî kete destê dijminê xwe. Di keleha Hema, Sûriya de xiste zindanê. Di sala 613 de careke dî Sergon çû ser welatê Mîdî û çil û pênc ji fermandarên wan xistin bin destê xwe û gelek pesnê xwe dida, ko ev mêranî kiriye. Çawa, ko di çaxê Senharîbde, jiber, ko leşkerê Aşûr, bi welatê Sûriya û Babil û Êlam ve mabû, careke dî Mîdîyan serê xwe hildan.

## 2- XWEŞTIRÎN FERAORT(KEYKAWÎS):

Xweştirîn, kurê Dayako-Keyqubad, çawa bavê wî hate girtin, bi gernasî kete şûna bavê xwe û ew miletên kevnare weke Kembêrî, Eskîzî, Manî kirin yek perçe û dewleta Mîdî eşkera kir. Leşkerekî mezin di hember Aşûr û Orartode pêkanî û tekûz kir.

## KEMBERÎ Û ESKÎZÎ KÎNE:

Di sedê heştê berî zayînêde, ev herdû eşîr jî, bi hevalên xwe re ji jêrê welatê Rûsiya hatin û li jêrê rajorê, rojavayê Îran û Asya biçûk û Sûriya û Felestîn belav bûn û bêjimar û weke kulî bihevre dihatin. Li devê riya xwe her tiştî dişewitandin û talan dikirin. Çi cihên, ko têre derbas dibûn, li pişt xwe kavil û wêran dihiştin.

Herodot, dibêjî, Aşûrî jî vê dabasêre di nav nivîsarên xwe de dibêjin, Kemberayî, Eskîzayî, çawa, ko di Tewratêde, jî ev herdû nav hatine û li ber navên wan wêrankerên miletan nivîsandiye. Ev herdû eşîr ji Cizîra Qirim, hatine. Lê Herodot dibêjî, Kemberî ji ber Eskîzîyan reviyane. Tenê pitên tarîxzana bi vê gotinê bawer nakin, ji ber, ko herdû miletê mirovên hev û bi yek zimanî mijûl dibûn. Lê ne gelek dûre, ko weke Teteran, Xezan, ko ji ber Selcoqîyan direvîyan û bi xwe yek milet û bi yek zimanî dipeyivîn.

Institut kurde de Paris

Di çaxê Sergonê diwem de, van herdû eşîran, êrîşî welatê Orarto kirin û şer ranewesta hetta, ko padîşahê Orarto xwe nekuşt û di wê çaxê de bûne du perçe.

Perçekî berê xwe da welatê Mîdya û xwe dane ber siya Xweştirîn Feraort. Perçê dî, ko hemî siwar bûn, berê xwe dane jorê welatê Aşûr, çiyayên kurdistan. Lê çawa dîtin ko nikarin di wê hindamêde cî bigrin, berê xwe dane Asya biçûk û bi rojavade pijilîn. Lê paşê li jêrê pingava reş cî girtin û êrîşî miletê Vêrcî kirin û zora wan birin û padîşahê Vêrcî, Mîdas, xwe kuşt, paşê padîşahê Gîgis kuştin. Lê padîşahê Aşûr, Banîpal, li Kilîkya, zora wan bir û peli xandin. Heçî mayî careke dî vegeriyan welatê Mîdya û lî cem pismamên xwe Eskîzîyan rûniştin. Lê Eskîzî bi cîkî dî de çûn.

Di çaxê padîşahê Aşûrî, Axadînde, berdane wan siwarên Kemberî, ko xwe dabûn ber siya Aşûrîyan û ji rajorê Hemedan derxistin û naçare çûne jêrê gola Ormiye rûniştin û berî hingî navê vê hindamê welatê Manî bû.

Lê Eskîzî, di çaxê dewleta wande gelek ji welatê Azerbaycan xistibûn bin destê xwe. Padîşahê wan Bartano, keça padîşahê Aşûrî, ji xwe re anî. Di şerê Mîdî û Aşûrîyande hevalbendê Mîdîyan bûn. Lê di nav şerde bûne dijminê hevalbendên xwe û padîşahê Mîdî Xweştirîn Feraort, kuştin. Madîs, kurê Bartano bû padîşahê Mîdî û Eskîzîyan û li şûna bavê xwe rûnişt. Di sala 653 de welatê Mîdî bi carek kete bin destê Eskîzîyan û 28 sala fermandarî di destê wande ma. Ew siwarên Kembêrîyan, ko ji ber Aşûrîya ji rajorê Hemedan reviyabûn, hatin cem Eskîzîyan û dirêjî Asya biçûk, jorê Sûriya kirin. Fînîkya, Dimişq, Felestîn di nav xwîn û şînêde hiştin. Çawa, ko ev dabaş di çûna pencem, Seferaxamis, Ermiyade hatiye gotin û dibêjî, Eskîzî gihane heta sînorê Misrê, lê Firewn, hin mal da wan ji ser welatê xwe vegerandin

3- KEYXESRO-KEYAXSER:

Kurê Xweştirîn Feraort, kurê Diyûsîs(Diyako). Herodot dibêjî, piştî, ko bavê wî hate kuştin, Keyxesro welatê Mîdya xiste bin destê xwe û pêlake dirêj xwe da bin siya Eskîzîyan. Lê çax û demên xwe badîhewa bernedan û di wê navêde leşkerê xwe tekûz dikir û hînî şer kirin, siwarî û peya ji hev dane alî û tiravêj anîne meydanê. Gelek ji awayê şerên Eskîzîyan xiste nav leşkerê xwe û çavnêrîya çax û demên xwe dikir.

Herodot dibêjî, Keyxesro, zora dijminê xwe Eskîzîyan



Institut Kurde de Paris

bir û Eskîzîyan welatê Mana ji dijminê xwe re hiştin û kes nizanî bi kû de çûn. Bi vî rengî Keyxesro, bû padîşahê Îran û hindama Persepolîs (Parsomaş), welatê Faris jî xiste bin destê xwe. Bajarê Akbatan ava kir û ji xwe re kire paytext. Akbatan, bi daxwaza cihê civînêye. Ji nûve weke bav û kalê xwe êrîş kire welatê Aşûr.

Lê di serê pêşîde hindama Zagros bi carek xiste bin destê xwe û keça xwe Amîtîs, da kurê padîşahê Babil, Bextû nesir. Di navbera xwe de peymanek girêdan û bi hevre êrîş kîrin ser welatê Aşûr. Leşkerê Babilî, bi serdariya padîşah Nebopolaser, ji jêrve û leşkerê Mîdî, bi serdariya Keyxesro Axsar, ji jorve êrîş kirin Aşûrîyan.

Di sala 612 de dewleta Aşûrî, bi carek hate hilweşandin û Nînova kete destê padîşahê Mîdî. Lê Aşûrobalîtê siyem, bazda û çû welatê Heran û Riha û ji nûva dewleteke Aşûrîli darxist. Tenê Keyxesro, di sala 609 de ew jî, jê sitand û ji wê rojê de hew deng ji miletê Qehremanê Aşûr hat û hew kesî ji wan serê xwe hilda.

Belem Keyxesro(Keyaxsar), paşê berê xwe da welatê Orarto Xelidî û bi zor xiste bin destê xwe û ber bi rojava da çû. Çar sala şer bi miletê Lîdîre kir, lê dawî li hevhatin û padîşahê Lîdî keça xwe da kurê padîşahê Mîdî, İstiyag, û Keyxesro vegeriya welatê xwe.

Lê Herodot, dibêjî, ji ber, ko roj hatibû girtin, tirsiyan û li hevhatin. Dibî jî, ko Bextûnesir, padîşahê Babil ew lihevanîbin. Sînorê dewleta Mîdî ji rojava de gihe çemê Halis, Qizilêrmeq.

## 4- İSTİYAG, KURÊ KEYXESRO, KURÊ XWEŞTİRÎ, KURÊ DAYAKO:

Keyistiyag, di sala 584 berî zayînêde keça padîşahê Lîdî, mar kir û Asya kirin du perçe. Welatên jorê Asya, ketin bin destê Mîdya û Sûriya û Êlam ketin bin destê Kildanîya.

Lê padîşahê Babil Nebonîd, di şerê Keyistiyag û Keyxesriwê Farisîde bûdijminê Keyistiyag û hevaltiya Faris kir. Heta, ko herdû dewletên mezin Mîdî û Babilî, jî, winda kirin. Lê çawa Keyxesro-Kohreş, welatê Mîdî xiste bin destê xwe, welatê Kildanî, bi hesanî ji wan sitand û kes li ber pozê xwe nehişt.

### ŞEHRİSTANİYA MÎDÎYA:

Mîdîya bi xwe tu şehristanî li pey xwe nehişt. Tenê, çend miletên kevnareyên Îranê, Zagros, gihandin hev û dew-



Institut kurde de Paris

letek li dar xistin, ko berî hingî, navê padîşah û dewletê li welatê Îran, peyda nedibûn. 1- Dibêjin, ji ber, ko pir milet di Îrande hebûn, 2- Çiya û avên pir û asê bûn. Ji lewra nikaribûn bibin yek dewlet.

Lê dibêjim, ev awir ne gelek raste. Ji ber, ko berî Mad û Faris miletên Guttî, Kaşî nêzîkî heşt sed(800) salî padîşahê kirine û ji xelkê vî welatî bûn û çiyayî bûn û di çaxê wande jî ev miletên Îranê pir hebûn.

Herwekû Hor-Mîtan, jî xelkê van çiya bûn û heta sînorê Misrê xistibûn destê xwe. Lê di virde gereke em tiştekî pir mezin bidin xuyakirin, ew jî,ewe, ko tarîxzanên rojava û rojhilat ne weke hev van serpêhatiyan dibêjin û heta navên padîşahên Mad û Faris jî, ne weke hev didin xuyakirin.

Tarîxzanê rojava weke, ko me derbas kiriye dibêjin û ba weriya xwe bi gotinê Heredot, tarîxzanê Yewnanî tênin û lî ser awira wî diçin û hin vedan û lêkolanên nû jî, alîkariya wan dikin û li gora gotina wan derdikevin.

1-Dayako-Dayûsîs, 2- Xweştirîn Feraort, 3-Keyexsar-Keyxesro, 4- İstiyax-İstiyag.

Herwekû tarîxzanên rojhilat dibêjin: 1- Keyqubad, 2-Key kawis, 3- Siyahxweş, 4- Keyxesro, 5- Lehraseb, 6- Kuştaseb 7- Erdeşêr Behmen, 8- Xemanî, 9- Dara, 10- Şehrezad, Mîdî û Exmenîyan didin ser hev û yek dewletê dijimêrin. Lê tarîxzanê rojava Mîdîya dikin koka miletê kurd û dewleta Mîdî serbixwe dibêjin. Dewleta Exmenî, ji Keyxesro Kohreş, destpêdikin û li Darayê siyem dawiya vê dewleta Farisî tênin. Piştî İskender, malbateke dî dest pêdikî. Lê newekhevî tenê di van herdû dewletande gelek eşkere xuyadibî.


Tarîxzanê rojava dibêjin, Keyxesriwê Kohreş, kurê keça padîşahê Mîdîye. Lê tarîxzanên rojhilat dibêjin, Keyxesriwê Kohreş, kurê Keykawise û herdû jî, baweriya xwe bi çîroka tênin.

Çîroka rojava, eve, ko Heredot dibêjî, yekî, ko bi sitêrka zanibû ji Keyistiyagre gotiye, wê kurek ji vê keça te çêbibî û taca te bidî serê xwe û ji tirsa Keyistiyag keça xwe daye yekî Farisî û Keyxesro jêre çêbûye û taca kalîkê xwe daye serê xwe.

Herwekû tarîxzanên rojhilat dibêjin Keykawis bi pîrî ji xwe re jineke ciwan anîye û kurê xwe, koji jineke dî bû,Siyahxweş, şandiye mala xwe, ko kîs û qelûna wî bênî, jinikê destê xwe avêtiye dawa wî û gotiye, bavê te, ez ji tere anîme, lê nedame te, lê Siyahxweş, ew, bi gurza bi ser hev de pelixandiye û vegeriyaye cem bavê xwe. Çawa bavê kal çûye mal diye, ko jina wî di nav nivîna de dinalî û li ber

serê wê rûniştiye û pirsiye, çi bi te hatiye xatûna delal, lê jinikê bêbextî li kurê wî kiriye û padîşah xwestiye kurê xwe bikujî. Lê çawa mezinên Îran ev bihîstine, berdane Siyahxweş û çûye cem padîşahê Tirkistanê û Efrasîyab keça xwe lê mar kiriye û Keyxesro ji wê jinikê çêbûye û paşê za vayê xwe kuştiye. Guhderz, çûye Keyxesro û diya wî revandî ne û ketiye şûna kalikê xwe.

Lê tarîxzanên rojhilat, malbatên padîşahên Îran bicarek dikin çar perçe, Pêşdadî, Keyanî, Eşkanî, Sasanî. Herçaran dibin ser hev. Lê bi rastî perçê pêşî, Pêşdadî, weke çîroka tê ber çavê mirov. Keyanî û Mîdîyan di nav hevde dikin yek dewlet. Di salên wan de jî newekehev dibêjin. Çawa, ko awira rojava bêtir li ser kevir û nivîsarên kevnare û Here dotê Yewnanî kirine. Di vî sedê bîsta(20)de her tiştê Ewrû pî bi rûmetin. Alika navê eşîreke kurde koçere, li rojhilatê bajarê Nisêbînê dikevî.



*Gor Relîfekî medî.*

# FARİS

Îran, yan welatê Faris, li gora nivîsarên Dektor Ezîz Osman tê xuyakirin, ko tarîxa Îran ji destpêka hezarê siyem berî zayînê pêdikî. Miletên Mezopotamya di nav nivîsarên xwede gelek serpêhatî, dan û sitandin û şerên navbera xwe û îranîyan, dane xuyakirin û nivîsîne.

Herwekû ew miletên, ko di îrana kevnarede rûniştî bûn, Êlam, Goto, Lolo, Kaşî ji wanre digotin Qawqazî- Asyewî. Xelkê çiyayê Zagros bûn, çawa, ko hin miletên weke van di jorê Sûriya û Cizîrê de hebûn, ko ji wan re digotin Sobarî Horî, Mîtanî û di jêrê Mezopotamya de miletê Somerî hebû, ko ev tevde ji Qawqazî-Asyewî dihatin jimartin û zimanê te va yek ziman bû, yan gelek nêzîkî hev bûn.

Bêgomane, ev navên ha tev navê êl û eşîrên miletê kurdin, weke, ko tê xuyakirin Kurd û Ereb, yan jî Arî-Qawqazî Asyewî û Samîyan li ser welatê Mezopotamya navbera herdû çeman ji kevnarede gelek şerê hev kirine û padîşahî ji destê hev sitandine

Lê Îran, di hezarê diwem, berî zayînêde cihê tevgerên koçerên Arî nûhatî bû. Di vê çaxêde çend eşîrên Arî bi koçerî hatin û ji jêrê welatê Rûsya rabûn û dirêjî Asya rojava kirin û têkelî milet, eşîrên kevnare bûn. Hin dewletên nû çêkirin û rojhilat dinav sergêjî û kuştin û talanade hiştin.

Tarîxzan bihevre dibêjin, ev koçer nebihevre hatine bel kî li peyhev û bi salan di piştî hevre hatine. Îran, çiyayê Zagros.

Herwekû ew koçerên, ko jiwanre dibêjin, Nîz, çûne roja-

va Ewrûpa, paşê hin ji wan di Bosforde derbas bûne û li Asya biçûk rûniştine. Berî wan miletê Xatî, di wê hindamê de bû û dinav Xatîyande xwe winda kirine. Lê tevde dibin navê Xatî, Hêtîtde miletek Afirandine.

Lê ew koçerên, ko jiwanre dibêjin, Hind û Ewrûpî, Arî, Hind û Îranî, ji deştên jêrê welatê Rûsîya, berjêr bûne û li rojhilat û hawîr pingava Qezwîn danîne. Lê ew jî bûne du perçe:

1- Yek jê, di Îrana kevnare, welatê Zagrosde rûniştiye û têklî miletên kevnare bûye.

2- Perçê diwem, berê xwe daye welatê Hindistan û zimanê wan Sanskrîtî bû, ko pê nivişta Wîdas çêkirine.

Tenê ew koçerên, ko têkelî miletên kevnê Îranê Zagros, bûne xwe dinav wan miletên kevnarede bicarek windakirine û hin dewletên navdar û mezin li darxistine.

Lê hin dibêjin, ew koçerên, ko li Îran rûniştine gelek hindik bûn. Jiber, ko pirên wan çûne hindama Bextêrya û li wir rûniştine, ko îro ji wan cîre dibêjin, Efqanistan.

Gerçî wan koçerên nûhatî xwe di nav wan miletên kevnare de winda kirinjî, lê zimanê xwe, zimanê Arî kirine zimanê tevayî, zimanê wan miletên kevnare bûne Arî, yan jî tevlihev bûne.

Lê di dawîya hezarê diwem, yan di sala 1200 berî zayînê de hin koçerên Hind û Ewrûpî bi koçemal hatine welatê Îranê û vê carê di Balqan ve hatin û bi xwe çend eşîr bûn.

Di sala 842 de Şelmanserê siyem, padîşahê Aşûrî, navên Parsêwî û di sala 836 de navê Mad anîne. Çawa ji nivîsandina padîşahê Aşûrî tê xuyakirin, welatê Parsêwî dikevî jêrê rojavayê gola Ormiye. Welatê Mad, dikevî nêzîkî Akbatan, Hemedana îro.

Lê çawa tê xuyakirin, ev herdû nav ne navê milet, belkî navên du hindama bûn. Me berî hingî dabaşa Mad, derbaskiriye. Ji lewra niha dixwazin dabaşa Pars, Faris, destpêbikin:

DEWLETA FARİS:

Miletê Faris, di nêzîkî sala 700 berî zayînê, li welatê Somaş, yan jorê welatê Êlam, ko nêzîkî çiyayê Bextyarî û rojhilatê bajarê Şoştir dikevî, nêzîkî çemê Karûn girtine. Êlamîyan, nikaribûn jorê welatê xwe ji bin destê koçerên nûhatî, yan zorkerên nûhatî derxin. Gelek diriste, ko Faris ji xwere di vê hindamêde derebegîyeke biçûk li darxistibî. Xwe dabîbin siya Êlamîyan. Li gora gotina Heredot,



Institut kurde de Paris

navê padîşahê pêşî Exmenîs bû û dibin destê padîşahê Êlamî de bû.

Tenê ji sedê diwazdehem û hetta sedê heştê berî zayînê jî, bi carek deng û pêjin ji Êlamîyan nehatiye û tiştek di destê me de nîne, ko dabaşa, Êlamîyan divê navêde bikî. Tenê dijminahî di navbera Êlam û Aşûr de gur dibî û dibî jî, hin miletên bêgane hatibin nav wan û bi xweve mabin.

Padîşahê Êlam, Hobanê Mîna, di hember Aşûrde herdem alî karîya Babilîyan dikir û çavên xwe berdabûn windakirina Aşûrîyan û di sala 692-688 berî zayînêde, leşkerekî mezin kişande ser welatê Aşûr. Cara yekem, ko leşkerê Faris dinav leşkerê Êlamîde hatiye xuyakirin, lê piştî çend şerên dijwar, Aşûrîya zora Êlamîyan birin û padîşahê Êlamî vegeriya welatê xwe.

Lê Senharîb, welatê Babil bizor xiste destê xwe û êrîşkire ser welatê Êlam û di nav xwîn û şînêde kavil û wêran hişt û kirin du perçe û berdane hev.

Herwekû, tê zanîn, miletê Faris divê çaxêde, xwe tekûz dikir û welatê Êlam bere bere dixiste bin destê xwe.

## 2- NÎSÎPÎS, KURÊ EXMENÎS:

Di sala 675-640 berî zayînêde bûye padîşahê hindama Faris, İnşan. Di çaxê wîde Faris, ji bin destê Êlamîyan derketin û serbixwe bû padîşah û dewlet.

Lê Heredot, dibêjî, kete bin destê padîşahê Mîdî. Xweştirîn Feraort, ko di wê çaxêde hevalbendên xwe dicivandin, ko bihevre şerê Aşûrîyan bikin. Lê dinav şerde Eskîzîyan, Feraort kuştin û welatê Mîdî 28 sal dibin destê xwede hiştin. Faris, diwê navêde ji bin destê Mîdîyan derketiye û serbixwe maye.

Herwekû tê xuyakirin, ko diwê çaxê bixwede Êlamî gewşek û bêkêr bûbû, yan jî bicarek xwe winda kiribû. Ji lewra Faris hindamên İnşan, Parsa, Parsomaş xistin bin destê xwe.

## 3- ARYAMENS, KURÊ NÎSÎPÎS:

Ji sala 640 hetta sala 609 berî zayînê padîşahî kiriye û navê xwe kire Şehîn Şah, padîşahê mezin, Cihangîr.

Kurê xwe, Keyxesro, kire padîşahê Somaş û jiber xweve danî. Di wê navêde leşkerê Aşûr êrîşî welatê Êlam kir û bajarê Sûsa, paytexta Êlamîyan xiste destê xwe. Nasirbal, lî jor, bajarê Mada, Gato jî girt û Tamarîno, padîşahê Êlamî vegerande ser textê wî. Lê piştî pêlakê ew jî, danî û welat bicarek, bi ser welatê xweve berda û berê xwe da rojava û giha heta bajarê Parsomaş, çiyayê Bextyarî. Padîşahê

Faris, kurê xwe Oroko, giraw li cem danî û xwe da ber siya dewleta Aşûrî.

Lê piştî pêlekê, welatê Aşûr kete bin destê padîşahê Mîdî, Keyxesro, Keyexsar. Herdû dewletên Farisên biçûk ketin bin destê dewleta Mîdî.

4- ARSAMES, KURÊ ARYAMENS, KURÊ NÎSÎPÎS, KURÊ EXMENÎS:

Di çaxê wîde dewleta Faris, herdû perçen jî ketin bin destê padîşahê Mîdî. Lê gelek neçû Qembêz, padîşahî ji Arsamêz sitand û di çaxê Keyxesrode kurê wî Heştasef, li şûna bavê xwe, li bajarê Parsa fermandar bû

5- QEMBÊZ, KURÊ KEYXESRO, KURÊ NÎSÎPÎS, KURÊ EXMENÎS:

Li bajarê Parsomaş di bin destê dewleta Mîdîde padîşah bû û bajarên Enşan, Parsa jî xistin bin destê xwe. Keça padîşahê Mîdî İstiyag ji xwere anî û ji wê rojêde nav û deng pêketin û bû xwedî rûmet.

6- KEYXESRO, KURÊ QEMBÊZÊ YEKEM:

Keyxesro,paytexta xwe bire Sasagard û gelek mizgevt û avanî têde avakirin. Gelek ji welatên hawîr xwe, xistin bin destê xwe û peymanek bi padîşahê Babil Nebonîdre girêda û bihevre çûne şerê kalikê xwe, Keyistiyag û dinav şerde kalikê xwe dîl girt û gelek rûmeta wî girt û paytexta xwe guhazte bajarê Akbatan, paytexta Mîdî. Welatê Mîdî biser welatê xweve berda û kirin yek dewlet û herdû milet kirin yekperçe.

Ji wê rojêde navê Faris, şûna navê Îran sitandiye. Welatê Mîdî bi carek kete bin destê pismamên xwe Farisan.

Di çaxê Keyxesrode, sînorê rojavayê welatê Îran- Faris, bû Derdenîl û Îraniyan welatê Lîdî, bizor xistin bin destê xwe. Çawa, ko Babil û rajorê Sûriya jî, bizor sitandin. Dîl û girtiyên İsraîliyan berdan û di sala 530 berî zayînê de Keyxesro hate kuştin.

7- QEMBÊZÊ DİWEM, KURÊ KEYXESRO:

Di saxiya bavê xwede padîşahê Babil bû û piştî kuştina bavê xwe bû padîşahê Îran. Di serê pêşîde birayê wî Berdiya, li ber rabû. Lê Qembêz liser destê fermandarekî Îranî, bi navê Comata, da kuştin.

Di çaxê wîde welatê Misrê jî, kete bin destê Îran û Qembêz sê leşkerên xwe rêkirin sûdan, Hebeş, Qertecê. Lê ji tîna pirê leşkerên Îran winda bû û di wê navêde, sergêjî ketin welatê Îran. Ji lewra Qembêz, naçare vegeriya we-

latê xwe. Lê li vegerê, li Sûriya, serê xwe danî.

8- DARAYÊ YEKEM:

Kurê Heştasev, kurê Aryamas, kurê Aryamenes, kurê Tîsîpîs, kurê Exmenîs. Di çaxê wîde, Comata bi xwe Berdiya kuş tibû. Li ser navê Berdiya doza padîşahî kir û xelk gelek lê gihane hev. Gelek qencî bi xelkê dikirin û digot, ez, Berdiya, kurê Keyxesrome. Gelek ji welatê Îran xiste bin destê xwe.

Lê dara bi leşkerekî giranve çû ser û kuşt û bû padîşah. Lê hawîr xelkê serê xwe jêre dananîn û li ber rabûn.

Li Mîdîya, Ermenistan, Êlam, Babil, Misir dijminê wî rabûn, lê Dara serê dijminê xwe zû pelixand û welat bicarek xistin bin destê xwe û serdarê leşkerê xwe Aryaner, ko fermandarê Misrê bû kuşt û rûmeta mizgevt û olperestan girt.

Ev serpêhatiyên xwe li ser lateke bilind, li Behsitûn, li serê çiyakî raserê riya Hemedan, Kermanşah, nivîsîne. Ayîna xwe, di bin siya xwedê Ahoramezda, ko serê wî ji nav rojê derdikevî, daniye, ew roj bi qiloçe û du mirov li pişt dara lingên xwe danîne ser laşê Comata, Berdiya û li pişt wan çend fermandar girêdayî bi werîsa têne xuyakirin.

Bi sê zimana ev serpêhatî, hatine nivîsandin. Farisiya kevnare, Babilî, Êlamî. Tarîxzana, ev tîpên mîxî dane zanîn, ko dibêjî: Dara, padîşahê heştem, ji Exmeniyan, Ahoramezda, bi destê wî girtiye û daniye ser textê Îran û dişerê dijminade alîkariya wî kiriye. Lê piştî, ko ji wan sergêjiyên xwe vala bû, berê xwe da rojhilat û welatê Kabûl, Peşawer, Sind xistin bin destê xwe û çû ser welatê Eskîzî jêrê welatê Rûsiya û Bosfor bizor xiste destê xwe û 700 hezar mirov pêre erîşî welatê xelkê dikirin. Piştî, ko Terakya xiste destê xwe, di çemê Danûb(Dona) derbas bû Estolê(Fîlo) wî mezin bû.

Lê gelek dijwarî ketin riya wî û heştê hezar ji leşkerê xwe winda kirin. Jiber, ko rê nasnedikirin û xwedîkirina leşkerekî wilo mezin di welatekî bêganeda gelek dijwar bû û çirav û pingav gelek ketin riya wî, naçare ma û vege riya Atîna. Xelkê Atîna, dixwestin pêre lihevbên, lê Esparta şerê wî dikirin û di hindirwê Atînade xelk li ber Hêvas, diktator rabûn û zora wî birin û bûne hevalê Esparta. Piştî çend şerên xwîndar, Yewnana bajarê Sardîs, xistin destê xwe. Leşkerê Îran careke dî bi zor ji wan sitand. Herwekû Vêrcî, Selamîs, Karbîn jî bi zor girtin, Ça

wa, ko ji rexekî dîve Estolê Farisî hin Cizîrên Yewnanî xistin destê xwe û girtî û dîl rêkirin welatê Îran, Sûsa.

Lê Partê Dîmuqratê Yewnanî, bû hevalê Îran û xwest, ko bi dara re peymanekê çêkin, dixwestin, welatê Yewnan dibin destê xwe xin. Estolê Farisî berê xwe dane Atîna, ko dihana Dîmuqratîya herin, lê bahoz li wan rabû û nêzîkî 20 hezar mirov winda kirin û nîvê Estolê Îranî hate pelixandin û çûne bin avê.

Dara, bi serdariya Danîs, padîşahê Mîdî, leşkerekî dî şande hana hevalbendên xwe û bajarê Atîna xistin asêgehê. Dinav bajerde dubendî çêbû, Kevneperest û Dîmuqrat. Lê di hember dijmin de herdû bend bûne yek, bi hevre şerê dijminê xwe kirin. Lê dawî Danîs bizor bajar girt û şaşiyeke mezin kir, ko bajar tevlî mizgevt û cihên pîroz şewitand. Xelkê bajêr kirin kole û rêkirin Îran.

Ji lewra Yewnaniyan li xwe pirsîn û gotin,"yan têne kuştin, ya dibin kole" û bihevre soz dan, ko hetta yek ji wan hebî, wê şerê dijminê xwe bikin. Karê xwe hawîr kirin û bi bawerî berê xwe dane meydana şer. Li Maraton, Dara, ji nişkave dî, ko leşkerê Yewnan li hember leşkerê wî bi gernasî rawestan. Çawa şer destpêkir Yewnanîya bi leşkerekî hindik leşkerê Dara şikandin û heft gemiyên wan dîl girtin. Jiber, ko xelkê Misrê liber Dara rabûbûn naçare Dara, vegeriya û hew giha, ko careke dî vegerî ser welatê Yewnan û di sala 485 berî zayînêde serê xwe danî.

9-SERXES EXŞEWÎRİŞ, KURÊ DARAYÊ YEKEM:

Ji sala 485 û hetta sala 464 berî zayînê padîşahî kiriye. Di saxiya bavê xwede padîşahê Babil bû. Diwazde sala li Babil maye, lê tim dixwest herî welatê Misrê û bihna xwe li wan berdî. Bi rastî mirovekî gelek zorker û dijwar bû. Piştî, ko bû padîşah çû ser welatê Misrê û gelek zor û setem li wan kirin, serê dijminê xwe bi dilhişkî pelixand û Babil bizor xiste bin destê xwe û bajar bicarek wêran û kavil hişt û xwedayê wan di nav êgirde şewitand. Navê xwe ji ser wan rakir û bi vî awayî bê rûmet kirin û paşê bi leşkerekî mezinve berê xwe Yewnanistan, 30 mirovên navdarên Îran kirin serdarên leşkerê xwe û bi xwe bû salarê leşkerê Îran. Fînîkîyan jêre pireke mezin ji qeyikan çêkirin û leşkerê wî di serve derbas bû û welatê Meqdonya, Tetalya, bê şer girtin û li Termobîl zora leşkerê Yewnanî bir û bi zor Atîna xiste destê xwe û Rakirepol şewitand.

Lê careke dî Estolê Îranî dinav bahozê de perçe werçe bû û ji hevde ket û serxweş bi çavê xwe didî, ko çawa leş

kerê wî dinav avêde winda dibî û gemiyên wî dipelixin diçin bin avê û dijmin çawa zora wan dibin.

Ji lewra gelek xeyidî û serdarê Estolê xwe, ko yekî Fînîkî bû bi darvekir. Lê Finîkî û Misrî xeyidîn û vegeriyan welatê xwe. Serxes hin ji leşker û Estolê xwe sipardin Mardotiyos, û vegeriya Îran. Lê Mardotiyos, her çiqas xwest, ko bi dijminre lihevhatinekê bikî, lê dijmina nexwestin û naçare serdarê Îranî êrîş kire Atîna û Atîna talan kir û şewitand.

Lê Yewnanî, ji desthilanîn, neketin û bi leşkerekî biçûk û di sala 479 berî zayînêde li bajarê Pelanya, dijminê xwe bi gernasî şikandin û serleşkerê Farisî şaşî kir, ko bixwe kete meydana şer. Têde hate kuştin û leşkerê wî ji hev bela bûn. Çawa, ko Estolê Îranî, li hindama Samos Salya hate şikandin û bi vî rengî leşkerê Îran bi carek hate pelixandin û Yewnan serbixwe bûn. Welatê Ewrûpa bicarek ji destê Faris derketin û padîşahê Faris hew berê xwe da rojava. Di sala 465 berî zayînêde di qesra xwede bi dizî hate kuştin.

## 10-ERDEŞÊRÊ YEKEM, KURÊ SERXES, KURÊ DARAYÊ YEKEM:

Çû şerê birayê xwe, fermandarê Xerasan Bextêrya û birayên xwe hemî kuştin. Misriyan serê xwe hildan û leşkerê Yewnan çû hewara wan, lê Estolê Farisî, Estolê Yewnanî şewitandin û Misrî bi zor xistin destê xwe. Sergêjiyên, ko li Sûriya, Babil çêdibûn vemirandin. Lê sînorê rojavayê Îran careke dî, vegeriya çemê Halis, Qizilêrmak û di sala 424 de serê xwe danî.

## 11-DARAYÊ DÎWEM, KURÊ ERDEŞÊR, KURÊ SERXES, KURÊ DARAYÊ YEKEM:

Di çaxê wîde gelek sergêjî di îande çêbûn. Lê zêrê Îranê vê carê gelek alîkariya Dara kirin. Meger çendan leşkerê Îran şikest, lê zêrê Îran, niha dixwazin leşkerê dijmin berdin hev, ta, ko bikévin bin destê Îran. Bi zêra Îsparta û Yewnan berdane hev. Dara, Tîsafern, mirovekî jîr û rêzan rêkire welatê Yewnan. Vî mirovî zêr rijandin û leşkerekî kurtêlxwer pêkanî û Îsparta kirin hevalbendên xwe. Lephilanîna Sardîs, walî dane kuştin, lê kurêSardîs kete şûna bavê xwe. Dara peymanek bi Îspartare girêda û bihevre çûne şerê Atîna. Çend bajarên Yewnanistanê carekî dî xistin destê xwe. Leşkerê Farisî di wande danî û salyana çend salan ko li ser wan mabû, ji wan sitand. Piştî pêlakê peymaneke

dî, bi İspartare çêkir û welatê Yewnan xiste bin destê wan bi zêrê Farisî, İsparta bûne xwedî dewlet û padîşah. Di çaxê wîde li Mîdya lephilanînek rûda. Li Misrê mizgevtên cihiwan şewitandin. Estolê Farisî di çend şerande şikestin û ji hevdeketin.

Lê dawî carakî dî Yewnanistan kete bin destê Faris. Jina padîşah, kurê xwe Keyxesro kire padîşahê Lîdya, Vêrciya û Kebadokya û kire serdarê leşkerê rojava û Dara di sala 404 de serê xwe danî.

## 12-ERDEŞÊRÊ DİWEM, KURÊ DARAYÊ DİWEM:

Ji sala 404 hetta sala 359 padîşahî kiriye. Di mizgevta Basagardde birayê wî Keyxesro, xencerek lêxist û kes nizanî çawa nehate kuştin. Lê Erdeşêr, li ser hêvîkirina diya xwe, birayê xwe azad kir û şande rojava, cihê wî. Lê birayê malwêran, bivê qenciyê dilxweş nebû û leşkerê Îranî û 13 hezar leşkerê Kurtêlxwer bixwere anîn û heta şerê birayê xwe. Li hêla Babil, di meydana şerde hate kuştin. Leşkerê wî ên Îranî xwe dane destê Erdeşêr û Yewnanî, leşkerê Kurtêlxwer, bi serdariya Ksenîfon, di Kurdistanêve vegeriyan ser Pingava Reş û çûne welatê xwe. Sergêjî di İmparatoriya Farisîde pir bûn.

Yewnaniyan, serê xwe hildan û doza serxwebûna welatê xwe kirin. Çawa, ko Fînîqîyan jî serê xwe hildan û xwestin ko welatê xwe jibin destê Îranîyan derxin. Her ûsa xelkê Misrê jî serê xwe hildan û serbixwe bûn. Cizîra Vêrcî û Sûriya doza gerdanazadî dikirin. Fermandarên ji derve li ber padîşahê xwe rabûn û Damatîs fermandarê Îranî, ko li Misrê bû, doza padîşahî kir. Leşkerê Misir û Îraniyên, ko pêre bûn, di çemê Feratve derbas bûn û berê xwe dane welatê Îran. Kurê padîşah hew karibû serdariya leşkerê bavê xwe bikî. Ji lewra naçare padîşah bixwe bû serdarê leşker.

Lê bextê Erdeşêr, sipî bû, ko di wê navêde xelkê Misrê, li ber firewnê xwe rabûn. Naçare, destê xwe ji hevalbendên xwe kişand û Damatîs poşman bû û padîşah ew azad kir û vegerande cihê wî. Li herder ewên, ko serê xwe hildabûn vegeriyan û gerdana xwe ji padîşahre xwar kirin. Leşker û xelkê welêt bê fermana padîşah, gelek ji wan kuştin. Çawa, ko wê paşiyê Damatîs di civata padîşahde hate kuştin û di sala 359 de serê xwe danî.

## 13-ERDEŞÊRÊ SİYEM, KURÊ OXOS, KURÊ ERDEŞÊRÊ DİWEM:

**Mirovekî hişk û dijwar û xwînrêj bû. Lê gelek hêja û mirovê dewletê bû. Seza û hêjayê İmparatoriya Îran bû. Ji rê**



Institut kurde de Paris

ve birayên xwe bicarek kuştin û paşê ew lephilanînên, ko di çaxê bavê wîde hebûn, vemirandin û dijminên xwe pelixandin. Yewnaniya, leşkerê xwe bipaşve kişandin û serê xwe jêre danîn. Erdeşêr, berê xwe da welatê Misrê, di rêde kasa xeyd û zor û setema xwe biser bajarê Seydade rijandin. Jiber, ko nû serê xwe hilda bû û bajar tevlî xelkê şewitandin. Firêwnê Misrê reviya û çû Etîopya. Leşkerê Îran, bajar û mizgevtên wan talan kirin û şewitandin. Pîr û olperestên welêt tevde kuştin. Bi vê zor û setemê sînorên Îrana kevnare fireh kirin û vegerandin û serê dijminên xwe pelixandin.

Lê mirovên weke İzoqrat, dinav miletên rojavade dengê xwe bilind kirin û gotin, ey miletên bindest, serê xwe hildin, bibin yek û destê hev bigrin û welatên xwe ji destê zorker û xwînxwaran biparêzin û serxwe bibin. Em, hatih û hebûna welatê xwe bixun.

Miletê Mekdonya, ko hêj nû serê xwe hilda bû, ev barê giran, barê yektiya welatê Yewnan da ser milên xwe. Meger çendan Mekdonî ne ji miletê Yewnan bûn jî, lê bi zimanê Yewnanî dipeyîvîn û xwendin û zimanê Yewnanî dinav wande cihên bilind girtibûn. Sînordaşên rajorê welatê Yewnan bûn ko di kevin navbera Yewnan, Sirbistan, Bilgaristan, Turkya îro.

Çawa, ko fermandarê Mekdonî, Fîlîp, dilê xwe bijandibû imperatoriyeke mezin û dixwest şûna Îraniyan bistênî. Belam Dîmostîn, ko zanakî Yewnan bû, li Atîna, nedixwest, ko welatê Yewnan ji bin destê Faris derkevî û bikevî bin destê Mekdonya.
Dîmostî, ji ber xweve çend mirov rêkirin bajarê Sûsa û bi padîşahre, dan û sitandin, dawî peymanek di navbera xwede çêkirin. Lê çawa Fîlîp, dî, ko bi haştî Yewnanî naxwazin xwe bidin bin taca wî, berê xwe da welatê Yewnan û di sala 338 de bizor xiste bin destê xwe. Herwekû di wê salê bixwede Erdeşêrê siyem, bi destê serdarekî xwe hate kuştin.

14-DARAYÊ SİYEM - KOHDÛMAN(ÇİYAYÊ Bİ MİJ):

Di çaxê wîde welatê Îran gavên xwe sivik ber bi newala mirinêve tavêtin. Ezezî, Xudperestî gihabûn heta pozê fermandar û serdar û malbatan. Heryek dixwest bibî padîşah. Miletê derve, ko di bin destê Farisde bûn, çavên xwe vekirin û dilê xwe bijandin serxwebûn û padîşahîyê. Hew kesî guh dida qanûn û destûra dewletê. Berdîberdanê hindirwê welêt dagirtibû. Bi kurtî dewlet û welat ji hevde xilxilî bû û hew dikaribûn xwe li ser xwe bigrin.

Divê çaxê bixwede, dewleteke ciwan nûhatî, çiyayî, di Mekdonya de gavên xwe ber bi serbilindî û payedarîve tavê-tin. Lê Fîlîp di wê navêde bi destê dijminekî xwe hate kuş tin. Kurê wî İskender, kete şûna bavê xwe û sivik gavên xwe bere pêş avêtin û çavên xwe berdane taca Îran, xwest tola welatê xwe ji wan bistênî û taca Îran bidî serê xwe.

Herwekû dinav dilê ÎrandeBegras, serdarê xwînxwar, padî şahê Îran Erdeşêrê siyem bi jehrê kuşt. Ersîbis, kurê Erde şêr, Oxos kire padîşah û piştî sê salan ew jî kuşt. Dara Kohdûman, çiyayê bimij kire padîşah û dixwest, ko ji xwere bihêlî.

Çi dema, ko dawiya dewletekê, malbatekê bê, dibin weke dareke kevnare, ko hew dikarî berê hêja bidî, dawî pelên wê hişk û ziwa dibin û diber bê diçin û kurm hindirwê wê diherivênin û zû ber bi mirinêve gavên xwe tavêjî. Herwekû ev di jînê tarîxêde tiştekî tevayî û herdemîye û weke des tûreke tarîxi ye.

Ev dewlet û malbat gelek caran bi destê kole û berdestî û serdarên xwe têne windakirin. Ev dikevin şûna wan, yan jî didin destê dijminê xwe. Darayê siyem, mirovekî gelek zana û gernas û birewer bû. Lê bextê wî ne sipî bû, ko di çaxekî wilode hate ser text, ko dijminê wî İskenderê Mekdo nî, di welatê rojavade gavên xwe sivik tavêtin, welatê Î-ran ketibû qûnaxa mirinê û ber bi kortala mirinêve digindi rî.

İskender, berî her tiştî dest bi welatê xwe kir û dij-min di nav xwede nehiştin û bicarek perçiqandin. Damarên sergêjî, dijminayî ji kokê rakirin û welatê Yewnan, bi ser welatê xweve berda. Leşkerekî giran, tekûz, hînbiwî ji xwe re pêkanî. Çawa, ko çek û alavên şer li cem xwe civandin û bi pêşve birin. Bi dilxurtî berê xwe da welatê Îran.

Herwekû di wê çaxêde, xelkê welatê Yewnan bûbûn du per-çe: Yekî digot, meger çendan padîşahiya Mekdonya li ser Yewnan, tiştekî giran û dijware jî, lê çawa hebî, em tev xelkê rojava, hevsînor û hevderd û hevzimanin. Padîşahiya, Îran, miletê bêgane, dijminê miletan dijwartire û ji mere kêmasiyeke mezin û bêrûmetiyeke dijware. Lê bira dî, digo-tin, em bi saya serê padîşahê Îran û firehiya İmperatoriya Îran dewlemend û serbilind bûne. Abor û hatina welatê me roj biroj bêtir û mezintir dibin, Lê Mekdonya di bin guhê mede ye û di karî her gav me bipelixênî û bi carek nav û nîşanê mejî winda bikî û welatê me biser xweve berdî. Lê jiber, ko Faris , gelek ji me dûre, nikanî zûzû me winda



Institut kurde de Paris

bikî.

Herwekû çawa İskender li mezinahî û serbilindiya malbat û milet û welatê xwe digeriya, wilojî milet bazirganên welatê Yewnan-Mekdonyajî, dixwestin bajar, dan û sitandin, meydana sermeyanê wan fireh û mezin bibin. Jibo, ko zêde dewlemend û maldar bibin.

İskender, bajarê Tîbê, ko serê xwe hilda bûn bicarek şewitand û xelkê bajêr kirin kole û firotin û ji Yewnanre got, kî ji we bixwazî wilo li wan bê, berê serê xwe ji min re derxî.

Lê welatê Atîna çendan, ko di bin destê wîde bû, hevalbendên wî bû. Lê ji 8 hezar leşker û perçak ji Estolê Atîna pêve, tiştekî dî jêre pêşkêş nekirin. Tenê İskender baweriya xwe bi leşkerê Mekdonî tanî û pişta xwe bi wan xurt dikir.

İskender, li ser qeyika, keleka, di Bosforve derbas bû û Terwada bi zor xiste destê xwe û berê xwe da meydana şer. Lê Dara Kohdûman, paxav ji leşkerê İskender nekir. Di dilê xwede digot, ev mirov ji ser xwe çûye û di şerê pêşîde wê di nav lingê hespade bê perçiqandin. Gelek guhê xwe nedayê û ferman da û got, li ku win İskender bibênin, wî bigrin û ji minre bişênin, ko bi bend û zencîran wî rêkin bajarê Sûsa, paytexta Îran. Çil hezar mirov rêkirin meydana şer û memnûn fermandarêRodis, serleşkerê Dara bû. Lê İskender bixwe bû serdarê leşkerê xwe û dibin destê wîre Barmêtûn, serdarê leşker bû û di milê çepê leşkerê Mekdonîde bû.

Leşkerê Mekdonî 30 hezar peya û 5 hezar siwar bûn û di dest rimbazade rimên heft metir dirêj hebûn. Qame - şûrên kin bûn, bi xoze û zirxên hasinî, poladî û beran, mengenîk bi wanre hebûn. Bi vî leşkerê hindik, leşkerê Îranê şikand û li Gertîkos, cara pêşî şikandin. Leşkerê İskender di avêre derbas bûn û nîvê leşkerê Îran hate kuştin û girtin. Lê siwarekî Îranî ajote ser İskender û hindik mabû, ko bikujî lê serdarekî wî siwarê Îranî ji ser vegerand û destê siwarê Îranî tevlî şûrê wî firand û İskender hate parastin û leşkerê İskender, rû birû li hember Dara rawesta.

Leşkerê Dara 600 hezar mirov bûn. Li kilîkya, nêzîkî bajarê Êsûs, li deşteke teng, ko têre leşkerê Dara nakî, şer destpêkir. Her çiqa serdarekî Dara, jêre got, ev tengedeşt bikêr şerê dijminê te nayê, jiber, ko carek leşkerê te, tê hilnayê û carekê jî Mekdonî xelkê çiyane, ji me çêtir di karin di vî cîde şer bikin.

Lê Dara , guh nedayê û got, bawer nakim, ko di cihanê de leşkerek hebî, ko karibî xwe li ber himbêza leşkerê min bigrî. Dara, ji ber, ko leşkerê İskender hindik bû, gelek waza û sêfil didît û jê neditirsiya. Lê çawa şer destpêkir leşkerê Îran xwe li meydanê negirt û zû şikest û Dara, naçare bi paşde vegeriya. Ev sala 332 ji Mekdonyare saleke pîroz û giranbiha bû, ko çil hezar leşkerê Mekdonî, şeşsed (600) hezar leşkerê Îranî, navdar şikandin.

Leşkerê Mekdonî sivik gavên xwe avêtin û bi serdariya Parmînon, leşkerê Mekdonî bajarê Dimişq xiste destê xwe, jin û zar û zêçên padîşahê Farisî têde dîl girtin. Çawa İskender texterewan û çadir û alavên mala Dara, ko hemî ji zêr û bi zêr xemilandî bûn, dîtin kire qêrîn û got, padîşahî gereke wilo bî û gelek bi dilovadî dê û jin û zarokên padîşah axavtin û bi rûmet ew xistin qesreke mezin û keça Dara markir.

Ji bajarê Sor pêve kesî li ber İskender serê xwe ranekir. Piştî heft mehan bajar bi zor girt û heşt hezar mirov serjêkirin û heştê hezar firotin û çû bajarê Xeza û mirov bicarek kuştin û jin ji xwere birin. Lê xelkê Misrê jêre şahî li darxistin û pîrekî olperest jiber xweve kire fermandarê welêt. Bajarê İskenderiye, li şûna gundê Raqore, avakir. Di sala 331 de berî zayînê ji Misrê derket û berê xwe da welatê Îranê, leşkerê wî bû 50 hezar. Dara milyonek leşker dahev û karê xwe û şerê dawî kir. Hin paytonê bidas û leşkerê Mekdonî kete nav tirs û sawiran. Çawa İskender bixwe jî, ji vê firehbûna welatê xwe ditirsiya.

Dara, 20 milyon zêr li ser welatê vebirîn, ko hersal bidî İskender. Lê qîma xwe nanî û dirêjî welatê Îran kir û li Erbîl leşkerê Dara, şikand û welatê Babil bêşer kete destê Mekdoniya û berê xwe da Persîpolîs, paytexta Îran û bajar talan kir. Qesra Dara, şewitand û berdî berdan dinav bajêrde çêkirin. Her tişt dane nav linga û bajar dinav zor û setemêde perîşan hiştin. Jin û zarok talan û berbad kirin û sê sala şer dinav welatê Îrande dirêjkir, heta, ko Dara hate kuştin. Hin dibêjin, Dara bi destê wezîrê xwe hate kuştin û hin dibêjin, bi destê du pêwanên xwe hate kuştin.

Di sala 322 berî zayînêde Dara hate kuştin û welatê Îran piştî dehsal şer keta destê leşkerê Mekdonî û İskender welatê Îran di nav serdarên xwede parvekir û Kurdistan kete bin destê Betlîmos û li bajarê Bedlîs rûnişt. İskender giha hetta çiyayê Hemalaya û ew welat bicarek xistin bin destê xwe. Di per avê pingava Hindê re vegeriya bajarê Sû-

Institut kurde de Paris

sa, paytexta Êlamîya. Lê bi rêde nêzîkî deh hezar ji leşke rê wî mirin. Li Sûsa bi şahiyeke mezin, Sitatêra, keça Dara li xwe markir. Di sala 321 de û hin dibêjin di sala 323 de serê xwe danî û tac û text û welat bicarek bi şûn xweve hiştin û çû bin axa sar.

13.3.1967 Cigerxwîn

Institut kurde de Paris

# DESTPÊKA ÊRIŞÊN EREB LÎ SER WELATÊ KURD Û FARİS

Di sala 8'ê koçîde Mihemed Peyxamber, nivîsarek rêkire cem Kesra û Ebdilah, kurê Hezafe, çawa nivîsara Peyxamber da destê wî xwend û çirand û got, eger agir ne gelek pîroz bûna, minê bişewitande û bi xeyd şande ceme serdar û fermandarê xwe Bazan, ko Yemen û Hicaz di bin destê wîde bûn, got, du mirovên dilhişk rêke pey vî mirovî û wî rêkin cem min.

Serdar Bazan, Babo û Xerxesre, du mirovên sinbêl mezin, rî kurkirî, bi tirs û saw rêkirin û nivîsarek ji Mihemed re şand û got, dixwazim bi wanre herî cem Kesra û ezê mehdera te licem padîşah bikim, lê, ko neçî, tu û miletê te têne perçiqandin. Çawa nivîsar ji Mihemedre xwendin, ji wanre got, sibehî werin cem min. Di wê şevêde mizgîn ji Mihemedre hat, ko Şêroye bavê xwe kuştiye.

Çawa sibehê herdû mirov hatin, Mihemed ji wanre got, ezê herim cem kê?, gotin, tê herî cem padîşah Perwîz, lê Mihemed ji wanre got, Şêreweyh, bavê xwe kuştiye. Lê wan ew gotin kirin bihane û gotin, eger rast derket, em dizanin tu peyxemberî û piştî qesekê mizgîn ji wanre hat, ko padîşah Kesra hate kuştin. Herdû mirov misilman bûn û Mihemed, gelek perwa û diyarî ji Bazan re şandin û got, eger misilman bibî, ezê te li ser fermandarîya te bihêlim û gelek qenciyê bi te bikim. Bazan misilman bû û bê şer Yemen kete destê Misilmana. tevlî leşkerê Îranî bûne hevalê Mihemed û

Institut kurde de Paris

xwe sipartin dewleta İslamê. Bazan, bi fermandarî ma, **heta** ko serê xwe danî. Piştî mirina wî, kurê wî Şehir, bû fermandarê Sena û paşê li ser destê Eswedê Ensî hate kuştin û Eswed jina wî Azad, markir, lê Azad û Feyrûz û Dazoye, Eswed kuştin, serdariya leşkerê Ebna kete destê Feyrûz û Dazoye.

Lê paşê Dazoye, bi destê Qeys, hate kuştin û Feyrûz kete serê çiya. Lê misilmana, Kurd, Faris û Deylem, ji Yemenê derxistin û Feyrûz ev serpêhatî ji Ebîbekirre nivîsî.

Ew zarokên, ko diya wan Ereb û bavê wan Kurd, Faris û Deylem bûn, yan dê Ereb û bav Ecem bûn û pêlake dûr û dirêj bi payedarî di Yemende mane.

Di sala 12 koçî de, padîşahê Hicazê, Ebû Bekir, bi serdariya Xallidê Welîd, leşkerekî mezin rêkire ser welatê Îran, Kurdistan û di serê pêşîde, bajarên Baniqya, Elîs, Barosma, Salyan dane leşkerê Ereb. Dewleta Hicaz û xwe dane ber siya wan.

Lê Ebû Bekir, leşkerekî dî, bi serdariya İyad, kurê Xenem, di riya Mesîxre şande han û hewara Xalid. Ji serdarên Erebên navdar Qaqa, kurê Emroyê Temîmî, Ebid, kurê Ewsê Humyerî, Musena, kurê Harîse Hermele, Mazûr, Selmî bun. Di bêjin, leşkerê herdû serdaran 18 hezar siwar bûn û êdî kurê Hatem bi leşkerê xweve bi xalidre bû.

Serdarê leşkerê Îran-Kurdistan, Hirmiz Eswar bû. Hirmiz ev hatina leşkerê Ereb şande ji Kesrare û bi leşkerê xweve çû pêrgî leşkerê dijmin û berî Xalid kete Hefîr û Qubad û Enoşcan, herdû kurên Erdeşêrê mezin kirin serdarê leşkerê xwe û xistin pêşingê.

Lê Xalid berê xwe da Kazimê, tenê Hirmiz, berî wî giha Kazîme. Lê naçare Xalid kon û çadirên xwe vegirtin û şerê pêşî destpêkir, Hirmiz û Xalid ketin meydana şer û bi gernasî çûne hev, lê Qaqa, bi dizî, ji paşve êrîş kire ser Hirmiz û bi rimê ew kuşt û ji nûva herdû leşker ketin şer.

Di vî şerîde Ereban, gelek ziyan gihandin dijminê xwe û Qubad û Enoşcan, bi mêranî xwe parastin û leşkerê Îran perîşan hate şikandin û gelek ji wan hatin kuştin û navê vî şerî kirine, Şerê Zencîran(Herbiselasil).

Ji ber, ko Qubad û Enoşcan xwe bi zencîra girêdabûn, ko nerevin. Lê naçare reviyan û xwe parastin.

ŞERÊ ÇEMKE :

**Serdarê leşkerê Îran, Qarîn bû, Di nav şerde Qarîn li ser destê Maqel, kurê Aşa, hate kuştin. Enoşcan bi destê A**

sim û Qubad bi destê Edî, kurê Hatem hatin kuştin. Sîh hezar ji leşkerê Îran divî şerî de winda bûn, hatin kuştin. Lê kuştiyên Ereb nehatine zanîn.

ŞERÊ WOLKE WOLCE :

Erdeşêr, padîşah, serdarê navdarê leşkerê Îran Enderzexer, şande şerê Xalidê Welîd. Li pey wî leşkerekî mezin bi serdariya Behmen Cadoya, şahde hana wî. Li vê hindamê şere kî xwîndar û dijwar destpêkir û careke dî leşkerê Îran şikest. Serdarê navdar Enderxezer, li çolê ji tîna serê xwe danî. Gelek dîl ketin destê Ereban.

ŞERÊ ELÎS :

Divî şerîde serdarê leşkerê Îran, Serdar Çapanê Kurdî bû. Heftê(70) hezar ji leşkerê Îran-Kurdistan hatin kuştin û bi dîlî ketin destê leşkerê Ereb. Ereban dîl jî kuştin . Divî şerîde hin Ereb jî, di nav leşkerê Îrande hebûn. Piştî şikandina leşkerê dijmin, leşkerê Ereb bajarê Menîşya, xistin destê xwe û wêrankirin. Xalid, ev xurtî û serpêhatî ji padîşahê Erebre nivîsî.

ŞERÊ BADİQLÎ :

Serleşkerê Îran, Merziban, ji Hîre derket û hate şerê Xalidê Welîd. Lê çawa bihîst, ko Erdeşêr, Kesra hate kuştin, bêşer vegeriya. Kurê Ezdabe hate kuştin û Hîre di sala diwazdehan(12) koçîda hate girtin. Leşkerê Ereb bajarên Enbar, Eyntemir, li ser Ferat xistin destê xwe. Şêrzad ji Enbar û Behram, ji Eyntemir reviyan û çûne eywana Kesra. Herwekû Rozmehir û Rozabe, herdû serdar, li ser Hesîr û Xenafis hatin kuştin.

Lê gereke divirde em hinek ji rewşa Îran-Kurdistan, bidin xuyakirin, ka çawa di wê çaxê bi xwede, berdîberdan û ji sergêjîyan hatibûn dagirtin û gelek ji İraq, ji bin destê Îran derket û Yemen û Behreyn ji destê leşkerê Îran-Kurdistan derketibûn. Şehreberaz serê xwe danî û Hirmiz Cadoye hate kuştin. Erzemîdoxt, keça Kesra, Perwîz bû padîşah û bi zor dane Firoxzad. Keçikê ev yek ji xwere bi kêmasî dît û destgirtiyê xwe bi destê Siyahxweşê Razî da kuştin careke dî bû padîşah û Sabûr da kuştin.

Lê di hember van sergêjî û bextreşiyande welatê Ereb bi alîkariya ola İslamê gavên xurt û ciwan û mezin berepêş ta vêtin. Herkes hawîr berê xwe didane ola İslamê û baweriya xwe pê tanîn. Di dilê xwede bi dizî misilman dibûn û dixwestin kengî ji bin zor û setema dewlet û serdar û ferman

darên Îranî, derebeg, axa, xan û zorkerên paşdemayî derkevin ronahiya ola Îslamê hawîr tîrêjên xwe belav kiribûn.

Padîşahê Hicazê ê diwem Ebû Bekir, di sala 13 dehê koçî de serê xwe danî û Umerê kurê Xetab kete şûna wî.

3- UMER, KURÊ XETAB :

Mirovekî navdar û payebilind û jîr û dîmuqrat bû. Padîşahê nû gelek ji serdarên kevnare danîn û hin serdarên dostên xwe, ko bi wan bawer dibû xistin şûna wan.

Padîşah Umer, bi serdariya Musena, kurê Harise yê Şeybanî, leşkerekî mezin şande ser welatê Îran-Kurdistan. Ebû Ubeydê Seqefî û Selît, kurê Qeysê Ensarî, serdarên navdarên leşkerê Musena bûn. Gelek mirovên navdarên dî jî di nav leşkerê Îslamê de hebûn.

Herweku divê çaxê bi xwede padîşahê Erzemîdoxt û Siyahweşê Razî, padîşahê berî wê, Sabûr û fermandarê navdar Firoxzad, ko fermandarê Xerasan bû kuştin.

Rustem, kurê Firoxzad, bi leşkerekî giranve hete Eywanê û Siyanweşê Razî kuşt û çavên padîşahê rijandin. Boranşah, keça Perwîz, xuşka Erzemîdoxtê kire padîşah.

Lê Rustem, çavên xwe berdabûn padîşahîyê û çavnêriya çax û demên xwe dikir. Ji lewra dixwest serdarên navdar ji ber xwe derxî û kesî xwedî dev nehêlî. Jiber vê yekê, serdarê navdar, Çapan rêkire meydana şer û çapan heta girtin û Merdan Şah, serdarê navdar hate kuştin. Leşkerê Îran, li Nemarîq hate şikandin û heçî ji wan sax mabû, hatin cem Nersî, Mixaletiyê padîşah û li Kesker gihane hev. Çawa, ko du kurxalên padîşah, Bendeweyh û Tîreweyh jî, bi Nersî re bûn. Çawa, Boran Şah û Rustem, bihîstin, Çapan hate girtin û leşkerê Îran şikest, fermandarê navdar Calînos, bi leşkerekî mezin ve şandin cem Nersî û ji nûva şer destpêkir.

Lê careke dî, leşkerê Ereb, zora leşkerê dijmin bir, bajarên Zenderûd, Paroşma, Zowabî bizor xistin destê xwe. Gelek ji leşkerê Îran bi dîlî ketin destê dijminî xwe.

ŞERÊ CALÎNOS :

Bi serdariya Ebû Ubeyde, leşkerê Ereb, leşkerê Îran şikand. Baqîsyata xistin destê xwe. Calînos, vegeriya cem Rustem. Cereke dî Rustem, bi serdariya Behmen Cadoye û Calînos, leşkerekî giran û siwarên fîla rêkirin meydana şer. Behmen, Derefşakawe hilda û berê xwe da şerê dijmin. Leşkerê Îran, zora leşkerê Ereb bir û gelek ji wan kuştin û nêzîkî çar hezar ji leşkerê Ereb di nav avêde hatin windakirin. Ebû Ubeyda, serdarê leşkerê Ereb di bin lingê fîla de

hate kuştin. Musena, kurê Hariseyê Şeybanî birîn bû û dawî bi vê birînê serê xwe danî. Behman vegeriya Mehreseyr Medain Eywanakesra

Kurê Êsîr, dibêjî, ev Derefşakawe, çar gaz(72cm) dirêj û du gaza fireh bû. Ji çermê pilinga hatibû çêkirin û di rojên tengasîde hildigitin xelkê welêt li ber Rustem rabûn û bûne du bendî.

Lê padîşahê Hicazê, haneke mezin ji Musenare rêkir û ji hawîrve leşkerê Ereb gihane hev. Dixwestin xwe diber ola İslamêde bidin kuştin, ko herin bihiştê û keçikên ciwan ji xwedê bistênin.

ŞERÊ BİWEYB :

Rustem û Feyrezan, Mihranê Hemedanî, kirin serdarê leşker û şandin şerê Musena, serdarê leşkerê Erebê navdar. Leşkerê Mihran di Ferat derbas bû û ji nûve şerekî mezin û dijwar destpêkir. Mihran dinav şerde hate kuştin û leşkerê wî şerpeze ji hev belav bû û talanekî mezin kete destê Ereb. Herwekû divî şerîde birayê Musena hate kuştin û çend serdarên navdar pêre serê xwe danîn.

ANÎNA YEZDÎ GURD :

Çawa xelkê Îran-Kurdistan dîtin, ko çi bi serê wande tê. Ereb ketin nav welêt û serdarên mezin û navdar ji meydanê winda bûn.

Naçare lihev kom bûn û gotin, Rustem û Feyrezan, yan divê win lihevbên û yan jî, eme we berî milet û welat bicarek herin bikujin. Ji lewra û naçare Rustem û Feyrezan , Yezdîgurd kirin padîşah û Poran Şah ji ser textê Îran avêtin û tevan serê xwe jêre xwar kirin. Herkesî ji mala xwe bi çek û bosatên xweve bi gernasî berê xwe dane meydana şer û li hev civiyan. Rustem bi xwe bû serdarê leşker û bi heytehol çû şerê dijminê xwe. Lêdi meydana şerde li Qadisiyê hate kuştin.

ŞERÊ QADİSİYÊ :

Herwekû tê xuyakirin, gereke leşkerê Îran zora leşkerê Ereb biribî. Ji lewra padîşahê Hicaz, Umerê, kurê Xetab, xwest, ko bixweherî şerê dijminê xwe. Lê xelkê nehişt û naçare Sadê kurê Ebîweqqas kire serdarê leşkerê Ereb û şandehana Musena. Sîh hezar siwarên gernasên Ereb rimbazên navdar li Qadisîyê gihane hev. Lê berî, ko Sad bigihê Qadisîyê, Musena serê xwe bi birîna xwe danîbû. Ji lewra Sad bixwe bû fermandar û serdarê leşker.

Di bin destê Sadê Ebî Weqqasde serdarên navdarên Ereb, Humeyse, kurê Naman, Umer kurê Madîyekrib, Ebûsîre kurê Zueyb Yezîd, kurê Heres Hebîb, kurê mislime û Museylema bûn. Herwekû Bişir kurê Ebdilahê Hilalî jî, yek ji serdarên leşkerê Sad bû.

Selmanê Farisî, rêber û rêzanê serdarê navdar Sadê Ebîweqqas bû. Lê di nav şerde Rustem hate kuştin û leşkerê Îran şerpeze şikest. Gelek ji wan bi dîlî ketin destê dijminê xwe. Leşkerê Ereb berê xwe bi gernasî da welatê kurdistan-Îran û hatin ser eywana Kesra Mehreseyr Medain.

Di dawiya sala 14 dehê koçîde bajarên Persîpolîs, Babil Guttî ketin destê Ereban û çend serdarên weke Feyrezan, Xêrxan, Mehran û Hirmizan di wan hindaman de mabûn. Lê piştî çend şerên sivik, reviyan û her yek bi cîkîde çûn. Hirmizan, çû Ehwaz û Feyrezan, çû Nehawend û Xêrxan û Mehran, çûne Eywana Kesra.

Di dawiya sala 14 de Sadê kurê Ebîweqqas, Selma jina Musena, markir û qesrek jêre li Qadisiyê avakir.

Di sala 16 de Sadê, kurê Ebîweqqas, bajar xiste destê xwe û Şehreyar, fermandarê Sabat, bû hevalê Ereb û zor dane şerê Debaba û Mencenîqa û kevir û kuçik biser bajêrde barandin. Piştî deh mehan, bizor bajar xistin destê xwe û çemê Dicle bû sînorê herdû leşkeran. Leşkerê Îran di Eywanêde bûn û leşkerê Ereban di Mehreseyrde bûn, yanî çem di navbera herdû leşkerande bû. Lê paşê, leşkerê Ereb, bi siwarî diavê derbas bûn û Yezdîgurd gewherên dewletê û herçî tiştên giranbiha û sivik birin û bi leşkerê xweve çûne Helwan. Leşkerê Ereb, Eywan talan kirin.

Kurê Esîr dibêjî, di Eywanêde bêjimar gewher û malê paqij û giranbiha ketin destê Ereban û tac, zirx û kincên kesra bicarek girtin û gelek tiştên hêja û giranbiha di nav wande hebûn û dibêjî, Kafûr, li şûna xwe dixistin nav hevîr. Zêr li şûna zîv difirotin û kurê Esîr pêde diçî û dibêjî, 60 hezar siwarê Ereb ketin Eywanê û her yek ji wan diwazde hezar dînar para wî ketin û ji bil ê, ko li belangazan parvekirin.

CELEWLE Û HELWAN :

Serdarê navdar, Behramê Razî, serdarê leşkerê Celewla bû û erx li hawîr bajêr kola bûn.

Lê bi serdariya Haşim, kurê Utbe leşkerekî ji diwazde hezar siwar, çûne ser Celewla û bi zor girtin. Kurê Esîr dibêjî, sedhezar ji leşkerê Îran-Kurdistan di bajarê Celewlade hatin kuştin û girtin. Lê nabêjî, ka çiqas ji leşkerê

Institut kurde de Paris

Ereb hatin kuştin.

Lê çawa Yezdîgurd, ev serpêhatî bihîst, rev ji mirinê çêtir dî û ji Helwan derket û çû bajarê Rey-Taran û Xesro, kire serdarê leşkerê Helwan. Sad, bi serdariya Qaqa leşkerekî mezin şande ser Helwan û Zeynebî, fermandar û mezinê bajêr hate kuştin. Xesro, ji Helwan derket û leşkerê Ereb bajar bê şer sitandin û Qaqa têde rûnişt. Lê paşê yek bi navê Qubad kire fermandarê welêt û bi xwe çû Kûfa. Mehran, serdarê navdarê Îran, bi destê Qaqa hate kuştin. Feyrezan, xwe kişande çiyayê kurdistan û têde asê bû. Jin û zarok û mal gelek ketin destê Ereban û gelek ji Kurd û Faris û Deylem û Cîl, xelkên kurdistan û Îran hatin kuştin.

Herwekû Tikrît, Mûsil, Nînowa û bajarên kurdistanê Banhezra, Hebtûn, Dasin, Baqirdî, Bazibdî û Kelehên Kurdistanê bicarek ketin destê leşkerê Ereb û li ser destê Rabîî hatin girtin.

Lê hin dibêjin, li ser destê İyadê, kurê Xenem, bajarên Kurdistanê hatin sitandin.

Hamiş dibêjî, Baqirdê û Bazibdê, du kurê-du deştin - du bajarin, li hember hev û nêzîkî çiyayê Cûdî ne.

MAHSEBZAN :

Bi serdariya Azîn, kurê Hirmizan, di Mahsebzande, ko gelek diriste Şax û Heler, leşkerekî Îran hebû. Sadê, kurê Ebîweqqas bi serdariya Haşim, kurê Utbe leşkerek şande ser û di nav şerde Azîn hate kuştin. Haşim kete nav bajêr û heta Serwan kete destê wî. Lê xelkê Mahsebzan ketin serê çiya û Haşim bextê xwe da wan û vegerandin nav bajêr û kurê Ezîl kire fermandarê wê hindamê û vegeriya cem Sad. Hin dibêjin, girtina Mahsebzan, piştî girtina Nehewende.

CİZÎRE :

Lê dibêjin, bajarên Cizîrê, Cizîra Bota, Nisêbîn, Heskîf, Serê kaniyê, Heran, Riha, Mardîn, Tûrabidîn, Amed, Erzen, Bedlîs, Xelat bi carek li ser destê İyad hatine girtin.

Lê Meletya, li ser destê Hebîb, kurê Muslime hate girtin û careke dî xelkê Meletya bûne dijminê İslamê û careke dî li ser destê Hebîb, kurê Muslime di çaxê Meawiyede hate girtin

AHWAZ :

Ahwaz, paytexta Xozistane û Hirmizan serdarê navdarê kurd têde bû. Ji kevnarede ev welat bi navê Êlam dihate xu-

yakirin. Navdarê bajarên vê hindamê Sewqil Ehwaz, Ramhirmiz, Îzec, Eskermukerem, Şoşter, Gundê Sabûr, Sûsa, Nehr - Tîrî, Menazirin. Lê ji kevnarede bajarê Sûsa, paytexta Êlamiya bû û di tarîxêde gelek navdar û kevnare ye.

Lê sadê, kurê Ebîweqqas, bi serdariya, Utbe kurê Xezwan leşkerek şande ser Hirmizan û li navbera Delet û Nehir-Tîrî, herdû leşker lihev rasthatin û piştî şerekî dijwar Hirmizan kete, Sewqilehwaz têde asê bû. Çemê Duceyl, di navbera herdû leşkerande bû. Naçare Hirmizan, bi dijminê xwere li hevhat. Paşê careke dî kurd hatin hana wî. Herwekû ev cara pêşiye, ko leşkerê Ereb li kurd rasthatiye û navê leşkerê kurd cihê hatiye gotin. ji vir û hade nema navê leşkerê Îran tênim meydanê û tenê ezê serpêhatiyên Kurd bi Ereban re bidim xuyakirin

NÎHAWEND :

Di sala 18 koçîde, bajarê Nihawend, li ser destê Naman, kurê Muqrinê Mezenî hate girtin. Naman, divî şerîde bi destê kurd hate kuştin. Herwekû bajarê Dînewer, li ser destê Ebîmûsayê Eşerî hate girtin. Hemedan li ser destê Neîm, kurê Muqrînê Mezenî hate sitandin û Esfehan di sala 28 de li ser destê Ebdilah, kurê Utban hate girtin. Şehreberaz, kurê Cadoye hate kuştin û mezinê bajêr Vasozvan, bi Erebanre li hevhat û Salyan dane dewleta Erebî. Rey, li ser destê Neîm, kurê Muqrinê Mezenî hate girtin. Siyahxweş, kurê Mehran, kurê Behramê Çopîn Kurdî, li ber leşkerê Ereb dest hîlanî. Lê Zeynebî, bû hevalê Neîm û zora Siyahxweş birin û Zeynebî bû fermandarê welêt û mala Behram winda bûn. Kurê Esîr dibêjî, hetta îro jî, hêj ji mala Zeynebî, Şehram û Ferxam, mezin û serdarên vê hindamê ne. Kurê Esîr sala 600 ê koçîde jîye.

QOMÎS-QÎRMÎSÎN-KERMANŞAH :

Li ser destê Siweyd, kurê Muqrinê Mezenî hate girtin. Lê Azerbaycan li ser destê Semak, kurê Xerşe hate sitandin û Esfendiyar hate girtin û bi xwere gerandin. Yeka yeka bajarên Azerbaycan, bi saya Esfendiyar xistin destê xwe. Moqan, li ser destê Bekir, kurê Ebdilah û Hebîb, kurê Muslime hate sitandin. Ermenistan li ser destêHuzeyfe, kurê Useyd hate sitandin û selman kurêRebîe pêre bû.

ŞEHREZÛR :

Li ser destê Utbe, kurê Ferqed û piştî du sal şer, bi li hev hatin, kete destê Ereban. Gelek ji kurdan hatin kuş

tin. Ûmerê xetab ev Utbe kire walî û fermandarê Azerbay-
can, Herseme , kire fermandarê Mûsil û Şehrezûr bi ser Mû-
silve berda. Hetta çaxa Harun Reşîd jî, Şehrezûr di bin
destê fermandarê Mûsilde bû.

FESA Û DARABGURD :

Di sala 23 koçîde, li ser destê Sariye hatin girtin .
Leşkerê kurd, bi navê Ekrad-Faris di nav şerde hatiye xuya
kirin.

Herwekû, divê salêde leşkerê kurd, hawîr li pîroz giha-
ne hev. Leşkerê Ebû Musayê Eşerî, li navbera Tîrî û Mena-
zir, li kurdan rasthatin. Şerekî mezin di navbera herdû
leşkerande destpêkir. Kurd û Faris di hana wan kurdan çûn
û Muhacirê kurê Ziyad hate kuştin û kurd di welatê xwede a
sê bûn û leşkerê Ebû Mûsa çû Esfehan.

ŞEREK DÎ NAVBERA KURD Û EREB DE :

Bi serdariya Selme, kurê Qeysê Eşceî leşkerekî giran ha
te ser welatê kurd û bi rêde li hin kurdan rasthatin û şer
di nav wande destpêkir. Dawî kurd şikestin û talanê wan ke
te destê leşkerê Ereb. Ji vî talanî gustîlek şandin ji pa-
dîşahê Hicazê, Umerê Xetabre, ko bihayê wê bîst (20) hezar
dirhem bûn. Lê Umer gustîl li wan vegerand û got, bifiro-
şin û li leşkerê xwe belav bikin.

Lê padîşahê Hicazê Umer, kurê Xettab di vê salê de serê
xwe danî û Osman, kurê Effan kete şûna wî.

OSMAN KURÊ EFFAN :

Çawa Umer, kurê xettab hate kuştin, misilmanan Osman ku
rê Effan kirin padîşah. Tenê ne bi dilê Elî, kurê Ebî Ta-
lib û Mihemedê, kurê Ebî Bekir bû, ko Osman bibî Padîşah.
Elî dixwest, ew bikevî şûna Umer.

Osman Muxîre ji walîtiya Kûfe danî û careke dî Sadê ku-
rê Ebîweqqas kire walî. Di sala 25 de Sad avêt û Welîd, ku
rê Ûqbe xiste şûna wî.

Çawa, ko Utbe, kurê Ferqed ji walîtiya Azerbaycan avêt
û Utbe li ber asê bû û serê xwe ji fermana padîşahre xwar
nekir.

Lê Welîd, ji Kufe çû şerê wî û gelek ji xelkê Azerbay-
can hatin kuştin û bi lihevhatin Azerbaycan û Ermenistan
vegeriyan bin destê Osman, padîşahê Îslamê. Di sala 30 de
Osman, Welîd danî û Seîd, kurê As kire fermandarê Kûfe.

Herwekû di sala 29 de kurdên hindama Îzec liber Ebîmûsa
yê Eşerî, fermandarê Besre asê bûn û ji ola Îslamê derke-

Institut kurde de Paris

tin. Ebûmûsa dixwest, bi peya herî şerê wan, lê xelkê Besre li cem Osman gazin û giliyê Ebîmûsa kirin. Padîşah, ew avêt û Ebdilah, kurê Amir xiste şûna wî. Tenê navê mezin û serdarên wan kurdan nedane xuyakirin û em nizanin jimara wan çiqas bû.

Herwekû di vê salê bi xwede padîşahê Îran Yezdîgurd hate kuştin û di awayê kuştina wîde neweke hev hatiye gotin. Hin dibêjin, di aşekîde hatiye kuştin û hin dibêjin, bi destê Xerzad, serdarekî xwe hatiye kuştin û hin dibêjin, li çolê û kes nizanî kê, ew kuştiye. Tenê bi kuştina Yezdîgurd dawiya dewlet û malbata Sasanîyan hat û padîşahî dî Kurdistan û Îran de ji destê kurd û Faris û Îraniyan derket û bêgane bûne padîşahê welatê me.

Tenê miletên Îran, Kurd, Faris, Deylem, Cîl bicarek ranezan û padîşahî ji guhê xwe navêtin. Çavnêriya roja xwe dikirin û dipêjinîn. Gelek lephilanînên mezin û xwîndar dikirin û xwe di riya mezinahî û weyatê xwede didane kuştin.

Di sala 34 de Osman di hindirwê mala xwede liser destê Mihemedê Ebîbekir hate kuştin. Di sala 38 de Mihemed, li Misrê li ser destê Emewiyan hate kuştin û şewitandin.

5- ELÎ, KURÊ EBÎTALİB :

Çawa Osman hate kuştin, Elî, kurê Ebîtalib kete şûna wî. Lê ne Emewî û ne hevalbendên Ayîşa(jina Mihemed), bawe riya xwe pê nanîn û bûne dijminê wî. Li her der Emewîyan serê xwe hildan û doza xwîna Osman kirin. Piştî çend şeran Miawiye xwe eşkere kir û li Şam bû padîşah. Ereb bûne du perçe û pirên Kurd û Faris bûne hevalbendê Elî. Lê piştî çend salan Elî hate kuştin û padîşahî kete destê Muawiye. Hesen, kurê Elî doza padîşahiya İslamê dikir. Lê jina wî, jehr dayê û kuşt û bi carek zariwên Elî ji derb ketin û Huseyn bi heftê mirovîve hatin kuştin. Naçare Eceman, berê xwe dane zariwên Ebbas, pismamên Elî.

Di çaxê Elî, kurê Ebîtalib de Benî Nacîye bi fermandariya Xerît li ber Elî rabûn û bi serdariya Ziyad, kurê Ubeye Elî leşkerekî giran rêkire ser wan. Pirê leşkerê Xerît kurd bûn û Xerît, kurê Raşîd reviya û gelek ji kurd û Ereben hevalbendên wî hatin kuştin. Ziyad, welatê Ehwazê bicarek xiste bin destê xwe û paşê Xerît jî hate kuştin. Di sala 38 de Elî hate kuştin û bi kuştina Elî dewlet û paytexta dewleta Erebî-İslamî ji Hicaz derketin û ketin Şam. Di sala 41 de Hesen bi jehrê serê xwe danî û di sala 61 de Huseyn hate kuştin.

## ŞORİŞÊN KURD

Di sala 68 de Kurdemê Qeradî ji xelkê Cizîrê rabû û bajarên Sabat Medain xistin bin destê xwe û li ber Emewiyan, serê xwe rakir. Gelek talan û kuştin û sergêjî çêbûn.

Herwekû di sala 76 de Muterif, kurê Muxîre li ber Ebdil Melik padîşahê, Emewî rabû û berê xwe da bajarê Helwan-Kurdistan. Siweyd, kurê Ebdirehmanê Sadî, fermandarê Helwan, bi kurdave rê nedane kurê Muxîre, ko bikevî nav bajêr. Gelek ji kurda hatin kuştin.

Çawa, ko di sala 83 de Ebdirehman, kurê Eşeb, li ber Emewîyan rabû, lê Hecacê Seqefî, fermandarê İraqê, zora wî bir û berê xwe da Secistan. Hecac, bi serdariya kurê xwe Mihemed, leşkerek pey şopa wîde rêkir. Li bajarê Sûsa û Sabûrxwast çend şerên xwîndar di nav wande çêbûn. Kurd hevalbendên Ebdirehman bûn û gelek ji wan hatin kuştin. Çawa Ebdirehman, giha Secistan, Retbîl padîşahê Secistan serê wî jêkir û bi diyarî ji Hecac re şand.

Herwekû di sala 129 de Kurdên hindama Faris, welatê Faris bi carek xistin bin destê xwe û bajarê Sabûr kirin paytext. Lê Suleyman, kurê Hişam, padîşahê Emewî bi leşkerekî giranve çû ser wan û bizor xistin bin destê xwe.

Herwekû di sala 90 de Kurdên welatê Faris, ew hindam bi carek xistin destê xwe, lê Hecacê kurê Yusifê Seqefî bi leşkerekî giranve çû ser wan û bi zor vegerandin bin destê xwe.

Herwekû di nêzîkî sala 132 de Ebdirehman Ebûmislimê Xeresanî şorişeke mezin, xwîndar diriwê Emewîyande çêkir û di sala 132 de padîşahê Emewîyê paşî Merwan, kurê Mihemed, kurê Merwanê Emew li welatê Misrê hate kuştin û dawîya dewleta Erebî li Şam hat.

Dewlet û paytext ketin Bexda, bin destên Ebasîyan. Diya Merwan kurd bû. Keça Mîr Ehmedê ji Cezîrê bû. Berî hingî jina Îbrahîm, kurê Merwan li xwe mar kir û ew Merwan jê çêbû.

Bi rastî ji Ebû Mislim, fermandariya kurd destpêkiriye. Dewleta Ebû Mislim, dewleta kurdiya pêşîye. Lê gelek dirêj nekir û zû hate herivandin.


Lê xuyaye kurd berê xwe daye fermandarî û padîşahî. Her fermandarek dicihê xwede serbixwe di welatê xwe, di hindama xwede maye. Carna salyan dane padîşahên ji xwe mezintir û carna bûne padîşah, herwekû wê ji vir û hade bêne xuyakirin.

Institut kurde de Paris




Dİ SALÊN 737'AN DA KURDİSTAN SERANSER Dİ NAV DEWLETA HUMEYDİ DA BÛ.

Kela Amedê(Dîyarbekir)



Institut kurde de Paris

Di sala 137 de Ebû Cafer Mensûr, padîşahê Ebbasî, bi bê bextî Ebû Mislim kuşt. Ji ber, ko tarîxa Ebû Mislim serbixwe hatiye nivîsandin. Evder ne cihê wêye, ko bidim xuyakirin

Herwekû di sala 141 de Rawendî, kurdên, ko hevalbend û leşkerên Ebû Mislim bûn, şorişek di riwê Mensûrde çêkirin û derê zindanê şikandin û ser pêwanê Mensûr kuştin. Lê şoriş zû hate vemirandin.

Di sala 147 de, Kurdên hêla Mûsil serê xwe hildan û şorişek diriwê dewletê de çêkirin. Mensûr, padîşahê Bexdayê, bi serdariya Xalidê Bermekî, leşker rêkire ser wan û gelek ji kurda kuştin û Xalid kire fermandarê Mûsil.

Di sala 176 de, bi serdariya Fedlê Xaricî, şorişek li Cizîrê çêbû û hetta Xelatê kete destê wî û li ser bajarê Mûsil hate kuştin 178. Divê salêde şorişek bi serdariya Welîd, kurê Terîfê Xaricî çêbû û Nisêbîn, Amed, Xelat ketin bin destê wî. Piştî du salan ew hate kuştin. 224, di vê salê de Mîr Cafer, kurê Mîr Hesenê Dasinî li jorê Mûsil rabû û li ber Mûtesem asê bû û bû fermandarê kurdistana rajorê Mûsil. Xelk ji hawîr lê civiyan û Mûtesem Ebdilah, kurê Enesê Ezdî kire fermandarê Mûsil û bi leşkerekîve şande ser Kurda. Di wê çaxêde Cafer li Matîs danîbû û leşkerê Ereb ew ji cihê wî derxist û naçare Cafer kete çiyayê Dasin û têde asê bû. Herwekû leşkerê Ereb bi dijwarî xwe gihande çiyê û kurda zora wan bir û gelek ji wan kuştin. Çawa, ko apê Ebdilah İshaq, kurê Enes û xezûrê Cafer, du serdarên mezin bûn, ko di vî şerîde hatin kuştin.

Lê padîşahê Ereb, bi serdariya Îtaxê turkî leşkerekî mezin şande ser Caferxanê Dasinî kurdî û Îtax zor û setemeke bê pîvan biser kurdade barand. Li çiyayê Dasin, kurd ji ber dijminê xwe şikestin û Cafer di nav şerde hate kuştin.

Lê hin dibêjin, çawa Cafer dît, ko zora wî çûye jehr vexwar û mir. Leşkerê Ebbasiyan tiştên kesnedî bi serê kurda de anîn û Îtax bi dilxişkî xwîn da rijandin û mal û jin û zarokên wan rêkirin Tikrîtê.

Hin dibêjin, ev serpêhatî di sala 226 de çêbûye. Herwekû ev Îtax di sala 235 de di zindanêde serê xwe daniye. 231, divê salêde bi serdariya Wesîfê turkî, leşkerê Bexda, çû ser welatê kurd, Çiya û gelek ji kurdan kuştin. Çiya û Esfehan bi zor xistin bin destê xwe û pêsed mirov ji wan anîn û li Samira xistin zindanê. Padîşah Wasiq, 75 hezar dînar û şûrekî zêrkirî dane Wesîf û bigir dewlet kete bin destê Turka. Roj bi roj padîşahiya Ereb li Bexda gavên xwe ber bi mirinêve sivik tavêtin 252. Di vê salêde Musawir ku

rê Ebdilhemîdê Şarî, Beclî, ji xelkê Mûsilê li ber padîşahê Ereb rabû. Kurd û Ereb gelek pêre gihan hev û şerên mezin û xwîndar dinavbera wan û waliyê Mûsilde çêbûn.

Herwekû di vê salêde Ebdilezîz, kurê Ebîdelefê İclî, li ser destê Wesîfê Turkî bû fermandarê Kurdistan, Çiya û Esfehan.

Çawa, ko di vê salêde leşkerek bi serdariya Bendarê Teberîde hate ser Musawirê Şarî, Bendar di nav şerde hate kuştin û serê wî jêkirin û hindama Helwan û Çiya, Kurdistan xistin destê xwe.

Lê leşkerekî dî, bi serdariya Hetermişê Turkî hate şerê wî. Lê leşkerê Musawir, ew jî şikandin û Celewla jî xistin destê xwe.

Herwekû di sala 254 de leşkerê Mûsil, bi serdariya Mîr Hesen, kurê Eyûb çû şerê Musawir, lê leşkerê Musawir ew şikandin û gelek ji leşkerê wî kuştin û gelek di çemê Rayatde bi avêde çûn.

255, di vê salêde Yaqûbê, kurê Leysê Seffar, padîşahê Secistan, bajarê Kerman xiste destê xwe û berê xwe da ser bajarê Şîraz. Di wê çaxêde Elî, kurê Huseyn, kurê Qureyş fermandarê Şîraz bû. Deh hezar leşkerê kurd di bin serdariya Mîr Ehmed, kurê Leysê kurdî de pênc hezar hebûn û dî bin serdariya Tewq, kurê Muflis de pênc hezar kurd hebûn. Berî hingî Mîr Ehmed, kurê Leysê Kurdî, bajarê Kerman talan kiribû û heftsed jin revandibûn û dused keç ji keçanî xistibûn. Ji ber, ko wê serpêhatiya Mîr Ehmed di cîkî dîde bê gotin, di virde naxwazim dirêj bikim.

256, di vê salêde Mihemed, kurê Wasil û Mîr Ehmed, kurê Leys welatê Faris bicarek xistin bin destê xwe. Heres, kurê Sîma serdar û fermandarê padîşahê Bexda şikandin û Mihemed, kurê Wasil bû padîşahê hindama Faris. Lê mexabin, ko çend caran navê Ehmed, kurê Leysê Kurdî tê, bê ko Em cih û bajar û tarîxa wî, bi ser heve zanibin.

Di sala 261 de Mihemed, kurê Wasil hetta Ehwaz xiste bin destê xwe û Ebdirehman, kurê Muflih kuşt. Herwekû serdarê Ebdirehman Taştemer jî di vî şerîde hate kuştin. Tala nekî mezin kete destê leşkerê kurd, lê paşê Mihemed, kurê Wasil bi destê Yaqûbê kurê Leysê Seffar hate kuştin. Navê xalê Mihemed, kurê Wasil Ebûbilal Derbas bû.

262, di vê salêde Mesrûrê Belxî, Mîr Ehmedê kurê Leysê kurdî ji ber xweve kire fermandarê welatê Ehwaz. Ehmed, kurê Leysê kurdî bi leşkerekî giran ve berê xwe da Ehwaz û li bajarê Sûsa, peya bû. Mihemed, kurê Ubeydilah, kurê Hezarmerdê kurdî, ji ber Yaqûbê Seffarve fermandarê welatê

Ehwaz bû û li bajarê Şoşter, rûniştibû. Çawa Mihemedxan kurê Ubeydulah bihîst, ko Ehmed, kurê Leysê kurdî kete bajarê Sûsa, rêkire cem padîşahê Zenc Xerît, kurê Raşîd û jêre got, dixwazim bibim hevalê te û xutbe li ser navê te bêne xwendin. Daxwaza Mihemed, kurê Ubeydilah ew bû, ko leşkerê Zencî di hana wî bê, ko karibiî li ber leşkerê Bexda lephilênin.

Lê padîşahê Zenc, jêre got, ezê, Elî kurê Ebban ji ber xweve bikim fermandarê Ehwaz û tu di bin destê wîde di welatê xwede fermanderekî min bimênî. Bi serdariya Elî, kurê Ebban leşkerê Zenc şand hana Mihemed , kurê Ubeydilahê kurdî. Bi hevre herdû leşkerên kurd û Zenc berê xwe dane bajarê Sûsa û çûne şerê leşkerê Bexda. Şer di nav wande destpêkir û gelek ji leşkerê Bexda hatin kuştin û naçare Ehmed, kurê Leysê kurdî vegeriya Gundê Sabûr û herdû leşkerên giran, kurdî û zêncî dane ser şopa wî. Çawa Ehmed, kurê Leysê kurdî dî, ko nikarî şerê wan bikî, ji Gundê Sabûr derket û bajar ji dijminê xwere berda.

Lê Mihemed, kurê Ubeydilah soza xwe nebire serî û xutbe di Şoşter, welatê xwede li ser navê padîşahê Bexda û padîşahê Secistan xwendin. Naçare Elî, kurê Ebban welat ji Mihemed, kurê Ubeydilah re berda û hate Ehwazê û pira ser avê hilweşand û li hêstirekê siwar bû û bazda. Lê çawa Ehmed, kurê Leysê kurdî ev bihîst, berê xwe da Şoşter û piştî şerekî dijwar zora Mihemed, kurê Ubeydilah bir û berê xwe da leşkerê Zencî û leşkerê Elî, kurê Ebban jî bi gernasî şikand. Elî birîn kir û bi hezar dijwarî xwe ji nav pencê mirinê parast û welatê Ehwaz bi carek kete destê Ehmedê kurê Leysê kurdî, Serdarê leşkerê Bexda.

Lê di sala 263 de carekî dî Elî kurê Ebban bi leşkerekî giranve hate şerê kurê Leysê kurdî û kete welatê Ehwazê. Lê careke dî Ehmed, kurê Leysê kurdî, ew şikand û ji herdû aliyan gelek hatin kuştin. Tenê 30 serdarên leşker ji rexê Ehmed, kurê Leysê kurdîve hatin kuştin.

265, di vê salêde Yaqûbşahê Seffarî bi leşkerekî giranve ji Secistanê hate ser welatê Ehwazê. Ehmed, kurê Leysê kurdî, naçare welat bi carek jêre berda û Xidir, serdarê leşkerê Seffarî, bû fermandarê Ehwaz.

Lê careke dî, Elî, kurê Ebban bi leşkerekî giranve hate şerê Xidir û zora wî bir û gelek ji leşkerê wî kuştin û talanekî mezin xiste destê xwe. Lê paşê li hev hatin û Xidir bû fermandarê Ehwaz.

Çawa, ko divê salêde Musawir, kurê Ebdilhemîdê Şarî Bec-

lî serê xwe danî. Xaricî li hev civiyan û xwestin Mıhemed, kurê Xerzadê kurdî, serdar û fermandarê eşîra Şumered bikin serdarê xwe. Lê Mihemed nexwest û naçare Eyyûb, kurê Heyyan kirin mezinê xwe. Kurê Xerzad di nav şerde Eyyûb kuşt û naçare xariciyan Mihemed, kurê Ebdilahê Warî kirin fermandarê xwe. Lê kurê Xerzad ew jî kuşt û dawî Haron, kurê Ebdilahê Beclî kirin fermandar. Mihemed, kurê Xerzad vegeriya Şehrezûr û leşkerê Kurdên Şumered li ga siwar dibûn û bi kulav bûn.

Çawa, ko di vê salêde careke dî Ehmed, kurê Leysê kurdî êrîş bire ser leşkerê Zencî û Suleyman, kurê Cami, fermandarê Zencî şikand û talanekî mezin kete destê Ehmed, kurê Leysê kurdî û gelek ji leşkerê Zenciyan hatin kuştin. Ehmed, kurê Leysê kurdî vegeriya bajarê Cenbela, ko dikevî navbera Wasit û Kûfa. Bêtir ji çil serdarên Zenc hatin kuştin.

Lê Elî, kurê Ebban bi leşkerekî giranve hate ser bajarê Şoşter û di wê navêde padîşahê Bexda Muweffiq, hindama Ehwaz xistibû bin destê xwe û dabû Mesrûrê Belxî, fermandarê İraq. Mesrûr ji ber xweve Tekînê Bixarî kiribû fermandarê Ehwaz. Tekîn, bi leşkerekî giranve giha Şoşter û leşkerê kurê Ebban şikand û gelek ji serdarên wî kuştin. Lê Elî û Tekîn li hev hatin. Herwekû ev li hev hatin ne bi dilê padîşahê Bexda bû. Mesrûr bi xwe berê xwe da Ehwaz û Tekîn xiste zindanê û leşkerê Tekîn bûn du perçe. Hina xwe sipar de Mihemed, kurê Ubeydilahê Kurdî û hina xwe sipardin leşkerê Zencî.

266, di vê salêde careke dî Elî, kurê Ebban, serdarê navdarê Zencî bi leşkerekî mezinve hate ser bajarê Şoştar û bajarê Ramhirmiz, ji Mihemed, kurê Ubeydilah sitandin. Careke dî Mihemed, kurê Ubeydilah şande cem padîşahê Zencî Xerît, kurê Raşîd û got: Dixwazim Elî, kurê Ebban ji welatê min derxî. Çi dixwazî ezê ji tere rêkim.

Lê çawa Elî ev bihîst, bi xurtî berê xwe da şerê Mihemed. Lê Mihemed, kurê Ubeydilah şer pêre nekir û xwe da serê çiya û paşê dused hezar dirhem dane Elî û ji welatê xwe derxist. Mihemed, ji Elî hêvî kir ko leşkerekî jêre bişênî ko bi hevre herin şerê kurdên Dernan(Daryan). Lê kurdên Darnan zora herdû leşkeran birin û gelek ji wan kuştin û talanekî mezin kete destê kurdên Dernan. Leşkerê Mihemed gelek ji talanê Zenciyan xistin nav lepên xwe û rût kirin.

Lê padîşahê Zenc, Xebît, ji Mihemedre şand û bi xeyd jêre got:"Tu tenê ji vê şikandinê berpirsiyarî" û tirs tê firandin û kurê Ubeydilah pêre lihevhat û gelek mal, pere jê



Institut kurde de Paris

re rêkirin û xutbe li ser navê wî xwendin.

Herwekû di vê salêde Umer, kurê Seffar, padîşahê Secistan, Ehmed, kurê Ebdilezîz, kurê Ebîdelefê Îclî, kire fermandarê Esfehanê.

Çawa, ko di vê salêde Îshaq, kurê Kendac ji nav leşkerê Mûsa, kurê Bexayê Turkmanî, fermandarê Mûsil derket û hate Beled, jorê Mûsil û kurdên Yaqûbî talankirin û gelek ji wan kuştin.

267, di vê salêde Muweffiq, padîşahê Bexda çû şerê Zenciya û zora wan bir. Mihemed, kurê Ubeydilahê kurdî, fermandarê Şoşter hate cem wî û gelek mal û pere jêre pêşkêş kirin û di welatê xwede bi fermandarî rûnişt û welatê Ehwaz kete destê wî.

Herwekû, di vê salêde Mihemed, kurê Xerzad, fermandar û serdarê eşîra Şumeredê kurdî, ko bi xwe ji xelkê Şehrezûrê bûn, hate ser Harûnê Şarî. Lê leşkerê Harûn li gundê Şamrex şikand û gelek ji wan kuştin. Harûn xwe avête nav Erebên Benîtexê lib Mihemed vegeriya Şehrezûr. Lê Harûn bere, bere hevalên wî jê dizîn û veqetandin. Ev Şehrezûr kurdin û her dem dijminê hevin.

Herwekû di vê salêde Mihemed, kurê Xerzad û eşîra Celalî-Kurdî li hev rasthatin û şerekî dijwar di navbera wande destpêkir û serdarê eşîra Şumeredê kurdî di vî şerîde hate kuştin û Harûnê xaricî serbixwe bû fermandarê xariciyan.

268, di vê salêde Umer, kurê Leysê Seffar padîşahê Secistanê, Mihemed, kurê Ubeydilah, kurê Hezar merdê kurdî, fermandarê Xozistan Şoşter girt î xiste zindanê.

273 de şerekî giran di navbera Yaqûbiyên kurd û serdarê leşkerê Mihemed, kurê Ebîsacde, ko bi zor welatê Cizîrê xistibû bin destê xwe çêbû. Yaqûbiyan, gelek ji leşkerê Feteh, serdarê leşkerê Sacî kuştin û ew ji hev balavkirin. Ji ber, ko berî hinî leşkerê Feteh bi dizî û bêbextî gelek ji Yaqûbiyan kuştibûn û talan kiribûn. Ev Yaqûbî kurdin û bûne file, Mesîhî.

279, di vê salêde Elî, kurê Dawid, kurê Zehradê kurdî bû fermandarê Mûsil û ev yeka ne bi dilê Mûsiliya bû.

281, di vê salêde padîşahê Bexda, Muqtefî hate ser baja rê Mardîn, ko Hemdûn, kurê Hemdan, têde asê bûbû, Muqtefî bajar bi zor jê sitand û berî bighê Mardîn şerekî dijwar di navbera wî û Kurd û Erebande çêbû. Li vegerê, hate ser bajarê Huseyniyê, ko Şedadê kurdî têde bi deh hezar leşkerê kurdve asê bûbû. Piştî şerekî dijwar kurda bajar ji Muqtefîre berdan û ketin serê çiya. Muqtefî keleha bajêr hilweşand û vegeriya Bexda.



Institut kurde de Paris

Çawa, ko di vê salêde, padîşahê Ebbasî ji Bexda derket û çû çiya-Kurdistan û kurê xwe Elî Muktefî kire fermandarê Çiya. Bajarên Rey, Qezwîn, Zencan, Ebhir, Qum, Hemedan, Deynewer xistin bin destê xwe. Umer, kurê Ebdilezîz, kurê Ebîdelefê Îclî kire fermandarê Esfehan. Nehawend û Kerec xistin bin destê wî û bi xwi vegeriya Bexda.

282, di vê salêde padîşahê Bexda, bi serdariya Wesîf kurê Mûşgîrê Turkî leşkerekî mezin rêkire ser welatê kurdistan, ko Hemdan, kurê Hemdûn têde asê bûbû. Şerekî mezin di navbera kurd ûWesif de çêbû. Mîr Hesen, kurê Elîkore di keleha Zaferande, ko dikevî jorê Mûsil asê bû. Fermandarên Kurd û Ereb paşê yeka yeka xwe dane destê leşkerê Bexda û bi bext her yek di cihê xwede rûniştin.

Di vê salê bi xwede Peyremê Bexda Mîr Hesen, kurê Elîkore kire fermandarê Mûsil û bi leşkerekî giranve şande ser Harûnê Şarî xaricî. Ji fermandar û mezinên wan navanre rêkir, ko bi carek xwe bidin bin serdariya Mîr Hesen û bi hevre herin şerê Harûn. Mîr Hesen, ji hawîrve leşkerê xwe da hev û bi dilxurtî berê xwe da meydana şer. Li gundê Meqele, şer di nav wande destpêkir. Leşkerê Harûn hivde êrîş birin ser leşkerê Mîr Hesen, lê leşkerê kurd ji wanre cihê xwe bernedan. Dawî bi xurtî leşkerê Harûn direjî meydana şer kirin û leşkerê Hesen ji cihê xwe bi paşde vekişiya. Mîr Hesen, weke hasin bi tenê di meydanêde ma û çend şûr li serê wî xistin, lê tu kêr tê nekirin. Çawa leşkerê Mîr Hesen dî, ko Mîr Hesen bi tenê weke mêra şer dikî, ber xwe ketin û bi dilxurtî vegeriyan û leşkerê Harûn şikandin û ji hev perçe kirin. Hin ji wan hetta bi Azerbaycanê jî reviyan, ji wanê, ko çûne Azerbaycanê, Mîr İbrahîm û Mîr Deysemê kurê wî bûn, ko paşê bûne padîşahê Azerbaycan. Hina, ji wan xwe sipardin Mîr Hesen, fermandarê kurd û hêla Mûsil. Tenê çend siwar bi Harûn re man. Paşê Harûn li çolê hate kuştin û Mîr Hesen vegeriya Mûsil.

Herwekû di vê salêde Heres, kurê Ebdilezîz, kurê Ebîdelefê Îclî li ber padîşahê Bexda asê bû. Bi serdariya Mîr Îsayê Noşerî leşkerek ji Bexda derket û çû ser Kurdistan û Ebû Leyla Heres hate kuştin. Ji ber, ko wê çîroka Ebî Leyla di cîkî dî de bê gotin, naxwazim di vir de dirêj bikim.

Mala Ebûdelefê Îclî, bi koka xwe Erebin, lê dewletek di Kurdistanêde li darxistine û leşkerê wan, welatê wan Kurd û Kurdistan bûn.

288, di vê salêde Mîr Hesen, kurê Elîkore, fermandarê Mûsil, leşkerek şande şerê Roma. Ev leşker bi serdariya Nezar, kurê Mihemed bû. Vî serdarê mezin, gelek ji kelehên

welatê Rom girtin û talankirin. Taln û dîl gelek bi xwe re anîne Mûsil.

Herwekû di sala 289 de Mîr Hesen şande cem Bedir, xulamê peyrenê Ebbasî û got:"Tû kêder ji welatê min dixwazî we re têde rûnê". Lê Bedir nexwest herî cem kesî.

290, di vê salêde Ebûseîd, serdarê Xwarzemî, ji Bexda bazda û hate Tikrît. Fermandarê Tikrît Xulamnûn kuşt û têde asê bû û bû mirovê Rebîê kurdî û jin bi hev guherandin û bi hevre bûne dijminê padîşahê Ebbasî.

293, di vê salêde Ebûlheyca Ebdilah, kurê Hemdan, kurê Hemdûn bû fermandarê Mûsil û çawa kete nav bajêr, xelkê ki re qêrîn û gotin: Kurdên Hezebanî, bi serdariya Mihemed kurê Bilal hatine talanê Nînova. Naçare Ebûlheyca çû şerê kurdên Hezbanî û kurdan zora wî birin. Li Marûban, li çemê Xazer şer destpêkir û di vî şerîde pismamê wî Sîma Îlhemdanî hate kuştin. Ebdilah naçare vegeriya Mûsil û han ji peyremê Ebbasî xwest, çawa han jêre hat, careke dî Ebdilah çû şerê Hezebaniya û kurd di çiyayê Sileq de asê bûn.

Ev çiya di çiyayên Şehrezûrde gelîkî teng û dijware. Da wî Mihemed, kurê Bilal xwe bi xapan ji nav pencê mirinê parast û kete çiyayê Qendîl û leşkerê Mûsil vegeriya. Lê piştî pêlakî Ebdilah bihîst, ko careke dî Mihemed, kurê Bilal koçên xwe li çiyayê Sileq danîne, bi leşkerekî giranve çû şerê wî, lê ji ber, ko berf hatibû û gelek serma bû û leşkerê Ereb nikaribû şerê kurd di nav berfê de bikî bi lihev hatin vegeriyan Mûsil û Mihemed, kurê Bilal kir fermandarê Hire, bextê xwe da wan û Mîr Mihemed û zariwên xwe hatin Mûsil. Yeka yeka kurdên Humeydî, Dasinî û kurdên wan navan serbest û her yek di cihê xwede rûniştin. Tevan xwe sipardin fermandarê Mûsil

294, di vê salêde Ebdilah, kurê Useyebê Mesmeî, fermandarê Mûsil, di Esfehande li ber peyremê Bexda asê bû û deh hezar kurd pêre bûn.

Çawa, ko di vê salêde kurdên hêla Mûsil, welatê Mûsil bi carek xistin destê xwe û Hesen, kurê Ehmed çû ser wan û gelek ji wan kuştin û jin û zar û zêçên wan birin û talankirin. Tenê mezinên wan ketin serê çiyan û Hesen hew karibû li pey şopa wan herî, lewra vegeriya Mûsil.

304, di vê salêde peyremê Bexda Mûnisê berdestiyê xwe bi leşkerekî giranve rêkire ser Azerbaycan, ko Yûsifê, kurê Ebîsacê Deylemî têde asê bûbû. Mûnis, Yûsif girt û anî Bexda. Lê yekî ji serdarê leşkerê wî bi navê Sebek, Azerbaycan xiste destê xwe û peyremê Ebbasî bi serdariya Mihemed, kurê Ebdilahê Farqînî şande şerê Sebek. Lê Mihemed şi

kest û vegeriya Bexdad.

314, di vê salêde Kurd û Erebên hêla Mûsil gelek sergêjî di riwê dewleta Mûsilde çêkirin. Ebdilah ji Bexdad, ji kurê xwe Huseyn Nasiri dewlere şand û got: Dixwazim sivik van sergêjiyan vemirênî û van kurd û Ereban vegerênî bin destê xwe.

Mîr Huseyn Nasiridewle piştî, ko ji Ereba vala bû, berê xwe da ser kurda û çû Şehrezûr, ser kurdên Celalî. Şerên mezin di navbera wan de çêbûn, lê dawî bi lihevhatin vegeriya Mûsil.

316, di vê salêde Merdawîg, serleşkerê Esfarşahê Deylemî, çû ser Şemîran û Terem û gote Mîr Mihemed Salar, kurê Musafirê kurdî, Esfarşah dixwazî xwe bidî bin darê wî, lê Mîr Mihemedê Salar jêre zor û setema Esfar Şah dane zanîn û got: Eger tu karibî wî bikujî, emê tev xwe bidin bin ala dewleta te. Merdawîg, çû ser padîşahê Deylem û kuşt û ew bû padîşah. Lê zor û setema wî ji Esfar bêtir bû.

Van serpêhatiyan dibêjim, da xwendewarên me zanibin, ko kurd ji serê Islamêde û heta îro jî, her dem di nav şer û kuştin û doza mezinahî û serxwebûnê kirine. Lê ji ber, ko nebûne yek nikaribûn bigihên daxwaza xwe.

Institut kurde de Paris

# DEWLETA MERWANÎ

DESTPÊKA DEWLETA MERWANÎ- HUMEYDÎ

Di sala 374 ê koçîde bi serdariya Mîr Huseyn Ebûlfewaris û Şahbaz Ebûşeca, herdû kurên Dostikê Humeydî, eşîra hindama Hîzan, Erdîş û Maden bi zor xistin destê xwe û gelek neçû Farqîn, Amed, Cizîrabota, Nisêbîn, Riha, Heran, Xelat, Bedlîs bi carek ji mala Hemdanê fermandarê Heleb si̱tandin û doza padîşahî kirin.

Bi kurtî çend şer di navbera wan û padîşahên Deylemîde çêbûn û di tevande kurda zora dijminê xwe dibirin. Lê di şerê pêşî de Ebûlfewaris Huseynşah hate kuştin û di şerê paşîde, ko li ser Mûsil destpêkir, şahbaz Ebûşeca jî hate kuştin. Dewlet û mal û jin bi carek ketin destê xwarziyên wan. Ebûelî Hesenşah, jinxala xwe ya Deylemî markir û li şûna xalanê xwe bû padîşah.

Ji keça Dostik, çar kurên Merwan, kurê Kesra hebûn. Ebû̱elîhesen, Seîd, Ehmed, Kesra Kek.

1- EBÛELÎHESENŞAH, KURÊ MERWAN, KURÊ KESRA :

Di sala 380 ê koçî de, çawa xalê wî, Şahbaz hate kuştin li ser laşê wî peya bû û jêre got:«Xalo, rabe ez te xelas bikim, birevênim.» Lê xalê mezin û bîrewer, jêre got: «Na, ez mirime, nema bikerî revê têm. Lê leşkerê xwe bide hev û xwe bavêjin çiyê û li xwe miqate be, neyê kuştin.»

Ebûelî Hesenşah, ji wê rojêde bû mezinê welêt û serdarê leşkerê kurdistana Amed-Farqîn.

Merwan Bi xwe mezinê gundêGirmas bû, ko dikevî navbera Sêrt û Maden û xwedî aş û zevî bû. Xuşka Şehbaz, keça Dos-

tikê Humeydî li cem bû û zariwên wî ji vê jinikê bûn.

Di sala 382 ê koçîde, leşkerê Roma êrîş kire bajarê Xelat, Melazgir, Erdîş û Barkêrî. Lê leşkerê Farqîn, bi serdariya Ebûelî Hesenşah, leşkerê dijmin şikandin û welat ji dest dijminê xwe derxistin û paşê li hevhatin, ko hetta deh salan şerê hev nekin. Bi vî rengî Hesenşah, welatê xwe fireh û xweş û ava kir.

Herwekû destê dilovanî, xêrxwazî dirêj kire mirov û dost û miletê xwe û perda wekhevî, dewlemendî bi ser welatê xwe de berda. Di meydana rêzanî, avadanî, çandinîde jî gavên mezin avêtin.

Lê gereke em rûmeta wî kalê bîrewer û zana, wezîrê pir jîr, Mem bigrin, ko hevsarê wezareta Kurdistan xistibû destê xwe û her rêçikên baş nîşanî padîşah dikirin û aşê bê av digerandin.

Di sala 384 de Hesenşah, ji wezîrê xwe re got, nema karibim vê kêmasiyê ji xelkê nav bajêr hilênim, ko bi mirov û leşkerê min dikin û guh nadin fermanên dewletê. Herwekû welat di bin destê wan deye, her tiştî li gora dilê xwe dikin.

Lê wezîrê pir jîr, jêre got, vê bisipêre min. Ez dizanim çawa wan gerdanxwar bikim. Wilo man heta, ko cejna Nûrozê hat û xelkê bajêr derketin çolê, Wezîr ji padîşahre got, îro roja meye, ferman dane leşker û hemî derê bajêr bi carek girtin û mezinên bajêr bi carek girtin û xistin zindanê û heçî dilê wan jêre dixwest anîn nav bajêr û ên mayîn bi çolêde belav bûn. Heçî av bi wan germ dibû kuştin û xistin zindanê. Malê wan bi carek talan kirin û pirê wan li çolê mirin. Hin ji wan piştî mirina şah vegeriyan nav bajêr û di cihê xwe de rûniştin.

Ji vir û ha de Hesenşah bû padîşahekî navdar û deng pêket û hawîr jê ditirsiyan û saw digirtin. Welat di bin rêzaniya wezîrê navdarde bi xêr û xweşî berepêş gavên xwe tavêtin.

Hesenşah, di sala 386 de keça Sadidewle Şerîf, kurê seyfidewle, padîşahê Heleb ji xwe re xwest û bûka reben Sitişam çawa giha bajarê Riha, mizgîneke nexweş bihîst, ko padîşah hate kuştin û bûk ji wir vegeriya mala bavê xwe.

KUŞTİNA HESENŞAH :

Rojekê padîşah ji Farqîn derket û hate Amed(Diyarbekir) wezîrê wî Şerwe, kurê Mem pêre bû. Wezîrê bêbext dilê xwe bijandibû padîşahî û dixwest Hesenşah bê kuştin, belkî karibî şûna wî bigrî û bibî padîşah.

Padîşahê kurd kon û çadirên xwe li derê bajarê Amed vegirtin. Mezinên bajêr hatin pêrgî mezinê xwe û perwa û diyarî jêre pêşkêş kirin. Bi navê Ebdilbir, yek ji malmezinê bajêr hate cem Hesenşah, padîşah gelek rûmeta wî girt û nêzîkî xwe kir û qencî pêkirin û bi dilxweşî şeva xwe derbas kirin.

Lê wezîrê bêbext, Şerwe, bi dizî ji Ebdilbirre got: We dî, ko vî padîşahî xwînxwar çi bi serê xelkê Farqînê kir. Win ji me nemezintir û xurttirin, bêgoman, ko îro sax bike vî nav bajêr wê wilo li we jî bikî.

Bi hevre sûnd xwarin û sozdan, ko îro Hesenşah bikujin. Çawa Ebdilbir vegeriya nav bajêr, mezin û geregirên bajêr civandin, ji wanre çîrok got: Vîlika kuştina Hesenşah dinav xwede veşartî hiştin û çawa Hesenşah kete derê bajêr, Ebdilbir, pere bi ser serê wî de reşandin û padîşah serê xwe danî û çavên xwe girtin, yekî bi navê kurê Dimne, ji paşve bi xencera Hesenşah kuşt. Laşê wî di ser bedena bajêrve ji leşkerê wîre avêtin û derê bedena bajêr girtin û karê xwe û şer kirin. Lê wezîrê bêbext leşkerê xwe vegeran de Farqîn û bajarê Amed pêlakê ji destê Merwaniya derket.

Ev serpêhatî di sala 387 de çêbûye. Hesenşah heft sala padîşahî kiriye û ji miletê kurdre birceke mezin û bilind ji rûmet û nav û nîşana bi şûn xweve hişt.

2- MUMEHİDİDEWLE SEÎDŞAH, KURÊ MERWAN, KURÊ KESRA :

Çawa birayê wî, li ser bajarê Amed bi bêbextî hate kuştin Seîdşah Mumehididewle, kete şûna wî û tac da serê xwe. careke dî wezaret siparde Mem û kurê wî Şerwe û laş û serê Hesenşah di gornistana Merwanîde, li bajarê Erzen veşartin û kumbedek li ser avakirin. Ev kumbed di rojhilatê pirê û di ser mizgevtêreye. Hetta sedê şeş, heftê koçî jî hêj xuya dikir. Merwan û jina xwe mala xwe guhaztin Erzen û li nêzîkî gorna kurê xwe rûniştin. Ji Hesenşah, kurek bi navê Fedil ma, ko bi Ebûdelef, navdar bû. Vê paşiyê Nesridewle, keça xwe lê mar kir û ji Ebûdelef keçek bi navê Fatê ma û paşê İbrahîm kurê Nesridewle, Fatê mar kir. Diya İbrahîm, keça Senharîb, mezinê Ermenê Sasûn bû.

Di sala 387 ê koçîde Seîdşah bû padîşahê Farqîn û Amed û li şûna birayê xwe rûnişt û di sala 388 de keça Sadidewle Şerîf, Sittî Şam, kurê Seyfidewle Elî, fermandar û padîşahê Heleb ji xwere xwest.

Herwekû me derbas kir, ev jinik destgirtiya Hesenşah bû û navê wê Sitişam bû. Seîdşah niha ji xwere anî û li bajarê Farqînê danî. Şerwe li ber destê Seîdşah û serdarê leş-

kerê wî ye û her tişt bi destê wî û bavê wîve berda ye. Çawa, ko ji bil Amed, welat bi carek di bin siya dewleta Merwanî kurdî de maye û bi dilxweşî û gerdanazadî jîna xwe derbas dikin.

Di çaxê Seîdşahde Kurdistana Farqîn û Amed, gavên hêja di meydana avanî, çandinî, xweşî de bi pêşde avêtin. Ala wekhevî, dilovanî di ser herkesîve hate rahejandin û xêr û xweşî li welêt hatin barandin.

Di sala sêsed û nodî(390) de, padîşahê Rom Basîl, bi leşkerekî giranve hate ser Amed û Farqîn. Lê herdû padîşah bi diyarî hev hatin û bi lihevhatin ji ber hev rabûn. Basîl vegeriya welatê xwe û Seîdşah bi serbilindî di welatê kurdistana Amed û Farqînde rûnişt. Di çaxê wî de welat gelek xweş û ava bû. Miletê kurd û gundiya bi xêr û xweşî jîna xwe derbas dikirin. Ji peyrewê(Xalîfe) Bexda û Bihaidewle, padîşahê Bexda jêre diyarî û perwa dihatin. Çawa, ko ji peyrewê Misrê jî jêre perwa û diyarî dişandin.

Di çaxê wî de gelek şûn ji bedena bajarê Farqîn nûjen û ava bûn. Çawa, ko ji dervê beden li ser 25 ciya û ji hindirûve li ser 30 ciya navê wî hatiye kolan û nivîsandin.

Çawa, ko derê bedenê hilweşiya û ji nûve avkir, derê Qilûfeh, ko di navbera herdû Tebalînade ye di çaxê wî de hate çêkirin. Birca di derê nêvîde li ser destê wî hate avakirin. Ev hemî di sala 396 de hatine çêkirin û lêkirin û parçîmkirin.

AMED PİŞTÎ KUŞTİNA HESENŞAH :

Hindama Amed, piştî kuştina Hesenşah, bi carek kete destê Ebdilbir û zavayê wî. Ebûtahir, kurê Dimne bû serdarê leşker û serkarê welêt û nav û dengê wî hawîr belav bûn. Li ser destê Şerwe, bajar ji Seîdşah bi derebegî, bi dused hezar dirhemî ji xwere sitand. Tenê pere û xutbe li ser navê padîşah man. Hilma padîşahî kete pozê wî û xezûrê xwe kuşt û serê wî jêkir û şanî mezinên bajêr da û got: Win dizanin, ko ez çawa li xwe miqate me, wilo jî li we agahdarim û naxwazim diwê çixarê bi ser we de bê, xezûrê min dixwest, ko Amed bidî destê padîşahê Merwanî û me tevan bidî kuştin. Heçî xwe bi min digrî, bere destê xwe hildî û heçî qîma wî nayê bere ji bajarê min derkevî. Lê çawa serê Ebdilbir dîtin, teva gotin, em hemî dost û hevalê tene û destê xwe jêre bilind kirin. Paşê embarên xezûrê xwe vekirin û çek û malê paqij ji xwere birin û hinek jî li dost û hevalên xwe belav kirin û dilê wan xweş kir. Gelek qencî bi xelkê nav bajêr kirin û bi vî awayî hûr û girs û mezin û

biçûk bi carek kirin dost û hevalên xwe. Di dilê wan de ji xwere cîkî bilind û mezin avakir. Şande Şerwe û bajar weke peymana navbera padîşah û Ebdilbir, xezûrê xwe, ji xwe re sitand. Salê dused hezar dirhem li ser xwe vebirîn û pere û xutbe li ser navê Seîdşah hatin xwendin û kolan.

Ebûtahir, kurê Dimne, ji xwe re qesrek li rojhilatê bajêr û li raserê Dicle avakir. Xeşîmek ji qesrê gihande ser avê û ji padîşah û hevdemên xwe re nivîsî û diyarî ji peyrewê Bexda û peyrewê Misrê re rekirin. Bi padîşahê Rom re da û sitand û kete rêza padîşah û fermandara, diyarî jêre hatin û xelkê ji hawîr xwe lê digirt û mala wî bû cihê xwînî û derketiya. Dengbêj û ristevana pesnê wî didan û rist li ser çêdikirin. Tuhamî çend ristên giranbiha di biwara wî de gotin.

Çi dema siwar dibû, heftê deve bi xeml û xêz û rewşa xweş pêre dihatin ajotin. Bejnek ji bedena Amed wî ava û bilind kiriye, ko heta îro jî xuya dikî.

Ebûtahir, kurê Dimne 28 sala bi vî awayî li bajarê Amed fermandarî kiriye, di çaxê Nesridewle Ehmedşahde, serdar Merenc, zavayê kurê Dimne jê xeyidî û bi dizî hate cem wezîrê navdar, Ebûqasimê Esfehanî, ko bi Xoce, navdar bû û got: Eger padîşah bextê xwe bidî min, ezê kurê Dimne bikujim û Amed bidim destê we. Gereke mal û mirovên min bêne parastin û rûmet û qîmetê min bigrin û li min miqate bin, neyêm kuştin.

Li ser vî awayî gihane hev û bi hevre soz dan û Merenc çû û kurê Dimne kuştin, lê berdestê kurê Dimne jî serdar Merenc kuşt. Zêr û cewahirê kurê Dimne anîn cem Xoce û got ez tenê dizanim bê malê kurê Dimne li ku hatiye veşartin. Çawa leşkerê kurd giha derê bajêr dîn, ko zarıwên Merenc bajar girtine û beden asê kirine û karê xwe û şer dikin.

Lê padîşah û Xoce ji wan re got, herweke me bext dabû bavê we wilo jî bextê me ji wereye. Eger bajêr bidin destê me, mal, can û gundên we nakevin ber talan û kuştinê.

Lê zarokên serdar Merenc gotin, eger berdestê, ko bavê me kuştiye bidin destê me, em jî wê çaxê dê bajêr bidin destê we. Di vir de Xoce zora padîşah bir û got, em naxwazin ji bo mirovekî, ko bavê wan di riya me de kuştiye, bi destê xelkêve berdin. Qewraş dane destê wan û kuştin. Bajar dane destê Ehmedşah û leşkerê kurd kete nav bajêr.

Her çiqas Seîdşah bilind dibû hewqas Şerwe jî pêre navdar û mezin dibû. Roj bi roj hilma padîşahî di mijiyê wî de xurt dibû. Bi arîkariya serdarê Cendirme, kurê Felyûs, berê xwe da kuştina Seîdşah û ketin vîlik û fen û fûta û

jêre davik hawîr vedan û çavnêriya dem û çaxê xwe kirin.
Mirovê har û dijwar Şerweyê xwînxwar, çend caran jehir xiste nav xwarina wî, lê serê xwe pê dananî. Naçare, karê kuştina wî kirin. Her sal Şah Seîd diçû keleha Hetax, ko ji bo xwarina serdarê bêbext dabûyê, li cem Şerwe mehek bi xweşî û şadîmanî çax û demên xwe derbas dikirin.
Ev keleh asê û bilind û raserî mêrg û deştên têr gul û gulistan û şînahîye, Şah û wezîr û serdar bi şadî derbas dikin û kurê Felyûs li ber destê wan û di karê wan de diçî û tê.
Şerwe, li ber derê kelehê leşker danîn, ko kes derbas nebî. Vexwarin hetta, ko bi carek serxweş bûn. Lê her yek ji mirovên şah serxweş dibû, ew dibirin û dixistin zindanê û digotin, ev bi fermana Seîdşahe û çawa Seîdşah pela dawî li ser rûmeta Şerwe vexwar, rabû û çû ser cihê xwe, ko razî, lê kurê Feylûs, şûrê xwe kişand û çû ser nivînê şah, ko bikujî, lê Seîdşah zû bi xwe şiyar bû û got, kuro, li o da min li çi digerî. Serdar Cendirma lê vegerand û got, ez benî, hatime, ko li te pêwaniyê bikim. Lê Şah Seîd rabû şû rê wî jê sitand û xiste bin xwe û li Şerwe kire qêrîn, lê çawa Şerwe hat, bi şûra dirêjî Şah Seîd kir û kuşt. Muşriq ko serkar û berdevkê şah bû girtin û bi xwe re birin Farqînê. Çawa pêvan û nobedarê bajêr bi dengê Muşriq derî vekirin û leşkerê Şerwe kete nav bajêr.
Naçare û ji tirsa xelkê bajêr bûne hevalê wî û fermandariya wî li ser xwe girtin. Bajar pere, çek û mal bi carek ketin destê serdarê dijwar û navê xwe bi padîşahî li nav xelkê belav kir û taca padîşahî da serê xwe.

3- EHMEDŞAH, KURÊ MERWAN, KURE KESRA :

Roja Hesenşah hate kuştin û Seîdxan bû padîşah Ehmedxan jî li Farqînê bû, lê Seîdşah xewnek dî û gote birayê xwe, dixwazim ji paytextê derkevî, yan gereke te bikujim.
Seîdşah, di xewna xwe de dîbû, ko roj ji jorve daket û li ser serê Ehmedxan rawesta. Çawa ji xew rabû, tirsiya û got, tac li serê Ehmedxan pîroz bûye û birayê xwe rêkire bajarê Sêrtê û dûr xist. Niha Seîdşah hate kuştin û Şerwe bû padîşah.
Lê Şerwe, dixwazî koka mala Merwan ji binî winda bikî û kesî nehêlî, ko doza padîşahiya xwe bikin. Leşkerek, Mîr Ebdirehman, kurê Dinbilî şande Sêrtê, ko Ehmedxan bikujin. Erzen, bi Xoce re kete dan û sitandinê, bi hevre derketin nêçîrê û dîn, ko ji dûr ve siwarek bi lez tê û siwarê çeleng bi dizî ji Xoce re got, Şerwe, Seîdşah kuşt û welat

bi carek xiste bin destê xwe û leşker rêkiriye, ko Ehmedxan jî bikujin û dixwazim herim Sêrtê û bi Ehmedxan bidim zanîn. Xoce sivik hin leşker şandin Sêrtî û Ehmedxan bi xwe re anîn cem Xoce Erzen û dest bi asêkirina keleh û bajêr kir û got, bajar li te û şerê dijmin li min.

Lê çawa Şerwenşah ev bihîst, leşkerekî giran şande ser Erzen, lê piştî çend mehan naçare vegeriyan Farqîn û nikaribûn tiştekî bikin. Piştî, ko leşkerê dijmin ji ser bajarê Erzen rabû.

Ji nûve Xoce, xelkê nav bajêr û eşîrên kurd li xwe civandin û ji Ehmedxan re dane sûndê û Ehmedxan kirin padîşah. Eşîrên kurd sûnd xwarin û gotin, hetta mirinê em bi terene, tiştekî ji te naxwazin. Xoce serpêhatiya Seîdşah ji dê û bavê wî re jî got. Roja dî leşkerê kurd lek bi lek kişiyane ser bajarê Farqîn.

Lê Şerwanşah, bi leşkerekî mezin ve derkete pêrgî dijminê xwe. Şerên xwîndar û dijwar destpêkirin. Tenê zû leşkerê Şerwe şikest û bi paşve reviyan. Mal û çek û barxane bi carek ji dijminê xwe re hiştin û Ehmedşah vegeriya Erzen û talan li leşkerê xwe belav kir û leşkerekî mezin saz û tekûz kir û bi Xoce ve berê xwe dane Farqîn, paytexta dewletê. Tirs û lerzîn ketin nav dilê Şerwexan. Her çiqas qencî bi xelkê nav bajêr dikir jî, lê dîsa li wan ewle nedibû. Lê serdarê Cendirma, kurê Feylûs, jêre got, bi ya min bî, emê hana xwe bibin padîşahê Rom û bajar bidin destê wî. Ji bo vî awayî xelkê bajêr jê tirsiyan û hew dilê wan jêre dixwest û dixwestin zû jê rûpakbibin.

Şerweşah, malê xwe di sindoka de rêkir Amed, cem kurê Dimne û bi hev re li ser dijminahiya Ehmedşah peyman û girêbendek çêkirin û sûnd xwarin.

Herwekû di roja înê de serdarê cendirma, kurê Feylûs bi cendirmên xwe ve hatin nimêjê û xelk di riwê wan de rabûn û êrîşî wan kirin û serdar kete qesra Şerwe û farqîniyan doza kuştina wî kirin.

Lê Şerwe serdarê cendirma xwe neda destê wan û ferman da leşkerê gurc, ko bi serdariya kurê Ebîleys, ji ber padîşahê gurcistan reviyabûn û hatibûn Farqîn û bûbûn perçak ji leşkerê kurdistan û Seîdşah ew bi camêrî xwedî dikirin. Leşkerê gurc, gelek ji xelkê bajêr bi tîra kuştin. Lê kurda êrîşî ser wan kirin û gotin, hetta kurê Felyûs neyê kuştin em ranawestin.

Lê Şerwe hevalê xwe neda destê wan û şerekî xwîndar di nav Textepayê de destpêkir. Lê Şerwe bazda û di birca padîşahde asê bû û han û hewara xwe bire mezinên bajêr û got,

dixwazim win, min ji van çewtî û şaşî û gunehan azad bikin
û nehêlin bême kuştin. Mezinên bajêr bextê xwe dane û bi-
rin mala yekî, ji malmezinê bajêr danîn, ko navê wî Mihe-
med kurê Ubeyd, kurê Mehwer bû.

Ev Mihemed kalikê diwem ji bapîrên Şeyxişiyûx Elî, kurê
Yehya, kurê Hesen e. Şeyxeşiyûx Elî, kurê Yehya, kurê he-
sen, kurê Mihemed, kurê Mehwere.

Lê xelkê bajêr, qesra kevnare û enbar wêran û talan ki-
rin û şandin cem Ehmedşah û gotin, gereke sivik xwe bighê-
nî bajêr. Serpêhatî jêre bi darvekirin, ha ha Ehmedşah û
Xoce bi leşkerekî giranve hatin hawîr bajêr girtin û ji
wan re şand û got, dixwazim win Şerwe bidin destê min. Lê
nedanê û gotin, me bextê xwe dayê, ko neyê kuştin. Lê ber-
dîberdan û berberî kete nav xelkê bajêr û hina go gereke
bidin destê Şah, birayê wî kuştiye, hina go, nabî, bextê
xwe bişkênin û Şerwe bidin destê dijminê wî.

Ji lewra Mihemed, kurê Ubeyd, kurê Mehwer xwe ji nav
wan derxist û li mala xwe rûnişt. Lê yekî dî bi navê Ebûta
hir, kurê Hemamê kirin mezinê bajêr. Lê gelek neçû ew jî,
li mala xwe rûnişt. Ehmed, kurê Wesî kirin mezinê bajêr û
bi arîkariya kurê Ebîreyhanê bajar bi carek xistin destê
xwe. Gelek mal û barxane civandin û bajar sipardin xwe û
li ber Ehmedşah asê bûn.

Lê leşkerê şah rê û çûn û hatin ji ser bajêr birîn û ne
hiştin, ko xwarin bê bajêr, zor dane şer û erîşî bajêr ki-
rin. Lê piştî çend mehan kurê Wesîf, bext ji şah û wezîr
sitand û bajar da destê wan. Lê bi soza, ko Şerwe nekujin.
Ehmedşah, kete nav bajêr û di birca mezin de rûnişt, lê
Şah li qesra Hemdanî bû mêvan. Di sala 401 koçîde ev serpê
hatî çêbûye.

Ehmedşah bû padîşah û Xoce kire wezîrê xwe û tiştek bê
wî nedikir. Wezîrê pir jîr, heçî serserî û pêxwas li nav
bajêr hebûn derxistin derve û gelek qencî bi xelkê bajêr
kirin û gelek zêr û gewher danehev.

Bajarên Tenzêg, Fafê û hetta sînorê Cizîrê dane kurê We
sîf û ew kirin fermandarê wê hindamê. Lê piştî pêlakê Eh-
medşah, Şerwe bire keleha Hetax û li cihê, ko Seîdşah hati
bû kuştin, kuşt û laşê wî bi darve kirin. Gelek ji dost û
mirov û hevalên wî kuştin û girtin. Paşê darbesta Seîdşah,
birin Erzen û li nav gornistana mala Merwan veşartin. Seîd
şah kordûnde serê xwe danî, hate kuştin.

Lê piştî kuştina Şerwe û hevalên wî, kurê Wesîf, reviya
û çû Bexda û bi şeş kevira fermandarî û welat ji destê xwe
berdan û li Bexda rûnişt û hew vegeriya kurdistanê.

Institut kurde de Paris

Di sala 403 ê koçîde, li Hicazê, Kabe çiriya û li Qudsê Bîeya mezin hilweşiya û li Samîra mizgevt şewitî û xelk ketin nav tirs û lerzîna.

Ehmedşah, bû padîşah û gelek bi pêşve çû. Herwekû me derbas kir, Amed kete bin destê wî û welatê xwe fireh kir. nav û dengê wî bi çolade belav bûn. Li cem birca padîşah qesrek ava kir, ji ber, ko Qesra Hemdanî hilweşiya bû. Lê qesra wî gelek xweş û mezin hate avakirin. Bostanek ji qesrê re danî û dîwar û jorê qesra xwe avzêr kirin, yan bi zêravê neqişandin, nivîsandin, ko hêj qesrên wilo çênebûne. Ji serê kaniyê av kişandin qesrê û têde hewiz û serşok çêkirin û di sala 403 de têde rûniştt.

Herwekû di vê salêde peykê peşrewê Bexda Qadirîbilah hate cem Ehmedşah û perdevanê kurê Biweyh, padîşahê Îraq û Faris, bi navê Mihemed, kurê Ehmed, kurê Mezîd pêre bû û perwa û diyarî û pîroznamek bi xwere ji padîşahre anî bûn û navê wî li ser fermana peyrew kirin Nasiridewle û min ji cem xwe, Xan, Şah pêve zêde danîne.

Berwayên peyrew 7 perçe kincê padîşahî bûn. Xevtan, Cibe, Şaşa Reş, du bazinên zêr, bi gewher û hespekî bi zêr xemilandî û pîroznamak bi tura peyrew, ko padîşahiya welatê Amed, Farqîn lê pîroz kiri bû, li nav xelkê bajêr hate xwendin. Fermanrewa Qadî Elî, kurê Hamid rûniştî bû û padîşah kincê xwe wergirtin û xelk pir gihabûn hev û dilxweş dibûn.

Herwekû di vê rojêde peykê peyrewê Misrê jî hate pîroziya padîşahê kurdistanê û pîrozname û gelek diyarî û perwa pêre bûn. Navê Ehmedşah kiribû Îzidewle. Xelkê bajêr derketin pêrgî peykê Misrê û bi govend û şahî gihandin qesrê.

Çawa, ko di wê rojêde peykê padîşahê Rom jî giha Farqîn û ji padîşahê Rom Basîl, pîroznamak ji padîşahre di gel diyariyên giranbiha anîbûn, birek hespên navdar û devên ciwan û gelek diyariyên dî jî pêre bûn.

Nesridewle, Îzidewle, Ehmedşah, li ser textê dewletê rûnişt û peykên peyrewê Bexda û sultan li milê rastê û peykên peyrewê Misir û padîşahê Rom li milê çepê padîşah rûniştin. Ristevan û dengbêj û Quranxwîn, li vê navê rûniştin û gotin û pîroznamê herdû peyrewan hatin xwendin û padîşah kincên xwe wergirtin û kincên giranbiha li mêvanên xwe kirin.

Ev rojeke navdar û gelek bi rûmet bû, ko hê ji kesîre wilo nehatiye kirin û nebûye Ehmedşah gelek qencî bi xelkê kirin û gelek tiştên mezin ji destê wî hatine çêkirin, ge-

lek gund û cihên hêja li ser bedena bajêr kirin weqf û hatina wan cî û gundan li bedenê dihate xerckirin û bi destê comerdî mal, pere qencî bi ser xelkê de barandin û belav kirin. Wezîrê pir jîr, Xoceyê Esfehanî, di wezaretêde destê wekhevî û dilovanî û comerdî dirêjî herkesî dikir û rêzan û xêrxwazê dewletê bû.

Ehmedşah bêş û bela ji ser xelkê sivik kirin û gelek ji dîwarê bedena Farqîn avakirin. Hin cî nûjen kirin û gelek barên genim li mizgevtê danîn û li belengaz û rebenan parvekirin. Her sal 366 kêl genim didane belengaza. Lê paşê gundê Etşa, li rojavayê bajêr kire weqf û hatina wî dida reben û belengaza. Li ser destê wezîrê Ewqafa, dihate belavkirin û dayîn. Herwekû wezîrê Ewqafa Hesen, kurê Mihemed, kurê Mehwer bû.

Di sala 409 ê koçîde Ebû Ebdilah Huseyn, kurê Selme ê Malikî bû fermanrewayê Farqîn û di wezareta Ewqafde sûngirê Hesen, kurê Mehwer bû. Gelek neçû fermanrewatiya Farqîn, Amed kete destê wî, ko ji paşve wê bê gotin.

Herwekû di sala 410 de Ehmedşah, keça Fedlûnşah, padîşa hê kurdistana rajor, Ermenistan Genco û Eran, Fedlûniyê markir û du kur ji vê jinikê jêre çêbûn, Seîd û Şahinşah.

Ev Fedlûn padîşahê Ermenistan û Eran bû. Di serê Rûsade mêranîyeke mezin kiriye, ko rojhilat ji setema Qeyserê Rûsîya parastiye. Çawa, ko Seyide, keça Şerefidewle, qewraş melîkê Mûsil jî markir û jêre qesrek bi qesra xweve avakir û gelek jê hezdikir.

Lê mirovek ji welatê Misrê hate cem û cariyeke pir şêrîn û ciwan pêre bû, ko bê pîvan dengê wê xweş û şêrîn bû. Lê kurekî mêrik jê hebû, ko navê wî Mihemed Ebûlwefa bû. Çiqas padîşah xwest, ko jê bikirî lê mêrik nedikir û paşê jê kirî û markir û bê pîvan jê hez dikir û pêve mabû.

Ji lewra herdû jinên wî, Fedlûniyê û Seyide xeyidîn û çûne malên bavê xwe û Fedlûniyê li mala bavê xwe serê xwe danî, lê Seyide çû mala bavê xwe û ji bû wê navbera Qerwaş Nesridewle nexweş ket û Qewraş bîst hezar dînar û bajarê Nisêbîn ji xwarina keça xwere ji Ehmedşah xwestin, lê Ehmedşah nedan û şer di nav herdû dewletan de destpêkir. Dawî li hev hatin û Ehmedşah 15 hezar dînar dane Qewraş û bajarê Nisêbîn bi diyarî daBedran, birayê Qewraş û li hev hatin. Tenê kurê Ezreq dibêjî, Seyide ji mala mêrê xwe derneketiye û wilo rûniştiye.

Herwekû dibêjin 366 cariye di mala wî de hebûn, ko ji salê şevekdigiha yekê.

Di sala 414 de, padîşah dînxanek avakir û mizgevta me-

Institut kurde de Paris

zin nûjen kir û li ser destê Bextyeşû hatin lêkirin. Ev Bextyeşû serkar û çavdarê pala û xeznedarê dewletê bû û di vê salêde minara mizgevta Rebed avakir û gelek cî ji bedenê avakirin û nûjen kirin.

Çawa Amed kete destê wî, li bajêr rûnişt û malê kurê Dimne dahev û ji xelkê sitand û gelek qencî bi xelkê bajêr kirin. Gelek bêş û bela ji ser wan rakirin û ala dilovanî, wekhevî di ser xelkê re rahejand.

Zengî, kurê Ewan, fermandarê Heran û Riha kire fermandarê Amed. Lê gelek neçû serê xwe danî û hate kuştin. Xezûrê kurê wî Ehmedşah bû. Piştî kuştina Mîr Zengî, Ehmedşah kurê xwe Sadidewle kire fermandarê Amed û nivîsvanê xwe, kurê Nexwar kire wezîrê wî.

Di sala 418 ê koçîde wezîrê pir jîr Xoceyê Esfehanî serê xwe danî û padîşah gelek li ser xeyidî û dilnexweş bû.

WEZARETA ELÎ KURÊ HUSEYN :

Ebû Huseyn Elî, kurê Huseyn wezîrê Misrê bû. Ji wir reviya û hate İraqê, nik mala Biweyhê Deylemî. Li şûna wî kurê wî Huseyn kurê Elî kurê Huseynê Mexribî bû wezîr. Lê paşê hate girtin û paşê reviya û hate İraqê, cem bavê xwe û piştî pêlakê bavê wî serê xwe danî.

Lê hin dibêjin, bavê wî li misrê hate kuştin. Gelek diristeke ev rastbî.Lê wezîrê navdar ji Bexda hate Mûsil nik Şerefidewle yan Mutemedidewle, Qerwaş fermandarê Mûsil. Paşê hate girtin û dawî hate berdan û berê xwe da Farqin. Lê bi rê de, birayê mûtemididewle Qerwaş, Bedran li wan rast hat. Careke dî vegerandin û xistin zindanê. Paşê careke dî hatin berdan û hatin cem Ehmedşah Farqin. Di wê navêde Kurdistana Amed bê wêzîr ma bû. Ji lewra Ehmedşah Elî kurê Huseyin kire wezîrê dewleta xwe û her tişt bi destve berda.

Dibêjin: ji vî wezîrî zanatir û mezintir hêj renebûne. Lê Suleymen kure Fehed bi rûmet li cem padişah rûnişt. Hata wekû navbera xwe û Qerwaş xweş kir û vegeriya Musilê û li mala xwe rûnişt. Lê wezîrê navdar, kurê berke, kire serekdîwan. Ehmed kurê silîkê Ermenazî li ber destê xwe, kire Nivîsvanê xwe.

Ev Ehmed, kurê Silîkê azgirî Ehmed,kurê Yûsif ji Melazgirde, ko li hindama Xertpirte, ne ji Melazgira hêla Xelatê ye. Bi xwe mirovekî zana û hezan û ristevan bû. Ji ber Ehmedşahve çend cara çûye Qestentîniye(İstanbul), cem padîşahê Rom. Gelek nivîştên giranbiha civandine û li herdû zanîngehên Farqîn û Amed parvekirine. Kurê Xelkan dibêjî, heta îro jî, hêj ji wan nivîştan re dibêjin " Nivîştên Mena-

zî.

Lê kurê Xelkan dibêjî, ev Ehmed kurê Yûsif, kurê Silîkê menazî, wezîrê Ehmedşahê Merwanî bû. Dîwanak ristîn wî giranbiha heye, lê nakevî destê her kesî, ji ber, ko gelek kêm bûne. Gelek nivîştên pir hêja çêkirine û li Meretinnaman, Ebûl Ela diye û pêre peyiviye. Xetîrî, di Zînetidehrde navê wî û çend ristên wî anîne. Di sala 437 ê koçîda serê xwe danîye.

Di sala 435 de, yan di sala 422 de Celalidewle, kurê Bihaidewle, kurê Edididewle, kurê Biweyhê Deylemî serê xwe danî û kurê wî Ezîzidewle, li şûna bavê xwe rûnişt. Lê Turkên serdarên leşker ew avêtin û pismamê wî Ebû Kalîcar, kirin padîşah. Ezîzidewle reviya û hate Farqîn, cem Ehmedşahê kurd û bi serfirazî li cem rûnişt, hetta, ko serê xwe danî.

Di sala 423 de Ehmedşah, mizgevta Mihdese, li jorê Farqîn avakir. Ji malê xwe gelek lê xerc kir û pir ciwan û xweşik hate lêkirin. Wezîrê Mexribî, di wezareta xwede gelek tiştên hêja û kesnedî pêkanîn û çêkirin û welatê kurd Farqîn û Amed gelek bi pêşve birin û dewleta kurd gihande rêza dewletên mezin, weke Misir û Bexda bilind û payedar kir û gelek qencî bi xelkê kirin. Lê di sala 428 de li Farqîn serê xwe danî û laşê wî xistin tabûtekê û birin Kûfa, li nik gorna îmam Elî veşartin. Hezar dînar ji tabûta wî derxistin.

Mexrebî, gundeke li nav kurdên Badîna ye, ko ev malbat, ji wî gundiye, ne ko ji welatê Mexrib hatine.

AVAKİRİNA NESRİYE :

Payiz û havîngeha Nesriye gelek xweş û hêja ye. Ji ber, ko Nesridewle, padîşahê kurdistanê avakiriye, jêre dibêjin Nesriye. Gelek avanîyên ciwan û xweşik têde hatine avakirin û qesra padîşah nayê pesindan. Li ser qiraxa çem hatine avakirin. Herwekû gelek xanî, bazar, serşok hatine çêkirin û lêkirin û ji her kurekî xwe re û mirovên xwe re xanîyên xweş avakirine. Dolabek li ser çem daniye û av kişandîye nav bajêr.Havîngeh û bexçe û pingav çêkirine û pirek li Tilbenan çêkiriye. Herwekû derê qesra padîşah ji sifir hatibû çêkirin. Kurê Ezreq dibêjî, di îro de ev derî dane ber mizgevtê

Bi kurtî cihên weke Nesriye, ji bo geşt û seyrangehê xweş û ciwan peyda nabin. Ji her şûn û derî xweştir û ciwantire. Di biharande padîşah û zar û zêçên xwe û mirov û dost û dilxwazên xwe diçûn Babodîn û roja dî diçûn Tilbe-

Institut kurde de Paris

nan û roja çaran ji nûve di gihane Nesriye. Herwekû şeva pêşî li Batirî diman.

Di vê rê de mêvanxane, mizgevt û pirên hêja avakiribûn û çêkiribûn. Hawîr mêrg û deşt û gulistanbûn, çûk û çivîk hawîr digeriyan, dengê bilûra avê guhê Evîndar û serxweş û dilgeşan tije şadî û xweşî dikirin û kalîtî bi paşde vedigerandin.

Padîşah û mirov û dostên xwe di vê havîngehêde bihara xwe derbas dikirin. Havînan vedigeriyan Farqîn û Amed, paytexta dewletê. Wilo bi serbilindî û dilxweşî di kurdistanê de jîna xwe derbas dikirin.

Nesridewle, gelek pirên mezin li ser çema avakirine. Gelek ji malê xwe li wan xerc dikir û weqf li ser wan datanîn. Weke, pirên Huseyniye, Humeydiye, Tilbenan, Qetîna, Babodîn, İbrahîmî, Bersedê

Bi kurtî di welatê xwe de destê xêrxwazî, comerdî dirêj dikire her hindam û di her meydanê de xerc dikir. Qenciyên bêpîvan ji milet re dikirin. Rojekê destê xwe dirêj nekir malê kesî. Mirovên weke, Serî İdella, Tuhamî xwe lê digirtin û pesnê wî didan. Ristevanên qesrê, ko li ber destê wî bûn weke, Qaîd, kurê Zerîf û kurê Sewadî, kurê Xêderî mirovên navdar û bi deng bûn.

Farqîn bûbû cihê mirovên xwînî û derketî. Hawîr xwe lê digirtin weke, Ezîzidewle, kurê Celalidewle, Suleyman, kurê Fehed û Zexîre û diya xwe, kurê peyrewê Bexda li cem Ehmedşah rûniştin û bi serbilindî xwedî dikirin. Ji hawîr diyarî jêre dihatin.

WEZARETA FEXRİDEWLE, KURÊ CİHEYRÊ MÛSİLİ :

Dibêjin, Ebûhekîm, serkarê leşkerê kurd, ko ji bajarê Hedîse bû, serê mirovekî padîşah şikand û reviya û kete mala pismamê wî, Merziban, kurê Belaş, kurê Kek Kesra. Padîşah bi xwe li pey çû, ko ji mala pismamê xwe derxî û bixî zindanê. Lê Merzîban, derkete pêşiya wî û got, " çawa di xwe re dibênî, ko vî mêrikî ji mala pismamê xwe derxî û rûmeta min bişkînî. Ser û mal û can tev li ber tene, ma kî heye karibî serê xwe li ber te, li ber padîşah rakî."

Ehmedşah ber xwe ket û vegeriya û şande cem Fermanrewayê Amed û got, dixwazim kurê Ciheyrê Mûsilî Fexridewle, ko li cem te ye, ji min re bişênî, ko bikim wezîrê dewletê. Fexridewle hat û li Farqîn rûnişt û bû wezîr. Ji vir tê zanîn, ko kurd negihabûn meydana zanîn û dewletê, çawa padîşahê kurd, yekî ji Hedîse bikî serdarê leşkerê xwe û kurê Cuheyrê Mûsilî bikî wezîrê xwe. Ma ev zanîne, ma padîşa

he. Serkarê leşkerê kurd, Ebûhemîm, ji bajarê Hedîseye. Lê ji ber, ko du Hedîse hene divê em bidin zanîn, ko ji Hedîse ya, ko dikevî ser çemê Zab û li hindama Muŝile. Lê Hedî sa dî li ser çemê Ferate û li hember Enbare. Enbar, li Cizîrê ye û Hedîse li Şamiye dimênî.

Herwekû zariwên Ebûhekîm, heta çaxê kurê Ezreq jî, çavdêr û serkarên leşkerên kurd bûn. Kurê Ciheyr, di sala 430 ê koçîde bû wezîrê dewleta kurdî. Diyarî û perwa ji zarokên Ehmedşah re anîn û pêşkêş kirin. Navê wî kirin Kafî Dewle. Lê çawa bû wezîrê peyrewê Bexda, navê wî bû Fexridewle. Mala Merwan pesnê xwe didan û xwe payedar didîn, ko du wezîrên mezin, navdar weke, Mexribî û kurê Ciheyr, ko berî hingî wezîrên peyrewên Bexda û Misrê bûn, ji xwe re kirine wezîr. Lê xuyaye pir nezan bûn.

Kafîdewle, Fexridewle, kurê Ciheyrê Mûsilî gelek jîr û mezin bû. Dilovan, bîrewer û zana bû û di çax û demên wî de, weke wî wezîr nebûn, ko bighêne rêza wî. Dengbêj û ristevana xwe lê digirtin û pesnê wî didan û diyariyên mezin jê distandin. Kurê Senan û kurê Heyyûs hatin cem û pesnê wî dan.

Lê hin dibêjin, di sala 450 de, kurê Ciheyr bûye wezîr. Herwekû di vê salê de Besasîrî, kurê Ebdilahê Turkî, ko Bexda bi zor xiste bin destê xwe, peyrewê Bexda Qaim Bîemrilah reviya û çû cem Mîr Mehariş, fermandarê Hedîsa Ferat. Mezinê Erebê Benî Uqeyl û Seyide û kurê xwe Zexîre re viyan û hatin cem Ehmedşahê Merwanî, padîşahê kurd li Amed û Farqîn rûniştin. Lê Zexîre û diya xwe li ser kîsê Fermanrewayê Amed dihatin xwedîkirin. Fermanrewa, Ji Ehmedşah, destûr xwest, ko li ser kîsê xwe wan xwedî bikî. Lê çawa Tuxrulşah ji Xerasan hate Bexda û peyrew vegerand, Zexîre û diya xwe jî vegeriyan Bexda û Ehmedşah bêjimar diyarî û mal dane wan û bi serbilindî rêkirin Bexda. Lê ev jî şaşîkî bû, ko dewlemendiya xwe nîşanî peyrew da.

Di sala 434 de Tuxrulşahê Selcoqî, bi serdariya Nasixlî û Boqa-boka leşkerek rêkire ser dewleta kurd û şerên xwîndar di navbera kurd û turkan de destpêkirin.

Lê Ehmedşah 50 hezar dînar dane wan, ko ji ser welatê wî vegerin, lê herdû serleşkerên turk serxweş bûn û xwe bi xwe hevdî kuştin, kurd li wan derketin û gelek ji wan kuştin. Gelek dîl kirin û mal û çek û hespên wan bi carek ketin destê leşkerê kurd û ew jî şaşî bû.
Herwekû ev cara pêşiye, ko kurd riwê turkan(Selcoqiyan) di bênin û ji wê rojêde û di çaxê Ehmedşah de hew kes bi ser wan de hat û ji Turkan rûpak bûn.

Lê di sala 439 de Alparslan, kete şûna Tuxrulşah û welat bi carek kete bin destê wî. Di vê salê de dilsarî kete navbera Ehmedşah û Şerefidewle( Mûtemedidewle, Qerwaş) û bûne dijminê hev. Herwekû di vê salê de Ehmedşah, Fermanreweyê Farqînê Suade, kurê Huseyn, kurê Bekir girt û xiste zindanê û derî lê girt heta, ko têde serê xwe danî. Ji ber ko dixwest bêbextiyê li welat û milet û dewleta xwe bikî. Bi dizî nivîsarek şandibû cem fermandarê Mûsil. Çawa padîşah jê pirsî înkar kir, lê nivîsvanê wî, ko nivîsar biribû îtîraf kir û got, belê Fermanrewa nivîsarek da min, ko bibim Mûsil û digot, tê hin nivişta ji min re bênî, ko li Farqîn peyda nabin.

Lê Ehmedşah, ev bawer ne kir û Fermanrewa bi vî rengî kuşt û Mihemed, kurê Şazanê Tûsî li şûna wî kire Fermanrewa. Herwekû wezareta Ewqafan jî da destê kurê Şazan. Lê ew di sala 435-436 de hate girtin.

Navê Ehmedşah, li ser bedena bajarê Farqînê, ji derve de, li ser 10-20 cihî û ji hindirûve li ser 30 cihî bêtir hatiye nivîsandin û kolan. Gelek gund kirin weqfa bedenê û herdû serşokên, ko nû avakiribûn jî kirin weqfa bedenê. Sê cihok ji serê kaniyê anîne nav bajêr û li qesr û serşok û mizgevtan gerandine.( Ne bajarê serê kaniyê, ko li Cizîrê navdare).

Herwekû di çaxê wî de Ehmed, kurê Cerî, ji kaniya Cenbaş av di rojavayê bajêrve aniye ser mizgevtê û li gelek şûn û ciyan gerandiye. 50 hezar dînarên Ermanosî(Romî) lê xerc kirine. Ermanos, Romanosê padîşahê Rome, ko di sala 352 de serê xwe daniye û ji neviyên padîşahê BêzentîBasîle.

Rojekê de yekî dikandar li Farqîn 500 dînar kar kirin û Ehmedşah şande pey û anî nik xwe û jê pirsî û got, raste ko te pêsed dînar îro kar kirine. Kurê Bihat jêre got, belê, dewlet serê padîşah raste. Wilo got û pêsed dînar danî ne ber destê wî û got, wane li ber destê te ne, çi jê dibî li te pîroz bî. Lê Ehmedşah perê wî lê vegerandin û got, rahêje perê xwe û sûnd xwar, ko qurûşekî jê nasitênî û got ez naxwazim perê kesî bixum, lê dilxweş bûm, ko yekî di bajarê min de û di rojekê de pêsed dînar kar kirine. Lê kurê Bihat, bazirganê navdar jî sûnda mezin xwar, ko bi xwe re venagerênî mala xwe û herdiwa li ber hev dan, lê dawî kurê Bihat got, ez benî, ji ber, ko sûnda te li te nekevî, hêvî dikim, ko gundê Benînoh pê bikirim û bikim weqf. Bi vî rengî gundê Benînoh, kirîn û kirin weqfa kelehên Egil, Yemanî Çatre, ko ji kelehên hindama Amedin. Gundê Benînoh, li çi-

Institut kurde de Paris

yayê Fetrasa dikevî.

Herwekû Ehmedşah, keleheke nû li sasûn, di sînorê xwe û Ermena de avakir û bedeneke mezin û bilind li hawîr kelehê û gund pêça. Herwekû ji malê Ebûbekir, kurê Cerî pêve malê kesî talan nekiriye û nesitandiye. Ew jî, ji ber, ko tê hildan û gotin, kurê Cerî, dixwazî bajar bidî Ermenê Sasûn. Bi ser mala wî de girtin û gelek çek di mala wî de girtin. Ji lewra malê wî, ko bi çarsed hezar dînar hêja ta lan kir û jê sitand. Bihayê heştê hezarî jî, ji zarokên wî re hiştin.

Herwekû dezgehek di nav bostanê Elî, kurê Mensûr de ava kir û gelek mal li ser danî û li ser destê kurê Ciheyr, wezîrê navdar hate çêkirin. Ehmedşah çar jin mar kirin. Seyîde, keça melîkê Mûsil Qerwaş, Fedlûniye, keça Fedlûnşah, fermandarê Eran, Gence, keça mezinê Sasûn Ermenî û Senharib, jinika dengbêja Misrî. Herwekû keça Senharîb berî hingî jinbira wî, Ebûelî Hesenşah bû. Sêsed û şêst û şeş carîye li cem hebûn, herwekû jinên dengbêj û dîlanvan bêjimar, li nik peyda dibûn.

Lê Ehmedşah, bi vî rengî nehişt, ko dîwarên dewleteke mezin û xurt, ko bi sedan sal piştî wî re ji zarok û miletê kurd re bimênî, bêne danîn û avakirin.

Divabû, ko vî malê bêjimar, ko li jin û saz û tirekiya, li mizgevt û minara û dîlanvana xerc dikir, li şûr û mertal û mencenîq û tîr û kevan û alavên şer û asêgehên xerc bikira û leşkerekî bêjimar û têr çek û cengawer bi şûn xwe de bihişta, ko serê miletê kurd û zariwên wî bilind bimana û kurdistan bi carek bixista bin destê xwe û dijminên xwe, bi gernasî ji ser sînorên welatê xwe vegeranda û bi şikanda. Lê malê xwe bi carek li tiştên badîhewa xerc dikir. Eger em hin avanî û comerdî ji nav bidin alî, zariwên xwe dibin barekî giran de hiştin.

Rojekê bi leşkerê xwe re rûdinişt û bi wan re dixwar û vedixwar û rojekê bi zarok û mirov û dost û hevalên xwe re rûdinişt û dixwar û rojekê bi dengbêj, tiyatro, sazbend û cariyên xwe re rûdinişt û dixwar û vedixwar û bi şev carîyak li cem xwe dihişt. Rojekê jin û zarok û keçên xwe li xwe kom dikirin û bi wan re dixwar û vedixwar û ji xwe re dilîstin û govend û dîlan dikirin. Şeva kîjan jinê bûna li oda xwe dihişt û pêre radiza û sibehê diçû nêçîrê û nîvro di hate mal û piştî saetekê wezîrê wî tenê di hate cem û di karê dewletê de mijûl dibûn û hinek pal dida û paşê li ser xwarinê rûdinişt ta wekû bedlak ji şevê derbas dibû û ji nûve cariye, dengbêj û sazbendên xwe tanîn û bi şadima-

nî şeva xwe derbas dikir û sibehê zû radibû serê xwe di-şûşt û nimêj dikir.

Ji hevdemekî wî pirsîn û gotin, raste, Ehmedşah 53 sala bi padîşahî derbas kirine. Lê mêrik li wan vegerand û got, 106 salan padîşahî kiriye, ji ber, ko şevên wî jî weke rojên wî bi xweşî derbas dibûn.

Dibêjin, ko rojekê felekîyekî Hindî hate cem Ehmedşah û carekê jê re got, mirovek heye, ko tu gelek jê hez dikî lê ewê rojekê vê dewletê ji vê malê, ji xwe re bistenî.

Ehmedşah, li kurê Ciheyr nêrî û got, eger hebî wê ev mirov bî. Lê wezîrê dijwar serê xwe danî û got, nebî, nebî vê gomanê bikî, ez çime hetta, ko bi vî karê bê rê rabim, yan karibim bikim.

Lê kurê Ezreq dibêjî, bavê min ji min re gotiye, ko kurê Ciheyr ji min re got, ji wê rojê de min çavên xwe berda ne dewletê û dilê xwe bijande malê mala Merwan.

Di sala 449 de wezîrê navdar, kurê Ciheyr, Fermanrewayê Farqîn Mihemed, kurê Şazan avêt û Elî kurê Amedî, kire Fermanrewa. Ji ber, ko bavê wî bû sebebê wezareta kurê Ciheyr û xiste serê padîşah û got, eger dixwazî careke dî Amed ji destê te dernekevî, gereke em kurê Amedî bikin Fermanrewayê Farqîn. Ji ber, ko carek em dilê bavê wî xweş dikin û carek jî, em wî giraw li cem xwe dihêlin.

Roja, ko Elî hate Farqîn, bavê wî û birayê wî Ebûhesen û kurê Eyûb û kurê Bekrûn û Xetîb, kurê Uqeyl, mizinên bajarê Amed bûn. Lê di sala 451 de Ehmedşah, Fermanrewa kurê Bexilê Amedî xiste zindanê û talan kir. Paşê di zindanê de serê xwe danî. Lê herdû kurên wî ketin şûna bavê xwe. Yek Elî bû, Fermanrewayê Farqîn û EbûHesen li Amed rûnişt û bavê xwe li derê Romê, kumbedekê de veşartin.

Lê di sala 453 de padîşahê kurd, li Farqîn serê xwe danî û mal û dewlet bi şûn xwe ve hiştin û laşê wî di Kumbeda sêtilî de li qesrê veşartin. Lê hin dibêjin, di mizgevta Muhdise de hatiye veşartin.

Di hamiş jimar yek de dibêjî, sêdlî gotineke ne Erebîye bi daxwaza sêtilî, sê sitûn hatiye. Ji lewra dibêjim, sêtilî gotineke kurdî ye, pir diriste, ko Seydelî ji vir hatibî.

Lê di sala 456 de keça wî Sitilmelîk, kumbedek bi navê Merwaniya avakir û bavê xwe guhazte wê kumbedê. Ev kumbed bi mizgevtê ve û li meydanê Farqînê hatiye avakirin.

**4- NİZAMİDÎN NESİR, KURÊ EHMED, KURÊ MERWAN, KURÊ KESRA :**

Birayê mezin Sadidewle Mihemed, li Amed serê xwe danî û

kor dûnde çû û piştî mirina Ehmedşah kurê wî Nizamidîn Nesir bû padîşah yan Fermandar.

Wezîr Fexridewle Kafîdewle, kurê Ciheyrê Mûsilî Nizamidîn ji mal anî û li şûna bavê wî danî û serê xwe jê re nixûm kir. Bi navê padîşah gazî kir û mirov û serdar û fermandar û fermanrewa û mezinên dewletê bi carek civandin. Jê re sûnd xwarin û paşê ji ser text daket û li ser qadê rûnişt û dengbêj û ristevana li ser padîşahê mezin Ehmedşah gotin û serxweşî dane padîşahê nûhatî û dilê wî xweş kirin.

Bêtir ji çil kurî, ji Ehmedşah man. Mezinê wan Sadidewle Hesen bû, ko li Amed ji ber bavê xwe ve Fermandar bû û kor dûnde serê xwe danî. Piştî wî re Seîd bû, ko keça fermandarê Heran mar kir, paşê serê xwe danî û İsko û xuşka xwe Sitinas, ji keça Zeng man. Di pey wî re Nizamidîn Nesir tê.

Herwekû sê keçên wî(Ehmedşah) hebûn, Sitilmelik, Zibeyde, Zeyneb. Sitilmelik mêr nekir û wê kubeda bavê xwe avakiriye. Lê Zibeyde, Ehmed, kurê Şibil, kurê İbrahîm, fermandarê Erzen markir. Zeyneb, Mûsik, kurê Mihemed, kurê Kek• Kesra markir û gelek zarokên wê çêbûn.

Lê pismamê wî gelek bûn, ji wan Serdar Mûsik, kurê Mihemed, kurê Kesra û Serdar Evşîn, kurê Mengelan, kurê Kek Kesra û Serdar Elî, kurê Mensûr, kurê Kek Kesra û Merziban kurê Belaşo, kurê Kek Kesra û Serdar Mihemed, kurê Dawid, kurê Kek Kesra bûn.

Ji van te va bêtir Merziban, kurê Belaşo keça Elî, kurê Mensûr, Hind markir û gelek bi nav û mezin bû û bi rûmet û saw bû û doza mezinahiyê dikir.

Nizamidîn Nesir, bû padîşah, lê Seîd, ko bi xwe fermandarê Amed bû û ji Nizamidîn meztir bû, serê xwe li ber hil dida û doza padîşahiya kurd dikir. Çû Bexda cem Sultan û giliyê birayê xwe kir û go, ez birayê mezinim, lê bi zor ji min sitandiye, sultan pê dilxweş bû û pênc hezar siwar danê û şande ser Nizamidîn Nesir. Lê wezîrê pir jîr xwe gihande Seîdxan û got, bere windakirina vê malê, vê dewletê ne li ser destê te bî û bere ev dewlet ji destê we teva dernekevî. Ew haşt kir û herdû bira li hev anîn û gelek gund û mal û bajar dane Seîd û çûne riwê hev û bi hev re rûniştin.

Lê di vê em zanibin, ko ev destpêka herivandina dewleta Merwaniye, ko dijminahiya xwe bi xwetî ketiye nav wan. Lê di sala 455 de Peyrewê Bexda Qaim, hêvî ji Nizamidîn kir, ko kurê Ciheyr jê re bi şênî Bexda. Nizamidîn, wezîrê xwe

ji destê xwe berda û bi diyarî û perwa ji peyrewê Bexda re rêkir.

Di vir de çîroka Efdel Elî, kurê Silahidîn tê ber çavê mirov, ko kurê Şedad ji dest xwe berda û ji birayê xwe re rêkir Bexda. Ev yek ji nezanî û qelsiya mirovê mezine, ko mirovên zana û birewer ji dest xwe berdidin.

Lê çawa, kurê Ciheyr, kafîdewle giha Bexda, peyrew ew kire wezîr û navê wî kire Fexridewle.

Lê Nizamidîn Nesir, padîşahê kurd piştî kurê Ciheyr ji dest xwe berda; İbrahîm kurê Ebdilkerîm, kurê Enbarî kire wezîrê Kurdistan. Herwekû ev wezîr İbrahîm, berî hingî li Mûsil wezîrê Ewqafa yan serekdîwanê Melîkê Mûsil Şerefidewle bû.

Di sala 455 de fermanrewayê Farqîn Ebûhesen Elî, kurê Amedî ji Fermanrewayî avêtin û kurê Cerî kirin Fermanrewa. Lê kurê Amedî, çû Misrê û hetta kurê Cerî ne mir venegeriya welatê xwe.

Di sala 458 de pênc hezar siwar bi serdariya Salarxeran Sultan şande ser Farqîn û êrîş berdane hawîr bajêr. Welatê Amed "Diyarbekir" dane ber talan û berbadiyê û kon û çadirên xwe li ser Farqîn vegirtin. Wezîr İbrahîm bi diyarî Salar ket û sêsed hezar dînar danê, ko ji ser welatê kurd vegerî, bı xap û fen û fûta ew birin nav bajêr û sê birayên Nizamidîn, Hesen, Fedlûn û Mamik kirin giraw.

Lê çawa birin cem padîşah Salar bi çend mezinê leşker ve kuştin. Leşkerê Turk talan kirin, lê leşkerê Turk jî du birayên padîşah kuştin û yek bi dûvê hespê ve girêdan û di gundê Termîn ve derketin, lê ew nemir û du kur ji Hesen man. Ebû Seîd û Mengelan. Herwekû Ebû Seîd ta bi sedê şeşê koçî jî hêj sax bû. Lê paşê kor bû û kete bêmaristanê(Dînxanê) û kurê Ezreq dibêjî, min ew bi çavê xwe di bêmaristanê de dî û paşê birne nik Tacidewle Mihemed, kurê Mensûr, kurê Nizamidîn. Di sala 458 de wezîrê Nizamidînşah serê xwe danî û li Meşhed hate veşartin. Selame, kurê İbrahîm, kurê Enbarî kete şûna bavê xwe.

Herwekû di sala 455 de Texrelşah yan Sultan Texrel, li Esfehanê serê xwe danî û biraziyê wî Alparslan, Mihemed kurê Dawid bû padîşah, sultan.

Herwekû di sala 460 de, dijminahî careke dî kete navbera Nizamidîn Nesir û birayê wî Seîd, fermandarê Amed(Diyarbekir). Seîd çû cem Alparslan. Di sala 463 de, padîşahê Roma, Qestentîniyê derket û hate ser Melazgir. Ji ber, ko dewleta kurd weza mabû, nikaribû kurdên wan nava biparêzî. Xwe bixwe herdû bira bûne dijminên hev û ji ber, ko Alpars-



Institut kurde de Paris

lan destê xwe dirêj kire Kurdistan û dixwest bixî bin destê xwe. Leşkerê Sultan bi xurtî hate Amed. Seîdxan kurê Ehmedşah, kurê Merwanê kurd pêre hatin Amed, ko herin şerê padîşahê Roma. Alparslan, wezîrê xwe Nîzamilmilik şande Farqîn, ko Nizamidîn bênî bin destê Sultan.

Nizamilmilik, hate Farqîn û got, dixwazim bi min re bê cem Sultan û bajarê xwe biparêzî, yan ne wê Sultan vî welatî ji te bistênî û bi derebegî bidî destê birayê te.

Lê jin û xuşkên Nizamidîn destê xwe avêtin dawa wî û hê vî jê kirin û gotin, em ditirsin Nizamidîn bê cem şah û wî bikujin. Lê wezîr ji wan re sûnd xwar û got, ezê wî Mîr bibim cem Sultan û Sultan vegerênim cem we.

Bi vî rengî Nizamidîn ji padîşahî dakete fermandarî û bû yek ji fermandarên dewleta Selcoqî û kete bin darê Alperslan û çû cem Sultan û bi perwa û diyarî wezîrê pir jîr ew vegerend û got, min sûnd xwaribû, ko ezê te Mîr bibim cem Sultan û te Sultan vegerênim mala te. Lê ji ber, ko nabî ji Sultan Alperslan pê ve Sultan hebin, lê navê te kire Sultanilumeran. Seîd dane destê Sultanilumera û di keleha Hetax de xistin zindanê. Sultanilumera serbilind hate nav zarokên xwe.

Lê Alperslan çû ser bajarê Xelat girt. Berî hingî Erzen û Bedlîs xistibûn destê xwe û peyayên xwe di wan de danîbûn. Li ser Melazgir, Sultan ji ber xwe ve kurê Miheleban rêkire cem padîşahê Rom, ko belkî bê şer li hev bên.

Lê padîşahê Rom, ji kurê Miheleban re got, ji Esfehan û Hemedan kîjan xweşe, ko ez lê rûnim. Lê kurê Miheleban, jê re got, Barxana te wê herî Hemedan, lê çûna te nizanim. Ji ber hev rabûn û şer destpêkir. Piştî şerekî xwîndar leşkerê Rom şikest û bi ritila zêr û zîv ketin destê leşkerê Sultan, Alperslan . Xelkên hêla Melazgir û wan nava talan ji xwe re dane hev û gelek dewlemend bûn. Sultan vegeriya, Azarbaycan û peyayên xwe di Xelat û Melazgir û bajarên wan nava de danîn. Ev hindama mezin ji destê mala Merwan derket û tenê Farqîn, Amed, Cizîr di destê Sultanilumera de man. Lê paşê Sultanilumera, birayê xwe berda û xiste bajarê Amed(Diyarbekir) û bi ser hev de giriyan û li hevhatin. Lê poşman bû û cariyak kirî û jê re got, ezê te bişênim ji birayê xwe re, lê tê wî derman bidî û bikujî û ezê te markim. Ceriye ji birayê xwe re şande Amed û jinikê Seîdxan derman da û kuşt. Sultanilumera, ew markir û Amed jî xiste destê xwe.

Di sala 466-477 de, Erslanşah Kîrertuq turkmanî bi leşkerekî ve şande ser Mûsil û Şerefdewle Muslim, kurê Qureyş

baz da û hate Amed. Lê Ertux, li nêzîkî bajêr zora wî bir û vegeriya Mûsil.

Herwekû di sala 468 de Alperslanşah, li Esfehan serê xwe danî û kurê wî Melikşah, kete şûna bavê xwe. Lê hin di bêjin, sala 465-466 de Eliberselan serê xwe daniye.

Di sala 461 de Nizamidîn Nesir, kurê Ehmedşahê kurd li Farqîn, qata jorî, ji birca melik, li ser destê fermanrewa kurê Cercûr avakir. Di sala 468 de, kurê Cercûr serê xwe danî. Çend mirovên dî weke kurê Amir, kurê Zêdan, kure Bexil ketin şûna wî û wezareta ewqafa jî dane destê Ebûhesen kurê Bexil.

Lê wezîr Ebûtahir Selame, kurê Ebdilkerîm, kurê Enbarî ji ber, ko ji kurê sedeqe bêtir hez dikir, ew kire Fermanrewa. Ev Mihemed Ebûbekir, kurê Sedeqe, mirovekî zana û rê zan û hozan bû. Li Esfehan, di gel, fermanrewayê Esfehan, Muşeteb, ko gelek navdare devjenî kiriye û çûye dîwana pey rewê Bexda.

Nizamidîn Sultanilumera welatê Farqînê gelek di meydana avanî de bi pêşve bir. Xelkê welêt di çaxa wî de gelek dewlemend bûn û bedena Farqîn û Amed di gelek cihan de bilind kirin. Navê wî li ser wan hindama nivîsandin. Pirek mezin li ser çemê Dicle û li ser destê wezîrê xwe Selame, kurê Enbarî avakir. Di sala 472 de dawî hat û Nizamidîn Sultanilumera, di sala 472 de serê xwe li bajarê Farqînê danî. Tac û textê dewletê ji kurê xwe re hiştin û çû bin axa sar.

5- EBÛ MUZEFER MENSÛR, KURÊ NİZAMİDÎN NESİR, KURÊ NESRİDEWLE EHMED, KURÊ MERWAN, KURÊ KESRA KEK :

Fermanrewa, serdar, fermandar, zana, Serkar, çavder , dengbêj, ristevan, xwendewar bi carek li qesra dewletê civiyan û tac dane serê Mensûr , sitiran û rist hatin gotin û li ser text danîn. Lê paşê wezîr ew bire odake dî û kincê padîşahî jêkirin û vegerande nav civatê û li ser qadê rûnişt û civat çûne serxweşiya wî û wezîr kincên xwe çiran din û şaşa serê xwe vereşand û hawar û girî destpêkir. Li ser Nizamidîn rist û sitiran hatin gotin û quran hate xwendin.

Herwekû di wêrojê de Şêx Xelef, pîrê xwedênas, xwediyê mizgevta ber derê qesrê jî serê xwe danî û herdû bi hev re veşartin.

Nizamidîn, bi şûn xwe ve sê kur hiştin. Mensûr, Behram, Ehmed û keçek bi navê Fatê hişt, ko Mucahididîn Hibetilah, kurê Mûsik ew markir, lê neçû cem û serê xwe danî. Piştî



Institut kurde de Paris

wî re birayê wî, Serdar Mihemed, kurê Mûsik markir û gelek li cem nema û Fatê serê xwe danî.

Ev Mucahididîn, kurê Mûsik ji mala Merwane û di çaxê Ehmedşah de ji ber ve fermandarê Bedlîs bû.

Di sala 472 de Mensûr bû fermandar û navê wezîrê xwe kire Zeîmidewle. Lê gelek neçû Mensûrxan, wezîrê xwe avêt û xiste zindanê. Dektorek bi navê Ebûzalim, kire wezîr, ko navê jina wî Ferîhe bû. Ferîhe û mêrê xwe, leşker û welat û milet bi carek xistin bin destê xwe û Ferîhe, keça Felestîn, serê Mensûr û jina Mensûr dagirtibûn û xistibûn bin destê xwe û bûbûn raspotînê Kurdistan. Dema Fexridewle, kurê Ciheyr çû cem peyrewê Bexda û bû wezîrê peyrew, pêlakêma û çû cem Sultan Melikşah û li Esfehan rûnişt. Keça Nizamilmilik, wezîrê navdar ji kurê xwe Zeîmiruesa Emîdidewlere anî û kir wezîrê Bexda. Bi xwe li Esfehan rûnişt û çend caran ji Nizamilmilik re got, bere sultan leşkerekî bidîmin, ko herim ser Farqîn û Amed û ez li ser xwe digrim, ko bi hesanî welatê Farqîn bixim destê xwe. Herwekû Melikşah, li tiştekî wilo digeriya û leşkerek da kurê Ciheyrê Mûsilî û şande ser kurê Nizamidîn, yan ser welatê kurd û bi kurê xwe ve hatin ser Amed û Farqîn.

Lê çawa Ebûlmuzefer Mensûr Xan, ev bihîst bajar û welat dane destê Ebûsalim û jina wî. Çend mezinên welêt û dewletê, weke Mîr Ebûl Heycayê Rewadî, Mîr Dawidê kurê Eşkerî, Serdar Ebû Ebdilah, kurê Mûsikê Merwanî û serek Elî, kurê Hesenê Ezreq û Benî Xalib û Benî Îsa bi xwe re birin û dakete Cizîra Bota û îşê apê xwe Mîr Huseyn, kurê Nesridewle Ehmedşah saz kir û çûne Esfehan, nik padîşahê mezin.

Fexridewle, kurê Ciheyr, di sala 478 de hate ser Farqîn û kurê wî çû ser Amed û man heta Tişrîna diwem, ko Fexridewle ji ser bajêr rabû û hate bajarê Sêrtê, zivistana xwe derbas kir. Çawa bû bihar, careke dî hate ser Farqîn û bajar xiste asêgehê.

Lê Melikşah, leşkerekî dî bi serdariya Ertuxê Turkmanî, di hana Fexridewle rêkir û rê û derbend ji ber xelkê bajêr girtin. Hêj Mensûr Xan li Esfehanê û Sultan jê re got, ji ber, ko mala te di Farqîn de ye, bere Farqîn ji te re bî û Amed ji xwe re bigre û ezê li hember wê Cizîrê ji xwe re bigrim. Bajarên mayîn, emê li hev par bikin, her tu yekî ji xwe re bigrî, ejî yekî ji xwe re bigrim.

Lê Mensûr go: Bere ji te re dilsarî û xem çê nebin, her tişt wek dilê te dixwazî, meger deh salan leşkerê Turkan di welatê me de bimênin jî, lê zora me nabin. Bajar û keleh gelek asê ne û nikarin çeqê di me bikin. Min bihîsti

Institut kurde de Paris

ye, ko Barîn ji te dixwazin, lê nebî bidî !

Ji ber, ko melîkê Mûsil, Barîn, ji Nesridewle xwest û nadayê û ji bo wilo jî hev xeyidîn. Ji ber, ko Barîn sînorê navbera Amed û Diyar Benî rabiye. Lê eger naçar bûyî keleha Balosa, bide, ko li ser çemê Hermase, ko di îro de jêre dibêjin Kelehabûnesre, di ser bajarê Nisêbîn re dikevî. Ji lewra sibehê Mensûr çû cem melîkşah û got: Ez wela tê xwe bi xweşî nadim kesî û welat di nav talan û xwînê de digevizî û Sultan leşkerekî dî bi serdariya Kohbarî, şande hana Fexridewle û leşker li pey leşker şande ser welatê Kurdistana Amed û Farqîn. Rewş û pergala bajar û kelehên, ko di bin destê leşkerê Kurdistan bûn, gelek nexweş bûn û leşker û milet gelek şerpeze bûn av, barxane, xwarin ji ser wan hatin birîn û Amed berî Farqîn kete destê dijmin. Di paşiya sala 478 de Farqîn jî, kete destê dijmin û Fexridewle kete nav bajêr û wezîrê Mensûr Xan girt û barxane û mal û çek û gewherên mala Merwan bi carek xistin destê xwe. Leşkerê Sultan vegeriya Esfehan û Fexridewle fermandarê welêt û li Farqînê rûnişt. Keleha Xertpirt, Husinziyad dane Cebeq, ko ji rexê Melikşah ve bûye şehne û sêsed siwar bi Cebeq re man.

Lê piştî, ko welat bi carek ji destê kurê Merwan derxistin, Sultan bi hêvîkirina hin mirovên xêrxwaz ji Mensûrxan re got,«niha welatê te bi carek kete destê min, tu kêder dixwazî, ko li şûna welatê te bidim te?.»

Tenê Mensûr, lê vegerand û got,«xencerek li sînga min bidî, ko di piştа min re derkevî,» lê Melikşah ew nekuşt û gundê Herbê ji welatê Îraqê dayê, ko hatina wî sîhezar dînar salê dihat, Mensûr naçare mala xwe bire Herbê hetta, ko Melikşah serê xwe danî. Herwekû wê ji paşve bêgotin.

FERMANDARÎYA FEXRÎDEWLE :

Kurê Ciheyr, Fexridewle, wezîrê dijwar niha kete şûna padîşahê kurd û bû fermandarê Selcoqiya û li Farqînê rûnişt û kurê wî Zeîmidewle li Amed rûnişt. Kurdistan kete destê bêgana û mal û veşartiyên mala Merwan dane hev û Fexridewle, Zeîmidewle kurê Enbarî ji zindanê berda û wezîrê Mensûr, Ebûsalim xiste zindanê û gelek qencî ji xelkê Farqînê re kirin. Bêş û bela ji ser wan rakirin, yan sivik kirin. Lê poşman bû, ko kurê Enbarî berda û tirsiya, ko herî cem Melikşah û lê Mukur bê û malê mala Merwan bi carek jê bistênî. Ji lewra careke dî xiste zindana keleha Heskîf(Hesenkêf) û siparde destê Ebîhesen Elî, kurê Hesenê Ezreq, fermandar û çavdêrê kelehê. Fermanek bi mirina wî derxis-

tin û şandin Bexda û belav kirin. Lê Elî, kurê Hesenê Ezreq û Yaqût, serdarê leşkerê Fexridewle li Heskîfê kurê Enbarî veşartin heta, ko Fexridewle ji welêt rabû.

Fexridewle bû fermandarê Kurdistan û malê mala Merwan bi carek da hev û şande keleha Heskîfê cem Elî Elî, kurê Hesenê Ezreq, ko bi xwe çavdêrê kelehê bû.

Elî, kurê Ezreq dibêjî,«carek hatim cem Fexridewle û ji min re got, Elî, vê carê barê te sivike, wilo got û masake belor, ko firehiya wê pênc bost û lingên wê jê bûn. Pênc perçe zibadên belor û cotek çînîyên belor û sê sênî û pênc peyale û şerbik û kelace bi carek ji belor û kolayî û neqişandî dane min. Qutiyeke zêr derxist û qapaxa wê vekir û ronahî yê da wê navê tizbiyek jê derxist, ko sed û çil perçe yaqût di takî yaqûtî de bi darvekirî, ko wezna her libekê misqalek bû. Şerîteke yaqût kirî ser, ko Ezîzdewle, kurê Celalîdewleyê Biweyhî ji Ehmedşah re bi diyarî pêşkêş kiribû, ko tê de deh perçe yaqûtê rengîn hebûn, ko deh perçe belexşên giranbiha, ko weke wan hêj kesî nedîne û dehzimered, ko her yek weke tilîkê dirêj bûn dane destê min û got, van dewleta Merwanîya hilweşandiye ji ber, ko çawa Ehmedşah serê xwe danî, ji Sultan re hate gotin, ko ev tizbî û şerît li cem kurê Merwan hene. Çawa, ko şûrê Mûsikê navdar, ko gerdena deva dibirî bi carek li cem Ehmedşah bûn. Sultan Alperslan ji Nizamidîn re şand, ko van tevan jêre bişênî, lê Nizamidîn, jêre tizbiyeke dî û hin gewher û tiştên giranbiha rêkirin û sûnd xwar, ko haya wî ji van tiştan nîne.

« Çawa Mensûr kete şûna bavê xwe Melikşah, jêre şand û ev tizbî jê xwest, lê Mensûr bihayê zêrekî jêre neşand û di wê rojê de li cem wezîrê Melikşah rûniştî bûm û min jêre got, ez tenê dizanim veşartiyên mala Merwan li kune û leşker da min û hatim vir û bûme fermandar û mala Merwan winda bûn.

« Bihayê wan ji bil werîsê yaqût 215 hezar dînar bûn û min ew bi carek rêkirin Heskîf û şandin Bexda, cem Emîdidewle, kurê Fexridewle, kurê Ciheyrê Mûsilî.»

Herwekû du milyar dînar bi destê wezîrê Mensûr, Ebîsalim hatin sitandin. Ev ji bil piyan û çînî û antîka û tiştên giranbiha û cariya û xulaman û qesr û qûnaxan ji bil dewlet û hatin û hebûna hindirwê qesrê û malê mayîn.

Fexridewle, piştî du salan hate rakirin û Emîdidewleyê Belxî Qewamidîn, xistin şûna wî û kirin fermandarê Kurdistan. Lê Fexridewle, bin xwe tije kir û xwe dagirt û çû. Tenê sêsed hezar dînarên Ermanosî ji filehan sitandin heta,



Institut kurde de Paris

ko dêra wan, ko berî niha kiribûn mizgevt, li wan vegerand û di sala 482 de Emîdidewle Qewamidînê Belxî kete bajarê Farqîn.

Lê di sala 479 de Mûsil, ji destê İbrahîm, kurê Qureyş derxistin û da ne destê Fexridewle. Çawa Qewamidîn, hate Farqîn, ew dêr careke dî ji fileha sitand û kire mizgevt. Gelek weqf li ser danîn û gelek ji kurdên Farqînê hez dikir û qencî bi xelkê dikirin, lê dilê xelkê ji Fexridewle re dixwest û birek mirovên navdar weke Mîr Ebû Heycayê Rewadî, serek Ebû Ebdilah, kurê Mûsikê Merwanî, Fermanrewa Ebûbekir, kurê Sedeqe, Fermanrewa Ebû Qasim, kurê nebatê serek, Elî, kurê Ezreq û Benûxalib bi hev re çûne Bexda û doza avêtina Emîdilmilik Qewamidînê Belxî kirin. Li ser destê Nîzamilmilik, wezîrê navdar û dijwar Emîdilmilik Qewamidîn avêtin û Emîdidewle, kurê Fexridewle kirin fermandarê Kurdistan.

Lê berî, ko Emîdidewle bê, Ebûtahir Selame, kurê Enbarî ko navê wî bi mirîtî belav kiribûn, ji rexê Sultan ve kiribûn fermandar. Lê piştî neh rojan û hêj li Bexda bû, xelkê Farqînê ew danîn û Emîdidewle, kurê Fexridewle, kurê Ciheyr kirin fermandarê Farqîn û deh hezar dînar dane wan mirovan, lê negirtin û gotin, hîvî dikin, ko ji ser rez û şînahiyên me Farqîniyan rakin û ji ser wan rakirin, lê ji welêt ranekirin.

DERXİSTİNA EBİTAHİR, KURÊ ENBARÎ :

Piştî, ko Fexridewle ji Farqîn rakirin, Sedîdidewle, kurê Enbarî çû cem Sultan û doza birayê xwe kir û got, birayê min saxe û bi derew mirandine, hêvî dikim bi berdana wî ferman bikî. Lê Nîzamilmelik, wezîrê Sultan, jêre got, vaye li defterên dewletê bi mirîtî hatiye nivîsîn, çawa dibê jî saxe.

Lê Sedîdidewle, çîrok jêre got û got, saxe û li Heskîfê girtîye di zîndanê de veşartî maye. Naçare şandin ji Heskîfê anîn û li Bexda rûnişt.

Di sala 482 de Emîdidewle, kurê Ciheyr hate Farqîn û mal û zêr û zîvê ji mala Merwan sitandibûn vegerandin qesra wan û têde rûnişt. Zibeyde, keça Nizamidîn, kurê Ehmedşah, kurê Merwan jina wî bû. Careke dî di mala bavê xwe de bû xatûn û Zibeyde, di sala 483 de serê xwe li Farqînê danî. Lê Emîdidewle, li Farqîn ta bi sala 494 ma û vegeriya Esfehan. Mezinên Farqîn weke Fermanrewa Ebîbekir, kurê Sedeqe, Fermanrewa Ebîqasim, kurê Nebate û kurê wî Elemidîn û Elî, kurê Ezreq û kurê Mûsik û gelek ji xelkê Farqîn pê-

re çûne Esfehan. Li wir kurê Sedeqe, bi seydayê Esfehan re herwekû derbas bûye devjenî kir, paşê bi Emîdidewle re hatin Bexdayê û li wir Emîdidewle kirin wezîrê Peyrewê Bexda. Birayê xwe Kafî, li şûna xwe kire walîyê Farqîn. Kafî ma heta, ko di sala 485 de çû Bexda, cem Melikşah. Kurê xweEbûhesen, li şûna xwe hişt. Li Mûsil mirina Melikşah bi hîst û Nizamilmilik jî, bi hindîkî piştî Melikşah re hate kuştin. Sultan Berkiyareq, li şûna bavê xwe bû padîşah(Sultan) û çavên birayê xwe, Mehmûd, kurê Turkanxatûn rijandin û ser bi xwe rûnişt.

Di Farqînê de piştî mirina Melikşah, gelek sergêjî çêbû. Ebûhesen, kurê Kafî, kurê Fexridewle, kurê Ciheyrê Mûsilî destê xwe ji fermandariya Farqîn kişand û li mala xwe rûnişt. Hina go, emê Mensûşah, ji Îraqê bênin û hina go, na, emê bajêr ji sultan re biparêzin. Naçare Yehya, kurê Mehwer kirin mezinê bajêr û benikê fermandarî xistin destê wî. Di birca Melik de danîn û miftê bajêr dane destê wî û şandin cem sultan û gotin, me bajar ji te re parastiye û dixwazin yekî ji cem xwe rêkî, ko bibî fermandar. Lê kes nehate Farqîn û çîrok gelek dirêjkir. Xelk man di nav sergêjîyan de û nema zanibin çi bikin.

Lê di vê navê de Mensûr, ji Îraqê hate Cizîra Bota û xiste bin destê xwe û têde rûnişt. Lê xelkê nedixwest care ke dî mala Merwan vegerin ser textê welêt. Tenê ristevanê navdar, kurê Esed, xort û gernasên bajêr li xwe dane hev û bi nav bajêr ketin û kirin gazî û bajar sipardin Mensûrşah û şandin ji Cizîrê ew anîn Farqînê û Mensûrşah, kurê Esed kire wezîrê dewletê û navê wî kire Mihyidewle û careke dî Farqîn û Amed(Diyarbekir) ketin bin destê mala Merwanê kurd.

Lê mezinên Farqînê weke, Fermanrewa Ebûbekir, Mihemed, kurê Sedeqe û Ebûsalim, kurê Mehwer û kurê Zêdan û kurê Musaid û kurê Belek berî, ko Mensûrşah bikevî bajêr, çûne bajarê Nisêbînê, cem Tacidewle Tetuş, kurê Alparslan, padîşahê Şam û Heleb û gotin, me bajar ji were parastiye, yekî bişêne, ko têde rûnî û fermandariyê li me bikî û ji we pêve, em kesî naxwazin.

Di sala 486 de bajar kete destê Tacidewle, kurê Alparslan û Mensûr kete çadira wezîrê wî Ebûnecim û xwe ji mirinê parast. Padîşahiya Şah Mensûr, kurê Nizamidîn, kurê Ehmedşah, kurê Merwanê kurd ve carê pênc meh bûn. Tacidewle, gelek qencî bi xelkê Farqînê kirin û gelek bêş û bela ji ser wan rakirin. Cubbakî etles û şaş û teylesan û hêstirek dane fermanrewa kurê Sedeqe. Kafî, kurê Fexridewle anî û

kire wezîr. Serdarekî xwe bi navê Textekîn, kolê xwe di ba jêr de hişt, bi xwe çû Heran û Riha rûnişt. Li wir Mihyidewle, kurê Esed, wezîrê Mensûrşah, di sala 487 de hate cem, bi navtêdana dijminê wî Sultan ew kuşt.

Lê gelek neçû xelkê Amed şoreşek çêkirin û li ber kolê Tacidewle rabûn. Gelek ji wan hatin kuştin û bajar hate talankirin. Di sala 489 de Tacidewle hate kuştin. Welatê kurd kete destê kurê wî, Deqaq. Textekîn, kolê Tacidewle, Şemsidewle Etaş, li şûna xwe li Farqînê hişt û çû Şam û bû serwesîyê Deqaq. Bajarê Heleb, dane destê kurê Tacidewle, Ridwan. Şemsidewle Etaş, Ebûhesen Elî, kurê Mihemed, kurê Safî kire wezîr, ko bi xwe mirovekî kole, xwînxwar û setem kar bû. Xelkên bajêr gelek ji zor û setema wî reviyan û bî çola ketin.

Herwekû Nasiridewle Ebûlmuzefer Mensûrşah, kurê Nizamidîn Nesir, kurê Nasiridewle Ehmedşah, kurê Merwan, kurê Kesra li Cizîra Bota di zindana Cigermij de, li mala yekî cihû, di sala 486 de serê xwe danî. Jina wî Sitinas, keça Seîd, kurê Ehmedşah li Amed kumbedek jê re avakir û laşê wî têde veşartin. Kumbeda wî di ser qesrê re, li ser zencîra çemê Dicle hatiye avakirin. Çawa jina wî jî serê xwe danî li cem mêrê xwe hate veşartin. Ev Mensûrşah, mirovê dawî bû, ko li Farqîn û Amed fermandarî kiriye.

Vê malbatê 130 salî li Farqînê û welatê Diyarbekir (Amed) padîşahî û li Hetaxê fermandarî kirine. Herwekû wê ji paş ve wê bê gotin.

1- Merwan, kurê Kesra yan Kekê Harbextî, ji gundê Girmas, ko di navbera Sêrt û Maden, li dora Hizanê de ye. Me, Kotê xuya kirin ev Maden li hindama Hîzane û ne paxirmadene.

2- Çar kurên Merwan hebûn. Ebûelî Hesen, Seîd, Ehmed, Kesra Kek.

3- Zariwên Ehmed, kurê Merwan.

1- Nizamidîn Nesir, kurê Ehmed, kurê Merwan :

Sê kur û keçek jê man. Nasiridewle Ebûlmuzefer Mensûr.

2- Behram, kurê Nizamidîn.

3- Ehmed, kurê Nizamidîn.

4- Fatê, keça Nizamidîn.

1- **EBÛMUZEFER NASÎRÎDEWLE MENSÛR, KURÊ NÎZAMÎDÎN :**
**Tacidewle Mihemed, kurê Nasîridewle Mensûr di sala 502**

Institut kurde de Paris

ê koçî de di gel Segmanê Qutbî hate Farqîn û Xettafe, keça Behram, kurê Nizamidîn, dotmama xwe anî û markir. Piştî ko Mîr Mihemedê Duweynî berda û bi vî rengî di çaxê Segman û Necmidîn û Hisamidîn de li ber destê wan li Farqîn rûdinişt, lê paşê çû cem Yaqût Erselan, kurê Şemsidewle Texan Erselan, li bajarê Erzen rûnişt. Piştî mirina Yaqût, li cem birayê wî, Fexridîn Dewletşah rûnişt. Tacidewle Mihemed, kurê Nasiridewle Mensûr, li cem vî mirovî gelek bi rûmet bû. Çawa çû cem Sultan Mesûd, li Esfehan, Fexridîn ji piya dima û Tacidewle li nik şah Mesûd rûdinişt.

Jina wî Xettafe, li Erzen serê xwe danî û li Farqîn hate veşartin. Tacidewle, di sala 554 de serê xwe danî û li Farqîn, li cem jina wî veşartin. Li jêrê çiyê û di bin miz gevta Hemze de hatin veşartin. Herwekû tevlî jina xwe çûne xeccê û kordûnde serê xwe danîn.

2- BEHREMXAN, KURÊ NİZAMİDÎN NESİR :

Ev li Cizîrê mir û di kumbeda dergehê çiyê de hate veşartin. Du keç jê man, Xettafe û Sewre.

Serpêhatiya Xettafe derbas bûye, lê Sewre, serek Ebûebdilah Mihemed, kurê Mûsikê Merwanî ew markir. Lê piştî, ko metika wê li cem serê xwe danî û navê metika wê Fatê, keça Nizamidîn bû. Ji Sewre, kurekî Ebûebdilah Mihemed çêbû. Na vê wî Mûsik bû û di çaxê kurê Ezreq de serê xwe danî. Ji Mûsik du keç û kurek man. Mamik, ko li Farqînê kurê mûsike. Lê herdû keçên Mûsik, herdû kurên Elî, kurê Ebîfewaris kurê İbrahîm, kurê Nesridewle Ehmedşah, ko navên wan Suleyman û Dawid bûn markirin.

3- EHMED, KURÊ NİZAMİDÎN :

Çû cem Sultan Mihemed û kete Mûsil û bi fermandarê Mûsil, Kerboqa re bû, gelek mêr û gernas û pehlewan bû. Paşê di şerekî de dîl kete destê Rom û li nav wan jinek anî. Kurek jêre çêbû û navê wî kire Mihemed û nîşana xwe da jina xwe û got, bere bê Amed-Farqîn û li min bipirsî, wê bi ser min vebî, ne winda me.

Paşê Ehmed hate berdan û hate mala xwe. Gelek geriya, carna dibû fermandar û carna li cem fermandaran rûdinişt, hetta, ko bû fermandarê Tenzê û paşê bû fermandarê Hetaxê û çend salan dûr û dirêj li Hetaxê fermandarî kir. Gelek zarok jêre çêbûn.

Çawa, ko Mihemedê, kurê wî, welatê Rom hate Hetax, cem bavê xwe û got, ez, Mihemed, kurê Ehmed, kurê Nizamidîn, kurê Ehmed, kurê Merwanê kurdim. Nişana xwe nîşanî wan da û

li Hetaxê jin anî, du kur jêre çêbûn. İbrahîm û Hesen, ko di sedê 6 de, li cem Necmidîn, li Farqîn rûniştin. Lê bavê wan Mihemed, ji bavê xwe xeyidî û kes nizanî bi ku de çû.

Herwekû me derbas kir, hin kurên Mîr Ehmed dî jî hebûn weke Mîr İbrahîm, Mîr Îsa, Mîr Behram û çar kurên biçûk jî hebûn û hetta sala 528 jî Hetax di destê wî de bû. Lê li vê salê de kurê wî Behram, bajar ji destê wî derxist û Ehmed çû cem Hisamidîn Seîd, padîşahê Mardîn ê Turkmanî Urtiqî.

Lê paşê Mîr Îsa Hetax ji birayê xwe sitand û neda destê bavê xwe. Di sala 529 de Îsa bû fermandarê Hetaxê. Lê di sala 530 de bavê nezan çû cem Hisamidîn Seîd û Keleha Hetax belaş dayê û bi zor ji Îsa û zarokên xwe sitand. Ji vê rojê de mala Merwan di welatê Amed, Farqîn de destvala man.

Tenê Şerefxan dibêjî, yek ji wan bi navê Qubad, li welatê Erdelan bûye fermandar û dewletek li dar xistiye. Îsa û zarokên xwe hatin bajarê Amed rûniştin. Ji ber, ko jina wî keça Şahrux, fermandarê Hênê bû, pêlakê li Amed man, paşê çûn Heskîf nik Fexridîn, Qere Arslan, kurê Dawid, kurê Segmanê Ertuqî rûniştin. Di sedê şeşemê koçî de li cem zarokên Fexridîn rûniştin û bi rûmet li ber destê wan man.

Lê Mîr Behram, kurê Mîr Ehmed, kurê Nizamidîn, du kur jê man. Mihemed û Elî. Herdû jî li cem Mîr Necmidîn li Farqîn rûniştin. Lê Mîr Behram, bi xwe di sala 532 de li Farqîn serê xwe danî û di gornistana Merwanî de hate veşartin.

Lê Behram, kurê Îsa, kurêEhmed, kurê Nizamidîn çar kur bi şûn xwe ve hiştin. Ebdilah, Suleyman, Ebûlqasim, Yehya. Her çar jî, li nik Hisamidîn, padîşahê Mardîn rûniştin. Herwekû Pêlakê Li cem Melik Necmidîn, li Farqîn rûniştin û Mîr Suleyman, li ber derê Bariîye, hate kuştin. Di sala 556 de di gornistana Merwaniya de, li Farqîn hate veşartin. Lê Ebûlqasim, kurê Behram, kurê Îsa, kurê Ehmed, kurê Nizamidîn li cem pismamê xwe Tacidewle Mihemed li Erzen rûnişt. Piştî Tacidewle serê xwe danî, malê wî ji xwe re anî û hate Farqîn cem Melik Necmidîn rûnişt.

Tenê Mîr Ebdilah, kurê Behram, kurê Îsa, kurê Ehmed, kurê Nizamidîn li cem Hisamidîn, padîşahê Mardîn rûnişt. Paşê hate Farqîn nik melik Necmidîn, paşê çû Heskîf û li nik Fexridîn Qerearslan rûnişt. Di sedê şeşemê koçî de li Heskîf, li cem zarokên Qerearslanê Ertuqî rûnişt û pirê caran li gundê Şabaniyê rûdinişt, birayê wî Yehya pêre bû.

## 2- ZAROKÊN İBRAHÎM, KURÊ NESRİDEWLE EHMEDŞAH :

İbrahîm, keça Ebîdelef Senharîb, kurê Ebî Elpı Hesen, kurê Merwan markir. Jêre Mîr Ebû Fewaris Şadî çêbû. Ji Şadî pênc kur çêbûn. Ebûnesir, İbrahîm, Elî, Ebûdelef, Ebûfetih. Şadî Ebûlfewaris, di sala 550 de serê xwe danî. Lê Ebûnesir, keça Nasiridewle Mensûrşah, Ebûlmuzefer markir û kurek bi navê Huseyn çêbû. Di sedê şeşemê koçî de, di çaxê kurê Ezreq de serê xwe danî. Ji Huseyn, kurek bi navê Hesen ma û di sala 537 de li gundê Başzirmê serê xwe danî. Ji keça Derbas, kurê İsko, kurê Nesridewle Ehmedşah, kurê Merwan kur û keçek man. Kurik, keça Mîr Suleyman, kurê Elî kurê Ebîlfewaris markir. Xuşka xwe da Mîr Mihemed, kurê Elbilfewaris. Zarokên wî gelek hene.

Lê Mîr Ebûfetih, di sala 533 de kordûnde serê xwe danî û jin nanî. Mîr Ebûdelef, kurê Şadî Ebilfewaris, kurê İbrahîm, kurê Nesridewle Ehmedşah, kurê Merwan, keça Mîr Ehmed ko navê wê Sewre bû, markir. Çar kur jêre çêbûn. Seîd, Baz Merwan, û Ebûdelef. Di sala 541 de serê xwe danî û zariwên wî li cem apê xwe Mîr Şecaidewle İbrahîm, kurê Ebilfewaris Şadî, kurê İbrahîm, kurê Nesridewle Ehmedşah, kurê Merwan mane.

Lê Elî, kurê Ebilfewaris Şadî, keça serek Muŝik, kurê Ebî Ebdilah, kurê Mûsik markir. Sê kur jêre çêbûn. Suleyman Mehmûd û Dawid. Hersê jî, li Ferqîn li cem Melik Necmidîn, rûniştin û zarokên hersiyan jî pir çêbûne. Lê Mîr Elî, kurê Ebîlfewaris Şadî, di sala 548 de li gundê Başzirme serê xwe danî û li Farqîn, li cem bavê wî veşartin.

Mîr İbrahîm, kurê Ebîlfewaris Şadî, keça Serek Ebû Elî, kurê Hesen, ko çavdêrê Erzen bû markir. Keçek bi navê, Fatê, jêre çêbû û Mîr Ehmed, kurê Ebdilah, kurê Ehmed, kurê Nizamidîn markir. Birek zarokên wan çêbûn.

Tenê kurek ji cariyakê ji Mîr İbrahîm re çêbû, ko navê wî Mesûd bû. Mesûd, çû cem Melik Nûridîn, kurê İmadidînzengî, padîşahê Şam û Heleb, gelek bajar û gund dane destê wî. Lê paşê dev jê berda û çû Misrê, nik Silahidîn, kurê Necmidîn Eyyûbê Kurdî, padîşahê mezin.

Herwekû Mîr İbrahîm, jinbira xwe, Serwe, markir û du kur jê çêbûn. Ehmedîl û Ebûlfewaris, ko di sala 600 koçî de li nik melik Necmidîn, li Farqîn rûniştin.

Mîr İbrahîm, li gundê Başzirmê, di sala 559 de serê xwe danî û di kumbeda Nesridewle de hate veşartin.

**3- ZAROKÊN MÎR HUSEYN, KURÊ NESRİDEWLE EHMEDŞAH, KURÊ MERWAN :**



Institut kurde de Paris

Ev Mîr Huseyn, fermandarê Cizîra Bota bû, lê weke me derbas kir, di sala 458 de bi destê Tacidewle Tetuş, kurê Alparslanê Selcoqî, li Nisêbînê, di gel mîrekên Mûsil hate kuştin. Du kur jê man. Ebû Seîd û Mengelan. Ebû Seîd, kor bû û serê xwe danî. Tu zarok jê venekitin. Lê ji Mîr Mengelan kurek ma, ko navê wî Ebûlheyca bû. Ebûlheyca çû bajarê Sêrtê û sê kur jêre çêbûn. Merwan, Hesen û Huseyn û li Farqînê di sala 559 de serê xwe danî û di mizgevta Muhdise de hate veşartin. Zariwên wî li cem melikê Farqîn rûniştin.

4- MÎR ÎSKO, KURÊ NESREDEWLE EHMEDŞAH, KURÊ MERWAN :

Kurek bi navê Derbas, jê ma û li gundê Homan, li navbera herdû çeman, li Cizîrê ji hindama Farqînê rûnişt. Du kur bi navê Îsko û Mem jê man û hin keç jêre çêbûn û bi carek li gundê Homat rûniştin. Lê pismamên Nesridewle Ehmedşah evin :

1- Kek Kesra, du kur jêre çêbûn. Mensûr û Mihemed. Ji Mensûr kurek bi navê Elî ma û ji Elî keçek ma, ko Merziban markir û kordûnde serê xwe danîn.

Ji Mihemed, kurê Kesra kurek bi navê Mûsik ma û ji wî, sê kur man. Hibetilah, Mucahid, Ebû Ebdilah. Hibetilah û Mucahid, kordunde serê xwe danîn, lê Ebû Ebdilah gelek zarok çêbûn û mirin. Lê du kur bi navê Mûsik û Mamik sax man û hatin kuştin, ji Mûsik keçek ma, ko ji xuşka Ebîelî, kurê Ebîheycayê Rewadî bû û Mîr Ebûelî, kurê Ebilfewaris markir. Lê ji Serwe, keça Mîr Ibrahîm, kurê Nizamidîn, kurek bi navê Mûsik ma. Paşê dîn bû û serê xwe danî. Lê ji Mûsik, Mamik ma û li cem Melik Necmidîn, lî Farqîn rûnişt û keçên wî çêbûn, ko Suleyman û Dawid markirine.

2- Mengelan, kurê Kek Kesra, ji Mengelan Evşîn ma û ji Evşîn Mengelan ma û ji Mengelan Ebûlheyca û Mûsik man.

Herwekû ji Ebûlheyca keçek û ji Mûsik kurek bi navê Mihemed Deksîr man. Deksîr, keça Seîdtacidîn, kurê Tahir, kurê Nebate markir. Sê kurên wî çêbûn. Evşîn, Elî, Mûsik..

Mihemed Deksîr, di sala 564 de serê xwe danî û zariwên wî li Farqîn rûniştin

Tarîxa mala Merwan dawî hat. Cigerxwîn

Lê Mihemed Emîn Zekî Beg, wezîrê pir jîr dibêjî, destpêka vê dewletê Baz Ebû Şeca danîye û alîkarîya Edididewle, padîşahê Deylemî kiriye û Mûsil ji destê Ebî Texelibê Hem-

danî derxistine. Çawa biweyhî ketin Mûsil û Baz hate cem Edididewle, di civata wî de rûnişt, padîşahê Deylemî çavên xwe berdane kuştina wî. Lê Baz Ebûşeca, bi dizî ji bajêr derket û çû mala xwe û karê xwe û şerekî mezin kir, lê Edididewle, di sala 372-373 de serê xwe danî û Ebûşeca Baz welatê Nisêbîn bi zor xiste destê xwe. Lê Semsamidewle, kurê Edididewle kete nav tirs û sawîra û leşkerek bi serdariya, Ebîseîd Behram, kurê Erdeşêr, şande ser Ebîşeca û şerekî xwîndar di navbera Kurd û Deylemîyan de destpêkir. Leşkerê kurd zora dijminê xwe bir û gelek ji wan kuştin û gelek, dîl girtin. Gelek mal û barxane û gelek ji mezinên leşkerê Deylemî bi dîlî ketin destê kurd û xistin zindanê. Lê di vê salê bi xwe de Semsamidewle, leşkerek bi serdariya Ebilqasim Sad, kurê Mihemedilhacib rêkire ser Baz û li Bacilaya, li ser çemê Xabûrê Huseynîye û li nêzîkî bajarê Kewaşî herdû leşker li hev rasthatin. Şerekî xwîndar destpêkir û xwîn gelek hate rijandin. Leşkerê Kurd careke dî zora dijminê xwe bir û perçe perçe bi paşde pozşikestî vegerandin. Gelek jî kuştin û gelek jî dîl girtin û şerpeze reviyan û çûne Mûsil. Lê Ebûşeca Baz, da ser şopa wan û bajarê Mûsil jî, ji wan sitand. Xelkê nav bajêr arîkariya kurda dikirin lê Baz, karê xwe û sitandina Bexda jî dikir û ji hawîr leşkerê kurd, li xwe gihande hev û civand.

Tenê Semsamidewle, di xwe re neçû bû û leşkerekî giran bi serdariya Ziyar, kurê Şêrkeh şande ser Mûsil. Herdû leşker careke dî raperikîne hev û xwîn gelek hate rijandin. Kuştin ji herdû rexan pir çêbû, lê vê carê Deylema bi gernasî zora kurda birin û şerpeze ew ji hev perçe kirin. Gelek ji wan kuştin û gelek dîl girtin. Deylemiyan, leşkerê xwe kirin du perçe. Yek, di riya Nisêbîn ve û yek di riya Cizîrê ve şandin ser welatê kurd. Lê herdû leşkerên wî jî, bi gotina wî nekirin û ne dane ser şopa leşkerê Baz û vegeriyan Mûsil. Naçare Ziyar, vegeriya Bexda û Sad, kurê Mihemedilhacib, walî û fermandarê mûsil û Ebûşeca Baz, li hev hatin û bûne dostên hev. Hinek ji Tûrilabidîn ket destê kurê Hacib û hin ji Baz re hiştin. Baz, bû padîşahê Amed,Farqîn,Cizîr,Nisêbîn heta Riha û Heran û Xelat û Melazgir jî ketin dest wî. Di sala 377 de ev peyman di navbera wan de hate çêkirin.

Lê di sala 378 de, Şerefidewle Ebûlfewaris, kurê Edididewle, birayê xwe Semsamidewle avêt û bû padîşah. Ebû Nesir Xaşad, li Mûsil danî, Baz ji nûve leşkerekî mezin bi xwe re hilanî û çû ser Mûsil. Lê Ebûnesir Xaşad, han ji Erebên Benî Uqeyl û Benî Numeyr xwest û di hana wî hatin û

şer ji nûve destpêkir û leşkerê kurd şikest û Mîr Huseyn, kurê Dostik, birayê Baz hate kuştin û li Farqînê veşartin.

Tenê gelek neçû, herdû kurên Nasiridewle, kurê Hemdan ji Bexda hatin Mûsil û êrîşî bajarê Mûsil kirin û bi kurê Museyeb Mihemed re peymanek girêdan, ko Mûsil ji mala Hemdan re bî û Nisêbîn û Cizîr, ji mala Museyeb re bin. Ji rojhilat û rojava de êrîşî Mûsil kirin û leşkerê kurd şikandin. Xelkê bajêr, dilxwazê mala Hemdan bûn. Piştî şerekî xwîndar û dijwar leşkerê kurd dijminê xwe şikandin, Lê xelkê bajêr bi dizî derên bajêr ji Ereban re vekirin û ji paş ve li kurda xistin û leşkerê Baz şikest û bi xwe birîndar bû û di sala 380 de serê xwe danî

Lê Ji Hamiş-l tê xuyakirin, ko kurê cizerî di kiteba kurê Cizîrî, Kamil 9, 26 sala, 380 û Tecaribilumem( Kitêbeye Tarîxî), bi vî rengî dibêjin, Mûsil kete destê Hemdaniya û Ebûşeca, xwest, ko ji destê wan derxî, leşkerê Baz Ebûşeca û leşkerê Becnewî pêre hatin ser Mûsil û di rojhilatê bajêr ve êrîşî Mûsil kirin, lê Ereban, ji hawîr direjî leşkerê kurd kirin û dixwestin rê li wan bigrin. Naçare Baz leşkerê xwe bi paşve kişande çiyê û dijmin zor dane leşkerê kurd û hespê wî kumişî û hate kuştin, xwarziyê wî Ebûelî Hesen, kurê Merwan hate ser û got, rabe, siwar be, ko te birevênim, lê Baz, jê re got, xwe biparêze, ez hatime kuştin, nema karibim rabim. Ebûelî Hesen, bi 500 siwarî ve xwe gihandin çiyê û hatin parastin. Paşê yek ji Benîuqeyl, yan Benîhesan hate ser laşê Baz û bi saxî dest û piyên wî birîn û laşê wî birin, li ber bedena bajêr bi darvekirin. Lê xelkê Mûsil xeyidîn û daxistin û şûştin û veşartin. Şîn û reşa xwe, li ser girêdan. Ji ber, ko gelek jê hez dikirin.

Herwekû Ebûtahir û Ebû Ebdilah, herdû kurên Nasiridewle yê Hemdanî serê Baz jêkirin û bi xwe re birin û çûne şerê Ebûelî Hesen, kurê Merwan, xwarziyê Baz, ko li şûna wî bûbû padîşah.

Lê Ebûelî, ew şikandin û Ebû Ebdilah, kurê Nasiridewle, dîl girt û nexiste zindanê, bi perwa û diyarî vegerande cem birayê wî û got, naxwazim şer di nav mede dûr û dirêj bimênî, dixwazim em li hevbên û Mûsil ji were û vegerin mala xwe. Lê Ebûtahir, careke dî leşker da birayê xwe û şande ser Farqîn, lê careke dî Ebûelî, ew şikandin û Ebû Ebdilah dîl girt û xiste zindanê û hew berda, heta, ko peyrewê Misrê, hêvî jê kir û berda û şande Misrê. Misriyan, ew kirin fermandarê Heleb. Lê Ebû Tahir, pozşikestî ji ser Amed



Institut Kurde de Paris

reviya û hate Nisêbîn. Lê kurê Museyeb, Ebûzewad Mihemedê Uqeylî, Ebûtahir û kurê wî Elî û Muzafer, mîrê Benînumeyr, di mala xwe de kuştin û Mûsil xiste destê xwe û şande cem Bihaidewle û jê xwest, ko yekî ji cem xwe bikî fermandarê Mûsil. Bihaidewle, Ebîhesen Ebdilah, şande Mûsil, lê her tişt di destê Benîuqeyl de bû.

Sînorê Kurdistana Merwanî, ji Nisêbîn ta Xelat, Melazgir, Erdîşê berjor di çû û ji Ferat ta bi jorê rojhilatê Wan, fireh dibû.( Ji rûpel 96-105 Ediwel Welîmaratilkurdiye fî lislem -2). Rûpel 109 de dibêjî, Ehmedşahê, kurê Merwan, piştî, ko welat bi carek xiste destê xwe, kurê xwe Suleyman kir fermandarê Cizîra Bota û bi xwe li Farqînê rûnişt.

Hemiş jimar-1, dibêjî, zana û xwendevan û ristevanan xwe, lê digirtin û ji wan mirovên mezin, ko hatin cem Ebûebdilahê Kazronî bû, ko li ser destê wî, mezhebê Şafiî kete Kurdistanê

Di sala 415 de wezîrê mexribî, Ebûqasim, ji Bexda reviya û çû cem kurê Merwan û ji bo wilo navbera peyrewê Bexda û Nasiridewle nexweşket. Lê çawa di sala 418 de wezîrê navdar serê xwe danî careke dî navbera herdiwa gelek xweş bû û bûne dostê hev.

Herwekû di sala 416 de, Nesridewle, bajarên Heran û Riha ji kurê Etîr, mezinê Erebên Benînumeyr sitandin û dane destê Ehmed, kurê Mihemed. Lê Etîr, ev Ehmed kuşt û xelkê bajêr şandin cem Nesridewle û gotin, em dixwazin yekî ji rexê xwe ve bikî fermandarê welêt. Naçare Nesredewle, fermandarê Amed, Mîr Zengî, kurê Ewan, kir fermandarê Riha û Heran. Lê Zengî, ji eşîrên Ereb re xwarinek çêkir û bi carek li ser xwarina xwe mezinê Ereban civandin û li hev anîn, lê bi rêde Mihemed, kurê Ehmed, Etîr kuşt û tola bavê xwe sitand. Careke dî şer destpêkir û Zengî, bi leşkerekî ve çû ser wan, lê di nav şer de hate kuştin û padîşah Ehmed Xan gelek li ser xeyidî û xemgîn bû.

Di sala 419 de Bedran, kurê Muqelîdê Uqeylî, bi leşkerekî giran ve hate ser bajarê Nisêbîn. Her çiqas leşkerê kurd,pêwanê bajêr li ber xwe dan, lê nikaribûn bajêr biparêzin. Naçare Ehmedşah leşkerekî mezin şande hewara wan lê zora dijmin nebirin, careke dî leşkerê kurd, hate şikandin. Ji lewra Ehmedşah, sê hezar siwar rêkirin û leşkerê Ereb şikandin û gelek talan kete destê kurdan.

Tenê leşkerê Ereb, careke dî, li dijminê xwe vegeriya û bi camerî dijminê xwe şikandin û gihandin heta ber dîwarê

bajêr. Lê di wê navê de Qerwaş, birayê Bedran, hate Mûsil. Naçare Bedran, bi paşde vegeriya.

Lê gelek neçû Ehmedşah û xezûrê xwe, Qerwaş, kurê Muqelidê Uqeylî ji hev xeyidîn û bedran û Qerwaş, li hev hatin. Sebebê xeyda zava û xezûr ew bû, ko Seyide, keça Qerwaş, jina Ehmedşah, ji ber, ko jineke dengbêj hatibû ser, ji mala xwe derket û hate mala bavê xwe û li Mûsil rûnişt. Qerwaş, doza 20 hezar dînar û bajarê Nisêbîn lê dikir, weke xwarina keça wî. Lê zava xwe neda ber tiştekî û dilsarî kete navbera wan.

Ji bo vê yekê Qerwaş, du leşker şandin ser welatê kurd, yek bi serdariya Bedran, hate ser Nisêbîn û yek hate ser bajarê Cizîrabota. Lê herdû jî bi şikestin vegeriyan Mûsil. Lê dawî Bedran, bi xwe çû mala Ehmedşah û Nisêbîn ji xwe re jê xwest, Ehmedşah, bi diyarî da xezûrê xwe û pazde hezar dînar ji Qerwaş re rêkirin. Careke dî li hev hatin û bûne dostê hev.

Di sala 422 de kurê Etîr û kurê Şibil, bi nîvekarî bajarê Rihayê dixwarin. Lê kurê Etîr para xwe firote padîşahê, Rom û leşkerê Rom hate nav bajêr û gelek ji musilmana kuştin. Naçare Ehmedşah leşkerek şande Romiya û leşkerê kurd, bi zor bajar ji dijmin sitand. Tenê careke dî Romiya bajar xistin destê xwe û paşê bi hev re peymanek çêkirin û li hev hatin.

Lê di sala 426 de, kurê Wessab, şêxê Eşîra Benî Numeyr, bi alîkariya Rom, leşkerekî giran gihande hev û hate ser Kurdistana Amed. Lê kurê Merwan, bi leşkerekî giran ve çû pergî dijminê xwe û kurê Wessab ji tirsa bi şûnde vegeriya.

Tenê Ehmedşah, şande cem padîşahê Rom û gazin jê kirin û got, te peymana navbera min û xwe şikandiye û te bêbextî li min kir. Lê padîşahê Rom di bersiva wî de got, eger min çewtî jî kiribî hêvî dikim di min biborî û ji îro pêve nema tiştekî bê dilê te dikim û li hev hatin.

Di sala 428 de, Ehmedşah, leşkerekî mezin şande ser bajarê Siweyda(Siwêrek) û bi arîkariya kurê Etîr û kurê Wessab û bi serdariya fermandarekî kurd bajar girtin, bajarê Riha jî, ji dijmin sitandin û kurd û Ereb bi hevre ketin nav bajêr.

Hamiş-1 dibêjî, Senasine Sasoniyên Ermen, Hececê Musilmana tazî kirin û kurê Merwan, ji Ermena re şand û got, eger malê Hecacan nedin wan, ezê we tevan winda bikim. Naçare talanê Hecaca vegerandin.

Kamil-9, rûpel 167 dibêjî, di sala 422 de Xeza, êrîşên,

xurt anîne Kurdistan, Azerbaycan û welatê Ezbenî(Hezbenî ) ya. Kurd bi carek li ber wan rabûn û bi gernasî li ber xwe didan. Lê gelek ji Xezan, bi nav welêt de hatin û bi nav Kurdistanê de belav bûn û talan, şewat, kuştin bi ser kurdan de hatin rijandin. Birên kurdan, di serê çiyan de asê bûn û xwe veşartin. Herwekû ji Xezan, jî hezar û pêsed siwar hatin kuştin û heft serdar û sed mezinê wan hatin girtin û mal û çekên wan bêjimar girtin.

Li Kamil(Esir Cizîrî)-9, 144, temaşa bike, ko bawer bikî, çi bi serê kurda de hatiye, ev tiştên, ko dinivîsim bi kurtî hatine gotin. Herwekû di vê salê bi xwe de İbrahîm Yenal, birayê Toxrolşahê Selcoqî, êrîşên dijwar berdane hê la Rey-Taran, ko wê çaxê di qiraxa Kurdistan de bû. Xezê wan navan tirsiyan û ji hindama Rey, çiya reviyan û berê xwe dane Amed û Mûsil, Kurdistana rojava. Di rê de şopeke, têrxwîn û şewat û talan û berbadî hiştin. Di zozana ve xwe berdane Cizîra Bota û bi serdariya Boka, Nasixlî, birekê xwe berdan hêla Amed(Diyarbekir) û bajarên Baqirda, Bazibda, Huseyniye, Fêşxabûr talan û wêran kirin.

Lê ew Xezên, ko li rojhilatê Cizîrê û di bin serdariya, Mensûr, kurê Xezxilî(Xezoxilî) de bûn. Suleymanê kurê Ehmedşahê Merwanî, ko ji ber bevê xwe ve fermandarê Cizîrê bû û bi Ebûherb navdar bû bi wan re kete dan û sitandinê û navbera xwe xweş kirin. Li ser vê lihevhatinê di cihê xwe de warê xwe girtin û rûniştin. Goya hetta bihar bê wê herin welatê Şam û Heleb.

Lê piştî pêlakê Ebûherb, Suleymanxan, xwarinek ji wan re çêkir û Mensor di mala xwe de girt, leşkerê Xeza perçe, perçe şikand û talan kir û çek û malekî bêjimar ji wan sitand.

Paşê Qerwaş, melikê Mûsil û Ehmedşah, bi hev re û Mîrê Finikê Becnewî, bi wan re leşkerên giran şandin ser Xezan û gelek ji wan kuştin û perîşan kirin, Mal, barxane bêjimar ji wan sitandin û perçe, perçe bi çola de reviyan. Lê di vê navê de ew Xezên, ko çûbûn hindama Nisêbîn û Şengal, vegeriyan ser Cizîrê û xistin asêgehê, lê gelek neman û reviyan û berê xwe dane hêla Amed(Diyarbekir) û dest bi talana kirin. Ji lewra û naçare Ehmedşah,Mensûr Xezxilî ji zindanê berda û hin pere jî danê û wî jî li ser xwe birî, ko Xez ji welatê kurd bi carek derkevin. Tenê birek ji Xezan, dirêjî bajarê Mûsil kirin û tiştên kesnedî bi serê xelkê Mûsil de anîn.

**Di sala** 439 de yekî Ereb, bi navê Useyferê Texelibî, li **serê kaniyê** rabû û doza payxemberî dikir û digot, nivîştên

pêxamberên kevnare dabaşa min anîne û gotine, wê ev mirov, rabî. Hevalên wî pir bûn û êrîş dibirin hawîr xwe. Lê Ehmedşahê Merwanî, padîşahê Farqîn ew girt û xiste zindanê . Ko didî zanîn hetta bi Ferat di destê kurd bû.

Di sala 440 de, navbera Qerwaş û Bedran, herdû kurên Muqelidê Uqeylî û herdû eşîrên kurd, Ezbenî û Humeydî, ko fermandarên Erbîr û Akrê bûn, nexweş ket. Ji ber, ko çend kelehên Humeydiyan hebûn, ko nêzîkî Mûsil bûn û Bedran dixwest bixî bin destê xwe.

Navê fermandarê Humeydî Mîr Ebû Hesen, kurê îskanê Humeydî bû. Navê fermandarê Hezbeniya, Mîr Ebû Hesen, kurê Mûsik bû û birayê wî Ebûelî, kurê Mûsik li ber birayê xwe rabû û doza fermandariya welêt dikir. Herwekû Ebûhesenê Humeydî, arîkariya Ebûelî dikir û birayê xwe girt û xiste zindanê û ev tişt ne bi dilê Qerwaş bû. Di wê navê de li ser keça Qerwaş, jina Ehmedşahê Merwanî, dilê wan ji hev man û xwestin şerê hev bikin. Herdû rexan leşkerê xwe dicivan de serhev û karê şer dikirin.

Qerwaş, hana xwe bire herdû mîrên kurd, ko leşkerê kurd berdî pêsîra leşkerê kurd. Mîr Ebûhesenê Humeydî bi leşkerê xwe ve hate Mûsil û Mîr Ebûelî, birayê xwe berda û kire serleşkerê Hezbenî û şande Mûsil. Lê di wê navê re Bedran, kurê Muqelid kete navbera zava û xezûr û bê şer li hev anîn.

Lê Qerwaş, ev ji xwe re fersende dît û Mîr Ebûhesenê Humeydî girt û got, herdû kurên xwe giraw li vir bihêle û here Mîr Ebûelî ji Erbîl werêne Mûsil, ko ez we li hev bênim. Ebûhesen, çû Erbîl û Ebûelî bi xwe re anî û hat.

Tenê Qerwaş, herdû jî girtin û got, dixwazim Ebûhesenê Hezbenî bibî fermandarê Erbîl û Ebûelî, li mala xwe rûnî. Naçare gotina wî neşikandin û Ebûhesenê Hezbenî kirin fermandarê Erbîl û li hev-hatin û bi hev re vegeriyan Erbîl, ko bajar û dewletê bisipêrin Ebûhesen.

Lê bi rê re Ebûhesenê Humeydî, ji Ebûelîyê Hezbenî re got, vaye min zariwên xwe ji destê Qerwaş derxistine, de ka em Ebûhesen bigrin û talan bikin û bere Qerwaş her û her xeyidî bimênî. Lê Ebûhesenê Hezbenî, bi ser weşweşa ket û ji tirsan, ji nîvê rê vegeriya Mûsil û mirovên xwe bi wan re şandin, ko keleh û bajêr ji Ebûelî bistênin, lê hevalbendan leşker û mirovên Ebûhesen talan kirin û xistin zindanê. Ji wê rojê de navbera herdû mîrên kurd û Qerwaş, melikê Mûsil nexweş ket û bûne dijminê hev.

Di sala 441 de, navbera Qerwaş û birayê wî Zeîmidewle Ebû Kamil, fermandarê Tikrît, nexweş ket û Qerwaş biraziyê

Institut kurde de Paris

xwe Qureyş, kurê Bedran şande ser Tikrîtê, Zeîmidewle bazda û hate Cizîrê cem Suleyman Ebûlherb, kurê Ehmedşahê merwanî. Suleyman çîrok ji bavê xwe re da zanîn û padîşah jêre got, divê bi xurtî alîkariya wî bikî û gelek rûmeta wî bigrî. Suleyman, leşkerekî giran dahev û leşkerê Becnewî û leşkerê Humeydî bi Zeîmidewle re xwe berdane ser Mûsil û Qerwaş, bi leşkerekî mezin ve derkete pêrgî dijminê xwe. Lê di nav şer de Qerwaş, kete destê leşkerê kurd û dane destê birayê wî, lê Zeîmidewle, birayê xwe berda û destê wî ramîsa û bi hevre çûne Mûsil. Ji ber, ko Zeîmidewle ditirsiya, ko welat bi carek ji destê wan derkevî û bikevî destê kurd, leşkerê kurd destevala vegeriya welatê xwe.

Lê hamiş jimar-1 dibêjî, li gora, ko tarîxa Kamil, dibêjî, navbera herdû bira nexweş ket û Suleyman Ebûlherb, kurê Ehmedşahê Merwanî, ji Cizîrê û Mîr Ebûhesen, kurê Îskanê Humeydî, ji Akrê û hin kurdên mayîn, di hana Qerwaş hatin. Çawa şer destpêkir, kurda xwe dane hêla Ebûkamil Zeîmidewle û zora Qerwaş birin. Hindik mabû, ko Qerwaş xwe bi dî destê dijmin, lê ji ber, ko Ereba doza mûçê û xwarinê li Ebûkamil kirin û nikaribû bidî, ji tirsa, ko herin cem birayê wî, ew reviya û çû cem birayê xwe û got, eger min bêrêtî kiriye jî, hêvî dikim min azad bikî û li hev hatin û leşkerê kurd vegeriya mala xwe. Kamil-9. 260.

Lê Mihemed Emî Zekî Beg dibêjî, di sala 441 de Toxrolşahê Selcoqî, ji Ehmedşahê Merwanî re şand û got, gereke dî xutban de li welatê te navê min bê xwendin. Ehmedşah, ev bi cî kir û pêkanî.

Lê di Hamiş-2 de Elîewnî beg dibêjî, ev gotin, ko xutbe li ser navêToqrolşah bê xwendin û gotina, ko padîşahê Rom ji Ehmedşah, hêvî kiriye, ko ji Toxrolşah, hêvî bikî, ko melikê Ebxaz, ji zindanê berdî. Di tarîxa kurê Esîr de nehatine, nizanim Mihemed Emîn Zekî Beg, ji ku derxistine.

Lê eger gotina Zekî Beg, rast bî, em nikarin ji Ehmedşah re bêjin, şah, ji ber, ko dibî fermandarekî bindest û yek ji xanên Selcoqiyan. Li ser gotina Mihemed Emîn Zekî Beg, Ehmedşah, ji Toxrolşah hêvî kir û melikê Ebxazê hate berdan. Padîşahê Rom, ji ber wilo, ji Ehmedşahê Merwanî kurdî, hez dikir û gelek diyarî jêre şandin û destûra avakirina mizgevta Qestentîniye da, ko ji nûve bê avakirin û misilman tê de nimêj bikin.

Di sala 446 de Toxrolşah, leşkerekî giran bi xwe re hilanî û hate ser bajarê Melezgir, ko wê çaxê ketibû bin destê Rom. Ehmedşah leşkerê xwe şande hana wî û gelek diya

rî jêre şandin.

Lê kurê Esîr, di kamil-9.223 de dibêjî, Toxrolbeg, hate Azerbaycanê û çû bajarê Tewrêz(Tebrîz), ko mezinê Azerbaycan wê çaxê Wehozanê, kurê Mihemedêrewadî bû. Wehozan, serê xwe jêre danî û kete bin destê wî û perwa û diyarî jêre pêşkêş kirin û kurê xwe giraw dayê û xutbe li ser navê wî xwendin.

Herwekû Toxrolşah, ji Azerbaycan çû Cenze, Eran, Gence cem Mîr Ebû Eswar û ew jî, xiste bin destê xwe û welatê wî jêre hişt û hate Melazgir û li wir Nasiridewle Ehmedşahê Merwanî, leşker û diyarî jêre rêkirin. Ji wê rojê de xutbe di welatê xwe de li ser navê wî dane xwendin(Elîewnî Beg).

Lê Ewnî Beg, di pêş de got, ko ev tişt di tarîxa kamil de nehatiye û nizanim Mihemed Emîn Zekî Beg, ev tişt ji ku derxistiye. Herwekû kurê Ezreqê Fariqî, ko tarîxa mala Merwan bi dirêjî û firehî çêkiriye nabêjî, ko xutbe li ser navê Toqrolşahê Selcoqî hatine xwendin. Lê di çaxê Nizamidîn de Alperslanşah , gelek ji welatê Kurdistana Merwanî xistiye bin destê xwe. Nizamidîn, kiriye yek ji fermandarê xwe û navê wî li ser destê wezîrê navdar Nizamilmilik kiriye Sultanilumera.

Nevbera Suleymanxan, kurê Ehmedşahê Merwanî, fermandarê Cizîra Bota û Mîr Mûsik, kurê Mîr Meclî, mîrê Bota nexweş ket û gelek dijwar çêbû. Lê Suleyman Ebûherb, nexwest, ko eşkera bikujî, dest bi xap û rîpa kir û keça mîr Ebûtahirê Becnewî, ko ji metika Suleymanxane, ji mîrê Bota re xwest û lê markir, yan keça kurê metika xwe li mîrê Bota markir. Lê paşê Suleymanxan, Mîr Mûsik girt û xiste zindanê. Sultantoxrol, çawa hate Melazgir ji Ehmedşah hêvî kir û got, dixwazim mîrê Bota, ji zindanê berdî. Lê di zindanêde kuşt û got, Mîrê Bota, di zindanê de serê xwe daniye.

Lê fermandarê Becnewî, li Finikê xeyidî û got, eger mala Merwan dixwestin, ko kurê Meclî, mîrê Bota, bikujin, çima keça min lê markirin û namûsa min şikandin.

Çawa Suleyman ev nivîsar bihîst, kete nav tirs û sawiran û çavê xwe berda windakirina Ebûtahirê Becnewî. Piştî pêlakê ew jî, bi jehrê da kuştin û kurê wî Ubeydilah, bi Suleymanxan re li hevhat heta, ko rojekê di civatê de suleymanxan, bi destê xwe kuşt û tola bavê xwe sitand.

Lê piştî mirina Suleymanxan, bavê wî leşkerek da kurê xwe Nizamidîn Nesir û şande ser Becnewî û Bextiyan û kire fermandarê Cizîrê. Lê di wê navê de Qureyş, kurê Bedranê Uqeylî, bi leşkerekî giran ve ji Mûsil derket û hate hana

Institut kurde de Paris

Becnewî û Bextiyan. Peymanek di navbera xwe de çêkirin û bi hev re, rê li ber leşkerê Nizamidîn Nesir girtin, şer destpêkir û gelek ji herdû rexan hatî kuştin. Lê dawî Nesirxan zora dijminê xwe bir û ji hev perçe kirin û Qureyş, vegeriya Mûsil sala 447 koçî de ev çêbûye.

Di sala 452 de Nesridewle Ehmedşah, kurê Merwan li Farqînê serê xwe danî.Kamil, jimar 10, rûpel 6-7

Mihemed Emîn Zekî Beg, ji Daîretilmearifilislamiye di guhêzî û dibêjî, di sala 457 de û di çaxê Nizamidîn Nesir de bajarên Herran û Siwerek ketin bin destê Nizamidîn Nesir û navê Nizamidîn, ji Bexda, ji cem peyrewê Bexda jêre hatiye. Lê kurê Ezreq, vî tiştî nabêjî, tevlî, ko dirêjtir ji Emîn Zekî Beg pêde çûye jî.

Herwekû Mihemed Emîn Zekî Beg, di biwara Mensûrşah de dibêjî, ji ber, ko navê xwe û peyrewê Misrê, di xutba de dixwend, welat jê sitandin û dane kurê Ciheyrê Mûsilî, wezîrê mala Merwan û dibêjî, Şerefidewle, fermandarê Mûsil hate han û heware Mensûrşah û leşkerê turk bi şev êrış kirin ser leşkerê Ereb û xerab şikandin. Şerefidewle, bi hezar dijwarî xwe gihande nav bajarê Amed(Diyarbekir) û Fexridewle, kurê Ciheyr, hawîr bajêr girt û Şerefidewle, li ser destê Ertuqê turkmanî, serdarê leşkerê Melikşah bi ber tîla xwe ji mirinê parast û reviya û çû Reqayê. Ev serpêhatî, di sala 477 de çêbû ye.

Lê bajarê Amed(Diyarbekir), di sala 478 û Farqîn, di sala 479 de hatin girtin. Mensûrşah bazda û kete Cizîrê û çend kelehên hawîr wê xistin destê xwe.

Lê Fexridewle, ew dîl girt û kelehên mayîn jî, xistin bin destê xwe û perdake reş xwe berda ser dewleta Kurdên Merwanî û dawî hat. Kamil-10, 53 û Ebûlfida

## DİYARBEKİR PİŞTÎ MERWANİ YA

Hate zanîn, ko Amed(Diyarbekir), di sala 478 de û Farqîn, di sala 479 de ketin destê kurê Ciheyrê Mûsilî, wezîrê kevnarê malbata Merwan. Nasiridewle, Mensûrşah, kete gundê Herbê û mal û çek û barxana dewleta kurdî ketin destê dijmin, ko du milyon yan du milyar dînar bûn û ji malê giranbiha û gewhera.

Lê piştî dusala Melikşah, ew rakir û Emîdidewle, Qewamidînê Belxî xiste şûna wî. Di sala 482 de careke dî û li ser xwestina xelkê welêt Emîdidewle, kurê Fexridewle, kurê Ciheyr kirin fermandarê Farqîn û Amed û Qewamidîn birin Esfehan.

Lê Fexridewle, piştî, ko salekê di fermandariya Mûsil û

Cizîrê de ma, serê xwe danî. Li Tiltobe veşartin û gorna wî hetta sedê şeşan(6), çaxê kurê Ezreq jî hêj xuya bû.

Çawa, ko di sala 484 de Emîdidewle, kurê Fexridewle jî ji Farqîn rakirin û birayê wî Kafî, li şûna wî hiştin. Lê di sala 485 de ew jî rakirin û kurê wî Ebûlhesen, xistin şûna wî.

Çawa, ko Melikşahê Selcoqî jî, di vê salê de serê xwe danî û li Esfehan veşartin. Kurê wî Şihabidewle, Berkeyareq, bû padîşah. Di vê salê de bi xwe de, li riya Esfehan, Batinîya, wezîrê navdar Nizamidûilik kuştin û li Farqîn Ebûhesen, kurê Kafî, kurê Fexridewle avêtin û Mensûr şah kurê Nizamidîn Nesir, kirin fermandar û padîşah. Tenê pênc meh neçûn bi destê Tacidewle Tetuş, careke dî Farqîn ji destê Merwaniya derket û Mensûrşah hate Cizîrê rûnişt.

Herwekû fermandarê Cizîrê, Huseyn, kurê Ehmedşahê Merwanî di gel çend fermandarên Ereb li ser destê Tacidewle Tetuş hate kuştin, Mensûrşah bi destê Cigermij, hate girtin û kete zindanê. Çawa, ko wezîrê Mensûrşah Mihyidewle, kurê Esed , li Heranê li ser destê Tacidewle Tetuş sala 487 hate serjêkirin.

Herwekû Sedîdidewle û kur û birazayê wî û kurê Nebate, li Farqînê kuştin û laşê wan gurûn û serê wan li nav bajêr gerandin. Çawa, ko Tacidewle, Taxtekîn kire fermandarê Farqîn û çû şerê Esfehan û di nav şer de hate kuştin. Kurê wî Deqaq, li Şam kete şûna bavê xwe û Textekîn bû Etabegê wî. Çawa, ko di sala 486 de Mensûrşah, li Cizîrê serê xwe di zindanê de danî û li Amed hate veşartin. Dawiya vê dewleta kurdî piştî, ko sed salî dirêj kir, bi mirina Mensûrşah hat.

Lê kurê Esîr dibêjî, di sala 489 koçîde serê xwe danî û jina wî li Erzen veşart û kumbedek li ser avakir û jinêkê, dêrek di welatê Becnewiyan de kirî û têde rûnişt, heta, ko serê xwe danî. Ev hemî derbas bûye û bi kurtî min ji were vegerand û gotin.

Lê piştî, ko Textekîn, ji Farqîn rabû û çû Şam, Şemsidîn Ettaş li şûna xwe danî û Ebûhesen Cabielî, kurê Mihemed, kurê Safî kire wezîr, ko kalikê wî Safî, kolê mala Nebate bû.

Herwekû Şihabidewle Berkeyareq, kurê Melikşah di sala 493 de serê xwe danî û birayê wî Sultan Mihemed kete şûna wî. Herwekû di sala 491 de Firingan bajarên Entakya, Terablus xistin destê xwe û di sala 498 de bajarê Qudsê bi zor sitandin û Riha û çend keleh li hindama wê sitandin û wela

tê Diyarbekir(Amed) girtin. Tenê di destê Deqaq de bajarê Farqîn û Amed di destê Yenal de mabûn.

Herwekû Hisamidîn Kemeştekîn, Bedlîs û Erzen xistibûn destê xwe. Şahrux, ji Erzen derket û hênê(Hanî) ji xwe re girt û Qizilerslan, fermandarê Diwîn, Eserd(Sêrt), Tenzê (Behmûd) xistin destê xwe. Segman, kurê Ertuqê turkmanî, Heskîf ji Mûsayê Turkmanî sitand û Mûsa bû fermandarê Mûsil û Cigermiş bû fermandarê Cizîrê. Çawa, ko Elxazî, kurê Ertuq bû fermandarê Mardîn.

Bi kurtî welatê Amad û Farqîn li fermandarên Turkman hatî belavkirin û zariwên mala Merwan xwe dane ber siya wan û li ber destê turkmana rûniştin. Tenê Ehmed, kurê Nizamidîn fermandarê Hetaxê bû. Farqîn di bin destê Şemsidîn Etaş de mabû, ko ji ber Deqaq ve tê de bi fermandarî rûniştibû. Di sala 491 de Deqaq hate Farqînê û wezîrê wî Miheme dê Divînî, yan Ecemî pêre bû. Di sala 493 de kurê Mûsikê Merwanî, Muhtesib, wezîrê kevnare ji Deqaq kirî û di etûna xwe de şewitand. Di sala 495 de Cigermij, li Mûsil serê xwe danî û zarokên wî pêlakê man, lê zû fermandarî ji destê wan derket.

Lê kurê Esîr dibêjî, Cigermij, di sala 500 de serê xwe daniye û di sala 497 de Deqaq Mîr Mihemedê divînî kire fermandarê Farqîn û dergevanê xwe bi dizdarî di bircamelik de danî.

Herwekû Mîr Mihemedê Divînî, Xettafe, keça Behram, kurê Nizamidîn markir û paşê berda. Di sala 497 de Deqaq bi serdariya Cigermij û Ertuq leşkerê Firing li Teberiya şikand û gelek mal û barxana ji wan sitandin. Di sala 498 de Deqaq serê xwe danî û Etabeg Textekîn bû fermandarê Şam û Heleb, ji Ridwan, kurê Tacidewle re ma.

Herwekû di vê salê de Mîr Mihemedê Divînî, Farqîn da destê Qelîç Erslan , padîşahê Rom, kurê Sultan Suleyman, kurê Qetilmiş. Di sala 498 de Qelîç kete Farqînê û careke dî mîr Mihemed kire wezîr. Fermandarên welatê Amed(Diyarbekir) bi carek hatin cem û gerdena xwe jêre xwar kirin. Mîr İbrahîm, kurê Yenal, ji Amed û Qizilerslan , ji Sêrt û Segman, kurê Ertuq, ji Heskîf û Şahrux, ji Hênê(Hanî) û Hisamidîn ji Mardîn.

Herwekû Qelîç, kolê bavê xwe kire fermandar û ji bajêr derket. Mîr Mihemed, bi xwe re bire Meletya û bajarê İblistîn ji bo xwarina wî da destê wî. Lê Mihemed bi xwe li Meletya rûdinişt. Qelîç bi leşkerekî giran ve hate ser Mûsil û Cawlîseqa, ko ji ber Mihemedşahê Selcoqî ve li Mûsil fermandar bû, leşkerê Qelîçerselanşah şikand û Qelîç di çemê

Xabûr de serê xwe danî. Laşê wî anîn Farqîn û kumbedek li ser avakirin. Di sala 499 de hate veşartin, di sala 538 de laşê wî birin. Lê ji Diyarbekir(Amed) vegerandin û careke dî di kumbeda wî de veşartin.

Etabeg Xemirtaş, kolê Qelîçerselan, ser bi xwe bû fermandarê welêt. Gelek zor û setem li xelkê dikir û di sala 499 de Segmanê Qutbî, ko padîşahê Xelat bû û bi xwe kolê, utbidîn bû hate ser Farqînê û di sala 502 de xiste destê xwe. Xemirtaş, bazda û fermandariya welatê Amed ( Diyarbekir) û Farqîn ketin bin destê wî(Segman). Gelek qencî bi xelkê kirin û yekî turkmen bi navê Xezoxillî kire fermandar û Xoce Esîridewle, Ebûlfitûhê kurdî Cizîrî, kire wezîrê welêt.

Çawa, ko di sala 503 de Fexridîn, kurê Umer, li Farqîn kirin Fermanrewa û Ebûlqasim, kurê Nebate hate avêtin. Awirek pir diriste, ko navê Cizîrê li ser navê van herdû bira ko fermandarên wê bûn, bûbî, Cizeretibnilumer, çawa, ko di riste ev Fexridîn, kurê Umer, birayê Esîridewle, kurê Umer bî.

Di sala 505 de Segman, li ser bajarê Rihayê hate kuştin yan serê xwe danî, kurê wî İbrahîm û diya xwe bûne padîşah. Di sala 505 de Ridwan, kurê Tacidewle li Heleb serê xwe danî û di sala 506 de Xatûn û kurê xwe İbrahîm, ji Xelatê hatin Farqîn û Xezclî avêtin û Sedîd Ebûsadê Huweylî, kirin wezîrê Xelat û birayê wî Ebûmensûr Mûîn kirin fermandarê Farqîn. Fermanrewa Fexridîn, kurê Umer dîsa vegerandin Cizîrê û kirin fermandar. Birayê wî Ebûlfitûh Esîr, li Farqîn kirin fermanrewa.

Di sala 507 de İbrahîm Şahermen, wezîrê xwe Sedîd, li Melazgir kuşt û birayê wî Mûîn, di Farqîn de asê bû û serbixwe bû padîşah. Çawa, ko Elemidîn Ebûhesen, kurê Nebate, ji fermanrewayî hate avêtin û Yehya, kurê Derîr kirin şûna wî. Lê çawa Mûîn bû padîşah, kurê Derîr danî û girt û Ebûhuseyn Ehmed, kurê Emar, kurê Muzefer yek ji xelkê Bedlîsê kire fermanrewa. Di sala 508 de kurê Derîr bi destê Mûîn hatekuştin, di vê salê bi xwe de Batinîya Mewdûd, kurê Toltekîn, fermandarê Mûsil li Şam kuştin û di sala 502 de Mûsil xistibû destê xwe.

Di dawîya vê salê de Sultan Mihemed, kurê Melikşah, Qeraça, kolê xwe kire fermandarê Farqîn û bi leşkerekîve rêkire ser Farqîn û bajar xiste destê xwe û Mûîn kire wezîr. Keça Sultan Mihemed Fatê bi Qereçare bû. Kurê Muzefer, ji fermanrewayî danî û kurê Nebate Elemidîn xiste şûna wî. Ev Qeraça İzidîn, li Farqîn ma heta, ko Sultan Mihemed ew şan

de welatê Faris, Şîraz. Mûîn jî, bi xwe re bir û çû û ji ber Sultan ve Ciyûşbeg, bû fermandarê Farqîn. Ciyûşbeg ji ber xwe ve Zirbeg li Farqîn hişt û vegeriya Mûsil. Di çaxê vî Zirbegî de, welatê Farqîn ji hev perçe kirin. Segman ji rexê çem ve sed gund bi ser Heskîfê de berdan û Necmidîn 30 gund bi ser xwe ve berdan. Hisamidewle, xwediyê Erzen 25 gund bi ser xwe ve berdan.

Di sala 512 de Sultan Mihemed, li ber derê Hemedan serê xwe danî û kurê wî Sultan Mehmûd, kete şûna bavê xwe û keça Sencerşahê apê xwe markir û keçek jêre bi navê Gewherne seb çê bû û di sala 552 de dawiya mala Selcoqîyên Kurdistan, Îran, Iraqê hat.

14.9.1965 Cigerxwîn.

Institut kurde de Paris

# DEWLET Û FERMANDARÎYA HESKÎF A KURDÎ

Heskîf yan Hesenkêf, ko berî hingî, jêre digotin serê Dêw(Rasilxûl). Keleheke mezin û bilind li ber qiraxa çemê Dicle, rexê Cizîrê ji latê hatiye birîn û çêkirin.

Mîr Şerefxanê Bedlîsî dibêjî, 150 gazî bilind û gelek asê ye. Çar hindamên wê hene, Sêrt, Bişêrî, Tor, Erzen û 13 eşîrên kurd di van hindaman de rûniştine. Aşîtî, Mihelmî, Mihranî, Becnewî Şikakî, İstêrkî, Gurdilê mezin, Gurdilê biçûk, Reşan, Kejikî, Çêlikî, Xindeqî, Sohanî, Bêdiya.

Lê li gora jimarê dibin çarde eşîr, lê nizanim ev çewtî ji ku tê, ko eşîra Bêdiya hatiye jimartin û neketiye nav komika jimarê.

Mîrê Bedlîsê, pêde diçî û dibêjî, diwazdeh hezar fileh xeracê didin vê derebegîyê. Herwekû di biwara fermandarê Heskîfê de dibêjî, Melekanê Hesenkêf, di sala 662 ê koçîde ko padîşahiya Eyyubî kurdî, ji Şam û Misrê koça xwe barkir û dawî hat yekî ji wan çend mehan xwe li bajarê Hema veşart û paşê hate cem padîşahê Mardîn û kelehe Sitewr, Sewr da destê wî, lê qîma xwe pê nanî û di keleha Heskîfê de asê bû û her çiqas leşkerê Mardîn çend caran çû ser, lê nikaribû tiştekî tê bikin. Ji wê rojê de bûne fermandarên vê hindamê û ji wanê, ko deng dane Melik Suleymane.

Lê ji bo, em karibin çend gavan bi paşde vegerin, da karibin hin ronî bavêjin ser bingehê vê malbatê, gereke em ji Melik Kamil Mihemed, kurê Melikil Adil, kurê Necmidîn Eyûb destpêbikin.

Institut kurde de Paris

Heskîf, di sala 374 ê koçî de, di bin destê mala Merwanê kurdî de bû. Ji mala Hemdanê Ereb, mezinê Heleb sitandi bûn. Herwekû di sala 447 de di destê Becnewîyên kurd de bû. Çawa, ko di sala 489 de di destê Mûsayê Turkmanî de ma bû, lê di sala 495 de kete destê Segmanê Ertuqî Turkemanî. Heta sala 629 ê koçî jî, di destê mala Ertuqî de maye. Lê di vê salê de kurdên Eyyûbî, padîşahên Misir û Şam û Kurdistan û Erebistan li ser destê Kamilşahê Eyyûbî, ji melik Mesûd, kurê Mewdûd hate derxistin û Kamilşah, hindama Diyarbekir, Elcizîre, Heskîf, Xelat sipardin kurê xwe Melikilsalih Necmidîn Eyyûbî.

1- MELİKİSALİH NECMİDÎN EYYÛB, KURÊ MELİKİLKAMİL MİHEMED , KURÊ MELİKİLADİL(EBÎBEKİR), KURÊ NECMİDÎN EYYÛB :

Di sala 629 ê koçî de bû fermandar û padîşahê vê hindama Kurdistanê û li keleha Heskîfê rûnişt. Lê dema, ko mizgîna mirina bavê wî jêre hat, li bajarê Ruhbe danî bû û xwarzemîya, ko perçak ji leşkerê kurdistanê bûn û gelek xurt û çavsor bûn, xwestin, ko fermandarê xwe bikujin û dewletê ji xwe re bihêlin. Lê çawa Melik Salih Necmidîn bi wan goman ket, reviya û kete keleha Şingalê û tê de asê bû. Ji hawîr ve dijminê kurd êrîşî Kurdistanê kirin, Melikê Mûsil Bedridîn Lolo, bi leşkerekî mezin ve hate ser Şingalê. Xwarzemîya pirê Cizîrê xistin destê xwe. Keyxwesro, Melikê Rom hate ser Diyarbekir. Herwekû Necmidîn di Şingalê de û Turanşah, kurê wî di Diyarbekir de asê bûn û weke mêra li ber xwe didan, lê kurê dî Fethidîn Umer, ji ber Xwarzemîya bazda û kete keleha Caber, li ser Ferat, lê nikaribû xwe li ber dijminê xwe bigrî û çû cem metika xwe Sefîye xatûn, Munbicê. Lê metikê xwe neda ber û naçare vegeriya Heran.

Tenê Necmidîn ya Eyyûb ji ber xwe ve Qadî Yûsif, kurê Hesenê Zirzarî Qadiyê Şingalê rêkire cem kurê xwe Fethidîn û nivîsarek jêre şand û got, dixwazim ji gotina Qadî derne kevî û Qadî kincê Erebên çolê li xwe kirin û bi dizî xwe gihande Fethidîn Umer û nivîsar da destê wî. Herdiwan bi dizî xwe gihandin cem Xwarzemîya û ji wan re hin sozên mezin û giranbiha dan û Şingal û pirê Cizîrê, bi wan re gotin û bi vî rengî kirin hevalbendên xwe û bi hev re hatin Şingalê û leşkerê Mûsil şikandin û talan kirin. Ji nûve Necmidîn derket û berê xwe dane Diyarbekir û leşkerê Romê şikandin û welat bi carek vegerande bin destê xwe û ji nûve hate Heskîfê.

Çîrok û serpêhatiya Melik Necmidîn Eyyûb, gelek dûr û dirêje. Lê bi kurtî kete zindana Kerek û dawî, fermandar û

mezinên dewletê birayê wî Melekiladil, padîşahê welêt li Misrê xistin zindanê û Necmidîn kirin padîşah û ji zindana Kerek derxistin û birin Misrê. Lê di sala 647 ê koçîde li hember dijmin(Firansa) serê xwe danî û mirina wî veşartin, hetta kurê wî Turanşah, ji Heskîfê anîn û kirin padîşah û ji nûve eşkera kirin.

2- MELİKİLMUEZEM, TÛRANŞAH, KURÊ MELİKİSALİH NECMİDÎN EYÛB KURÊ MELİKİLKAMİL MİHEMED,KURÊ MELİKİLADİL EBÎBEKİR, KURÊ NECMİDÎN EYÛB :

Piştî, ko bavê wî çû Misrê, bi fermandarî li cihê wî rûnişt û kurdistan bi gernasî û camerî li hev ragirt. Sînorên xwe parastin û êl û eşîrên kurd li hevragirtin. Per û balên wekhevî, dilovanî, xêr û xweşîyê bi ser milet û gundîyên xwe de berdan û welatê xwe gelek bi pêşve bir û xweş û ava kir.

Lê çawa bavê wî li Misrê û li hember leşkerê Firansa ko bi serdariya melik Liwîs hatibû şerê dewleta kurd û misilmana serê xwe danî. Fermandar û mezinên dewletê, Turanşah kirin padîşah û sivik birin welatê Misrê. Çîroka wî jî hinek dirêje, ko wê di tarîxa împeratorîya kurdî de li ser hev bê gotin. Naxwazim di vir de bi dirêjî bibêjim. Lê çawa Turanşah naskir, ko nexweyîya vê dewletê ji destê kole û hin serdarên dilbijê padîşahîye. Ji lewra ji revê dest bi kola kir û xwarina wan birî û bê rûmet kirin. Lê kole ji wî konetir bûn û serdar hemî li xwe civandin û xwestin dewletê bixin destê xwe û jinbava wî, Dirdara Şeceretidur û fermandarê kurd Ebûelîyê Hezebenî, fermandarê Qahîre kirin hevalê xwe, jinik markirin û nişka ve û bi şûra li Turanşah hatin hev û bi perîşanî kuştin. Paşê Dirdara jî bi destê wan û bi gernasî hate kuştin û welat ji xwe re hiştin. Tenê Şam û Felestîn, Kurdistan, Hicaz, Yemen, Libnan di destê dewleta kurdî de mabûn. Tenê di vir de xeleka nav bera Tûranşah û melik Suleymanê, ko Şerefxanê Bedlîsî dibê jî, e^pêşîne, ko bûye fermandarê Heskîf, hatiye winda kirin û nexuyaye.

Lê mirov dikarî bêjî, navê bavê melik Suleyman, melik Mihemede. Ji ber, ko kurê her dem, yan pirên cara navê bavê xwe li kurê xwe dikin. Ji lewra di îro de, em dikarin melik Mihemed bixin navbera wan.

3- MELİK MİHEMED, KURÊ MELİK TÛRANŞAH, YAN JÎ FETHİDÎN UMER :

Weke me derbaskiriye, tarîx û xeleka vî mirovî windayî

mane û min bi goman aniye meydanê, ji lewra nikarim tiştekî li ser bêjim. Lê Dektor Cemalidîn Şeyal, ko di sala 1953 ê zayîn de tarîxa Mufericilkirûb, li Misrê çap kiriye dibêjî, du tarîxên dî jî hene, ko bi dirêjî di biwara dewleta kurdên Eyyûbî, ko li Hema, Heskîf di sedê 8-9 de fermanradî kirin, hatine çêkirin, lê Şeyal bawer dikî, ko her dû tarîxan jî ji Mufericilkirûb sitandine.

Lê mixabin, ko hêj perçê çarem ji Mufericilkirûb û herdû tarîxên dî jî nehatine çapkirin, ko mirov karibî vê xeleka winda bibênî û rast bikî.

4- MELİK SULEYMAN, KURÊ MELİK MİHEMED :

Mîr Şerefxanê Bedlîsî dibêjî, ê, ko bi fermandarî deng daye, ji vê malbatê, ev Melik Suleymane. Hetta dawîya padîşahiya Cengîzî jî hêj Melik Suleyman fermandarê vê hindamê bû, ko di sala 736 de bû. Lê çawa serê xwe danî, kurê wî Melik Mihemed kete şûna bavê xwe.

5- MELİK MİHEMED, KURÊ MELİK SULEYMAN :

Piştî mirina bavê xwe bû fermandarê vê hindamê û ji rêve dest bi avanî û xweşkirina welatê xwe kir. Welatê Heskîfê di vê meydanê de gelek bi pêşve ajot.

Mirovekî dilovan, comerd, bîrewer bû, çawa serê xwe danî, kurê wî Melikiladil kete şûna bavê xwe.

6- MELİKİLADİL, KURÊ MELİK MİHEMED, KURÊ MELİK SULEYMAN :

Li ser daxwaza bavê xwe bû fermandarê welatê Heskîf-Kurdistan. Li keleha Heskîfê rûnişt, mirovekî dilavan, nerm, zana û di çaxê wî de kurdistana Heskîfê di meydana avanî de gavên mezin berepêş avêtin. Di sala 781 ê koçîde serê xwe danî.

7- MELİK EŞREF, KURÊ MELİKİLADİL, KURÊ MELİK MİHEMED, KURÊ MELİK SULEYMAN :

Ev mirov hevçaxê Teymûrxanê Korekan(Teymûrêlenk) bû.Xwe diyê Zefernamê Şerefidîn Elîyê Yezdî dibêjî, di sala 796-(1394)de Teymûrxan bajarê Bexda sitand û berê xwe da Mardîn û fermandarê Heskîf, li bajarê Ruha, bi diyarî padîşahê, navdar û serbilind ket û gelek diyarî û perwa jêre pêşkêş kirin û bi serbilindî vegeriya welatê xwe. Pêlek neçû serê xwe danî.

**8- MELİK XELÎL, KURÊ MELİK EŞREF, KURÊ MELİK ADİL :**

**Piştî mirina bavê xwe, bû fermandarê Heskîf û di sala**

Institut kurde de Paris

824(1422) de bi çend mîrekên kurdistanê ve li wan, Westan bi diyarî Şahrux, kurê Teymûrxan ketin. Gerdanxwarî û bindestîya xwe pêşkêş kirin. Pêre man hetta, ko li Eleşgîr bi fermana şahanî mîrekên kurd weke Mîr Şemsidînê Bedlîsî, Melik Mihemedê Hekarî û kurê Sultan Suleymanê Hîzanî vegeriyan welat û mala xwe, wê çaxê Melik Xelîl jî hate Heskîfê û di sala 862(1458) de serê xwe danî.

9- MELİKXELEFÊ ÇAVSOR, KURÊ MELİK SULEYMAN, KURÊ MELİK EŞREF :

Piştî apê xwe bi camerî û gernasî bû fermandarê welatê Heskîf. Gelek şerên xwîndar û dijwar di navbera wî û mîrê Bota de çêbûn. Herdem çavsor, zora dijminê xwe dibir î leşkerê Bota dişkandin.

Çawa jêre digotin çavsor, wilo jî jêre digotin Ebûseyfeyn. Ji ber, ko bi du şûran şer dikir.

Lê çawa Hesendirêj Bayendûrî, fermandarê Aqqoyunlû, çavên xwe berdane vegirtina kurdistanê, leşkerekî giran, têr çek rêkire ser welatê Heskîfê û Xelefêçavsor, bi gernasî leşkerê dijmina pozşikestî bi paşde vedigerand. Gelek ji wan kuştin. Lê çawa dijmin dîn, ko nikarin bi zor bixin bin destê xwe berê xwe dane vîlik û dolabên bêbextî. Yek ji zariwên Melikxelîl kirin hevalê xwe û jêre gotin, ji bo çi emê hevdî bikujin. Lê em dixwazin Melikxelef, bavêjin û te bixin şûna wî û lihevbên. Ji bo vê nezaniyê zariwên Melikxelîl, apê bê guneh di serşokê de bi bêbextî kuştin û Heskîf xistin destê dijminê xwe û bi xwe jî nebû fermandar.

10-MELİKXELÎL, KURÊ MELİK SULEYMAN, KURÊ MELİKEŞREF :

Di çaxê Aqqoyunlû de pêlakê xwe li Hema veşart, Lê çawa padîşahîya Aqqoyunlû dî kurdistanê de ber bi newala mirinê ve gindirî û dîwarên wê hawîr hilweşiyan û herivîn,

Melikxelîl, bi alîkariya Mîrşah Mihemedê Şerwî, ko berî hingî yek ji wezîr û fermandarên mala Eyûbî bû Melekê Heskîf û eşîrên kurd li xwe gihandin hev û bi gernasî direjî dijminê xwe kirin, bi hesanî Heskîf ji dest dijmin derxistin û ser bixwe bû fermandarê vê hindamê.

Şerefxan, pêde diçî û dibêjî, birastî, hêj kes ji fermandarên kurdistanê bi payedarî, serbilindî negihaye rêza vî mirovî, di rêza padîşahan de bû. Ji padîşahên mezin dihate jimartin, xuşka Şahismaîlê Sefewî, şahê Îran markir û melik û fermandarên kurdistanê bi carek di govend û destgîrana wî de civîyan û govend û şahî hatin li darxistin. Ke-

Institut kurde de Paris

çikên çîm sîm kûpên şerabê digerandin û ji civatê re dîlan dikirin, ko hêj kesî govendên wilo li darnexistine.

Lê çawa dewleta Aqqoyunlû, hate hilweşandin û sitêra Şahismaîl di ezmanê Îran de bilind bû, fermandar û melikên kurdistanê diwazde mirov bi hevre çûne pîrozîya wî û serê xwe jêre xwar kirin. Lê Şahê nezan, her diwazde mîrek bi bend û zencîr xistin zindanê û sipardin Zeynelxanê Şamlû.

Lê Melikxelîl û keça xwe û bi zarokên wan ve di hember qencîya wî de birin Tewrêzê û zavayê xwe li Tewrêzê xiste zindanê. Bajarê Heskîf, ji rexê Qizilbaşa ve kete destê Becnewîyan, ko melikxelîl bavê Mîrhuseynê Becnewî, Mîrmihe med kuştibû. Mîr Huseyn, bi dil û can bû hevalê Qizilbaşan û rêçika Qizilbaşa bawerkirin û Becnewî ji wê rojê de bûne nîv qizilbaş.

Lê çawa ordiya kurd û turk li Çaldêrdan ordiya kurd û qizilbaşan bi gernasî şikandin û fermandarên kurd berê xwe dane welatê xwe. Melikxelîl, bi hevaltiya Başbiyûk, nobedar û pêwanên xwe kuştin, bi şev derketin û berê xwe dane welatê xwe. Lê bi rêde û li hêla Wan eşîra Mehmûdî ketin pêşiya wan û Başbiyûk di meydana şer de hate kuştin û Melikxelîl, bi gernasî xwe ji wê lehîya mirinê parast û hat.

Di vê navê de eşîrên Şerwan, Zirikan di gel eşîrên Heskîf, Melik Suleymanê, kurê Melikxelîl kiribûn fermandarê xwe. Tenê eşîra Reşan, yek ji pismamên Melikxelîl ji xwe re kirin fermandar û mezinê xwe. Çawa, ko Bota, leşkerê xwe kişandibûn ser bajarê Sêrtê, lê çawa dengê hatina Melikxelîl kete welêt, leşkerê Bota vegeriyan mala xwe û kur û mirovên wî tevan gerdena xwe jêre xwar kirin. Sêrt bi he sanî vegerande bin destê xwe û hate ser Heskîf û Becnewîyan ji xwere barxane ji Torê anîne kelehê û têde asê bûn. Lê Melikxelîl, şûna xwîna bavê Mîrhuseyn de gundê Balê(Balanê) dayê û lihevhatin. Keleh bi dostanî dane destê wî.

Ewên, ko bi serpêhatiyên Becnewîyan agahdarin dibêjin: Bext û Becin, bacin, birayên hev bûn û di Cizîra Bota de bûn. Lê li hev nekirin û Becin ji Cizîrê derket û hate Heskîfê. Eyûbîyên Heskîfê kele ji Becnewîyan sitandine.

Ev gotina Şerefxane, lê min ji were gotina rast berî niha derbas kiriye ko çawa Heskîf ketiye destê Eyyûbîyan. Lê Şerefxan, pêde diçî û dibêjî, herwekû hin dibêjin, kurd hemî ji Becn û bextin. Ewê, ko dibêjin kurd ji cinane, çawa me di pêşde gotiye, ji vir sitandine û bi çewtî guhaztine. Becin(Bacin), eşîreke kurde, li torê hetta îro jî rûniştîne. Baweriya wan êzîdî yan jî weke Şerefxan dibêjî,

Qizilbaşîye. Lê di îro de ji wan re dibêjin êzîdîyên bacinê.

Bacin bi xwe şikeftin û wêranbajarek heye, ko jêre dibêjin Becnexwêr, di nav eşîra Hevrika de ye û bê gomane, ko Becnexwêr, bajarê Becna, Becnewîya ye û Mihemed Emîn Zekî Beg, wezîrê navdar dibêjî, Becnewî, Becnawe, Basinawe. Lê bi rastî Bacine, ji ber, ko gundên bi "ba" gelek di hindama Heskîfê de peyda dibin. Bagas, Balan, Batûş, Basyat, Bacin.

Herwekû tê xuyakirin ba, bi daxwaza xwedî di vir de hatiye, weke çawa Ereb dibêjin Zatilşîh.

Di çaxê Mîr Şerefê Cizîrî de dijminahî kete navbera Mîr Huseynê Bacinî û Mîr Şeref û Melikxelîl, bavê mîr Huseyn, Mîr Mihemed û diwazde kurên wî kuştin. Ji ber, ko Mîr Mihemed, di civata Melikxelîl de dijûnên nebaş ji mîrê Botan re kiribûn. Çawa Qizilbaş ketin Kurdistanê, Becnewî bûne hevalbendê wan û di keleha Heskîfê de asê bûn. Melikxelîl, gundê Balanê(Balê) ji ber xwîna bav û birayên Mîr Huseyn ve dayê û li hevhatin. Kele bi hesanî xiste destê xwe, lê çawa ji vir tê xuyakirin, hindama Torê di destê Bacinî(Becnewî)yan de bû. Piştî mirina Melikxelîl, çar kur li şûna wî man. Melik Suleyman, Melik Elî, Melik Mihemed, Melik Huseyn.

11-MELİK HUSEYN, KURÊ MELİKXELÎL :

Piştî mirina bavê xwe bû fermandarê hindama Heskîfê. Lê çendan hê zaro bû jî, lê ji ber mêranî û comerdî, dilovanî û serbilindîya wî eşîrên kurd ew kirin fermandar û li şûna bavê wî danîn.

Lê çawa dar kete destê wî, herdû birayên xwe, Melik Elî û Melik Mihemed xistin zindanê, lê birayê wî Melik Suleyman, ko serdarê leşkerê wî bû ji bajarê Erzen reviya û çû Diyarbekir û xwe avête bextê Xesropaşa, waliyê Diyarbekir û got, ez birayê mezinim, hêvî ji dewletê dikim, ko min bikin fermandarê welêt. Xesropaşa, li tiştekî wilo digeriya û ha ha nagihan şande ser Melik Huseyn û herdû birayên wî pê dane berdan û li Diyarbekir Melik Huseyn kuşt û fermandarî da destê Melik Suleyman.

12-MELİK SULEYMAN, KURÊ MELİK XELÎL :

Lê çawa ev hov hate ser textê fermandarî eşîr û xelkê welêt jê dil sar û nexweş bûn. Kuştina Melik Huseyn bi destê dijmin bû xwîna Kohreş û kete pasîra wî û ji tirsa bazda û çû Diyarbekir û miftên kelehê ji Xesropaşa re pêşkêş

kirin û welat bi hesanî da destê dijminê miletê xwe. Lê pa şayê navdar, ji bo vê qenciyê ew kire fermandarê bajarê Rî hayê. Ji hatinên Heskîfê sêsed û sîh hezar ji Rihayê da bî rayê wî Melik Mihemed û Zeametek da destê birayê wî Melik Elî bi dusedhezar axçe û Heskîf bû ji ji xwepêgirên Diyarbekir û kete dest dewletê.

13-MELİK MİHEMED, KURÊ MELİK XELÎL :

Piştî mirina birayê wî Melik Suleyman, welatê Riha ji destê wan derket û hindama Erebkêr, kete destê wan. Turkan bi Senceqî sipardin Melik Mihemed, lê paşê ew jî jê sitandin û kirin Qaymeqamê Bedlîsê. Lê dawî hate cem Bedirbegê Botî û li Cizîrê rûnişt û keça xwe da kurê Bedirbeg, Mîr Mihemedbeg û li wir serê xwe danî. Yazde kur bi şûn xwe ve hiştin. Xelef, Huseyn, Eşref, Elî, Suleyman, Xelîl, Zahir, Adil, Mehmûd, Hesen, Ehmed.

Xelew, bi ciwanî serê xwe danî. Kurek bi navê Hemze bi şûn xwe ve hişt. Suleyman, Zahir, Hesen kordûnde serê xwe danîn. Tenê Huseyn bû qaymeqam. Evên mayîn bi carek li nik mîrekên kurdistanê rûniştin.

14-MELİK SULTAN HUSEYN, KURÊ MELİK MİHEMED, KURÊ MELİK XELÎL :

Piştî pêlakê destê xwe ji Qaymaxamî kişand û di îro de li kurdistanê digerî. Ji gundên weqfê, ko bavê wî kiribûn weqf nan dixwî. Şerefxan dibêjî, 1005 ê koçî ye, ko ev mirov bi vî awayî debara xwe dikî.

# DEWLETA KURDÎ-ZENDÎ

Çawa Nadirşahê navdar, padîşahê Îran hate kuştin, welatê Îran kete nav sergêjî û berdîberdanê. Her fermandarekî, di hindama xwe de çavên xwe berdane padîşahî û bûne dijminê hev. Şer û kuştin û talan di welatê Îran de destpêkir. Ehmedxan, di Xerasanê de û Mihemed Huseynxanê Qacarî di Istirabad û Mazenderanê de û Esedxanê Evxanî di Azerbaycanê de û Hidayetxan di Geylan de û Hiraqles di Gurcistanê de û Kerîmxanê Zendî Kurdî di Cilfa de serê xwe hildan û doza padîşahî dikirin. Tarîxzan dibêjin, Kerîmxan û Elî Muradxan, ko herdû jî kurd bûn, di serê pêşî de bi hevre sûnd xwarin, ko kurekî Nadirşah bênin û bikin padîşah û Elî Muradxan bikin wezîr û Kerîmxan bikin serdarê leşker.

Lê hin dibêjin, ji ber, ko Elî Muradxan pîr û kordûnde bû Kerîmxan dixwest wî bikî padîşah û piştî wî, ew li şûna wî rûnî. Tenê çawa Elî Muradxan, Esfehan xiste bin destê xwe, dest bi talan û zor û setemê kir. Lê ev ne bi dilê Kerîmxan bû. Dibêjin, tevlî, ko Kerîmxan, ne ji malbateke xanedan û mezin bû jî, lê xelkê gelek jê hez dikir û bi carek dilxwazê wî bûn.

Tenê di Kenar jimar-1 de Mihemed Emîn Zekî beg dibêjî, xelkê hinda Xoy, di çîrokên xwe de dibêjin Kerîmxan, kurê miroveki keleş û xwînrêj bû, ko navê wî Îmak bû û hetta îro jî navê kalikê wî ne hatiye zanîn û winda ye.

Lê gelek neçû Elî Muradxan, walîyê Esfehan kuşt û Kerîmxan kete nav sawîr û tirs û lerzîna û di dilê xwe de got, eger Elî Muradxan, nexwazî min jî bikujî, lê bêgoman wê min ji dûr bixî. Lê dawî şer û pevçûnê di navbera herdû



Institut kurde de Paris

kurdên hevalbendên hev de destpêkir. Elî Muradxan, di meydana şer de bi destê serdar Mihemedxan hate kuştin. Di sala 1160 koçî de Kerîmxan di jêrê Îran de bû padîşahek bê hevta. Serbixwe rûnişt, lê nexwest wilo piştvekirî li mala xwe razî û dijminê wî xurt weke Mihemed huseynxanê Qacarî, li ser textebendê tarîxê di welatê Îran de sax bimênin. Di vabû dijminê xwe yeka yeka ji ber xwe bavêjî, ji lewra leş kerekî bêjimar û cengawer ji eşîrên Kurd, Ereb, Turkmen da ne hev. Xelkê bajaran û Ereb, Turkmen bi carek dost û dilxwazên wî bûn.

1- KERÎMXANÊ ZEND KURDÎ :

Çêkroxê vê dewletê Kerîmxan bû, ko çawa Elî Muradxanê Lorî kurdî hate kuştin, kes di ber sînga wî de nema û berê xwe da şerê Esedxanê Evxanî û Mihemed Huseynê Qacarî. Ji rêve ajote ser welatê Azerbaycan, ko di bin destê Esedxande bû û li nêzîkî Qezwîn herdû leşkerên mezin li hev rasthatin û şer destpêkir.

Lê leşkerê Kerîmxan şikest û şerpeze bi sed dijwarî xwe gihande çiyayên navbera welatê Faris û Xelîc û têde asê bûn. Lê Rustemsultan, ko mezinê gundekî biçûk, bi navê Xişt, gelek alîkariya Kerîmxan kir. Ji ber, ko gundê wî di serê çiyakî de bû, ko raserî çemê Girmisîrê û di derbendê, Komarîç de êrîşî leşkerê dijmin kir û perçewerçe ji hev be lav kir û perîşan, bêpergal leşkerê Esedxan bi şûnde reviya û şikest. Kerîmxan bi ser bilindî di vî şerî de xwe parast û zora dijminê xwe bir û çavên wî şikandin. Lê Kerîmxan, bi şikandina leşkerê dijmin tenê dilxweş nebû û da ser şopa wî û bajarê Şîrazê xiste destê xwe. Esedxan reviya û çû Bexda û ji wir çû Gurcistan û naçare paşê hate cem dijminê xwe, Kerîmxan û rûnişt. Padîşahê kurd gelek qencî pê kirin û bûne dost û hevalên hev.

Lê dijminê herî mezin Mihemed Huseynxan Qacarî ye, ko serdarê eşîra Qacarê Turke, ko Teymûrxan ji Sûriya bi xwe re anîbû û herwekû ev eşîr ji leşker û hevalbendên Şahismaîlê Sefewî bû.

Mihemed Huseynxan, piştî reva Esedxan, welatê Azerbaycan bi carek xiste destê xwe û karê xwe û şerê Kerîmxan di kir, bi leşkerekî giran ve hate ser Esfehan û naçare Kerîmxan bajarê Esfehan jêre berda û vegeriya Şîraz, paytexta xwe.

Lê Mihemed Huseynxan, 38 hezar mirov şande ser Şîraz û heşthezar li Esfehan hiştin. Tenê xelkê Şîraz, bi gernasî li ber xwe dan û Elîxanê Zend, ji paşve êrîş kire ser leş-

kerê dijmin û leşkerê Kerîmxan ji bajêr derket û direjî
dijmin kirin. Naçare leşkerê Mihemed Huseynxan vegeriyan
sfehan û hinek jê li hawîr bajêr hiştin, lê zû ji hev be-
lav bûn û çûne malên xwe.

Çawa, ko Mihemed Huseynxan, nikaribû xwe li Esfehan jî
bigrî û naçare berê xwe da Mazenderan û reviya û çû. Di sa
la 117 ê koçî de Kerîmxan ajote ser Esfehan û bi hesanî
girt û xelkê bajêr hatin pêşberî wî û pê dilxweş bûn. Çawa
ko bi serdariya Elîxanê Zend, leşkerekî giran şande ser Ma
zenderan. Elîxan, ji bo, ko karibî zora dijminê xwe bi he
sanî bibî, herdû bavikên Qacarî, ko herdem li ser mezinahî
ya eşîrê pevdiçûn, berdane hev û dijminê Mihemed Huseynxan
kirin hevalê xwe û berdane pêsîra Mihemed Huseynxan.

Di vê çaxê de eşîra Qacar, sê perçe bûn. Yek, li hinda-
ma Gence bû û yek li hindama Merwe û yek li hindama İstir-
abad bûn. Çawa, ko navê dijminê Mihemed Huseynxan jî Mihe-
med Huseynxan bû û serdarê eşîra Buxwarî Qacarî yan Baxarî
başî bû û bû hevalê Elîxanêzend.

Meger çendan Mihemed Huseynxan, bi gernasî kete meydana
şer, lê xwe negirt û zû şikest û Mazenderan kete destê Elî
xan û Mihemed Huseynxan bi dîlî kete destê dijminê xwe û
li Şîraz xistin zindanê. Piştî vê xurtiyê Azerbaycan jî ke
te destê Kerîmxan, lê dijminê wî, Fetehelîxanê Evşarîkurdî
xiste bin destê xwe û hate şerê Kerîmxan. Lê jêrê bajarê
Tewrêzê(Tebrîz) li hindama Qereçîmen, şer destpêkir û naça
re Fetehelîxan ji dijminê xwe re hişt û reviya û kete Ormî
ye. Lê di sala 1173 de xwe siparde Kerîmxan û gelek rûmeta
wî girt.

Lê ji ber, ko Fetehelîxan, bi çend serdarên Kerîmxan re
mejûl dibû, ko wî bikujin, naçare Kerîmxan, Fetehelîxan
kuşt û di jêrê Îranê de çend caran sergêjî çêbûn, lê Kerîm
xan bi xurtî perçiqandin.

Herwekû Zekîxanê birayê wî hate nav Lor û xwest, ko des
tê wî bigrin û bi hev re şerê Kerîmxan bikin. Lê kesî des
tê wî negirt û naçare vegeriya cem birayê xwe û Kerîmxan
derameteke mezin dayê û bi serdariya wî leşkerekî giran
şande ser hindama Damxan, ser Qulîxanê Qacarî. Zekîxan, bi
gernasî û sivik Qulîxan şikand û Qulîxan naçare xwe avête
nav Turkmana û xwe veşard. Bi vî rengî gelek lephilanînên
dî jî bi sivikî li ser destê Zekîxanê dijwar hatin vemiran
din. Bi vî rengî zekîxan welatê Îran kire gustîlek û xiste
tiliya Kerîmxan û sîh salî bi padîşahî û kamîranî derbas
kirin û navê padîşahî nebire ser xwe, lê her tişt di destê
wî de bû. Kerîmxan, Şahismaîl, kurê xuşka Şah Huseynê Se-



Institut kurde de Paris

fewî bi padîşahî li Şîraz li cem xwe danî bû û xwe bi serdar û serkarê Şah nav dikir.

GİRTİNA BAJARÊ BESRA :

Ji ber, ko xelkê hindama Besra û xelkê Îranê hevalbendê Elî ne, herdem çavên wa li girtina Besra û Kûfa digerin û dixwazin İraqa Ereb di bin destê xwe xin û ziyaretgehên xwe ji destê Sinnîya derxin û ji xelkê Îranê bi şerê Turkan bidî karkirin û navê welêt paqij bikî û dijminê xwe ne hêlî. Divabû şerekî di navbera xwe û Osmanlîya de bi afirênî û ev, yek ji şaşîyê serkarên dewleta Zend bû.

Çawa, ko Umerpaşa, walîyê Bexda di wê navê de bêş û xercên giran ji Îranîyên İraqê distandin û çûna Kerbela û Kûfa li ber wan dijwar û nexweş kiribû û Kerîmxan meger çend caran li cem Sultan gilî û gazin ji Umerpaşa kirin jî, lê kesî dengê wî nebir xwe û bersiva wî neda. Ji ber van îşan tevan Kerîmxan leşkerek bi serdariya Sadiqxanê birayê xwe şande ser Besra. Sadiqxan bi pênc hezar mirov di xelîc derbas bû û êrîş kire ser bajarê Besra û sîh gemî di avê re çûne şerê Turka û ji Beşîr û Rîx berê xwe dane Besra.

Meger çend gemiyên Turka li delavê Besra hebûn jî, lê ji ber, ko Sadiqxan Şetilereb xistibû bin destê xwe, gemiyên Turka şer nekirin û xwe li ber Estelê Îran negirtin û bi hesanî Sadiqxan Şetilereb derbaskir û xiste bin destê xwe û bi tewf û keleka di ser avê re pirek çêkir û bi hesanî derbas bûn û bajar xistin asêgehê. Bajarê Besra wê çaxê gelek mezin bû . Pêncî hezar mirov têde bûn û hawîr bax û bostan bûn. Suleyman Axa mirovekî jîr û gernas û li ber dilê leşker û xelkê bajêr gelek şêrîn û bi rûmet bû. Kesî gotina wî nedişkand, bedena bajêr gelek bilind bû, lê negelek asê bû, tenê çend birc têde hebûn, ko nêzîkî sed top di wan de danîbûn.

Di sala 1189 ê koçî de bajar kete asêgehê û dewleta Osmanlî ferman da wan. Diyarbekir, Şam, Heleb, Mûsil û hawîr leşker ajotin ser Besra. Lê çawa gihane Bexda û dîn, ko nikarin şerê Kerîmxan bikin, Umerpaşa, walîyê Bexda kuştin û şandin cem Kerîmxan û gotin: Eger te giliyê walî dikir vaye ji bo, ko şer di navbera Îran û dewleta Osmanlî de xurt nebî, me walî kuşt û hêvî dikin leşkerê xwe ji ser Besra bikşênî.

Lê Kerîmxan, ev gotin xiste qalibê tirsê û nexiste serê xwe. Sadiqxan hawîr bajêr berneda û naçare serdarê leşkerê Turk xwe da destê Sadiqxan, piştî, ko sal û mehek di asêgehê de ma. Di sala 1190 de Suleyman, walîyê Besra, bajar bi

destê Sadiqxan ve berda. Sadiqxan, ew bi dîlî, gel çend serdarên leşkerê Turk, bi payedarî şandin paytexta dewleta Kerîmxanê kurd, Şîraz. Sediqxan, bi camêrî rûmeta xelkê nav bajêr girt û li wan bû xwedî. Serdarek ji rexê xwe ve bi navê Elîmihemedxan, li ser wan danî û vegeriya Şîraz.

Lê paşê, şer di navbera du eşîrên Erebên hêla Besra de çêbû û Elîmihemedxan çû, ko navbera wan xwe bikî û di navbera wan de hate kuştin. Çawa Sadiqxan ev bihîst, zû xwe gihande wan û herdû eşîr lihevanîn û bi xêr û xweşî li Besra rûnişt, heta, ko Kerîmxan serê xwe danî û koça xwe jî vê cihanê barkir.

Çawa Sadiqxan bihîst, ko Kerîmxan serê xwe danî, ji Besra derket û çû Şîraz, paytexta welêt û walîyê Bexda bi hesanî Besra vegerande bin destê xwe.

Kerîmxan, heştê salî û di sala 1193 ê koçî de serê xwe danî û 28 salan serbixwe padîşahê welatê Îran maye. Lê hin dibêjin, 75 salî serê xwe danîye.

Kerîmxan, bazirganî, cotkarî di Îran de gelek bi pêşve ajotin û sergêjî, çetetî, talan, dizî ji welêt maliştin û wekhevî û dostanî, dilovanî xistin cihê wan. Şîraz gelek xweş û ava kir.

Kerîmxan, nexwendî bû, lê gelek ji xwendin û xwendevana hez dikir û xelk tajotin ser xwendinê û gelek rûmeta xwendewaran digirt û mala xwe kiribû civîngeha pêzan û xwendevan û ristevana. Gorna Sadî û Hafiz nûjen kirin û li hawîr wan gul û gulistan danîn.

Kerîmxan, bi xwe axakî çiyayî bû û li ser şer û mêranî û talan û pevçûnê mezin dibû. Lê piştî, ko bû padîşah ev tişt hemî ne tenê dûrî xwe, belkî ji welêt tevî dûrxistin.

Wezîrê navdar Mihemed Emîn Zekî beg, gelek pesnê wî didî û çîrokên dûr û dirêj di biwara wî de dibêjî û di guhêzî. Lê naxwazim di virde bibêjim, yan biguhêzim nivişta xwe.

PÎŞTÎ MÎRÎNA KERÎMXAN :

Bi rastî, çi mirovê, ko kûr temaşa bikî, dibênî, ko mirina Kerîmxan destpêka sergejî û paşketina dewleta kurd bû. Kerîmxan çar kur bi şûn xwe ve hiştin. Silahxan, Ebûfetihxan, Mihemedelîxan, Îbrahîmxan.

Herwekû kurekî wî bi navê Mihemedrehîmxan, di saxiya wî de serê xwe danî bû. Sadiqxan, çavên Ebûfetihxan rijandin, Ekberxan, çavên Silahxan û Mihemedelîxan rijandin û zimanê Îbrahîmxan jêkir û her çar kurên kerîmxan jî li qûn rûniştin.

Ji vir tê xuyakirin, ko ev malbata xwînxwar û hov û nezan nikarî welatê Îran di destê xwe de dûr û dirêj bihêlin, wê zû dawiya wan bê û ne xercê padîşahîne. Ji ber, ko zor û setema xwe bixwetî zû dawiya malbatê tênî û dewletê dixî destê bêgana û dara padîşahî û fermandariyê dixilxilênî û bi hesanî tê şikandin.

2- ZEKÎXANÊ ZEND-KURD :

Çawa Kerîmxan, serê xwe danî, Zekîxan, birayê wî bû padîşahê Îran. Lê serdarên eşîra Lek, ko Zend bavikek jêye, baweriya xwe pê nanîn û dixwestin yek ji zariwên Kerîmxan, bikin padîşah. Di keleha nav bajêr da asê bûn û xwe nesipardin Zekîxan. Ebûfetih, kirin padîşah, lê Zekîxan, ev rê ji ber wan girt û got, Ebûfetih û Mihemedelîxan, li şûna bavê xwe padîşahin, tenê ez serkar û serdarê leşkerê wa me lê bi rastî her tişt di destê wî de bûn. Lê bi vî rengî ne xwest, ko xelk jê bixeydin û herdem digot, herdû kurên Kerîmxan zarokin, negihane, ko padîşahiyê li welatekî weke Îran bikin. Ji lewra, ez li şûna wan kar û barê dewletê dixim destê xwe. Lê ê, ko ev rê didane ber, kurê xuşka wî, xwarziyê wî Elîmuradxan bû, ko bixwe destê rastê Zekîxan bû.

Zekîxan, xelkê di kelehê de vegerandin û bi hostayî derxistin, lê bi carek kuştin. Sadiqxan, çawa mirina Kerîmxan bihîst ji bajarê Besra derket û hate paytexta welêt, Şîraz li derê bajêr leşkerê xwe bi cî kir û kurê Caferxan, şande cem Zekîxan û ji Zekîxan gelek soz û gotinên xweş bihîstin. Lê gelek ewle nebû û şer di nav ap û birazî de destpê kir. Lê çawa Zekîxan dî, ko nikarî bi hesanî Sadiqxan bixî destê xwe, bajar asê kir û derê bedena bajêr bi carek girtin. Ebûfetihxan, kurê Kerîmxan xiste zindanê û padîşahî li ser navê Mihemedelîxan, kurê Kerîmxan hiştin. Hersê kurên Sadiqxan, ko di bajêr de bûn girtin û şande cem heval û serdarên leşkerê Sadiqxan û got, ew kesê bi Sadiqxan re şerê min bikî, ezê, jin, zarok û mirovên wî bikujim. Herwe kû xelkê berî hingî Zekîxan nas dikir, ko ev bêqidoşî jê tên û naçare bazdan û xwe avêtin rexê Zekîxan û Sadiqxan bi sê siwaran ve berê xwe da Kerman û reviyan.

Lê Zekîxan, kewtak siwar li pey şopa wî rêkir û bi çil mîlî li rojhilatê Şîrazê ji paşve gihane Sadiqxan û li derbendê Orincan, bi hev alîyan û serdarê leşkerê Zekîxan hate kuştin, leşkerê wî şerpeze bi şûnde vegeriyan û Sadiqxan kete keleha Kerman û têde asê bû û karê xwe û şerekî mezin kir.

Lê Mihemed Emîn Zekî beg, di rûpel 303, kenar-1 de dibê jî, piştî, ko Mihemedhuseynxanê Qacarî, hate girtin, zariwên wî reviyan û çûne Turkistan. Lê piştî çar salan vegeriyan û hatin nik Kerîmxan û gelek derametên bilind dane wan û Mihemedaqaxan, kurê Mihemedhuseynxan, paşê ev malbat û dewlet winda kir û bû padîşahê Îran.

Herwekû Kerîmxan, keça Mihemedhuseynxanê Qacarî, mar kiribû, lê piştî mirina Kerîmxan, Mihemedaqaxan reviya û çû Mazenderan û serbixwe doza padîşahiya Îran kir.

Lê Zekîxan, dizanibû fermandarê Qacarî bi hindama Mazenderan tenê qîma xwe nayênî. Ji lewra leşkerekî giran, bî serdariya xwarziyê xwe Elîmuradxan şande ser Aqamihemedxanê Qacarî. Lê Elîmuradxan, ne destê Zekîxan bû û bi zor û setema wî ne dilxweş bû. Çavnêriya çax û demên xwe dikir. Ji lewra çawa giha Taran-Rey, serdarên leşker civandin û ji wan re got, Aya diriste, ko em alîkariya vî mirovê xwîn xwar û setemkar bikin û zarokên Kerîmxan xistin zindanê û dost ji xwe re, ji me re nehiştin. Bi vî rengî serdarên xwe kirin dost û hevalên xwe û berê xwe da Esfehan û walîyê Zekîxan, danî û got, dixwazim yek ji zariwên Kerîmxan, bê ser textê padîşahîya Îran û ez ji xwe re tiştekî naxwazim. Her kesî berê xwe dane Elîmuradxan û hêviya qenciyê jê kirin.

Lê çawa Zekîxan, ev bihîst bi leşkerekî giran ve berê xwe da bajarê Esfehan û bi rê de li bajarê Yezdîxwast dest bi zor û setemê kir û bêşên giran avêtin ser xelkê. Çawa birek mirov çûne cem, ko jê hêviya kêm kirina bêşên xwe bikin, bi carek di kelehê werkirin û kuştin. Naçare xelkê bajêr lê gihanehev û kuştin.

3- EBÛFETİHXAN, KURÊ KERÎMXAN :

Di sala 1779 ê zayîn de, çawa Zekîxan, li Yezdîxwast hate kuştin, ev Ebûfetihxan, kurê Kerîmxan bû padîşahê Îran.

Meger çendan dilovan, comerd û payebilind bû jî, lê ne xercê padîşahîya Îran bû. Ji lewra zû ji destê wî derket û Sadiqxan bû padîşah û li şûna Zekîxan rûnişt.

4- SADİQXAN, BİRAYÊ KERÎMXANÊ ZEND - KURD :

Çawa Sadiqxan, kuştina Zekîxan bihîst, bi gernasî hate paytexta welêt û gelek neçû Ebûfetihxan girt û xiste zindanê û çavên wî rijandin û di sala 1194 de padîşahîya xwe eşkere kir û kurê xwe Caferxan şande Esfehan.

Herwekû Elîmuradxan, dijminê xwe Zulfiqarxan şikand û welatên Qezwîn, Sultanîye, Zencan xistibûn destê xwe û se-

Institut kurde de Paris

rê Zilfiqarxan şande Şîraz û hatibû Taran-Rey. Çawa girti-
na Ebûfetihxan bihîst, banga padîşahî da û ala serxwebûnê
di riwê Sadiqxan de hilda û berê xwe da Esfehan û Welîbeg,
ji ber xwe ve kire walî û fermandar.

Lê Sadiqxan, bîst hezar mirov bi serdariya kurê xwe Te-
qîxan şandin pêrgî dijminê xwe û Teqîxan, Elîmuradxan şi-
kand û gelek ji leşkerên wî xwe dane rexê Teqîxan û Elîmu-
radxan reviya û bi sed dijwarî xwe gihande Hemedan.

Lê Sadiqxan, ji kurê xwe re şand û got, gereke Elîmurad
xan bi carek bête perçiqandin û ji pişt wî venegerî. Lê Te
qîxan, tenê bi reva Elîmuradxan hate xapandin û bi payeda-
rî kete bajarê Esfehan û şadîmanî têde rûnişt û bihna dij-
minê xwe berda, fersende jêre hişt, ko karibî xwe tekûz û
saz bikî.

Elîmuradxan ji nû ve leşkerekî giran dahev û berê xwe
da şer û hate ser Teqîxan. Lê çawa Teqîxan, ev bihîst bi
leşkerê xwe ve çû pêrgî dijminê xwe, lê bi rê de pirê leş-
kerê wî dev jê berdan û çûne malên xwe. Li nêzîkî Hemadan
herdû leşkerê kurd-Zend, lihev rasthatin û şer destpêkir.
Lê vê carê leşkerê Elîmuradxan, leşkerê dijmin şerpezeker
û şikand. Teqîxan, bi lingê hespê xwe û bi hezar dijwarî
xwe ji devê dêwê mirinê parast û hate Şîraz Sadiqxan, leş
kerekî dî şande pêrgî dijminê xwe. Elîmuradxan, bi xwe be-
rê xwe dabû ser bajarê Şîraz û sivik dihat û zû xwe gihan-
de dîwarên bedena bajêr.

Lê Sadiqxan, kete asêgehê û heşt meha li ber xwe da, lê
ji ber birçîbûn û perîşanîya xelkê nav bajêr, naçare xelkê
derê bedena bajêr jêre vekirin û leşkerê Elîmuradxan, bi he
sanî ketin nav bajêr.

Lê Sadiqxan, û serdar û jin û zarokên xwe pêlakê di kele-
hê de li ber xwe dan û naçare paşê xwe sipardin dijminî xwe
Elîmuradxan, bi carek ew dane ber devê şûra û kuştin. Di sa
la 1186 de çira dewleta Sadiqxan, bi carek, bi bahoza sete-
mê hate vemirandin. Ji mala Sadiqxan, tenê Caferxan hate pa
rastin. Ew jî, ji ber, ko dostê Elîmuradxan bû, ne kuştin.

Gereke em zanibin, ko dawîya dewleta vê malbatê ber bi
newala mirinê ve sivik digindirî û wê dawî di bin lingê
dijminê wan de bê ne perçiqandin û winda bibî. Ji kevnare
de eve karê mezin û fermandarên nezanê kurd. Lê kengî emê
şiyar bibin, çavên xwe vekin û yek perçe li hember dijminê
xwe rawestin. Tenê tarîx dikarî bersiva vê pirsiyarê bidî.

**Ekberxan, kurê Zekîxan bi destê xwe Sadiqxan û zariwên**
**wî kuştin û piştî pêlakê Elîmuradxan, bi destê Caferxanê**

Institut kurde de Paris

kurê Sadiqxan, Ekberxan jî da kuştin û xwe jê xelaskir. Ca ferxanê kurê Sadiqxan kire fermandarê Esfehan û Şêxweysê kurê xwe kire serdarê leşker û paytexta xwe guhazte Esfehan û sînorê rajorê Îran siparde Uweysxanê kurê xwe û şande şerê Aqamihemedxanê Qacarî û zora wî bir. Lê Aqamihemed xan reviya û çû Îstirabad.

5- ELÎMURADXAN XWARZÎYÊ KERÎMXAN :

Çawa, ko me derbas kir Elîmuradxan paytexta xwe guhazte Esfehan û kurê xwe şande şerê Mihemedaqayê Qacar û zora wî bir. Mihemedaqayê Qacar reviya û çû Îstirabad, lê Uweysxan bi serdariya Mihemedzahirxan, leşkerekî giran û mezin şande ser Îstirabad, lê Mihemedzahirxan di meydana şer de hate kuştin û leşkerê wî ji hevbelav bû û naçar Uweysxan ji Mazenderan reviya û hate Taran û di sala 1199 de kete nav leşkerê bavê xwe.

Elîmuradxan, padîşahê Îran di wê navê de nexweş ket û tevlî nexweşiya xwe dixwest herî şerê dijminê xwe. Lê mizgîneke nexweş jêre hat, ko Caferxan, kurê Sadiqxan di Esfehan de bi navê padîşahî serê xwe hildaye û tevlî nexweşîya xwe li Caferxan vegeriya û meydan ji Aqamihemedxanê Qacarî re vala hiştin û xwe bi xwe ketin pêsîra hev. Elîmuradxan, bi gotina dektorê xwe nekir û berê xwe da şerê Caferxan. Lê li nîvê rê serê xwe danî û di sala 1785 ê zayîn de serê xwe siparde axa sar û çû.

Elîmuradxan, mêrekî dijwar û zana û dilovan bû û payebilind û comerd û hêja bû. Çavên wî wir bûn û Aqamihemed bi navê Elîmuradxanê kor navê wî hildida û digot, heta, ko ev korê payedar nemrî, em nikarin tiştekî bikin.

6- CAFERXAN, KURÊ SADÎQXAN :

Piştî mirina Elîmuradxan, Caferxan kete bajarê Esfehan û walîyê Elîmuradxan danî û Uweysxanê kurê Elîmuradxan xweste cem xwe û çavên wî rijandin.

Dewleta kurd, ji hevde dikevî û fersende ji Aqamihemedxan re hatiye û kurda hevdî perçiqandin û hatin kuştin û korkirin û sergêjî û şerên dijwar di nav kurdên milhasinde destpêkirin. Herwekû dilê xelkê ji van sergêjiyan hate dagirtin û ji xwedê hêvî dikin, ko zû ji vê malbatê xelas bin. Ji ber zor û setem ko li welatê Îran hatibûn rijandin û her kesî çavnêriya mirovekî zana û birewer dikir, ko wan ji van sergêjiyan biparêzî.

Aqamihemedxan, bi sêsed siwarî ve ji Mazenderan derket û bi rêde ji hawîr ve leşker lê gihane hev û bi dilxurtî û

bawerî berê xwe da bajarê Esfehan. Di sala 1788 ê zayîn de kete nav bajêr. Caferxan berî, ko leşkerê dijmin bigihê ba jêr Esfehan jêre berda û xwe gihande Şîraz û Hacî Îbrahîm, ko alîkariya wî dikir kire fermandarê Faris.

Tenê vê carê Aqamihemedxan, li Esfehan ranewesta û berê xwe da Şîraz. Lê bi rêde çend şer di gel eşîrên Loristan kirin. Naçare bi paş ve vegeriya Taran-Rey û Caferxan care ke dî Esfehan xiste destê xwe û Rehîmxan, kire qurbana serê Aqamihemedxan û kuşt û bi şûnda vegeriya û careke dî Esfehan kete destê dijminê wî. Lêdijmin vê carê li Esfehan ranewesta û berê xwe da Şîraz.

Herwekû Caferxan di çend sergêjîyan de weke serpêhatiya Hemedan, ko walîyê wî li ber asê bû, leşkerê wî şikand û bajarê Yezd jî ji destê wî derketibû. Lê bextê wî hêj sipî mabû, ko kurê wî Lutufelîxan, welatê Lar, Laristan sitand û leşkerê xwe careke dî şande ser Esfehan û dîsa girt. Lê careke dî ji dijmin re hişt û vegeriya Şîraz

Caferxan, bi alîkariya wezîrê pir jîr Mîrzahuseynxan ci hekî xwe di dilê xelkê de hiştibû û hêj xelkê jê hez dikir û dilxwazê wî bûn.

Lê li Kaşan şoreşek gur bû, lê bi serdariya Erebmihemedhuseynxan roj bi roj bi peşve diçû. Serdarê leşkerê Caferxan Elîqulîxanê Kazronî, Erebmihemedhuseynxan bi hezar û pêsed mirovî re li ser bextê xwe girtin û anîn Şîrazê, lê Caferxan, bextê serdarê xwe şikand û bi carek xistin zindanê û guh neda bextê Elîqulîxan.

Lê li hember vê yekê Hacîelîqulîxan, li mala xwe rûnişt û bi xeyd ji Caferxan dûr ket. Tenê qîma Caferxan bi vê yekê nehat û leşker şande ser serdarê xwe û bi zor vegerandin Şîraz û xiste zindanê. Hacîelîqulîxan di zindanê de vîlikek gerand û hevalên xwe pir kirin û kuştina Caferxan dane ber çavên xwe û bi alîkariya Seyidmuradxan, wezîrê kevnare, ko gelek alîkarîya Caferxan kiribû û ji bo tiştekî nehêjayî xistibû zindanê, vîlika xwe birin serî.

Hinek efyûn xistin nav xwarina Caferxan û çawa ji hiş ket, bihev re êrîş kirin ser laşê wî û di sala 1789 ê zayîn de Caferxan kuştin û serê wî jêkirin û li nav bajêr gerandin û bajar xistin destê xwe.

## 7- LUTUFELÎXAN,KURÊ CAFERXAN, KURÊ SADÎQXAN :

Berî niha ji ber bavê xwe ve li Kerman rînuştî bû û çawa bavê wî hate kuştin Seyidxan, padîşahîya xwe eşkere kir û Lutufelîxan hate bajarê Bûşehir serê xwe danî û ji kurê xwe re got, gereke arîkarîya Lutufelîxan bikî.

Şêxnasir, leşkerekî hindik şande ser Şîraz, lê paş de şikest û şerpeze vegeriya. Hacîhaşim, birayê Seyidxan, şêx nasir şikand û Seyidxan leşkerek bi serdariya Hacî İbrahîm şande ser Lutufelîxan û ev serdarê mezin bû hevalbendê Lutufelîxan û bihev re çûne ser Şîraz û bajar xistin destê xwe.

Lê Seyidxan û hevalên xwe di kelehê de asê bûn, ko paşê naçare xwe sipardin dijminê xwe û Lutufelîxan, Seyidxan bi darvekir. Lê Hacîelîqulîxan, li ser hêvîkirina Hacî İbrahîm azad kir û gelek rûmeta wî girt.

Tenê Lutufelîxanê bîst salî û di nûbihara ciwanîya xwe de bû padîşah, lê nikaribû di bin vî barê giran de rabî.

Di vê navê de Mihemedaqayê Qacarî hate ser Şîraz û Lutufelîxan bi leşkerê xwe ve derkete pêrgî dijminê xwe û bi paşde şikest û di Şîraz de asê bû. Lê piştî mehekê Aqamihemedxan vegeriya Taran û Lutufelîxan xwe bi serhevde anî û karê xwe û şerekî mezin û dirêj kir.

Çawa, ko Aqamihemedxan li Azerbaycan şerê hin dijminê xwe dikir. Lê Lutufelîxan li bendeyî hatina dijminê xwe ranewesta û bi xwe hate ser bajarê Kerman.

DİLSARİYA NAVBERA LUTUFELÎXAN Û WEZÎRÊ WÎ :

Nivîsvanê leşkerê Caferxan di saxiya Caferxan de hin pere dizîbûn. Caferxan guhê wî jêkiribû. Mîrza Mihdî, di kuştina Caferxan de xwedî par û pişk bû. Lê çawa Lutufxan hate ser text û Şîraz bi zor xiste bin destê xwe, dixwest Mîrza Mihdî, bikujî. Lê wezîrê gernas, ko gelek alîkarîya Lutufelîxan kiribû, nexwest, ko Mîrza Mihdî bê kuştin û bi serde jî perwa pêve kirin.

Lê diya Lutufelîxan gotinên çors dane riwê kurê xwe û got, ne kêmasîye, ko bi ser kuştina bavê xwe de tu perwa bivî mêrikî vekî. Vê gotinê gelek dilê Lutufelîxan êşand û Mîrza mihdî şewitand û çawa Hacî İbrahîm, wezîrê pir jîr dî, ko Mîrza Mihdî hate şewitandin. Heta nav tirs û sawîran û di dilê xwe de got, bêgomane, ko wê min jî bikujî. Xwest, ko bi carek xwe ji Lutufelîxan biparêzî û padîşahê, kurd winda bikî. Wezîrê navdar bi xwe ev serpêhatî ji Sîr Malkolim re gotine.

Lê çawa ji tarîxa padîşahên kurd tê xuyakirin, dawîya vê dewletê niha hatiye. Ji lewra gereke wezîrek yan serdarek vê dewletê bixî destê xwe yan jî bixî destê yekî dî, ko karibî di bin siya wî de serbilind û payedar bijî. Ji ber, ko kengî laş weza û sêfil dibî meydan ji mikroban re fireh dibî û bi hesanî dikarin wî laşî biherivênin û biku-

jin.

Dewleta Eyûbî, dewleta Merwanî, dewleta Rawadî - Deysem wezîrên dijwar û bêbext ji wan sitandine lê piştî riziyanê.

Wezîrê dijwar, ji wê rojê de windakirina vê malê xiste dilê xwe û hilma padîşahî kete pozê wî û dî, ko dawîya vê malbatê nêzik bûye, çima ji xwe re tacê nexwazî.

Piştî pêlakê Lutufelîxan bi leşkerekî giran ve ajote ser Esfehan, lê berî, ko birêkevî yek ji malbata Zend kire serdarê leşkerê Şîraz û yek ji wan kire dizdarê kelehê.

Lê hêj Lutufelîxan bi çend qûnaxa ji paytexta xwe dûr neketibû, Hacî İbrahîm, wezîrê dijwar, bajar bi carek xiste destê xwe û bi hesanî keleh sitand. Mirov û hevalên şah dîl girtin û birayê xwe Mihemedhuseynxan, kire serdarê leşker û ji birayê xwe re , ko di nav leşkerê Lutufelîxan de bû, şand û got, çîrok bi vî karî çêbûye.

Çawa, ko leşkerê Mihemedaqaxanê Qacarî, bi serdariya xwaziyê wî Babacan, bi bîst fersaxa nêzîkî li leşkerê Lutufelîxan kir, birayê wezîrê dijwar, bi şev û bi çend leşkerê xwe ve êrîş kirin ser cihê padîşah û kirin qîr û zîr. Padîşah çawa bihîst, ko leşkerê wî bûne dijminê wî, siwar bû û bi alîkarıya Tehmasebqulîxanê Fîlî lorî, ko heftê siwar pêre bûn, bi hezar dijwarî xwe ji vê bextrejiyê xelas kir û reviya. Di sala 1791 zayîn de berê xwe da Şîraz, lê birê de serpêhatiya wezîr bihîst.

Herwekû di vê navê de leşkerê wî sêsed siwar mabûn û çawa giha Şîraz, şande cem wezîr û jê pirsî, ka çi dixwazî. Lê wezîr, lê vegerand û got, dixwazim wî ji padîşahî bavêjim û bere bi paşde vegerî, berî, ko bêkuştin.

Lê şah Lutufelîxan, bi gotina wî nekir û şer destpêkir. Çawa Hacî İbrahîm dî, ko leşkerê dijmin hin bi hin giran dibî, dest bi lîzekê kir û got, çi kesê di nav leşkerê Lutufelîxan de şerê min bikî, ezê zar û zêçên wî bi carek bikujim yan ewê birevin û bêne nav bajêr.

Bi vê gotinê pirê leşkerê Lutufelîxan reviyan û çûne nav bajêr û çend mirovên hindik pêre man. Lutufelîxan bi şûnde vegeriya Bûşehir. Lê ji ber, ko Şêxê Bûşehir bi xwe bûbû hevalê Hacî İbrahîm, ew negirte xwe û rê nedayê. Naçare Şah xwe ayête Bender-Rîk û fermandarê wê gelek rûmeta wî girt û jêre leşkerek civand û pêre çû ser dijminê wî. Lê birê de leşkerê Şêxê Bûşehir, kete riya wan, lê bi gernasî leşkerê dijmin şikand û Serdarqulîridaxan bû hevalê wî û bihev re çûne Kazron û bi zor girtin û çavê Hacîelîxan, fermandarê Kazron rijandin.

Tenê ji ber vê yekê gelek ji leşker û hevalên wî jêgeri yan û çûne mala xwe. Çawa hate ser Şîraz, Hacî İbrahîm bi gernasî li ber xwe da û han ji Aqamihemedxanê Qacarî xwest û han bi sivikî giha ser şer, lê leşkerê Lutufelîxan, leşkerê Qacarî şikand û perçe perçe kir. Lê Aqamihemedxan leşkerekî dî bi serdariya Canmihemedxan û Rizaqulîxan şande ser Şîraz.

Her çenda leşkerê Lutufelîxan hindik bû jî, lê bi rêzanî û tektîkê xwe zora dijminê xwe bir û leşkerê Qacarî ji hev perçe kir û şikandin. Serdarê leşkerê dijmin, Rizaqulîxan bi dîlî kete destê leşkerê kurd û vê xurtiya Lutufelîxan dilê Hacî İbrahîm xiste nav tirs û sawîran û bi carek padîşahî ji gomana wî dûr kir û şande cem Aqamihemedxan û bi carek welat ji padîşahê Qacarî re pêşkêş kir. Weke, ko zarok dibêjin, ne ji min re û ne ji te re, ji xwedekê di ser me re.

Aqamihemedxan, li çi digerî, ev ji xwe re bi pîrozî dît û bi sîh hezar siwar ve berê xwe da bajarê Şîraz, paytexta kurdên Zend û heta bîra wî û got, ev cara paşîye, ko yekê ji me herdiwa li şûna yekî mexel bê û padîşahî gereke ji yekî re bimênî.

Lê çawa leşkerê Aqamihemed, giha gundê Meyan, Lutufelî, bi şev û bi leşkerekî hindik ve ji nişka ve bi serde girt û bi gernasî leşkerê dijminê xwe şikand û leşkerê Lutufelîxan kete nav barxana Aqamihemedxan û İbrahîmxanê Qacarî kuşt û leşkerê wî ji hev belav kir. Tenê bi gelepûrave man û hew li pey Aqamihemedxan çûn. Ji wan'were, ko Aqamihemedxan hew karî vegerî meydana şer. Bi carek bazda ye û serdarekî Lutufelîxan xiste serê wî, ko heyfe leşkerê me vê barxanê talan bikin û em pey Aqamihemedxan kevin. Bi vî awayî Lutufelîxan hate xapandin û hew pey şopa dijminê xwede çû.

Lê di berê sibê de banga şer pê da zanîn, ko hatiye xapandin û tac dewlet ji destê wî winda bûn. Ji nûve hate bîra wî, ko Mîrzafehilahê Erdelanî bi vê gotinê, ew xapandiye û ji nûve dar di destê wîde şikest û bi carek hêvî nema ko careke dî taca Îran bidî serê xwe. Ji xwe re rev ji mêranîyê çêtir dî û bi çend siwarên xwe ve bazda û xwe avête bajarê Kerman. Ji nûve leşkerê xwe gihande hev. Lê Aqamihemedxan, bi xwe çû Şîraz û hinek ji leşkerê xwe şande ser Kerman û çawa hatina leşkerê Qacar kete guhê leşkerê Lutufelîxan dest bi talana kirin û ji hev belav bûn. Naçare Lutufelî berê xwe da Xerasan û di sala 1207 ê koçî de giha Xerasan. Mîrhuseyn, fermandarê bajarê Tobos, xwe da ber û li ber barê wî rabû û sed siwar bixwe re hilanîn û çûne ba

jarê Yezd, lê fermandarê Yezd, leşkerek rêkire pêşîya wan û rê li ber wan girt. Lê leşkerê Lutufelîxan dijminê xwe şikand û derbas bûn û çûne bajarê Ebûkeh û bi zor xiste destê xwe û ji xwe re kire leşkergeh û tê de rûnişt. Gelek neçû hezar û pêsed siwar pêre gihane hev û di sala 1208 de berê xwe dane bajarê Darabgurd.

Lê çawa ev gotin kete guhê Aqamihemedxan, yan şahê Îran û Hacî Îbrahîm, du leşker ji Taran û Şîraz rêkirin ser Lutufelîxan û naçare ji Darabgurd derket û çû gundê Renîz û tê de asê bû. Lê piştî pêlakê ji wir jî derket û vegeriya gundê Topiz, lê dostê wî jêre got, hew karim tiştekî ji te re bikim, lê ya qenc ewe, ko herî cem Teymûrxanê padîşahê Efxanistanê. Ew tenê dikarî te vegerênî ser textê te. Lê ji bextreşîya vî mêrikî, çawa giha nîvê rê, bihîst, ko Teymûrşah, serê xwe danî û li wir rawesta û kete nav sawir û gomana û bi ser xwe de pûjinî û hew bi pêş de çû.

Lê hêj wilo nivîsarek jêre hat, ko du fermandarên hindama Kermanşîr jêre rêkiribûn û gotibûn, Mehmûdxan û Cihangîrxan, em herdû dixwazin vegerî û xwe li me bigrî. Emê mal û can di oxira te de bidin û vê nivîsarê hinek ronahî berda ser goman û daxwaz û hêviyên wî û nagihan vegeriya Kermanşîr. Çend siwar lê gihane hev ajote ser Kerman û piştî şerekî xwîndar, leşkerê şahê kurd di ser dîwanran ve kete hindirwê bajêr û pêwanê bedenê tirsiyan û cihê xwe ji dijmin re berdan û ketin keleha nav bajêr û serdarê leşkerê Kerman bazda û xwe ji mirinê parast û xelas kir. Lê leşker û barxane bi carek ketin destê Lutufelîxan û gelek ji dijmin hatin kuştin.

Careke dî Lutufelîxan, pere û xutbe bi navê xwe derxistin û bû padîşahê Îran û bihna wî hinek derket.

Lê çawa Aqamihemedxan, şahê Îran, ev bihîst di sala 1210 ê koçî de, bi leşkerekî giran ve ajote ser Kerman û çû şerê dijminê xwe û Lutufelîxan, Elîşah, di bajêr de asê kir. Nêzîkî meheke şer dirêj kir û dijmin zora wî nebir. Lê çend serdarên wî bi bêbextî çend bircên bedena bajêr dane destê dijmin û çend hezar ji leşkerê Qacar ketin nav bedenê. Lê leşkerê kurd bi zor careke dî ji wan sitandin. Lê serdarekî dî xwe siparde destê dijmin û derê bedenê ji leşkerê dijmin re vekir. Bi xurtî leşkerê Qacarî ketin nav bedenê û hawîr cî li leşkerê Lutufelîxan teng kirin. Lutufelîxan, careke dî û bi gernasî ji Kerman derket û careke dî çû bajarê Kermanşîr û Aqamihemedxan sê şev û sê rojan bajar bi destê leşker ve berda û her tişt dane ber lingê Qacaran û bê namûsîyên kesnedî di bajêr de kirin, ko enîya

Institut kurde de Paris

tarîxê ji şerma wan xwedan didî û qermiçî dimînî.

Lutufelîxan, pêlakê li Termanşîr rûnişt û serdarên wî jêre bi dizî gotin, ko fermandarê Termanşîr dixwazî me bi bêbextî bikujî, lê Lutufelîxan, guh neda wan û pişt vekirî kete xew. Lê bi şev dî, ko birek mêr çekdar hawîr şahê kurd girtin, lê Lutufelîxan, bi gernasî şûrê xwe kişand û dirêjî dijminê xwe kir û gelek ji wan kuştin û li hespê xwe siwar bû, ko birevî, tenê yekî hesp kuşt û bi du birîna birîn kirin û birin nik Aqamihemed û xwînrêj bi neynûka xwe çavên wî rijandin. Di sala 1794 ê zayîn de kuştin. Li vir perdake reş xwe bi ser dewleta kurdê Zendî de berda û dawîya çîrokê hat. Jîna 25 salîya Lutufelîxanê kurd dawî hat. Ev hêjaye, ko filimekî sînemayî li ser bê girtin.

DEWLETA KURT :

Gurzon, dibêjî, eşîra Kurdgelî, li Sîstan, Secistan di sala 643 ê koçî de çêkiriye û heta sala 785 ê koçî maye.

Lê Şemsidîn Samî, xwediyê Qamûsililam dibêjî, ev dewlet di sedê 7-8 ê koçî de çêbûye û maye û li welatê Hirat, hatiye lidarxistin. Welatên Xor, Xeceristan, Sîstan di bin destê wan de bûn.

Ew mirovê, ko ev dewlet li darxistiye Şemsidînmihemede, ko li şûna bavê diya xwe bûye padîşah û di sala 643 ê koçî de bûye padîşah.

1- ŞEMSİDÎN MİHEMED :

Di çaxê Menkexanê Mexelî de, di sala 643 ê koçî de li şûna kalikê xwe, bavê diya xwe rûniştiye,lê pir cihê axînê ko navê bavê wî û kalikê wî nehatine zanîn û ji rexê Menko Aqayê Elîxanî ferman bi fermandariya wî derxist û perwa û diyarî jêre rêkirin û di sala 676 ê koçî de serê xwe danîye.

2- RİKNİDÎN, KURÊ ŞEMSİDÎN :

Di sala 676 ê koçî de bi gernasî kete şûna bavê xwe. Lê gelek neçû koça xwe ji cihana jîndarî barkir û hevsarê dewletê bi destê kurê xwe ve berda û serê xwe danî.

3- FEXRİDÎN, KURÊ RİKNİDÎN, KURÊ ŞESİDÎN :

Di saxiya bavê xwe de heft sala di zindanê de maye. Lê çawa hate berdan çû cem Xazanxan û bi alîkariya Newrozxan, bû fermandarê kurt. Lê paşê Newrozxan reviya û çû cem Fexridîn, lê Fexridîn, ew siparde dijminê wî. Herwekû vî Fexridînî dest bi şerê birayê xwe Olcatexan kir û diwazde sa-

lan di nav şer û xwînrijandinê de ma û di sala 706 ê koçî de serê xwe danî.

4- XİYASİDÎN, KURÊ RİKNİDÎN, KURÊ ŞEMSİDÎN :

Piştî mirina birayê xwe, bû fermandarê welatê Kurt û di sala721 ê koçî de çû heccê û li vegerê hate Sultaniye, pay texta Elîxanîya û bi diyarî Sultan Esîseîd û mîr Çopan ket Lê gelek neçû Mîr Çopan û kurê xwe Hiloxan, ji ber Ebûseîd reviyan û çûne cem Xiyasidîn. Xiyasidîn, di mala xwede her dû jî kuştin û laşê wan ji sultan Ebîseîd re rêkirin û 22 sal bi fermandarî rabiwardin û serê xwe danî.

5- ŞEMSİDÎN, KURÊ XİYASİDÎN, KURÊ RİKNİDÎN :

Piştî mirina bavê xwe , bû fermandarê welêt. Lê çend meh neçûn û di sala 730 ê koçî de serê xwe danî.

6- MUİZİDÎN, KURÊ XİYASİDÎN, KURÊ RİKNİDÎN :

Di sala 736 de, bi serfirazî kete şûna birayê xwe û padîşahiya xwe eşkere kir û pere û xutbe li ser navê xwe der xistin û xwendin. Di welatê Xor, di sala 771 de serê xwe danî.

Sadidînê Tevdezanî nivişta Mutewel, di Belaxa de li ser navê wî çêkiriye û piştî mirina wî kurê Xiyasidîn Pîrelî, bû fermandarê welêt.

7- XİYASİDÎN PÎRELÎ, KURÊ MUİZİDÎN, KURÊ XİYASİDÎN :

Piştî mirina bavê xwe, bû fermandar û padîşahê welêt û piştî diwazde sala leşkerê Teymûrxan Pîrelî, di keleha Herat de girt û tevlî zarokên wî kuştin.

15.10.1965 Cigerxwîn

Institut kurde de Paris

# DAWÎYA CÎLDÊ YEKEM

## *EFRANDİNEN CİGERXWÎN YÊN HETA NİHA ÇAPKİRÎ*

1. Dîwana yekem, *Pirîsk û Pêtî, Surîya 1945*
2. *Cîm û Gulperî, Çîroka Yekem, Surîya 1948*
3. *Dîwana Duwem, Sewra Azadî, Surîya 1954*
4. *Reşoyê Darî, Çîroka duwem, Surîya 1956*
5. *Gotinên Pêşiyan, Surîya 1957*
6. *Destûra Zimanê Kurdî, İraq 1961*
7. *Ferheng, Perçê Yekem, İraq 1962*
8. *Ferheng, Perçê Duwem, İraq 1962*
9. *Dîwana Sêyem, Kîme Ez, Libnan 1973*
10. *Mîdya û Salar, Libnan 1973*
11. *Dîwana Çaran, Ronak, Swêd 1980*
12. *Dîwana 5'a, Zend Avista, Swêd 1981*
13. *Dîwana 6'a, Şefaq, Swêd 1982*
14. *Dîwana 7'a, Hêvî, Swêd 1983*

Institut kurde de Paris

## WEŞANÊN ROJA NÛ

1. Ronak, Dîwana 4'a, Cigerxwîn, Stockholm 1980
2. Zend-Avista, Dîwana 5'a, Cigerxwîn, Stockholm 1981
3. Kilam û Miqamêd cimeta Kurda, Cemîla Celîl, Stockholm 1982
4. Şefaq, Dîwana 6'a, Cigerxwîn, Stocmholm 1982
5. Zozan, Casimê Celîl, Stockholm 1982
6. Hêvî, Dîwana 7'a, Cıgerxwîn, Stockholm 1983
7. Tarîxa Edebyeta Kurdî-1, Qanatê Kurdo, tockholm 1983
8. Dimdim, Ereb Şemo, Stockholm .983

Institut kurde de Paris



" Di vî perçî de dixwezim, Cografiya û nav û koka kurd, zimenê kurd, olperestîya kurd û rewşa abûrî, civakî, rêzanî bidim xuyakirin. Eger ev karê dijwar ne barê mirovên weke mine jî, lê dixwazim her nebî, kevirekî ji devê rê bidim alî ko hozan û tarîxzanên piştî me karibin bi hêsanî vî karî bibin serî û bi cîbikin.

Çawa hin mirovên weke Mihemed Emîn Zekî Beg û Merdoxî û Şerefxan û hin mirovên dî ji hene, ko rê ji mere xweş û ronî kirine, ko şayanê pesn û rûmetın û em di îrode sipasên xwe û miletê Kurd ji wan mirovênre pêşkêş dikin."

Cigerxwin

WEŞANÊN
ROJA NÛ

Institut kurde de Paris